# Nasnameya Kurdî li Sûriya

[ferhengok](#) [fehrist](#)

# Mafên çapê parastîne

Navê pertûkê:
Nasnameya kurdî li Sûriya

Daner:
Mehmûd ê Sebrî

Çapa yekem, sal: 2011
Beyrût – Libnan
Çapxaneya Emîral.

Derhêner û belga pertûkê: Royar ZENGÎ.

**Mehmûd ê Sebrî**
**(Evîndar ê 'Xemgîn)**

# Nasnameya Kurdî li Sûriya

**Vekolîn**



**Bi soza lehengan  bi sûnda giran**
**Bi doza bi gorî dibin   pakrewan**
**Bi xaka ji xwîna temîz têr vexwar**
**Me jînek bi rûmet divê yan neman**

***Mehmûd ê Sebrî***

# *Diyarî*

- Bo her piştgirên mafên mirov û gelan, ew ên bi dil û can, dijî serdestî û şovînîtiyê ne.
- Bo her berevan û têkoşerên mafên rewa û dozên giran .
- Bo her goriyên amancên bilind, û pêşengên mujdevanên azadî û aştî û pêşveçûnê .
- Bo her kesê ji rastiyê nazîvire, bi aliyê berjewendên ne rewa ve.
- Bo her kesê ji şaşiyan vegere, bi aliyê rastî û mirovatiyê ve.

***Bi navê Yezdanê dilovan***

# *Pêşgotin*

Bi dilekî bi tirs, em têkiliyê bi vî babetê giran û giring dikin, çikû pêwîstên vekolînê, li ser nasnameya gelê Kurd kêm in, li ber destê me, ji alîkî bi egera ku rewşenbîrên Kurda yên dîroknas, hindik giringî dane dîrok û ferhengiya Kurdî, û ji alîkî dî ve, hin dîroknasên biyanî xwestine dîroka gelê Kurd bi çuqulîkên xwe ve – winda bikin, yan ew dîrok, ji wan re, ne giring bû, û guh ne dane wê. Û ji aliyê sêyem de, erkê ku xwedî bi wî ne rabe – na ête xwestin ji biyaniyan ku ew pabend bin bi hilgirtina wî.

Lê digel vê, nasnameya gelê Kurd winda ne bû ye, bi ho ya xurtiya surişţî ya gelê Kurd, digel kilametên ku hatine serê wî, û xweragiriya wî li ser xakê wî yê dîrokî, bi hezarên salan, ta van demên han ku koledarên şovînî dixwazin wî bipişêvin û durvên wî yên netewî – tune bikin, yan vî gelî bi tevaya salix û taybetiyên wî – ji ber çavan hilînin.

Ez bi hêvî me, ku ev vekolîna min ya ne berbiçav, rencek bi sûd be, ji bo gurêxkirina rewşenbîrên me yên Kurdên Sûrî ku hevkar bin di vî erkê pîroz de, da ev beşê biçûk , ji gel û welatê me–xweş li ber çavan xuya be, çikû hebûna vî beşî ya dîrokî – reh kûr û şewqdar e, ji demên fermandariya Mîdiya û Horî û Mîtaniyan, hem li nik dîroknasên Ereb (Mes'ûdî,

Istexrî), û yên nihad paqij ji dîroknasên biyanî (Mînoriskî, Î. M. Diyakonof, Mark Saykis…).

Ez, lêbûrînê ji gelê xwe û ji rewşenbîrên Kurd hêvî dikim, ji kêmasiyên di vê vekolînê de, çikû ew rewşa me ya kambax nas dikin, ji aliyê kêmbûna jêderên pêzanînan, nemaze li ser Kurdên Sûrî yên bajarên mezin, wek Şam, Heleb…Ji ber vê yekê, giringiya vekolînê hatiye ser her sê deverên dêmanî yên Cizîrê û Beraziya û Çiyayê Kurmênc, çikû ew her sê dever – cihnişînên me yên bingehî ne, ji ber ku beriya sed salî, bajar li wan deveran – pir Kêm bûn, lê gund û avahî û çandinî ji mêj ve hebûn.

Her wiha pêzanînên me li ser Kurdên bajarên Cizîrê – kêm in, bes em dizanin ku piraniya niştecihên bajarên deverên Kurdî (Cizîrê, Beraziya, Çiyayê Kurmênc) kurd in, bi rêje yên bilind, ta pirtir ji 80 ji sedî, ji bilî bajarokên Şedadî, Hol, Mergeda li Cizîrê, evên han Ereb in.

Em lêbûrînê hêvî dikin ji wan hoz û birrên Kurd ku li gorey pêwîste, em li ser wan ne axivîne, wek Kurdên ku ji ber cengên navbera Rûsiya û Osmanliyan – mişext bûn, berî cenga Cihana yekem ew ên niştecih bûn li deverên Kurdî li Sûriya, ew ên ku hijmara wan 25- 30 hezar kesin. Her wiha birrên ji hozên Harûnî, Dummilî, Sûrgiçî, Baravî, Badilî, Dêrikî, Mêrdînî, Şêbî, Mehfelîtî, Şikakî... ku her yek ji wan bi sedên malbata ne, lê belav bûyî ne, û li hev ne civiya ne, li cihekî taybet.

Her wiha pêzanînên me qels in, li ser wan Kurdên hatine Pişavtin û bûne Ereb, li hin deverên Sûriya (Hema, Cisr-Şuxûr,Şam, Perava Sûrî…) û ta nuha jî ew xwe Kurd dibînin, lê mixabin taybetiyên xwe yên netewî – winda kirine.

Çendî ez pabend im bi berevaniyê, di ber gel û welatê xwe de, lê ez naxwazim bikevim nav şaşiyên şovînî, ew ên ku şovîniyên wek Mihemed Teleb Hilal û yên wek wî, di nav de nuqum bûne.

Ez hêvîdar im ku ev vekolîn babetî be, û pabend be bi rastiyê, û berevaniyek rewa be, di ber Kurdên Sûriya de, ew ên azarkêşên gelek coreyên çewsandin û zordariya şovînî ne, û her em û tevaya gelê me bendewarên azadiyê ne.

**Mehmûd ê Sebrî**

# *Hoza Koçerên Botan*

Koçerên Botan  hozek mezin e, ji du hevbendên fireh pêk tê:

**1-**Hevbendiya Mîran ku ji van êlên Koçer pêk tê: 1- Berkeliya, bi serokatiya malbata Mustefa Paşa.2- Elyoka bi serrokatiya malbata Miheme Xoxika.3- Wareserya bi serokatiya malbata Yûsifê rîsipî. 4- Sêniga bi serokatiya malbata Emer Eliya. 5- Îsibka(Îsika)bi serokatiya malbata Silêmanê Xalid. 6-Ermedela û Evdela bi serokatiya malbata Simaîlê Eyûb. 7-Berzeriya bi serokatiya malbata Heso reş A'xa. 8- Kotolî bi serokatiya malbata Gul Miheme, Garisa, Dudêra... Ev hevbendî tête navdan Çoxsor.

**2-** Hevbendiya Şilit ku pêk tê ji Teya, Mûsa reşa, Batuwa, Kiça, Xêrika…Ev hevbendiya duduwa – hat damezrandin bi serokatiya Emerê Temir, li Dêrgul (Emer hat kuştin bi destê Tirka). Hoza Koçerê Botan di demên Osmanliyan de, beşek bû ji fermandêriya (Mîrîtîya) Bedirxaniyan, û bi egra ku koçer bûn, di ça'xa sermê de, dadiketin deşta li jêr çiyayê Cûdî ta Şingalê, û di demên germê de, hildikişiyan Zozanan, ta digihan devera Wanê. Lê piştî şikestina Bedirxaniyan di raperîna Bedirxan Paşa ûYezdanşêr de, Serokatiya Koçerên Bota – kete destê Mustefa Paşa, ji malmezinên Mîran. Mustefa Paşa  kurê Temir A'xa kurê Birahîm A'xayê pêşîn kurê Mihemed kurê Husam kurê Ebdikirîm kurê Kumsor A'xa kurê Delê ye. Delê Êzîdî bû, ji hoza Dinna ye. Rîsipiyên Mîran dibêjin ku pêşiyên malbata Mustefa Paşa û Mîran bi tevayî Êzîdî bûn, ji êla Dinnan. Û

bi egera nekokîyek xwe bi xwe, hatine nik Mîrê Botan, û wî jî, bi rêzgirtin ew malbat kirin serekên Koçerên Botan.

Di vê malmezina Koçeran de, du kurên Husam hebûn bi navên Mihemed û Hisên, zaro û neviyên Mihemed têne navdan A'xa, Mustefa paşa ji va ye. Û zaro û neviyên Hisên têne navdan PisA'xa.

Mustefa Paşa, bi hoza xwe ya mezin ve – alîkar bû digel Osmanliyan, û bi sedên şervanan pişkdarî di cenga Belqan de kirin, bi serketinek xuya, û şervanên Koçeran, li dema vegerê – hatin pêşwazî kirin, bi gurzên gula û lîlandinan, li hemî bajarên ku di wan re bûrîn, nemaze li bajarê Amedê.

Şerekî xwe bi xwe, di navbera hoza Koçer de – rû da, û Mustefa Paşa xwest wî şerî rawestîne, û gulleyek jêder-winda li Mustefa Paşa ket, û bi encama wê, giha dilovaniya Xwedê.

Hin dibêjin ku Mustfa Pşa bi egera dek û pîlanek desthilata Osmanlî hatiye kuştin, bi hoya bandora wî ya fireh ku Osmanlî ji wê ditirsiyan. Tête gotin ku şivanekî koçer pezê xwe li devera Şingalê diçêrand, û yekî Êzîdî ji wî şivanî pirsiye; ma tu na tirsî li vê devera dûr ku hin pezê te talan bikin? Û şivan li wî vegerandiye: Şêrek heye li çiyayên zozana di irmije, û çiya û newalên Şingalê, ji ber irmijandina wî dilerizin, ew şêr pezê min diparêze. Mebesta şivan bi şêr Mustefa Paşa ye.

Paş ê hoza Koçeran pişkdarî kirin di cenga Osmanliyan de dijî Rûsya Qeyserî, di nava alayên Hemîdî de, bi serdariya Ebdilkirîm Beg kurê Mustefa Paşa.

Ebdilkirîm Beg di destpêka jiyana xwe de hînî xwendin û zanînê bû, û ji civat û mêvangeha bavê xwe gelek ezmûnên bi sûd wergirtin, û xwe sipart raman û hişmendiya xwe, û bi

sincê xwe yê behredar serdariya hoza xwe bi cih kir. Lê di serdariya alayên Hemîdî de rexne li cengên Osmanliyan kir, û Sultan Reşad ferman bi girtin û dadgeh kirina wî da, û bi sê sal

Zindan û ziyanek darayî pir giran – hat siza dan. Her sê salên sizaya xwe derbas kirin, û hoza Koçerên Botan ziyana wî ya darayî hilanîn, û ew cihê ku zêrên wê ziyanê li wî hatin civandin – hate navdan "Çemê zêra".

Û piştî wî, birayê wî Birahîm A'xayê duwem, kete cihê wî, lê di vê carê de, ziyanek mezin giha şervanên Koçera û tevaya alayên Hemîdiyan. Bê guman dema koçerên Botan Birahîm A'xayê duwem pejirandin ji bo serdariya hozê, xuyaye ku hin

salix û suriştê serdariyê di wî de hebûn. Lê diyare ku karîn û

pendiyariya wî ne wek yên kesaytiyên malbata wî bûn, ji Mustefa paşa û Birahîm Beg, ta Nayif Paşa, bi nîşana van tevgerên Birahîm A'xa yên jêrîn:

1- Hevbendiya wî digel Şemmera bi awakî xurt, ta bi pişkdariya sedên şervanên Mîran di her dû şerên Xinês û Sûse di navbera Millanê Birahîm Paşa û Şemmera de. Û xuya bû ku Şemmera rêzgirtin nedan wê hevbendiyê, di dema Nayif Paşa de, û du cara ketin şer dijî Koçeran, û bi alîkariya desthilata Sûrî, Şemmera dest danîn ser deverek fireh ji xakên devera Koçera.

2 - Yaxîbûna wî, li ber fermandêriya (Mîrîtiya) Bedirxaniyan, û cudakirina Koçeran ji nav Mîrîtiya Botan, û rikdariya dijî Bedirxaniyan, bi derbsbûna devera wan, û şikanndina sehma wan, bi şerê Besta beleka ewa ku ziyana wê giran bû li ser Bedirxanî ûKoçera herduwa, çikû piştî şikestina Bedirxaniyan, Mîrîtiyên Baban û Badînan û Hekarî di hana Bedirxaniyan de hatin, û Koçer naçar kirin ku bikevin nav rêzên Bedirxaniya, û hin mercên giran li Koçeran sepandin .

3-piştî ku Osmaliyan Birahîm Beg siza kirin û hoza Koçer xistin bin zor û ziyanek giran, dihat xwestin ji birayê wî Birahîm A'xa ku xwe û hoza Koçer ji Osmanliya dûr bike û pêwendên xwe digel Bedirxaniyan xurt bike ne ku dijî hev kar bikin. Her wiha ew fermandêriyên Kurd ku di hana Bedirxaniya de hatin, gava wan Koçer û Bedirxanî li hev anîn, karekî qenc kirin . lê pêwîst bû ku ew fermandêriyên Kurd û Koçera bi tevayî dijî "mêrikê nexweş" Imperatoriya Osmanlî biketina yek çeperê.

Hoza Koçer hate parçe kirin, di navbera Turkiya û Sûriya û Iraqê de, li gorey lihevkirina Saykis-Pîko û peymana Versay, di çaryeka pêşîn de, ji sed saliya bîstan, û beşê mezin ji Koçeran, li Sûriya man. Û êla Kotolî bi tevayî man li Iraqê.

Piştî Birahîm A'xayê duwem, serokatiya hoza Koçer ya parçe bûyî, kete ser millê birayê wî Nayif ê Mustefa Paşa, û nekokî kete nav birrên vê hoza mezin, û ji encama wê nekokiyê, asteng ketin pêşiya Nayif, lê kesayetiya Nayif ya xurt, ew asteng hêsa kirin, û hino hino, bû Nayif Paşa yê xwedî bandor, û cihê xwe dagirt. Nayif, bi şiyanên xwe, naznavê Paşatiyê wergirt, ne ji desthilat û dewleta Osmanlî.

Rûber û pîvana devera Koçra li Sûriya, di vê demê de–bîst k. m. ji bakur ta başûr, û 15 k.m. ji rojhilat ta rojava. Piraniya gundên Koçeran yên Mîran in, giringtirînên gundên Koçera li Sûriya, ev in: Şekerxaç, Ber roj, Hemze Beg. Besta sûs, Tepkê (ev herdû gund yên Sêniga ne). Sêgira, Gire sor, Siwêdî, Quldûman (ev her çar gund yên Ware serya ne ). Til xenzîrê jêr, Til xenzîrê jor, Kelehê. Banê şikeftê, Bella bizin, Elî gamêş, Şurrukê (ev her çar gund yên Xêrika ne). Gir balat, Gir Kendal. Girkê Hêwil (ev gund yê bereya Teya ye).Teqil beqil, Gir xerdel (ev her dû wêran in). Hin gundên Nayif Paşa bi pirojeyên desthilata Sûrî ew ên ku hatine navdan bi (çak kirina

çandiniyê û Çembera Erebî) – ji dest wî çûn, wek Zuhêrî, Xirabreşkê.

Û hin gundên din jî, Nayif Paşa – ew firot in; wek Mameşûr, Rûbarya, Sermisax…

Ev devera ku hoza Koçerên Bota yên li Sûriya li wê dimîn in, beriya wan bi demekê Êzîdiyên Mûsê sana li wê deverê niştecih bûn.

***Hin salixên xurtkesayetî û dilêriya Nayif Paşa:***

Çend bûyerên ku şiyanên Nayif Paşa didin xuya kirin:

**1-** Di sala 1927 a de, ji nişka ve, birrek suwarên Şemmera ji malbata Şellal – ketin pêşiya hin suwarên Koçeran, suwarên Şemmera pirtir bûn ji suwarên Koçera, û xwestin ku wan ji çekdarî bixin, û wan bişellînin, û hespên wan, ji wan bistîn in, lê suwarên Koçera nemerdî nekirin, û berengarî wan bûn, û di encama şer de, Bineyyan ê Şemmerî –hate kuştin, û yekî dî jî, ji Şemmera birîndar bû.

**2-** Paş ê bi egera vê bûyerê dijminayî di navbera Şemmera û Koçeran de gûr bû, û di sala 1932 de, birrek mezin ji

şervanên Şemmera ketin pêşiya Nayif paşa digel 12 suwarên Koçer. Dixuyê ku Nayif Paşa û hevalên wî, hay ji wê bose yê hebûn, yan bi egera wê dijminayê, hay ji xwe hebûn, û li xwe nigehdar bûn, çikû gava her dû alî ketin şer, Milêhan birayê Dehamê Hadî, ji serekên Şemmera – hat kuştin û Tirêwî birîndar bû, û du hespên wan jî hatin kuştin, û boseya wan şermzar bû. Dibêjin di vê bûyerê de, hevalekî Nayif Paşa, ew ci'xirand û ji wî re got: Ka segmanî ya te ya tivingê? Ma tu dixwazî ew me bi dest bigirin? Û bi vê egerê Nayif paşa hêrs bû, û ew bose şikand.

**3-** Firensiya, Nayif Paşa û zavayê wî Evdil'ezîz ê Bellê xistin cîpekê, efserekî Firensî û ajovanê wî bi tenê – di wê cîpê de bûn, û ketin rêya Qamişlo. Nayif Paşa ket gumana ku dibe Firensî wan bidin destê Şemmera, ji Evdil'ezîz pirsî: Demança te bi te re ye? Evdil'ezîz got: Erê, bi min re ye. Wê gavê Nayif ji wî re got: Eger berê cîpê dan gundê Til Elo (gundê Deham ê Hadî), tu ajovan bikuje, û ez dê efser bikujim. Lê cîp ne ket rêya Til Elo, û serrast çû Qamişlo.

**4-** Firensiya, Mala Nayif Paşa bi tenê – dûr kiribûn, ji nav hoza wî, bi aliyê devera Serê Kaniyê de, û di şevekê de, Nayif li konê xwe bû, dît ku hin nijdevan girtin ser dirawsê yên wî (cîranên wî), û xwestin wan talan bikin, Nayif bi hêrs rabû û kete şer, di hana dirawsê yên xwe de, dijî nijdevanan, û talan ji dest wan vegerand. Piştî demek dirêj, yekî Ereb ji parêzgeha Dêra Zorê, ji malbata Segr ku pişkdar bû di wê nijdeyê de – da xuya kirin ji Nayif Paşa re: ku ew di wî şerê wê şeva nijdeyê de, bi destê Nayif Paşa birîndar bû.

Malbata Nayif Paşa, ji mêj de, dost bûn digel Şemmera, û Birahîm a'xa birayê Nayif, digel sed şervanên koçeran alîkariya Şemmera kirin, dijî Birahîm Paşa yê Millî. Û piştî vê dijminaya xurt di navbera Şemmera û Koçeran de, ev her dû hoz, di sala 1958 de – li hev hatin, bi pendiyarî û şarezabûna Nayif û Dehamê Hadî û giregirên her dû hozan, piştî vê lihevhatina herdû hoza, şerek di nav Ware seryên ji Koçera û Şemmera de –çê bû, û mêrek û du jin hatin kuştin. Lê bi pendiyarî û dostaya Nayif Paşa û şêx Dehamê Hadî – zû li hev hatin.



Jinek ji Koçerê Botan bi kêsima Folklorî
(Ji parastiyên ristevan Salihê Heydo)



Ew jin bixwe bi kêsimek Folkloriya dî
( Ji parastiyên ristevn Salihê Heydo)

# *Hoza Hesinan*

Ev hoz niştecihên deşta Hesina ne, navê vê deştê belge ye ku ev hoz bi awakî dîrokî û kevnar, li vê deverê – bi cih bûye û ma ye. Ev deşt firehe, rûber û pîvana wê 20 k. m.(ji bakur ta başûr) û 10 k. m. (ji rojhilat ta rojava). Ev deşt piştî cenga Cihanê ya yekem, hate perçe kirin di navbera Turkiya û Sûriya û Iraqê de. 25 gundên li Sûriya, ji serê çemê Sefên dirêj dibin, ta digihêjin Ava Mezin (çemê Dicle) û Sînorê navbera Turkiya û Sûriya. Û 11 gundên deşta Hesina, di bin desthilat Turkiya de ma ne.

Di vê deştê de, hin Kurdên din, ji bilî hoza Hesinan jî hene, wek Cezerî, Koçer.. t. d, nemaze li bajarê Dêrika Hemko û În Dîwarê, hozên tev li hev hene, ta Filleh jî hene.

Hoza Hesina 11 bere ne: Beşika, Gewre sera, Baweliya, Şaweliya, Emer gewra, Zuhêriya, Qorika, Ale reşa, Eyn Sûriya, Hacibka, Danhêrya. Piraniya niştecihên vê deştê, ji hoza Hesina ne. Sê mezinên Hesina bi navê Emer dihatin navdan: Emer a'xa ji Beşika ye, ew bê dûnde bû, û malbat ji wî ne ma, ew bi tenê bi naznavê A'xatiyê dihate nasîn. Emerê duduwa, malbata Silêman ê Hisên ji wî man, nuha ew niştecihên gundê Mameşûrê ne. Emerê sisiya, malbata Hecî 'Evdil 'Ezîz ê Emer – ji wî man, ew malbat nuha li gundê Pillîsiyê niştecih in. Kesayetiyek sergevaz û jêhatî di nav Hesinan de hate xuya kirin, bi navê Mîro dihate navdan, wî çend gund li deştê girtin, û cihê xwe li nav hoza Hesina da xuya kirin. Erebên Cubûriya birayê Mîro kuştin, li

deverên koçeriya jêrîn , û li aliyê dî Hesina yekî Cubûrî kuştin, û her dû hoz li hev hatin, û her dû kuştî xistin hember hev.

Lê Mîro qîma xwe bi wê lihevhatinê ne anî, û du kesên Cubûrî kuştin, û bi vê egerê Mîro ji nav hoza xwe hate dûr kirin. Piştî çend salan, carek dî, Mîro vegeriya nav hoza xwe, û cih girt.

Nuha Malbata Mîro cihekî xuya di nav Hesinan de – digirin, û li gundên Mozelanê û Girikê dimînin.

Hoza hesina, digel xwedîkirina pez û sewala, ji mêj ve, çandinî dikirin û li ber çemê Sefên bendav – çê dikirin, û birinc û kuncî diçandin û av didan, digel coreyên çandinî yên bejî ku gelek serketî û pir sûd bûn, li xakê deşta Hesina yê behredar û pir deramet.

# *Hoza Abasa*

Ev hozeke Kurdî kevnare ye, cihnişînên wê, ji mêj ve, li rojavaya devera Dêrika 'Hemko dijîn, li tenişta hoza Hesina û hoza Koçerên Bota. Ji Aliyê rojava de, çemê 'Hellaq dikeve navbera wan û hoza Aliya. Li devera vê hozê hinên din jî dimînin, Omerka, Bêdarî, Seyyida... Dirêjaya vê deverê, ji rojhilat ta rojava 20-25 k.m. heye, û pehnaya wê 10 -15 k. m. Û beşek ji vê deverê di bin destê Turkiya de ma ye.

Giringtirîn gundên vê hozê, li Sûriya Ev in: Gir-ziyaret, Gir Qafik, Gundik, Mustefawiyê, Gêrê, Kortepan, 'Elwanka Ezêm, 'Elwanka Şêxê, Kanî kerkê, Dekşûriya, Cîlika, Ser- misaxê.

Bereyên vê hozê yên serekî Ev in: Rûtan (malbata Colo), Teterka, Sofîka, Lîlika, Malbatên Xellê, Hemo, Emo (Bere ya Birahîm ê Hesen Beg birayê Colo).

Ev zincîrek berjor e, ji neviyên bereya Colo ya serekî: Muhsin, Evdillah, Şêxê, Reşîd, Ehmed, Dellî yê duwem, Dellî yê pêşîn, Colo (Xwediyê cuwê), Hesen Beg (Rûto), Colo (Mîrê Êzîdiya).

Colo yê kurê Hesen Beg – pehlewanekî çeleng bû, û şervanekî xurt bû, gelek xak ji xwe û hoza we re parastiye, rima xwe, li girekî nêzîkî Rimêlan çikandiye, da sînorê xakê hoza wî – xuya bibe, bi çikandina wê rimê, ne hişt kesên ne

ji hozê – xakê wê deverê bigirin. Û bi vê egerê navê wî girî bû Rim-hilan (Rimêlana nuha). Û Colo, bi pesindarî, navê yekî ji neviyên xwe – kire "Rim hilan".

Ew rim di dawiyê de giha xwarzayê wî, Se'edoyê Gergerî, û bi wê rimê Se'edo tola bavê xwe yê ku hatibû kuştin – sitand. Gava temenê her bavekî ji wê zincîrê 25 sal be, ta bigihêje Colo, dema jiyana her heşt bava – dibe du sed sal ku ev dever ava kirine.

Gelo çawa Erebên şovînî îro dibêjin: "Ev Kurdên han mihvanên vî xakî ne, û em xwediyên wî ne"?!

Ji şûnwarên Colo sê tişt ma ne:

**1-** Qesrok (kavilên xanî û koşka wî yên demekê qeşeng û berçav bûn), li Gundik e.

**2-** Dara berrû ya ji sedê sala ve – hêj geş e, ew jî li Gundik e.

**3-** Şopa cuwa wî ku ava kaniyên Şekşek û Şe'ebanê li kurdistana Turkiya – werdigirt û dikişand Banûkiyê, Delikê, Cilwa qelaç, ta digihand gundê 'Elgana, ew cuwa ku di vê qona'xa dirêj de – hêj li ser zimana ye.

Kesayetiyên xuya ji hoza Abasa: malbata Farisê Colo, li gundên Kortepan, Mustefawî, Cîlika. Malbata Delliyê Colo, li gundên Elwankê, Kanî kerkê, Dekşûriya. Malbata Ûsê Colo, li gundên Gir ziyaret, Gundik, Sermisaxa hecî Elî. Malbata Reşo, li gundê Gêrê. Malbata 'Irso, li gundê Gir qafik. Di salên sî yên sed saliya bîstan de, ji nişka ve, hoza Şemmera ya Ereb – doza çend gundên devera Abasa kirin, û gef li Abasa kirin, paşê êrîşî wan kirin, bi serdariya 'Elî yêMedlûl û hin şervanên malbata Misgal, lê Abasa bi serdariya Delliyê Colo – bose girtin, li hember wan, û ew şikandin, bi hin kuştî û birîndaran, û dane ser pişta wan, ta ew gihandin gundê Koçera Kelehê. Paş ê Şemmera bûn hevbendên Omerka û alîkariya wan kirin,

li nik desthilatê, dijî Abasa, û her dû gundên Til Cemalê û Du girkê – ji wan sitandin û dane Omerka. Piştî demekê, hecî Bexît ê Şemmerî – bû navincî di navbera her dû hoza de, û li hev hatin.

Dema Şakoyê Mihacir, Efra jina Ebdurrehman ê Medlûl – revand, carek dî Şemmera – xwestin Abasa bi êşînin, bi wê behaneyê, lê Şako û Efra, li nik Seyyida, li gundê Batirzanê – hatin girtin, û çi dijminayî, di nav Şemmera û Abasa de – nuh ne bû.

Hoza Abasa, li vê devera xwe ya zengîn û behredar, di çandiniyê de– kar dikirin, û hêj kar dikin, digel xwedîkirina pez û ajelan, û bi hev re, hevgirtî dijîn, û çi arîşeyên dijminahiyê, ne di nav wan xwe bi xwe de, û ne di nav wan û hozên dirawsê de –ne ma ne. Ev hoz, ji aliyên civakî, pêş ve diçin, û xwendevan û rewşenbîrên wan pir dibin, û rewşa wa

ya abûrî başe.

# *Hoza Omerka*

Ev hoz ji hozên Kurd yên perçe bûne, di navbera Sûriya û Turkiya de, li gorey peymana Saykis– Pîko. Omerka niştecihên wê devera Abasa û hinên din in, wek Bêdarî û Seyyida, û ji hêla olê ve, Omerka, Musilman û filleh in.

Devera Omerkên li Turkiya–dikeve rojavaya bakurê bajarê Cizîra Bota, û giringtirîn gundên wan ev in: Kerboran, Îwan, Babilê, Ezdîn, Ancik, Fîlê, Batlê, Hespist, Gizirê, Xindok, Xêratê, Hedilê. Û girngtirîn bereyên vê hozê ev in: Îwanî, Hesoka, Şerefka, 'Izdînka, Dîwanka, Silêmanka, Lalika.

Tête gotin ku pirtir ji deh gundên Filleh yên Omerkî li Turkiya hene. Omerkên Filleh li Sûriya niştecihên bajara ne. Giringtirîn gundên Omerkên Musilman li Sûriya ev in: Girkê legê, Til cemalê, Du girka, Girikê Selma, Sermisaxa jêrîn, Gir zîro, Girkê Xello, Cello, Carûdî , Şêro.

Malbatên xuya, li nav Omerkên Sûriya ev in: Malbata Berekat, li Girikê legê, Malbata Sima'îl, li Til cemalê, Malbata hecî Sebrî li Du gir'ka.

Pêwendên Omerka, digel Erebên deverê hene, nemaze Erebên Şerabî yên ku ew û Omerka xwe nêzîkî hev dikin. Dostayî di navbera Omerka û Şemmera de – heye, Şemmera hevbendên wan bûn, di nekokiya navbera wan û Abasa de.

Rewşa Omerka ya civakî başe, digel gelek hozên Kurd li Sûriya, Pêwendên wan xurt in digel hoza Kasika, li devera

Sinceqa Xelef A'xa, hem pêwendên wan, digel bereya Omera ya Kîkî xurt in.

Rewşa Omerka ya abûrî başe, xwendin û zanîn, li nav wan belav bûne. û hin ji cuwanên wan – derketine derveyî welat.



**Lewendek ji hoza Omerka bi kêsima folklorî**
( ji parastiyên ristevan Salih Heydo )

## *Hoza Aliya*

Ev hoza Kurd ya mezin û pirçuqulîk, bi nijadê xwe, ji devera Bazîdê ne, û ji Kurdistana Turkiya – daketine vî perçeyê behredar û zengîn, ku di Cu'xrafiya de, tête navdan "Nikkilê werdekê" ew devera dikeve navbera Ava mezin û Qamişlo, ew a ku nexşeya wê wek Nikkilê werdekê xuya dibe.

Pêşkêş û serekên vê hozê Essafî ne, bereya malbata Mer'ê ku ji Bazîdê hatine, berî sedên salan. Û Elî birayê Essaf e, li cihê xwe, li Bazîdê ma ye, ew bavê pêşîn yê hoza Elika ye.

Hoza Aliya gelek nijadên Kurdî yên hevgirtî – dicivîne: ji Essafa û malbata Mer'ê, ta Hemka, Elîka, Cobira, Motka, Eluwa, Bêdî, Dûmanî, Seyyida, Harûnî, Şêxbizina, Dêra, Hermêsî, Dûrika, Dermemka, Qulingo şimxaltî.

Cêms Bingham rojhilatnasê Ingilîzî – serdana vê deverê kiriye, berî 195 salan. Û ji Nisêbînê berê xwe daye Mûsilê, di serê Tîrmeha 1816 de, piştî 2 dem-jimêra – gihaye Til Şi'îrê, û dibêje: Niştecihên wan gundan tevde Kurd in, û xaniyên wan dirêjokî ne, wek 'imbarên tene ne, û banên wan xaniyan çimandî ne, ji qirş û heriyê ne, lê gelek ji wan, di bin konan de bûn. Piştî 2 dem-jimêrên din, Bingham digihêje Gundê Xelf A'xa Eznarwar li Sinceqê ku ji 50 xaniyan pêk dihat, lê sed kon jî, li hawîr gund vegirtî bûn. Û di heman rojê de, Cêms Bingham, berî nîvro, digihêje Gundê Du girê.

Di roja dî de, Cêms Bingham digihêje devera Aliya, û êvarê li nêzîka gundê Çil A'xa, li tenişt çemekî biçûk şevder dimîne, û dibêje: Xaniyên Çil A'xa du par bûn, lê kon sê yan çar par bûn, û banên wan xaniyan ji zillê û heriyê bûn.

Cêms dibêje: Ji me re hat gotin ku ji vir û wê de, rê bi tirse, ji ber Êzîdiyên Şingalê. Me xwe çekdar kir, û berê rê ya me

kete rojhilata başûr, û em gihiştin Rimêlê, û di nîvê qonaxa navbera Çil A'xa û Rimêlê de, em di çemekî biçûk re, derbas bûn, bi navê "Demir koprî".

Ji van dîtinên Bingham xuya dibe:

**1-** Gundên ava di wê demê de, hindik û dûrî hev bûn.

**2-** Çi kes, ji bilî Kurda, di wê demê de, li navbera Nisêbîn û Şingalê – ne bûn.

**3-** Xanî hindik bûn, ji ber hindikbûna çandiniyê, çikû wê demê gîsinkêş û çinînkar yên Mîkanîkî (terektor û derrase) ne bûn, û çandinî bi cota bû, û çinîn bi das û qeyna'xa bû.

**4-** Piraniya wan deverên han deşt û çêregehên pez û ajelên Kurda bûn, û kurdên Musilman û Êzîdî ew dever diparastin. Ne wek şovîniyên Ereb dibêjin: "Kurda xwe avêtine talda me, û Ereb xwediyê deverê ne".!!

Devera Aliya fireh bû, dirêjaya wê, ji bakur ta başûr – pirtir ji 50 k. m. bû, û pehnaya wê ji Tirbesipiyê, ta digihişte Rimêlê 30 k. m. bû. Lê ew dever, ji çar hawîr hate birrîn. Li Bakur, 15 k. m. li Turkiya – man, li gorey peymana Saykis –Pîko, û ji Başûr de, 15 k. m. ji hoza Şemmera ya Ereb re man. û ji rojhilat de, 5 k. m. bi şûnde hat, ta hembera Demirkopriyê. Û ji rojava de, bi şûnde hat, û ket ser devera Tirbe - sipiyê.

Ev tengbûna devera Aliya hino hino bû, ji ber du egera:

**1-** Yaxîbûna devera Aliya, li ber Fermandêrê Bota Yezdan Şêr, di sala 1853-1854 de, û xwe radestiya Aliya, li ber Yezdan şêr.

**2-** Desthilatên Sûriya û regez perestiya dijî Kurdên Sûriya ku hozên Ereb degel dikirin, dijî Kurda, ta ku Şemmera, beşekî mezin ji xakê Aliya birin, digel Çembera Erebî û yasayên awarte dijî Kurdan.

**Giringtirîn kesayetiyên xuya û gundên wan, li devera Aliya:** Giringtirîn gundên Essafa û malbata Mer'ê û kesayetiyên wan ev in: Dêrûna A'xê ya Evdiyê Mer'ê, Aleqos gundê Sima'îl ê Evdê, Mûsagewra, Sêgirka Gundê Der'o û Ridênî, Kêşkê gundê Salihê Evdê, Qastepan gundê Hisên ê Evdê, Girkê Mûrad gundê Şêxmûs ê nayifê Mer'ê, Dêrûna kevnik gundê hecî Teleb, Gundikê Şellal (gundikê Niwîla), Gundikê Teyib gundê hecî Hisên, Badiyan gundê Berces.

**Giringtirîn gund û kesayetiyên din ji devera Aliya**: Bakirwan gundê Heso yê Dûmanî. Abirê û Şebek gundên Cobira. Nebî sadî, Lodka, Bakirwan gundên Dûmana. Xirbê Cuhuwa gundê Hisên ê Ehmed hecî. Bekir O'xlî, Hellaq, Çalka gundên Dûrika. Itbê, Şêtka, Xirab reş, Kevirê Dinna, Tokil gundên Hemika. Batirzan, Xirbe belik, Qer'xo, Gulîce gundên Seyyida. Elî Bedran, Xuşênî, gundên Qulingo Şim xaltî. Girdemîk gundê Şêx Birahîm. Girkê Xello gundê Bêdiya.

Gundên ku desthilata Sûrî dan Erebên Me'xmûrîn: Hemra (Kêşkê), Cewadiyê (Çil Axa),Tewekkul (Tokil).

Kaniyên devera Aliya ev in: Kaniya reş, li gundê Teyib, kaniya li gundê Dêrûna kevnik, kaniya gundê Elî Bedran. Demên berê, li ber van kaniyan birinc û sipîdar dihatin çandin, û hem aşên avê, li ber wan – dihatin gerrandin.

Di vê demê de rewşa abûrî ya devera Aliya ne wek berê ye, lê bi rê ve diçe. Û rewşa Aliya ya civakî baştir e, civak hev girtiye, û xwendin û asta jiyanê – pêş ve çûne.

Di dawiya pênciyên sed saliya bîsta de, şerrek di navbera Aliya û Şemmra de – çê bû, û di encamê de, Şemmera vekişiyan.

Serdangehek oldarî, bi navê "Êlim" li beşê jor, ji devera Aliya heye, di ser sînorê navbera Sûriya û Turkiya re, bi 7-8

k.m. li ser çiyakî biçûke. kesên deverê, bi Êlim – sûnd dixun. Bawerî ew e ku ew perestgehek Kurdî bû, berî Islamê, û Kurdên deverê wê nav didin Êlimê "Rim kesk".



***Zeriyek ji Aliya bi kêsima folklorîya zîba***

( ji parastiyên ristevan Salih Heydo )

# *Hoza Aşîta(Sinceqa Xelef A'xa)*

Sinceq: Bêreq, û ji hêla Ci'xrafî ve devereke şarevaniye (wek parêzgehê). Sinceqa Xelef a'xa – dikeve navbera Qamişlo û Tirbe sipiyê, deverek zengîn e, bi xak û dahatên xwe, beşeke ji devera "Nikkilê werdekê " weku di Cixrafiya de hatiye navdan.

Ev Sinceq deverek Kurdî ya dîrokiye. Pehnaya vê sinceqê ji bakur, ta başûr – digihêje 30 k. m. li piraniya deverên wê. Û dirêjiya wê navbera Qamişlo û Tirbe sipiyê 30 k. m. heye. Xelef A'xa, di demên Osmanliya de – diyare ku A'xayekî giring bû, ta ku Osmanliya ev deşta zengîn û pir deramet – xistibûn bin desthilata wî. Xelef a'xa, ne tenê A'xa yê vê Sinceqê bû, lê wî baca wê deverê disitand, û bandora wî digiha ta sînorê devera Şingalê. Wî ew devera fireh û kêm niştecih tevde – diparast ji Êzîdî yên Şingalê û ji nijdevanên din, û gelek car diket şer dijî wan. Elîk ê Hesen, mamê Ehmed ê Yûsif, carekê girtî bû, li nik Xelef A'xa û tirs hebû ji Êzîdî yên Şingalê. Enter ê Silo yê gundê Ne'emetiyê, tev ku nekokiyek di navbera wî û Elîk de hebû – ji Xelef A'xa xwest ku Elîk ber de, da ku pişkdariyê di şerê dijî Êzîdiyan de bike, û xwe kire girawdarê (kefîlê) vegera wî. Xelef A'xa, Elîk ber da, û Enter û Elîk, di hola şer de, hûçk û qemçikên xwe – bi hev ve girêdan, û di wî şerî de bi ser ketin. Xelef A'xa rêzgirtinek mezin da her duwa,û Elîk azad kir bi aferîn û pesindariya herduwa. Wê demê di hola wî şerî de, û li wê deverê, berî dusedsal – çi Ereb ne bûn ku wê biparêzin, û Kurda ew diparastin.lê îro şovîniyên Ereba dibêjin:"Ew Kurd penaberin".

Xelef A'xa bû , ê ku ev dever li ser Kurda qoçan dikir:

**1-** Gundê Du girê, da Yûsif bapîrê Silêman ê Ebas yê Dûrikî, û gundê Dirêçîk, da Oslo ku sebze û şînkayî, li ber çemê Cerahê, diçandin û av didan.

**2-** Gundê Til Cihan – da Enterê Silo bapîrê pêşîn yê Sebrî kurê Silêman kurê Çaçan kurê sifûg ê Enter.

**3-** Gundê Girdahol – da hecî Mido û wî ava kir.

**4-** Gundê Til şi'îrê da malbata Elikê, ji mal mezinên hacî Silêmaniya.

**5-** Tirbe sipiyê da Hesenê 'Iço, û gava Şêx Ehmed ê Hiyalî, Xelîfeyê Mewlana Xalid ê Neqşibendî yê ku di sala 1821ê de –giha Xudayê xwe , Hesen ê 'Iço perçeyek xak da şêx Ehmed ê Hiyalî, di navbera Tirbe sipiyê û Girê şêra de. Û ji wê gavê de navê wî perçeyê xak – bû Xirbê şêx Ehmed, û bi egera hezkirina di nav Hesen ê 'Iço û Şêx Ehmed ê Hiyalî de, sozdan hev ku kî ji wan her duwa, berê bimire, dê yê dî, wî li Diyarê Kêlê (dikeve başûra Şorik) – veşêre, û bi vê egerê, Mela Murad ê bavê Şêx Ehmedê Xezna – li wê deverê hate veşartin.

Ji malbata wî Xelef A'xayê navdar, nuha du sê mal li gundê Enteriyê, Li tenişta Qamişlo hene, û çend mal li gundê wî "Eznarwer" li Turkiya ma ne, Her wekî hatiye Gotin: (Ji pezê pir, ma kavirê kur), Ew jî ne xwediyê tiştkî ne, ji deşta bapîrê xwe yê navdar. Hin dibêjin ku hin neviyên jêrîn yên Xelef A'xa yê Sinceqê, di vê demê de, li gundên Eznarwerê û Dêrzindîqê, li Turkiya dijîn. Ev her dû gund ji gundên Xelef A'xa bûn, berî nêzîkî du sed sal.

Di vê demê de, ev hozên Kurd yên jêrîn di Sinceqa Xelef A'xa de ne:

**A-** Hacî Silêmanî: bere û bavikên vê hozê ev in: Xidiroka,Ce'eferka, Suwarka, Dekşûriya, Elikiya, Garisa, Elî mihema, Emoka, Husnî, Ebasa, malbata Hisko, malbata Osê, malbata Bê kirk, malbata Sinco.

Giringtirîn gundên Hacî Silêmanya ev in: Til zîwan,Til Şi'îr, Omerîk, Dekşûrî, Beyandûr, Hulwa, Hasûd, Xirbe dîb, Şelhûmî, Gir dêmê Helîmê. Gundekî hacî Silêmanya li Turkiya heye.

**B-** Dûrika, giringtirîn malbatên wan ev in: Malbata Ebas, Malbata Hîto, Midoka, Şemoka, malbata Dellî. Giringtirîn gundên wan, li Sinceqê Ev in: Dugirê, Nesran, Beyaza mezin, Beyaza biçûk, Ebû hicêra, Gir Dahol, Til berhem.Til berhemê çembera Erebî jî heye. Dûrika beşek ji hoza Hevêrka ya mezin tên hijmartin.

**C-** Kasika: Giringtirîn gundên wan, li Sinceqê ev in: Sîha mezin, Sîha Biçûk, Bilêc, Girê suwar, Himara, Arzana, Xirab Ebid, Leylan, Til xernûb, Girê zêra, Xirab cihaş, Sûgiya , Riheyya, Zor ava.

Kesayetiyên xuya ji Kasika: malbata Ehmed ê Yûsif, û malbata Elîkê yûsif in. Kasika ji mêj ve li Sinceqê ne, û

Li nik wan qoçanên xwedîtiya gundên wan – hene ji sala

1935a de. Hin dibêjin Kasika bi nijadê xwe ji Kasiyên Kurdên Kevnar yên Mîdî ne.

**Ç-** Mihelmiya – Giringtirîn gundên wan li Sinceqê Ev in: Xezna mezin, Xezna biçûk, Sihil, Xirêcka, Buwêra, Til xezal, Mircan,Xezna Osman, Ni'imetiyê, Farqîn, Gundikê Xelîl, Gundikê Bekir ê Xanê, Xuwêtla. Malbatên giring, ji Mihelmiya – Ev in: malbata 'Xeyda, û malbatên Hemê, Hesenê Xirêckî, Hecî, Rico, Cumhor, Ehmê, Hidadka, 'Itman, Xelîlê Osman, Delo, Es'ed, Cirdo, Kejo. Dibêjin:

'Xeyda jinek Merd û sermiyan bû, û bi vê egerê navdar bû.

**D-** Kurrisa: Giringtirîn gundên wan li Sinceqê Ev in: Tennûrî, Şorik. Kesayetiyên xuya ji Kurrisa, malbata Hesen ê Birahîm in.

**E-** Cewdika: Giringtirîn gundên wan: Til cihan, Getba.

**Ê-** Şapizniya– Giringtirîn gundên wan: Cum'ayê, Ni'imetiyê. Mihelmî yên malbata Cirdo jî li ni'imetiyê ne. Kesayetiyên xuya ji Şapizniya Malbata Sifûgê Enter in.

**F-** Dil memika – Gundên wan: Girdêmê jor, Xizêmok. Dil-memika ji Hoza Hevêrka ya mezin in.

**G-** Gundê Enterî yê, li rojhilata Qamişlo ye, nuha ketiye sînorê bajêr. Xwediyên vî gundî bi nijadê xwe, Berazî ne. Kesayetiyên xuyanî ji wan malbata hecî Faris û birayên wî ne.

Xakê Sinceqê behredar û zengîn e, û gelek core ji dahatan, li wê, berhemê didin; genim, ceh, nok, nîsk, rez, zebeş, petêx, û coreyên şelengo û ecûra…Lê piroje û yasayênregez-perest, gelek niştecihên Kurd, ji wan samanan – bê par kirin, nemaze yasayên "Çembera Erebî" û "Hijmara Awarte", di sala 1962 an de, ew a ku bi deh hezaran, ji malbatên Kurd – bê nasname û bê welatdarî kirin. Û bi encama avakirin û çandina gundên

Erebkirinê, li Sinceqê bi van navên ha :"Ummil-fursan (li nêzîkî Cum'ayê ye), "Tennûriyel cedîde,Hulwel cedîde,Til berhemilcedîd" û bi niştecihkirina Erebên Reqqayê, li nav van gundên han–Kurd ji wan xakan bê par bûn.

Li devera başûra Sinceqê, hin hozên Erebên " 'Imame" Teya, Herba, Benî seb'a – nuha niştecih in. Çi arîşe û şer di navbera wan û Kurdên Sinceqê de – rû ne da ne, ji bilî nekokiya di nav serekê Teya Faris û Şêx Ehmedê Xezna de, li ser hin gundên şêx Ehmed ku Faris doza wan – dikir. Û bi mirina Faris, dawî li wê nekokiyê hat. Lê piştî pirtir ji 30 Salî, bi yasaya çakkirina çandiniyê "Islah zira'î" û bi piştgirî ya desthilata Sûrî, ew gund ji destê Malbata şêx Ehmed – derketin, û gihan Ereban.

# *Hoza Hevêrka*

Hevêrka, Hewêrka, her dû navê hozek Kurdî mezin in, (di zimanê Kurdî de, Pir cara, tîpên" v " û " w " di cihê hev de tên). Ev nav, û belavbûna vê hozê, û hebûna beşekî Êzîdî ji vê hozê, û navê Hewêriyên Êzîdî li Kurdistana Iraqê –gelek pêwend an didin xuya kirin, yek ji wan kûrahiya bingehê netewî di nav gelê Kurd û Êzîdiyan de.

Ev hoza mezin – hatiye perçe kirin, di navbera Turkiya û Sûriya de, li gorey rêkeftina nav-netewî ya Saykis-Pîko, di sala 1916 de, û hin ji vê hozê li Sûriya bûn, wek Dûrika û Dilmemika yên li Sinceqê û li nava Aliya…,lê piraniya vê hozê li Tukiya man, li devera "Torê".

Hevêrka, bi olê sê beş in, Musilman û Êzîdî û Filleh in. Beşê Musilman du birrên mezin in, yek bi serokatiya malbata Osmên (malbata Haco), û ya dî, bi serokatiya malbata Eliyê Remo.Tête gotin ku malbata Eliyê Remo Kevnartirin, lê bandora xurt ya malbata Osmên e, û sêyeka Hevêrkên Musilman di bin bandora malbata Eliyê Remo de ne, û herdû sêyekên mayî bi serokatiya malbata Osmên – pabend in. Beşên Êzîdî û Filleh, mal mezinên wan – hene, li gundên wan, lê bi rêzgirtin pabend in bi bandor û serokatiya her dû malbatên Osmên û Eliyê Remo.

Pîvana devera Hevêrka li Turkiya ku têe navdan bi "Torê"

firehe, ji Nisêbînê ta bajarê Hezexê, nêzîkî 100 k. m. Û ji bakur de, nêzîkî 70 k. m. Lê di vê devera fireh de, hin nişte-

cihên din jî – hene, wek Harûna, Moma, Elika…

Giringtirîn birrên hundirê hoza Hevêrka Ev in: Doman, Dil memika, Hemka, Botika, Dûrika, Çomera, Daska, Mihoka, Bacola, Kiyoxî, Kevnasî…û giringtirîn birrên di bin bandora malbata Eliyê Remo de, ew ên ku têne navdan "Erebiya" ev in: Xelîlî, Dîwanî, Çêlikê Eliyê Remo, Mewêlî… Beşekî dî ji Hevêrka li devera Kircewsê û hawîrî wê, malmezinên wan ji wan in, lê ew jî, xwe dixin nav xêzên hoza Hevêrka. Hin Hevêrkî bi navên Gundên xwe têne navdan: Zaxuranî, Medehî, Salehî, Basbirînî,Tepirzayî, Sareyî…

Fillehên Hevêrkî ew jî, xwe dibînin Hevêrkî, emekdariya wan ji hoza Hevêrka re xurte. Û mal mezinên wan ji wan in. Gundên Fillehên Rayîtî pênc şeş gundin: Erbo, Hebabê... Û gundên Fillhên jorîn ev in: Êwertê, Zaza.. û Hevêrkên Êzîdî xwe ji dilsojên Hevêrka dibînin.

Li nav Hevêrka bi tevayî, û li nav Hevêrkên Sûriya, bi taybetî, cihekî giring ji malbata Osmên re – heye, nemaze malbata Haco.

Divê em ji bîr nekin ku sê kesayetî bi navê Haco di malbata Osmên de –hene, Hacoyê pêşîn ew e yê ku dihate xwestin ji aliyê desthilata Tirka, bi hoya ku ew bi kuştina gelek leşkerên wan gumanbar bû, û di encamê de, ew bi dek û xapa girtin (Cilê jina li mêrekî kirin, û dan xuyakirin ku ew jin di girawa Haco de hatiye girtin. Haco xwe radest kir, ji ber şerma girawbûna wê jinê, da ku wê rizgar bike, û kete davika dekdariyê, Û Tirka ew bi destê Cumo yê Dekşûrî dane ser jê kirin, lê pir dem ne çû, Cumo di tola wî de hate kuştin. Kevaniya Haco yê pêşîn Zeyneba Emerê Osmên, ji mal mezinên seyyida bû, destgirtiyek ji kurê xwe re, Çaçan ê Hacoyê pêşîn, Helîma keça Sima'îl ê Werdê, ji mal mezinên Dil memika – xwest, lê berî ku herdû destgirtî, bi hev şad bibin, Çaçan giha Xudayê xwe, û Helîma ji wî bi şûnde ma.

Zeyneb, destûra Helîmê – da ku şuwekî bike, lê Helîma emekdar, nas dikir ku Zeyneb bi du giyana ye, ji Zeyneb re got: "Ez dê bendewara zikê te bim, ez destgirtiya wî me, di cihê birayê wî de, eger mêr be".

Canewerê malzaroka Zeyneb – hate ruwê Cihanê, Haco yê navîn bû, A'xa yê navdar û sur kêş, yê ku Hevêrka bi gorra wî sûnd dixun, û di stiranên pesindariyê de – hatiye navdan "Sultanê Hevêrka". Helîmê peymana xwe bi cih anî, û bû Xanima Hacoyê duwem, û berî wî, Helîmê bi nav sala ket, û ji wî re got: "Erê ez bendewarê te mam, lê çê na be, tu bendewarê min bimînî, ez mezin bû me, tu ji xwe re, jinekê bîne". Vê jina Kurdî comerd, hemberê comerdiya xwe – ne xwest, lê besî emekdarî û rûmeta wê ye, ku ew diya Hesen A'xayê Haco ye.

Divê em hinekî rawestin li ser asteng û bûyerên ku hatine pêşiya Haco yê duwemîn. Ev sêwiyê di siha wê dibistana civakî û malbata bilind de, mezin bû , Jîriya wî ya suriştî, û behredariya wî jî – alîkariya wî kirin, ku rê ya xwe, bi serkeftin di jiyanê de – derbas bike; ji sala 1923 a de, kete orta gêrra astenga de, ji alîkî Kemalistên Tirk, ew didîtin A'xakî xwedî bandor, û metirsa wî li ser ricîma xwe, mezin didîtin, tev ku wî, dostanî digel wan dida xuya kirin, ew bi wî bawer ne dibûn, çikû hin pêzanînên wan, li ser wî hebûn, ku ew dijî wan didan xuya kirin.

Di dema şoreşa şêx Se'îd de, Kemalistan çi belge, li ser pişkdariya wî di wê şoreşê de – negirtin, lê her û her dane pey wî, û dema bidarvekirina şêx Se'îd, ji Haco xwestin, ku ew, kursiya bi darvekirinê, ji bin ling û gewdê Şêx Se'îd – bi de

alî, lê Haco xwe da alîkî, û qasid ji Kemalistan re şiyand û got: "Ez nikarim wî karî bikim, çikû ta zaro yên min –dê bibin dijminên min, û dê min bikujin".

Haco êdî nema xwe berdestî kemalistan kir. Paş ê Haco, Efserekî ku bi nijadê xwe Kurd bû û hem dostê wî bû –dît û pirsiyarî ji wî kir, li ser rewşa xwe.Wî efserê Kurd, ji wî re got: "mandê te û her malmezinên Kurd – yan kuştin e, û yan surgûn û derbideriye".

Êdî, tevgera Haco ma li herdû aliyê sînorê Turkiya û Sûriya Çikû Tirka ew didîtin derketî, li ser yasa yê, û Firensiya jî ew didîtin hev-bendê Tirka, bi egera kuştina efserê Firensî Rogan, di sala 1923 an de, li dema raperîna Beyandûr, ku hevêrka û Dûrika jî – pişkdarî di wê de kiribûn, çikû Firensiya Mihemedê Ebês, birayê Silêman ê Ebês yên Dûrikî – kuştibûn, û hespê Rogan gihiştibû Haco.

Piştî ku cih li Haco teng bû, û Kemalist û Firensî her dû bûn dijî wî, û kete rewşek ne xweş, wî ji Gelloşabo yê fille ku bi ser Hevêrka ve bû – xwest ku ew ji Ingilîza bixwaze, ku çareyek ji bo wî û yên digel wî re – bête dîtin, lê Ingilîza gotin: "Em dikarin wan li başûrê Iraqê – bi cih bikin".

Diyare Ingilîza ne xwestin Tirka û Firensiya –bi'xeyidînin. Û diyare ku ev pêşinyara Ingilîza ne cihê pejirandina Haco bû. Haco, bi şarezabûna xwe, û bi têkiliyên xwe, digel Kemalî û Firensiya – hînî nekokî û dijîtiya di navbera wan de – bibû. Û xwest sûdê ji wan wergire. Haco bi hevalbendên xwe re – gengeşe kir, û gihan biryara ku Haco xwe radestî Firensiya bike.

Berî vê biryarê, Kemaliyan, her dixwestin ku Haco alozî yan, dijî hebûna Firensiya çê bike, lê Haco, tiştek ne dixist destê wan, lê piştî vê biryarê, bersivek erênî – da wan, û daxwaza

çek û fîşeka – ji wan kir. Parêzgerê (waliyê) Mêrdîn – Ferman da berpirsê debboya çekdarî li deverê, bi nivîsnameyek fermî, ku daxwaza Haco bi cih bike. Haco hate nik berpirsê debboya leşkerî, û gava ku berpirs nivîsname ji wî xwest, Haco got: "min, nivîsname li malê – jibîr kir". Berpirsê debboyê bi walî re – peyivî, li ser wê rewşê, û walî pejirand ku daxwaza Haco bide wî, bê nivîsname yê.

Ceneral Katroyê Firensî, li Beyrûtê, dîdarek ji Haco xwestibû, û Haco di sala 1926 an de – çû wê dîdarê, û bi ceneral re da û sitand, û nivîsnameya walî danî ber cenral, û cenral û Haco li hev kirin ku dijî Tirka kar bikin. Haco deverek ji xwe û hevalên xwe re –xwest, û Ceneral devera Tirbe sipiyê û bakur û rojhilata wê da wan, û ji wê gavê de, Haco li bajarê Hesekê ma, bi daxwaza Firensiya, û hevalên wî li devera Tirbesipiyê niştecih bûn. Cihnişîniya Hesekê, li ser Haco hate sepandin, çikû nikarîbû serdana malbata xwe bikira, bê destûra Firensiya, û hate dûrkirin li bajarê Tidmir, û paş ê li bajarê Şamê, dema du sala.

Haco ji endamên rêxistina Xoybûn bû, û hevbendê Hemze Begê Miksî û Mîr Celadet û Kamiranê Bedirxanî û malbata Cemîl Paşa û malbata Şahîn ya Berazî – bû, di piştgiriya Şoreşa çiyayê Agirî û di xebata ji bo kêşeya Kurdî de.

Haco ji sala 1932 de – ma di niştecihiya sepandî de, li bajarê Hesekê, ta giha Xwedayê xwe, di sala 1940 de.

Hijmara malbata Haco, nuha gihiştiye pirtir ji 500 kesî, û piraniya wan bûne penahber û derbider û biyanî li Urupa. Îro ev malbata xwedî rûmet û bandor, di nav gelê Kurd de, kula pişaftina zaro û neweyên xwe, di nav milletên biyanî de – dikêşin, pirtir ji kula xak û zeviyên xwe yên ku hatin talan kirin.

Piştî Çespandina yasayên awarte û şovînî, li ser Kurdên Sûriya, û piştî regezperestiya desthilata Be'esiyan ku xuya bû, di Çembera Erebî û hijmara awerte de, di sala 1962 de, û bikar anîna gelek coreyên din, ji pirojeyên şovînî, û piştî ku malbata Haco ya fireh, xwediyên pirtir ji sed hezar donim bûn – bi biryarek ramyarî (siyasî), ne bi rêzanek yasayî û dadgehî, Be'esiyan Ekrem ê Haco bi tenê pejirandin xwedî xak, û dest dan ser tevaya xakên malbata Haco, û çi kesê dî ji wê malbatê – ne jimartin xwedî xak. Piştî 45 salan, 450 Hiktar bi tenê, bi biryarek dadgehî –bûn ji mafê vê malbatê, ku divê li wan bête vegerandin.

Di vî babetê em di nav de ne, pêwîste ku em hindekî li ser gotarek Enwer Ebdilhemîd ê Şemmerî –rawestin, di hijmara11-12 de, ji govara 'Hiwar. Ev nivîskarê Şemmerî, êrîşek ne dadmend berdaye ser Haco, û derbarey hin hozên Kurd li Cizîrê, rastî xistiye bin lingê xwe, û bi dilê xwe, ramanên xwe yên durû, di vê govara Kurdî de – belav kirine.

Enwer di gotara xwe de, ji alîkî, pesnê serekên Koçerên Botan dide, û ji aliyê dî, Koçera û Abasa – dike pêgirtiyên Şemmera. Û navê koçerên Mîran diguhere bi "Meydan" da navê Mîrîtiyê winda bike, û beriya wê jî, Koçer tevde kiribûn pêgirtiyên Şemmera. Her wiha, pesnê Malbata Mer'ê dide û hoza Aliya – dike pêgirtiya Şemmera. Û navê bereya Elika ji hoza Aliya – dike"Al 'Ilêwî" û wan bi vî navî, digihîne Şemmera. Enwerê Şemmerî, pesnê malbata Ebas ji malmezina Dûrika ji hoza Hevêrka – dide, lê Dûrika dike pêgirtiyên Teya ji Ereban. Her wiha pesnê Malbata hecî Elî yê Hisên û malbata Elik ji Hacî Silêmanya ji Aşîta – dide, lê bereya Hacî

Silêmanya –dike pêgirtiyên Teya. Û bi vî rengî pesnê malbata Yûsif, Malmezina Kasika ji Aşîta – dide, û kasika dike pêgirtiyên Teya. Û Enwer ê Şemmerî xwe dide jibîrkirin ku ev her sê bereyên Aşîta – Kurd in û ji nişte-cihên kevnarên Sinceqa Xelef A'xa ne, û çi pêwenda wan, bi Teya re nîne .

Gava Enwer ê Şemmerî digihêje ser hoza Hevêrka, Dibêje:

"Ev birrek hindike, na ête ser ziman, û bê dîrok e û malbata Haco serekên wa ne". Enwer, xwe dide jibîrkirin ku ev hoza Kurdî ya mezin di dîroka Kurdî de – navdar e, û niştecihe li deverek fireh ji Kurdistanê, ji devera Nisêbînê, ta devera Cizîra Bota. Û gava tête ser navê Haco, pirtir jehra xwe ya şovînî – dixe nav nivîsandina xwe de.

Enwer ê Şemmerî gava tête ser raperîna Beyandûr, bûyerên wê tevlihev dike, û piraniya rûmeta wê raperînê – dide

Cewwala ji Teya û beşekî– dide Misgalê Asî yê Şemmerî, û dibêje: "Misgal û şervanên xwe – dane pey Rogan, di ça'xa vegera wî de, ji deravê Pêş Xabûr, ta ew gihandine devera "Teya". Lê ev cihê Pirsiyarê ye, çikû cihên raperînê Beyandûr û Tirbesipî û Beyazê bûn, û baregahê Rogan li Beyandûr bû. Gelo çima dê Rogan biçe nav Teya ku berjêre bi 40 K . M .? û Enwer parek hindik ji wê raperînê dide hozên Kurd yên ku stûna wê raperînê bûn.

Li ser kuştina Mihemedê Ebas, ji malmezina Dûrika, bi destê ceneral Rogan, Enwer geh wî nav dide Ebas û geh wî nav dide Mihemedê Ebas. Ya ku sirinca hişmendî dikişîne ew e ku Rogan xwediyê derûnek leşkerî bû, ne konevan bû, xwe didît û dilhişk bû. Û Mihemed ê Ebas ji mal mezina bû û rêzdar bû, û Rogan ew bi awakî hovîtî kuşt, çikû nas kiribû ku ew serdestiya leşkerekî biyanî, li ser xwe û hoza xwe –na pejirîne, û hozên kurd li wê deverê–tev bûn kîndar li ser Rogan, bi hoya

wê kuştina Mihemedê Ebas ya bi hovîtî (ew xiste kortek kûr, ta stuwê wî, û gewde yê wî tev, di zemînê de, bin-ax kir, û ew işkince kir, ta ku can da) û Dûrika û Hevêrka tevde, dixwestin van leşkerên dilhişk – ji welatê xwe derînin, û tola wî kuştiyê rêzdar bistînin, û bi vî awayî, devera raperînê, li çarhawîra baregahê Rogan bû, ji Hacî Silêmanya û Dûrika û Kasika … rast e, hin ji Teyan pişkdar bûn, lê pişkdariya Teya – di pileya duwem de bû .

Enwer bi xwe dibêje: "Mezintirîn komela raperînê ji bereyên Aşîta bûn, Dûrika û Hacî Silêmanya û Kasika ..". Û gava ku beşê mezin ji Teya (Raşida) – ne pişkdarbûn di raperînê de, çima Enwer pêşengiya raperînê dide bereya Cewala ji Teya? û çima qehremaniya raperînê dide Ayidê Nezzal, û di rûpela 53 de ji govarê, carekê dibêje: Ibrahîm ê Xelîl ê Gu'ûd, Rogan Kuştiye , û carek dî, di wê rûpelê bi xwe de, dibêje: Ehmed ê Ibrahîm ê Xelîl ê Gu'ûd Rogan kuştiye.

Enwerê Şemmerî na bêje: Ka hespê Rogan li nik kê ma bû? û kî ne ew ên ku termên Rogan û Firensiyan, li nik wan ma bûn, û bi awakî şehristanî û mirovatî, ew term parastin, ta radestî xwediyên wan kirin? Enwer ê Şemmerî, bersiva van pirsiyara na de, çikû dizane ku ew ên ev karên bi rûmet kirine, hozên Kurd in, Dûrika û Hacî Silêmanya û Kasika û Hevêrka bi serdariya Haco…Lê Enwerê Şemmerî, gava digihê ser Hevêrka û Haco, hişê xwe, di nav kîna xwe ya şovînî de winda dike!.

Lê em dikarin ji Enwer re bêjin: Haco ne tenê A'xa bû, Haco kesatiyek Kurdî behredar bû, karger û xwedî bandor bû, û xwedî cemawer bû. Gava Enwer dibêje: "Desthilatên Tirkî û Firensî bi hev re, alîkarî ji Haco – dixwestin", pêwîst e ku Enwer zanibe Haco xwediyê şiyanek bilind û ne asa bû, û

Tirkiya û Firensa, şiyanên wî nas dikirin, û li gorey wan şiyanên wî, daxwaz ji wî dikirin.

Enwerê Şemmerî dibêje: "Haco hatiye nik Malbata Mihemedê Ebas, û malmezinên Kurd û Teya li wî civiyane, û ew nav dane A'xa, û bi hev re nexşeya raperînê – danîne, ji bo tol-standina Mihemedê Ebas û dijî Rogan û Firensa".

Êdî, çawa Haco dê dijî malbata Mihemedê Ebas be? û çawa dê kar ji Firensa re bike?.

Enwerê Şemmerî sê lîstikên konevanî dixe stuwê Haco:

**1-** Lîstika digel Firensa, bi parastina termên Rogan û kuştiyên Firensî.
**2-** Ji hevxistina hozên Kurd, li deverê, da tev bikevin bin destê wî, û serekatiyê, ji malbata Mihemedê Ebas – bide alî.
**3-** Hevkarî û nokerî ji Firensa re, da bibe serekê Kurdê Cizîrê teva.

Em dikarin ji Enwer re bêjin:

**1-** Firensa ne kawik bû, bi pileya ku Haco lîstika li ser wê – bibûrîne. Û Firensa Haco Surgûn kir, û cihnişîniya zordarî li ser wî sepand, li Şamê û Hesekê, û Haco azar kêş ma, ta giha Xudayê xwe.
**2-** Haco nexşe danî digel hozên deverê û tola Mihemedê Ebas stand, êdî dê çawa bixwaze serekatiya malbata wî bide alî? Û Haco ne di cihê rikdariya serekatiya wan de bû, çikû Haco serekê Dûrika û Hevêrka teva bû, ne di cihê ku bi dexise ji malmezina Dûrika. Haco Kurd dicivandin, ne ji hev dixistin. Lê Enwer û şovîniyên wek wî – dixwazin Kurda ji hev bixin, û wan bikin dijminên hev.
**3-** Ji mafê her kesê kurdê ku gelperwer be, û welatparêz be, û xwedî karîn be – ku bide pêşiya gelê xwe, û doza

daxwazên wî bike. Û Haco xwediyê van Sali'xan bû, û şayisteyê serakatiyê bû.

Hin nimûne ji kesayetiyên malbata Haco:

Hesen A'xa yê Haco (Xwedê ji wî xweş be): Xwediyê çehrê gewz û ruwê sor-zerî, digel Koloz û Hemawiya bi nigar, ku rûmet û pendiyarî ji wan dibarîn. Gava ez bi dîdara wî şad bûm, ez rewal bûm. Şêx Mihemed Îsa, Xwedê ji wî xweş be, ji min re got: "Tu dixwazî digel min were ba Hesenê Haco? "Ez pir şad bûm, û min bi dilxweşî ew dîdar wek mizgînê dît, û bi tevaya hest û hişê xwe, min li peyvên wê kesayetiya hêmin û hişmend –guhdarî kir. Tête bîra min ku wî, bi kuldarî, li ser hoz û netewe û birrên din, yên ku Kurd bi wan re dijîn – peyivî û gazin ji wan û ji dan û sitandina wan kir, û got: "Ew tev, ji me re –ne li gorey emekdarî û dilxwazî û rastiya me ne"!. Hesen a'xa yê Haco, berî yasaya "Islahi zzira'î" (çakkirina çandinî û zeviyan), rîsipî û xuyayên hoz û malbata xwe, civandin, û pêşinyarek kir ku tevaya wan pejirandin, û biryar dan ku xak û zeviyên malbata Haco, ji nû ve bêne par kirin, bi vê rêzana ha: Her kurekî Haco 35 hiktar ji wî re bin, û her kesê xwedî jin û mal, ji malbatê 25 hiktar ji wî re bin, û yên mayî bêne parkirin li hezar û sed û du malên gundên wan, ji hozê û cotkarên wan gundan. lê dest hilata Be'esiya – ne hişt ku ev piroje bi cih bibe.

Di jiyana Haco de, gava hin nekokiyên êldarî rû didan yan şer çê dibûn, û aştî û li hevkirin pêk dihatin, ew ên hemberê malbata Haco – dikirin merc (şert) ku ew li hev kirin, divê di bin siha bext û nihadê Hesenê Haco de be.

**2-** Zinawerê Haco: Ew bi bejna xwe ya bilind, û durvên xwe yên girs, û peyva xwe ya li rû – suriştê A'xatiyê dide der, lê di dibistana malbata mezin de – hînî gelek sincên bi rûmet bû ye û hişmendiya wî fireh bû ye.

**3-** Dr. Hizniyê Haco: reftar û dan û sitandina wî-gelek nerm û xweş e. Gelêriye di alîkariya kurdên pêwîstî alîkariyê ne. Girêdayiye bi kêşeya Kurd ve, û li gorey wê – tête guhertin.

**4-** Silêmanê Hesenê Haco: Peyv-xweş û zar – şayik e, şaristaniyekî nûjen û pêwendarekî jêhatiye. Mixabin ku ji rewiştên malbata Haco – cuda ye: Hevjîna wî ya Ereb – keça Hesen Siza î, ( parêzerekî Ereb e) û bi vê egerê, û bi encama xebata wî di partiyek Erebî û radikal de, zaruwên wî – bi Kurdî na peyivin.

# *Hoza Pinar Eliya*

Berî nêzîkî du sed sal, pêşiyên vê hozê, ji Girê Dîşê, yê dikeve devera Wêran şarê – hatine, û li navbera Qamişlo û Amûdê – bi cih bûne. Ji wê ça'xê de, hin gund ava kirine, û çandinî kirine, lê wan digel vê, pez û tariş jî – xwedî kirine. Hin bi hin, devera wan ya çandiniyê –fireh bûye, û devera çêregeh û ne avakirî teng bûye. Ev devera wan, dirêjiya wê, ji bakur ta başûr 65-70 k. m. ji gundê Darê û Zivingê (li kurdistana Turkiya) – ber jêr dibe, ta digihêje Berkesiz (Til birak li Sûriya) ku bi 30 k. m. dikeve bakurê rojhilata Kewkebê Millan, û gundê Xaşûga yê ku bi 13 k. m. dikeve bakura Kewkeb. Pehniya vê deverê 20 -25 k. m. heye, li ser wê dirêjiya ku me berê got, ji çemê Hirmasê (Ceqceq) bi aliyê rojava de diçe.

Hoza Pinar Eliya, ji çar êlan pêk tê; Temika, Mîrsiniya, Bobilana, û Koceka. Deverên van her çar êlan – tev li hev dibin, û piraniya Kocekan li aliyê Turkiya bicih bûne. Malmezina Pinar Eliya bi tevayî, malbata Hisên A'xa bû, navend

ên vê malbatê gundê Dêrê û Qesrê ku dikevin rojava ya Nisêbînê, li Kurdistana Turkiya. Nelihevî – kete navbera vê malbatê, xwe bi xwe, û A'xatiya Pinar Eliya ji destê wan çû. A'xa yê vê malbatê yê dawîn – Xelef Axa bû, û berî pirtir ji190 salî hebû. Û piştî wî, A'xatiya her êlekê, ji her çaran – kete destê wan.

**A-** Êla Temika ji rojava ya Qamişlo û ber jêr de – bi cih bûne, û pehniya devera wan 10 k. m. heye, û 25-30 gundên wan hene. Giringtirînên wan gundan ev in: Xerab kort, Hîmo, Til şi'îr, Necm, Gir bawî, Agûlê. Û giringtirîn bere yên Temika ev in: Doko, Lêlê, û Doqo. Mal mezina Temika malbata Mi'o Teze ye (dihate navdan "Teze" çikû pir sipehî bû).

Vê malbatê, berî 60 salî, cihê xwe yê civakî girtiye, û serekên êla xwe ne, dewlemend in, xwedî xak û gund in, beşekî mezin ji xakê wan ku li Nisêbînê bû –Tirka dest danî ser. Vê malbatê pişkdariyek xurt, di tevgera nûjeniya awayên çandiniyê de, li Sûriya – kiriye. Şêxmûsê Derwêş ê Mi'o teze, di pêşiya wan kesên ku gîsin-kêş (terektor) û Çinînkar (derrase) yên mîkanîkî – anîne Parêzgeha Cizîrê (Hesekê).Torevanê welatparêz Mûsa Enter ji malbata Mi'o teze ye, ji yên ku li Turkiya ma ne, û nav û dengê xebata wî, ji bo azadiya gelê Kurd – gihane guhê her Kurdekî azadî-xwaz. Temika ketin dijminayê, bi Bobilana re, di pêşiya sed saliya bîstan de. Û di çilên sedê bîstan de – ketin dijminayê dijî hoza Cubûrî ya Ereb.

**B-** Êla Mîrsiniya: Ev êl li rojavaya devera Temika bi cih bûne, û hin gundên wan û Temika tev li hev bûne. Çend malbat û bere di vê êlê de hene; malbata Xello, malbata Cum'a..û bere yên Welîka, Dellî, Betalo, Ruhê… Giringtirîn gundên

Mîrsiniya ev in: Kotiya, Topiz, Olçiya, Elî Fero, Gir sorê Mîrsiniya, Hecî Nasirê, Xirbê Kuruma...

Dijminayî ket navbera Mîrsiniya û hoza Cubûriya Ereb, heşt kes di wê dijminayê de– hatin kuştin, sê kes ji Mîrsiniya, û pênc kes ji Cubûriya, yek ji kuştiyên Cubûriya bi navê Ebasil A'xewat, yê ku serek bû. Berberiyek êldarî di navbera Mîrsinî û Deqoriya de jî – çê bû, lê gûr ne bû, û bê ziyanên mezin – dawî li wê hat.

Êla Mîrsiniya dewlemend in, û navdar in bi şarezatiya di vî warî de. Mal mezinên Mîrsiniya malbata Xello ye. Evdiyê Xello yê navdar bû – ji serekên wa ye, Hisko birazayê Evdî, gernasekî mêra bû. Min carekê ew dît, û ramana ku min ji wê dîtinê sitand – ew bû ku durvên mêrxasî û kesayetiya giran –li wî xuya bûn, û gelêrî û ne oflaz bû, û bi hêminî, cihê xwe dadigirt. Mixabin, bi dest min ne ket ku ez pêzanîn ên fireh, li ser wê kesayetiya rêzdar – nas bikim. Digel ku Mîrsiniya pêşve çûne, pêwendên civakî di nav wan de – qels in.

**C-** Êla Bobilana: Çend bere yên vê êlê hene; Gird, Gurîkî, Zerdo, û Geddo…Bobilana, çendî bi hijmara xwe ne pir in, lê destê xwe, dibin destê kesî ve nakin, û ji ber vê yekê ketin rezm û nekokiyan digel êlên dirawsê yên xwe; bi Mîrsiniya re, bi Temika re, bi Millanê Xidir re, tev ku ji teva hindiktirin. Malmezina Bobilana malbata Qaso ye, malbatek rêzdar û welatparêze, navendên vê malbatê – li gundê Zorava û li Qesrê ne, ku li nêzîkî Darê ne, li Tukiya.

Giringtirîn gundên Bobilana li Sûriya Evin: Doda, Çamurlê, Elo, Atêş, Xaşûga, Naroz…Bobilana hogirên dost û hevalên xwe ne, û ew dost û heval dikarin xwe bi spêrin wan. Bobilana xûkîtî – ne dane Şemmera, Ew hoza Ereb ya ku talanker bû, ew a ku xûkîtî ji Piraniya êlên Cizîrê distandin, di demên berê de. Bobilana 18 şervanên xwe

şiyandin di hana Kîkan de, di wan şerên ku di navbera Kîkan û Beggara yên Ereb de – çê bûn, di salên 1944–1945 de, û dijî Beggara şer kirin. Bobilana, bi giştî, ne pir dewlemend in, lê nuha digel dest-tengiya wan, ew pêşve çûne, û xwendevanên wan çê bûne.

**Ç-** Koceka: Piraniya vê êlê li kurdistana Turkiya ma ne, li devera ku dikeve, hembera devera Temika û Mîrsiniya û Bobilana yên li Sûriya. Koceka, bi hijmara xwe, ji Bobilana pirtirin. Mal mezina Koceka di vê demê de – malbata Hemo yê Mihê ye, li Nisêbînê. Ev malbat dewlemend û cih girtiye di nav êla xwe de. Gundên koceka yên giring yên ku nêzîkî Nisêbînê ne – ev ên han in: Dehla Bû nisra, Şanşê, Bawirnê…Xakên van gundan mêrg in, û nîv-avî ne, Pembo û birinc, li wan – têne çandin. Di dîlokên li ser zimanan, û di Folkulorê Kurdî de– Koceka xwedî Hunner û şadiman in, û çêkerên kêf û dilxweşiyê ne.



zîbayek ji malmezinek Temika
( ji parastiyên ristevan Salih Heydo )



Ciwanikek rêzdar ji Mîrsinya
( ji parastiyên ristevan Salih Heydo )

# *Hoza Deqoriya*

Ev hozek Kurdî ya dîrokî û kevnar e, û ji sedê salan de, li devera Şernexê, li cih û warên Botan – cih girtibûn. Û berî sê sed sal, beşek ji wan  – koç kirin û hatin devera hawîr Amûdê, û li wê niştecih bûn, û gund ava kirin û zevî çandin. Û bi egera ku bi nijadê xwe, ji devera Botan bûn, têkilîyên wan hebûn, digel pêşiyên Bedirxaniyan, ji fermandêrên (Mîrekên) Botan. Û gava Bedirxan Paşa raperî dijî Tirkên Osmanlî, û bi şoreşa xwe ya netewî ra bû, di çelên sedsaliya 19 a de, Xelîl A'xa yê Deqorî (bapîrê şeşemîn ji malbata Mihemed A'xa re) – xwest pişkdariyê di çalakiyên wê şoreşê de bike, û dest danî ser du topên Osmanliyan.

Deqorî ji sê bere yên serekî pêk tên, bereya mezin û fireh, ji her sê yan – bereya Gebeka ye, û bereya duwemîn bereya Seyida ye, û bereya sêyemîn Domiza ne.

Piştî sala 1920 a, gava ku Sûriya bû desthilatek serbixwe, û ji Osmaliyan  cuda bû – hoza Deqoriya hate perçe kirin, di navbera Turkiya û Sûriya de, Beşê mezin ma li Sûriya, û beşekî mezin ji xakê Amûdê – tîş bû, bi 'xêza tuxûbê nav-netewî, û ew beş bû ji para Turkiya, û xwediyên wî xakê bakurê Amûdê ji wî bê par bûn.

Piştî ku avahî û çandinî fireh bûn, li devera navbera Amûdê û Hesekê, Hozên Deqoriya û Millanê Xidir û Gabara –digel hev gund ava kirin, û çandinî berfireh kirin, û gundên wan her sê hozan – ketin nav hev, di wê devera navbera Amûdê û Hesekê de, bi dirêjiya 80 k. m. û bi pehniya 30 k. m.

Girkê Deqoriya gundê Gabara ye, û bi navê Deqoriya tête navdan, û Dawudiyê gundê Se'îd A'xayê Deqorî bû, di nav gundên Millan de ye, û nêzîkî Kewkebê Milla ye. Û ta nuha jî, ev her sê hoz, bi hev re –niştecihên vê deverê ne.


Hinek dijwarî di dîroka Deqoriya de –çê bûne, û bûne hoyên tengezarî û arîşeyan, ji wan re; Piştî ku Xelîl A'xa (bapîrê pêşîn yê malbata Mihemed A'xa) – bû xwedî sûc, li nik Osmanliyan, bi egera dest danîna ser her dû topan, du kesayetiyên Deqorî, Es'ed û Şero, xwarzayên Xelîl A'xa bûn – antaxî û nokerî ji Osmanliyan re kirin, dijî Xelîl A'xa, û bi alîkariya wan digel Osmanliya –Xelîl A'xa hate kuştin û kurê wî, Hisên A'xa– hate girtin, û Mamo yê Sadiq– bû A'xa, lê A'xatiya wî – dirêj ne kir, çikû Osmanlî li Hisên A'xa buhirîn, û ew berdan, û gava vegeriya nav hoza xwe, Mamo yê Sadiq, ji A'xatiyê ket û bû cihê tinaz û pê kenînê, û Hisên A'xa, Es'ed û Şero Kuştin û dilnexwazên xwe û bavê xwe, bi tol sitandinê êşandin, û bi sitema xurt, hoza xwe berbat kir.

Malbata mezin ji bereya Domiza, malbata Şemdîn A'xa – çûn bajarê Şamê, û li wê deverê niştecih man, ta nuha. Gebeka û Seyida – hev kuştin, û sûc kete stuwê Gebeka û hatin dûrkirin û çûn nav Ereban.

Piştî ku Hisên A'xa – dît ku hoza wî ji hev belav bû, A'xatiya hozê da dest kurê xwe Birahîm A'xa. Birahîm A'xa Seyida û Gebeka li hev anîn, û Gebeka vegeriyan, û gundê Dîkê û gundên xwe yên din ava kirin. Û ji wê demê û pê ve, rewşa Deqoriya durist bû, ta giha dema Se'îd A'xa, ça'xa ku li ber desthilata Firensiya ra bû, di sala 1937 de, û Se'îd A'xa penahber bû, û çû Iraqê. Lê zû vegeriya û cihê xwe yê civakî girt, bi rûmet û serbilindî. Mixabin ku Se'îd A'xa, di dawiya jiyana xwe de, hinekî destteng bû, û naçar bû ku gundê xwe,Terzî bifiroşe, da karibe erkên xwe yên giran – bi cih bîne. Di van dem an de, giringtirîn gundên malbata fireh ya

Mihemed A'xa ku ji Se'îd A'xa û zaruwên wî û her sê birayên wî pêk tê – ev in: 'Hetlo, 'Ereb kendê, 'Ezêm, Sarîncê, Til cihaş.. Û giringtirîn gundên Seyida – ev in: Te'elikê, Qez-enbûkê, Mi'êrîkê… Û gundên  Domiza ev in: Herem Cimo, Birîva… Û giringtirîn gundên Gebeka evin: Elî goran, Dîkê, Zînar, Çolme, Şerefiyê, Xirbe zirgan... Se'îd A'xa mirovekî heval-perest bû, "Bi mezinan re mezin bû, û bi biçûkan re biçûk bû", alîkariya kesê tengezar dikir, û rêzgirtina mirovan bi cih dikir, û rewiştên civakî, û sinc û toreyên baş – diparastin.

Mihemedê Se'îd A'xa mêrxasekî navdar bû, Xwedî namûs û rûmetek bilind bû; di rûdawa şewata sînema Amûdê de, ewa diltezîn, ku bi sedan zarokên kurd – di wê de, hatin sotin, di sala 1960 de, Mihemed ê Se'îd A'xa, gelek ji wan zarokan –ji nav pêtên agir rizgar kirin, û gava ku ji wî re hat gotin: "zarokên te ne di nav van zarokên sînemê de ne", wî vegerand: "Ev tev zarokên min in", ta ku xwe kir goriyê zarokên gelê xwe, û di nav pêtiyên agir û dîrekên hesin yên banê sînemê ku heliyan û hilweşiyan, canê xwe yê pak siparte Xwedayê xwe, û rûmeta bilind wergirt.



Keçek ji malmezinên devera Amûdê
(ji parastiyên ristevan Salihê Heydo)

## *Hoza Gabara*

**Koka Gabara**: deverek rojavaya parêzgeha Mêrdîn – di bin destê Mîrê hoza Sorika de bû. Mamek bi navê Dodo û sê xortên birazayên wî, bi navên 'Heydo û Subhan û Ebdo digel xwehek xwe – niştecih bûn li wê deverê. Diyare ku ew Mîr pir sitemkar bû, bi awakî ku derbas dibû ji sînorên mirovatiyê, ta digiha radeya ku gava jinek ji wê devera di bin bandora wî de – diket serê wî, li ser xwediyên wê disepand, ku wê bixemilînin, û pêşkêşî wî bikin, daxwaza Mîr jî – ne dihat vegerandin, û arezûya wî jî – ne dihat şikandin. Dilê Mîr bijiya birazaya Mam Dodo, û ji kes û karên wê xwest ku wê bikin diyarî ji wî re, û pêşkêşî wî bikin. Mam Dodo û her sê birazayên xwe – raman li hev gerandin, û gihan biryara ku Ebdo xemla jina wergire, û bibe bûk, û pîşkêşî Mîr bibe, û Mîr bi destê Ebdo bête kuştin, berî ku şad bibe, bi zavatiya xwe, û Dodo û her sê yên din kara koçkirinê kirin, û simên gayê xwe kulav kirin, da şopa simên ga – ne xuyên, û hem deng jî, ji ber simên ga, di nav keviran de – der nekeve.

Pêwîstên rêwîtiya xwe, li ser pişta ga yê xwe bar kirin, û bi şevê û bi dizî – bi rê ketin, Ebdo jî Mîr kuşt, û ber bi Dojehê de şand. Rêzana wan, bi duristî – bi cih hat, û ji devera bandûra Mîr ê Sorika – derketin, û di qonaxên dirêj de – gihan devera Şingalê, û di warê nuh de, li deşta Şingalê ya fireh – bi cih bûn, û bi mêrxasî û gernasî, xwe parastin, û hatin navdan "Gabara". Demek dirêj bi dehan û sedên salan derbas kirin, û pir bûn, ta bûn hozek ji çar bereyên mezin, bi navên: Mam Dodî, Heydanî, Subhanî, Ebdikî.

Ji malmezina vê hozê û ji bereya Mamdodiya–Hemê Hesso mêrek kuşt, û gava dijminayî – çê bû û fireh bû, Hemê Hesso bi tenê –xwe dûr kir, û hat cem malbata Mihemed A'xayê Deqorî, û kar kir ji bo Peydakirina warekî nuh, ji hoza xwe re, li devera Başûra Amûdê, û pir dem – ne çû, hoza wî jî hate warê nuh, di dawiya sedsaliya 19 Z de, û bûn hevbendên hoza Deqoriya, û malbata Mihemed A'xa gundê Til Hebeşê dan wan. Nuha, em dê li ser her çar bereyên Gabara bipeyivin:

'Hemê Hesso giha Xwedayê xwe, Gabara Mecîd ê 'Hemê Hesso kirin serekê xwe. Mecîd serekekî bê kêmasî bû, û hoza wî û hevbendên wî, bi rêzgirtin, bi wî re, dan û sitandin dikirin. Lê ew bê dûnde bû, û gava giha Xweda yê xwe, birayê wî Yûnis ê 'Hemê Hesso, bavê hecî Şêxmûs ê Hesso kete cihê Mecîd. Piştî Yûnis, kurê wî hecî Şêxmûs ê Hesso hat pejirandin ji bo serekatiya Gabara.

Hoza Gabara, piştî ku hatin devera başûra Amûdê, bi saya şarezabûna serekên xwe, û bi rêkeftina digel hozên Millan ê Xidir û Deqoriya – bûn xweş dirawsê, ji van her dû hoza re, û her sê hoz– man niştecihên devera navbera Amûdê û Hesekê ku dirêjiya wê ji bakur ta başûr 80 k. m. û Pehniya wê, ji rojhilat ta rojava, nêzîkî 30 k. m. bû. Gava avahiya gunda û çandiniyê, di vê deverê de fireh bû, van her sê hoza, bi hev re – pişkdarî di wan çalakiyan de kirin, û ta nuha jî, gundên wan tev li hev in, û bi biratî, digel hev – dijîn, û pêwendên wan yên civakî – xurtir dibin.

Divê ku bête zanîn ku serekatiya Gabara – cuda ye, ji A'xatiya hozên din, çikû serekên Gabara – xwe didîtin berpirsên hozê, wek berpirsiya bav, ji malbata xwe re, bi hestê biratî, ne bi serdestî – berjewendên hoza xwe diparastin. Em dê vegerin ser her çar bereyên Gabara:

**1-** Giringtirîn malbat û gundên bereya Heydaniyan – ev in: malbata Ûso, li gundên Xirbê kejê û Hesê Ûso, malbata Emo, li gundên Çox reş û Gir reş, malbata Reşik, li gundê Topo, malbatên Ico û Remo û Reşik li gundê Sîçwa.

**2-** Giringtirîn malbat û gundên bereya Subhaniya – ev in: malbata Ebês li gundên Werdiyê û Çolmeyê jêrîn, malbata Elî sêwî, li gundê Şîqnê, malbata Şindî li gundê Til Hemam.

**3-** Giringtirîn malbat û gundên bereya Ebdikiya – ev in: malbata Ebdella, li gundê Girê êş, malbata Hessûn, li gundê Beko, malbatên 'Xanim û Xelefo li gundê Mestûra, malbata Kişko li gundên Gi'êt û Seyid Elî.

**4-** Giringtirîn malbat û gundên bereya Mamdodiya –ev in: malbata Hesso, li gundên Bîrabazin, Sîxur, Mi'êrîkê, Qere tepe, Çetelê, Sebahiyê, Kurdo, Til hebeşê, Xalid, Marîtê, Sinceqa şêx, malbata Revê li gundê Gir keftar, li van gundan, hin bereyên din jî hene, lê piraniya wan Mamdodî ne. Li hin gundên din, Mamdodî û hin bereyên din ji Gabara – tev li hev in: Girkê Deqoriya, ji Mamdodî û Heydaniya – pêk tê, gundê Seyid Elî, ji Mamdodî û Ebdikiya – pêk tê, gundê Girê fêris ji Subhanî û Mamdodiya, pêk tê, gundê Silinder, ji Mamdodî û Heydaniyan pêk tê…

Şarezabûn û pendiyariya malmezina Gabara – hoyê mezin bû, di pêş ve çûna vê hozê de, nemaze serekên wan: Hemê

Hesso, Mecîd ê Hemê Hesso, û bi taybetî, hecî Şêxmûsê Yûnisê Hesso. Ev ên han, bi duristî cihê bavê hoza xwe digirtin. Hecî Şêxmûs, bi alîkariya hoza xwe – bûn hoyê ku 99 ji sedî, ji Gabara, bûn xwedî xak û zevî, di 42 gundan de.

Di vê demê de, rewşa Gabara ya abûrî – baş û orte ye, piraniya gundên wan – xwedî gîsin-kêş (terektor) û çinînkerên mîkanîkî (derrase) û Turimbêl in. Û rewşa wan ya civakî qenc e; hevgirtîne, bi hev re alî kar in.

Rêjeya xwendinê, li nav wan baş e, bi sedan derçûyên zanîngehan, di nav wan de –hene, bi dehan, Duktor in, û bi rêjeyek pirtir Endazyar û Mamosta ne. Keçên xwe – didin xwendin, û wan, bi viyana wan, û bê asteng – didin şû kirin, qelenê Gabara, xwe bi xwe, ne giran e, (125 hezar lîre yên Sûrî, û ji dused hezarî derbas na be). Gabara welatparêzin, û ji heval û dost û dirawsê yên xwe re rêzgir in.



Keçek Gabarî bi kêsima folkloriya dêrîn
( ji parastiyên ristevan Salhê Heydo)

# *Hoza Millanê Xidir*

Ev hoz kevnar e wek hoza Millanê Keleş Evdî (Millanê Paşê), ev her dû hoz, xwe digihînin hev, bi nijad, lê bi egera kevnariya wan, nema tête zanîn, ku ew di çi deman de, ji hev cuda bûne.

Hoza Millanê Xidir, li navbera bajarê Amûdê û bajarê Hesekê, bi cih bû ne, digel her dû hozên Deqoriya û Gabara bi hev re dijîn. Ev devera hevbeş, di nav van her sê hozan de, dirêjaya wê 80 k. m. Û pehnaya wê 30 k. m.

Millanê Xidir têne navdan, bi navê Xidir A'xa, ew ê ku berî sêsed sal, ew û hoza xwe, li vê devera navkirî, niştecih bûn. Diyare ku Xidir A'xa xwedî bandorek fireh bû, li wê deverê, di wê dema koçerî û êldarî de. Gelek şûnwarên wî û hoza wî û neviyên wî –li wê deverê, xuya dibin, û bi navên wan, hatine navdan:

**1-** Kewkebê Millan, ew girê volkanî ku dikeve rojhilata bajarê Hesekê, bi heft k. m. Û li hawîr wî girî, bilindiyên volkanî hene, lê ew bilindtire, bi awakî ku xwe dide xuya kirin, li hember çiyayê Şingalê û çiyayê Evdil 'Ezîzê Geylanî, li rojhilat û rojavayê xwe.

**2-** Girê Xidir: Ev gir dikeve başûra Qamişlo, bi 45 k. m. li devera Til hemîs, ta nuha jî, kevirekî nicirî, li wî girî – tête navdan bi navê Xidir A'xa.

**3-** Girê Mecdel: Ev girê ku tête navdan bi navê yekî ji neviyên dûr yên Xidir A'xa – dikeve rojava ya Hesekê, bi 8 k. m. di navbera çemê Xabûr ê Serê kaniyê û çiyayê Evdi1 'Ezîzê Geylanî de. Erebên wê deverê, Mecdel nav dikirin "Ra'il-

Rîmat" ango xwediyê asikan ('xezalan), mebest ew bû ku deveh ên wî, wek asikan spehîbûn.

**4-** Qubbet Birahîm, ango "Kunbeda gorra Birahîm" Neviyê heftemîn ji neviyên Xidir A'xa. Ev kumbet dikeve rojhilata Kewkebê Millan, bi 15 k. m. Erebên wê deverê ew kumbet nav dikirin "Qubbetil Me'elûg" ango Kumbeta miriyê sotî, wan Ereban nifrîn li Birahîm A'xa dikirin ku bête sotin, bi agirê Dojehê, çikû wan gelek zor û sitem ji destê wî dîtibûn.

Di van deman de, pirtir ji 120 gundên Millanê Xidir hene, ew gund belav bûyî ne, di navbera Amûdê û Hesekê de. Millanê Xidir, bi ola xwe, du birr in, Êzîdî û Musilman in. Ew ên Musilman, ji sê bereyên serekî, pêk tên:

**A-** Badînan: Giringtirîn gundên vê bereyê ev in: Sinceqa Se'edûn, Me'emurlê, Girê Xelîl, Girê Xêlid, Misto hindî, Xirbê Hisî…

**B-** Herçar malbatên neviyên Xidir A'xa:

**1-** Malbata Şêxmûs ê Elî A'xa (malbata Newafê Hesen, li gundên Sê mitik û Til batî, û malbata Osman A'xa, li gundê În qirdê).

**2-**Malbata Evdilqadirê Elî A'xa (malbata Hisênê Birahîm A'xa û Silêmanê Îsa, li gundên Kodhê, û Efendî...

**3-** Malbata Îsayê Elî A'xa (Malbata Îsa yê Evdil kirîm û Mecdelê Evdil kirîm, li gundê Gundor).

**4-** Malbata Ehmed ê Elî A'xa (malbata Dr. Yûnis Xidir û Dr. Şêxmûs Xidir, li bajarên Hesekê û Qamişlo).

**C-** Cemaldîna: Giringtirîn gundên wan ev in: Xerezê, Bişêriyê, Eslo, Cemîliyê…

Ev bereyên serekî – belavin li wan gundên me bûrandin û gundên Bergîr boz, Moza, Eslo…û li hin bajarên Cizîrê.

Her çar malbatên neviyên Xidir A'xa, ji dema Xidir A'xa ta nuha, bi 13 nifş û neviyên li pey hev - bûne bereyek mezin. Zincîra neviyên Xidir A'xa ya Malbata Îsayê Elî A'xa ev e: Ehmed kurê, Elî, Îsa, Evdil kirîm, Şêxmûs A'xa, Elî A'xa,

Birahîm A'xa, Hisên A'xa, Celalî, Emer Axa, Isma'îl A'xa, Xidir Axa.

Êzîdiyên Millanê Xidir – çar bere ne:

1- So'anî. 2 – Şerqî. 3 – Dinna. 4 –Xalida.

Giringtirîn gundên wan ev in: Kerengo, Merkeb, Morîkê jorîn, Çetela Millan, Hêşerî, Avgîra jêrîn…Du gundên Êzîdî yên Millanê Xidir hene, bi navê Berzan ê jorîn û jêrîn in. Diyare ku navê van her dû gundan – li navê her dû gundên Berzan yên Êzîdiyên kurdistana Iraqê – hatine kirin, ew ên li nêzîkî Başîqê ku li bakura bajarê Mûsilê dikevin. Hem diyare ku seng û rêza navê Berzan bilind e, li nav Kurdên Êzîdî û Musilman tev de. Her wekî ku Pîr Xidirê Silêman Gotiye, di govara Metîn (hijmara 122) de: "û ji kenarê zimanvanî ve, Berzan peyveka resena Kurdiya lêkda ye, weha çawa gu "zanîne"Ango ber zan–cihê me'erifet û nasînên melbendê rûhî..".

Em bi hêvî ne ku têgihiştia me ya netewî – yek be, çi li baregehên Kurdên oldarên Êzîdî yên Zerdeştî û Kurdên resen, û çi li baregehên Barzaniyên Kurd-perestên navdarên

Musilman, hêmayên Kurdayetiyê,wek Barzaniyê nemir û şêx Evdisselam…û çi li hişên zana yên Kurd yên hevdem.

Zorbeya kesên Millanê Xidir – xwedî sincên rêzdar in, comerd û çav-vekirî ne, bi rûmet û ji xwe fedî ne, û hestê welatparêziyê, li nik wan – xurt e. Belavbûna xwendinê, li nav wan – orte ye, û li nav jinan kêmtire.

**Xuyayên Millanê Xidir**: gelek kesayetiyên rêzdar, di nav wan de hebûn û hene; Eliyê Elî, Newafê Hesen, Hisênê Birahîm A'xa – navdar bûn bi mêrxasiyê. Îsayê Evdilkirîm û

Birahîm ê Qado – Pendiyar û êlparêz bûn. Û gêncên wan yên vê demê – welatparêz û çav vekirî ne.



Zeriyek Êzîdî ji Millanê Xidir
( Ji parastiyên ristevan Salihê Heydo)



***Jinek çalak ji dewkilên xwemal ji devera Amûdê***
( Ji parastiyên ristevan Salihê Heydo)

## *Hoza Kîkan (Kîkan û Xeleca)*

Kîkan yek ji hozên Kurd yên kevnr e, û bere û êlên vê hozê pir şa'x dane, ji ber vê yekê, ev hoz hatiye navdan "Dehla hişîn". Beriya hezarên salan, ev hoz, ji çiyayên Zagros, û ji jêra deryaçeya Urimya û çiyayê Serdeşt – bi aliyê rojava ya Kurdistanê de – hatine.

Hin ji wan, li navbera Dihok û Mûsilê bi cih bûne, lê piranî ya wan, li deşta başûra Mêrdînê –bi cih bûne. Herdû dîrok-nasên Ereb, Mes'ûdî û Istexrî, beriya 1059 salan, navê Kîkan anîne, di nav 28 hozên Kurd yên bi cih dibûn, di navbera Mûsil û Feratê navîn de. (li pertûka "Tenbîh û Işraf" vegere, rûpelên 88–91). Beriya van jî, Dîrokzanên Farisa, navê Kîkan anîne di nav hozên Kurd de, yên ku li devera Serdeşt, diman. Di van deman de, birrê mezin ji Kîkan, li rojhilata Çemê Zirganê – bi cih bûye, û her tête navdan "Kîkan", lê birrê ku li rojavaya çemê Zirganê – bi cih bûye, tête navdan "Xeleca". Egera cudabûna van her dû birrên Kîkan, ji hev – dijminaya ku ketibû navbera herdû malmezinên wan, ango Malbata Ristêm û malbata Dêwid, berî nêzîkî190 salî, dema ku du gênc (Me'emo û Bineyya ) ji malbata Ristêm hatin kuşt in, û gumanek hebû ku destê malbata Dêwid, di kuştina wan de – hebe. Di tol-sitandina van her dû gêncan de, hecî Eyûb A'xa, bi alîkariya dilxwazên xwe, dudo ji malbata Dêwid (Ehmedê Mûsa û Hisênê Mûsa) – kuşt in. Bê guman, desthilata Osmanlî –kêfxweş bû, ku ev hoza mezin –bibe duperçe, û bi vî awayî hecî Silêman Paşa parêzgerê Mêrdînê – kete navbera wan, û çemê Zirrikan (Zirgan) – kire sînorekî surişţî, di nava wan de, û malbata Ristêm – ma ne A'xa yên Kîkan, li rojhilata çemê

Zirganê. Û malbata Dêwid – ma ne A'xa yên birrê rojava, ku ji wê gavê de – hate navdan "Xeleca", weke hozek serbixwe.

Devera Kîkan ji bakur de – nêzîkî 70 k. m. dirêj dibe, ji rojhilata Mêrdînê û sînorê hoza Omeriya, bi aliyê rojava de, ta digihêje sînorê êla Sorika. Û ji rojava de, di ber sînorê Millanê Paşê re – berjêr dibe, nêzîkî 70 k. m. ta digihêje goşeya ku çemê Xabûrê Serêkaniyê – berî dide rojhilat, li hembera gundê Menacîr û Gozeliyê. Û ji başûr de, devera Kîkan, ji wê goşeyê, digel çemê Xabûr –berî dide rojhilat, nêzîkî 70 k. m. ta digihêje qefayên pişta Hesekê û her dû Gir  Reşa. Ji rojhilat jî, devera Kîkan di demên berê de, ji Gir Reşa, berjor dirêj dibû nêzîkî 70 k. m. ta digiha Girsorê Kîkan û Gir Herînê, li rojhilata Mêrdînê. Lê dema îro, ew devera Kîkan ji çar hawîr de –hatiye birrîn, beşek ma ye, di bin destê Turkiya de, û beşekî mezin hatiye tar û mar kirin, bi piroje û yasayên Şovînî yên Sûrî.

Kîkanên rojhilata Zirganê, ji du êlên mezin – pêk tên; Mîrguhera û Hesinîka. Bereyên Mîrguhera Ev in: Remaka, Hîzika, Azîza, Şukura, Necara, Sim'êla, Omera, Sînka, Seroxana. Û bereyên Hesinîka jî ev in: Elî xanya, Morîka, Koseka, Cimika, Kurdika, Birîm zerka, Şêxan.

Mîrguhera, bi hijmarê gelek pirtirin ji Hessinîka. Navê Mîrguhera – hatiye danîn, çikû Kîkan, di dema berê de, A'xa yên xwe – diguhertin, bi xul, di navbera bereyên hozê de,yek bi yek. Paş ê dîtin ku bereya A'xa ji wan be – serdestiyê dike, li bereyên din. Rabûn dest ji wê rêzana guhertinê –berdan, û A'xatiya malmezinan xistin cihê wê, û piştî ku malbata Dêwid dest bi zordestiyê kirin, Kîkan malbata Ristêm li ber wan – rakirin, û her yek ji Xeleca û Kîkan – bûn hozek serbixwe, û her yek A'xayê wan – ma ji wan.

Malmezina Kîkan, malbata Ristêm – Hesinîkî ne, ji bereya Cimika ne. Hin caran, ew dibêjin: "Em Seyid in", ango Pê'xember zade ne, lê diyare ku ev dozdariya wan bê kok e, û di bingehê xwe de, ew hatiye, ji bo ku A'xatiya wan –bi hêztir bibe, çiku Kîkan û Kurd, bi tebayî – rêzek mezin, ji Seyyidan re digirin.

Malbata Ristêm, Xwedî nav û rêz e, li nav Kîkan û hozên devera Mêrdîn tevde. Zincîra bavikên vê malbatê, li pey hev, ta nuha –ev e: Ristêm, Ehmed, Isma'îl, Mihemed, Evdiyê sor, hecî Eyûb A'xa, Temê, Mihemed Elî, Nihyet.

Ji dema Evdiyê sor û vir de, bandora vê malbatê –xurt bû, û desthilata Kîkan li ser devera wan – Fireh û tekûz bû. ew dever parastin ji destdirêjiya hozên din, bi awakî ku ne dihiştin tarişên hozên din wek Beggara û Şerabiya – derbasî bakurê çemê Xabûr bibin, bi behaneya ku ew dê çêregehên pez û tarişê Kîkan – gemarî bikin. Di vê malbatê de, Reşîd beg jî, birayê temê – nav da, bi xurtiya A'xatiyê û comerdiyê û serketina di şeran de. Ta nuha jî, stiran têne gotin, li ser qehweya wî ya giran û serketina wî di cengan de. Temê jî A'xayekî xwedî rêzek bilind bû. Temê hate kuşt in, bi destên nijdevanên Hisênê Qenco, gava ku tarişên Kîkan talan kirin, Temê bi pey talan ket, û ew nijdevan – baş rawestandin, û ne hişt ku ew talan bibin. Û bi egera ku hewara Kîkan dereng gihişte Temê – ew hate kuşt in, di nav rûmeta rizgarkirina talanê hoza xwe de, û di nava mêrxasiya berevaniyê de. Bê

guman, berevaniya rewa rûmet e, nemaze ku xurtiya Hisên ê Qenco, bi Birahîm Paşa û Osmanliya, dijî Kurd an – na ête pejirandin.

Malbata Ristêm û malbata Dêwid her dû – sitemkar bûn, li ser hozên xwe. Ev her dû nimûne mînakin ji sitema wan:

**1-** A'xayek ji malbata Ristêm, lokê kon-hilgir, ji Behlo yê Kurdikî – xwest, bi behaneya ku konê A'xê mezin e, û lokê Behlo xurt e, dikare rahêje wî. Behlo, lokê xwe yê xurt, bi xweşî neda A'xê. Rojekê A'xê behaneyek bê kok li rebenê Behlo girt, û got: "Gava te mast xwariye, te mast bi ser riha xwe de – rijandiye. Bi vê yekê, te rêzgirtin ne da ye riha xwe ya sipî ya Pey'xmeberî". Behlo naçar bû, lokê xwe da A'xê û ji wî re got: A'xa; eger ez Mîrguherî bû ma, te nikarî bû lokê min, ji min bistanda, lê ez na bim Mîrguherî" (Hessinîka alîgirê malbata Ristêm bûn pirtir ji Mîrguhera).

**2-** Isayê Hesen, ji bereya Emereka, ji Xeleca bû, û navdar bû, bi comerdiyê. A'xayek ji malbata Dêwid, ji navdariya wî dixisî, rabû Yawerên xwe, di roja koçkirina êla 'Îsa de, bi mêvanî şandin cem 'Îsa, da nikaribe erkê mêvandariyê –bi cih bîne, û leke bête ser navdariya wî, û 'Îsa siza bike, yan talan bike. Lê 'Îsa têgihişt û nemerdî nekir, xwarina Yawerên A'xê bi duristî pêk anî, û bi egera ku ardû ne bû, 'Îsa gwîz kirin ardû, ji agirê xwarina wan re.

Kîkan û Xelecan, tev ku ji hev – cuda bibûn, bi egera nekokiya herdû malbatên A'xa yên xwe, lê pêwendên herdû hozan – xurt man. Gava Kîkan û Millanê Xidir – ketin şer dijî hev, Kîkan tarişên xwe bi aliyê Xelecan de –rast kirin, da ku tûşî talanbûnê nebin, eger Kîkan bêne şikandin. di wê gavê de Osman A'xa yê dêwid – dil êşê Kîkan bû, li cihekî bilind, û ji dûr ve li hola şer – temaşa dikir, û gava didît ku Kîkan bi ser diketin, şad dibû û halan,di Kîkan de hildidan "Aferîn kekên Şêrê", û gava Kîkan qels xuya dibûn, dil êşiya xwe dida xuya kirin, û bi tepa li ranên xwe dixist. Hem hinek ji gernasên Xeleca, wê ça'xê – alîkariya Kîkan kirin, û ji bo vê yekê, gava

Kîkan – bi ser ketin, Reşîd Beg şûr û mertalek – diyarî kirin, ji 'Emerê Evdî re, çikû hin cengawerên 'Emereka – di hana Kîkan de hatibûn. Emerê Evdî ew diyarî – da hecî Hisênê kurd, ew ê oldar ku soz da bû; nema dikeve cengê, da gunehan hilnegire, lê dema dît ku Kîkan Ketine tengiyê, xwe ne girt û soza xwe şikand, û di hana Kîkan de çû. Ew diyarî – bûye pêmayekî bi rûmet li nik malbata hecî Hisên, û bi wê şanaziyê dikin.

Kîkan û Xeleca, gelek car li ber Osmanliyan radibûn, lê pirê wan cara Osmanliya dikaribûn, nekokiyên êldarî – bixin dest xwe, û raperînên wan pûç bikin. Ev sê nimûne ne, ji wê yaxîbûna li ber Osmanliya:

**1-** Evdiyê sor yek ji navdarên malbata Ristêm bû, û li nav Kîkan, wî cihekî bilind digirt, bandora Evdiyê sor li nav hoza wî – giran bû bi Osmanliya, nemaz e,dema ku Evdî fermanên wan – di ser guhê xwe re, di avêtin. Osmanliya, bi xapan, ew birin Mêrdînê û kuşt in. Dibêjin dema ku parêzgerê Mêrdîn, Evdiyê sor girt, ji ber pirsên di ser xwe re, got: "Ev beran, pir dikeve serê serjêker (qessab) ên Mêrdînê!".

**2-** Carekê efserekî Osmanliya û leşkerê xwe – hatibûn gundekî 'Emereka, ji hoza Xeleca, û Mihemed Reşîd, yek ji xuyayên Emereka –kuşt in. Beriya Ku ew leşker ji cihê xwe bilivin, yekî ji Emerekên malbata Qinco, ew efser kuşt, û tola Mihemed Reşîd sitand. Ji ber vê yekê, 'Emereka, demek dirêj – aware bûn, bi aliyê devera Dêra Zorê de, cihê ku desthilata Osmanliya li wî cihî qels bû.

**3-** Di yaxîbûnek Kîkan de, Osmanliya girte ser wan, hin kuşt in, û hin talan kirin, û keçek Kîkî, bi navê Şêrê, ji malbata 'Helêc dîl girtin. Gernasekî Kîkî, Bi navê Osman ê Elîxanî,

bi tena xwe êrîşî bêlûkek leşkerên Osmanlî kir, û Şêrê, ji nav destên wan – rizgar kir, bê ku xwe, bi wê bide nasîn. Lê, ji wê re got: "Ez xortekî Kîkî me". Şev tarî bû li Osman û Şêrê, serma hat, û herdû naçar bûn bikevin bin kurkê Osman, piştî ku Osman, şûrê xwe xist navbera xwe û Şêrê, û ji wê re got: "Em xweh û bira ne". Piştî dawî li şer hat, û her kes bi rê ya xwe de çû, malbava Şêrê û Kîkan, li wî qehremanî geriyan, di nav gernasên Kîkan de. Di ça'xa şer de, Şêrê destê xwe di xwîna kuştîkî dakiribû, û lepê xwe yê bi xwîn – li pişta Osman xistibû, bê ku zanibe. Şêrê got: "Ez dê wî nas bikim, eger ez wî bibînim". Gava gernas, li pey hev – şanî Şêrê dan, û wêneyê lepê xwe, li pişta Osman dît, bi vî Sali'xî Osman hate nasîn. Bavê Şêrê û Kîkan –xwestin Şêrê bidin Osman, lê wî got: "Em bûne xweh û bira, ji wê şeva sar, di bin kurkê min de". Ji wê gavê, bi biryara hoza Kîkan, halana Kîkan bû "Kekên Şêrê". Û her kesê Kîkî,

xwe wek Osman– dike kekê Şêrê, û şanaziyê bi wê rûmeta Osman ê Elî xanî dike.

Pêwîste em vegerin li rewşa Kîkan yên li Sûriya man, piştî rêkeftina Saykis–Pîko, û perçebûna hoza Kîkan, di navbera Turkiya û Sûriya de.

Giringtirîn bere û malbat û gundên Kîkan ev in:

Bereya Remaka: Malbata hecî Silêmanê Hecî Şêxmûs, li gundên Til kember û Gundik. Malbata Şêxoyê hecî Ehmed, li gundên Xasê û Xerab kort û Nofeliyê û Hessikê. Malbata Ûsê 'Eliyê 'Emmo, li gundê Qerequyê. Malbata Feno li gundê Rihanê. Malbata Bişo, li gundê Heno. Mabalta hecî Mûsa, li gundê Dîbek. Malbata Ebtan û Cewê, li gundê Reşîdiyê. Malbata Çekurro, li gundê Ummildibis. Malbata hecî Es'ed,

li gundê Qasimiyê. Malbata mela Mihemedê Cabon û birayên wî, li gundên Gola û Mizêr'a.

Bereya Hîzika: Malbata Welo û Hîzikên din, li gundên Berkevirê, û Sêbîrka. Malbata Elîko û Hîzikên din, li Sê bîrka. Malbata hecî Emîn, û Hîzikên din, li gundê Yarimcê.

Malbata Ristêm û gundên wan: Malbata 'Îsa A'xa,li gundê Tilgidîşê, Til 'Xezal, Sîha, Be'aca, Umm kubera. Malbata Mihemed Eliyê Temê, li gundên Cinaziyê, Perpere, Umesor. Malbata Kermo yê A'xê, li gundên Şah mensûr, Şuwêhan, Murrat, Til 'Xezalê jêrîn, Şûniyê.

Bereya Morîka: Malbata Ehmedê Hemo, li Gundê Seyranê, Malbata hecî 'Îsa li gundên Xiwêtla û Kevra. Malbata Ezo û Çeçan li gundê Mensef.

Bereya Kurdika: Malbata Xelefê Şêxê, li gundê Himêdiyê. Malbata Behlo, li gundê Ferhiyê.

Bereya Cimika: Malbata Şêxê Xanê û merivên wan, li gundê Curnik.

Bereya Azîza: Malbata Mêmed, li gundên Qermanê, 'Xennamiyê, Qnter, Şefqet, Sefer, Sifêra, Bişêriyê, Şerefiyê, Rihaniyê, Zêdiyê. Malbata Bozo: li gundên Bîrkinêsê, Mûsaqutkê, Sundoqlî. Malbata Erebo, li gundên Delîkê û Melek. Malbata Kerrê, li gundên Şêrikê, Fethille, Qsimiyê, Zêdiyê. Malbata Qere-Mîkayil li gundên Girbeşkê, Xirbê hecî Birahîm, Idamiyê, Silam'elêk. Malbata Dirbês, li gundê 'Aliyê.

Bereya Sim'êla: Malbata Xelo, li gundên Ebû ciradê, Çolbesan, Gola, Cewzat, Herem şidad, Malbata Hedoya li gundê Xatûna. Malbata hecî Reşîd, li gundê Kox. Malbata Korîka, li gundê Qasimiyê.

Bereya Omera: Malbata hecî Mihêmid, li gundên Çetela Kîkan, Selam, Hemdaniyê, Xirbe bellik, Hemra. Malbata Mecîdê Fendo, li gundên Til dîk, Hemra, Miselta. Malbatên Ehmedê Elo û hecî Hisên, li gundê Qolan. Malbata Hecî Evdê Ezîz, li gundê Xiwêtla. Malbata hecî Emînê Ezîz û hecî Osman li gundê Miselta.Malbata Kinnê li gundê Um idam. Malbata Hesso li gundê Ereb xan. Malbata Qerê, li gundê Ummişi'êfa. Malbata Cemal li gundên Cirêba û Xirbediwîş.

Bereya Seroxana: Malbata Sîno, li gundên Gir kundê, Herem reş, Hacoxlî, Tal'a, Cewzat, Şora rojhilat, Şora rojava. Malbata hecî Osman li gondîn Tirbe, Um hermela. Malbata Mîrzo, li gundên Ker betilî, Cideydê. Malbata Mi'îş, li gundê Sor sorkê. Pêwîstî gotinê ye ku malbata hecî Hisênê Biro yê Seroxanî xwediyên şêst hezar donim bûn,lê desthilata Sûrî bi yasaya çakkirina çandiniyê "Islahizzira'î" du kes bi tenê ji wê malbata fireh û pir xêzan – hijmartin xwedî xak, û tevaya xakên wan yên mayî ji wan sitadin.

Bereya Koseka: Malbata Osmanê Mella, li gundên Til êlûnê, Hewaşiyê. Malbata Nûro, li gundê Nofeliyê. Malbatên hecî Mihemed û hecî Hisên, li gundê Bîrikê. Malbata Biro yê Hiso, li gundê Ummişiwalî. Malbata hecî Himêdî, li gundê Çihefa.

Bereya Necara: Malbata Silo, li gundên Mişêfra Helîmo, Nemrûd. Malbata Remo, li gundên Boxazê, 'Asî, Sefawî. Malbata Nûhê, li Gundê Xirbe soda, Malbata hecî Sebrî li gundên Xirbe cemo. Til 'xezalê Oksizê.

Bereya Şêxan: Malbatên şêx 'Îs û Kalê, li gundê Gagurê. Malbata Kalê, li gundên Wehşik, Idamiyê. Malbata şêx Sînan, li gundê Salihiyê, Malbata şêx Xelef, li gundê Lizga. Malbatên şêx Mihemed Îsa û şêx Emer û şêx Beşîr, li gundê Bi'êrîr. Malbatên şêx Evdî û hecî Elî, li gundê Xirbe Diwîş.

Kîkanên rojavaya Zirganê (Xeleca), Bereyên wan yên serekî, ev in: Heseneka, 'Emereka, û Temereka. Dirbasiya ji Temereka ne, û her wiha malbata Dêwid jî Temerekî ye. Li devera rojavaya bakurê Xeleca, hin bereyên din hene, xwe ji Xeleca dibînin; Bilokiya, Bîreşiya, Mehfelîtiya, Zêdînka, Şêbiya. Piraniya gundên Xelecan – ma ne di bin destê Turkiya de. Giringtirînên wan gundan ev in: Hêşerî, Meşqoq, gundên bereya Heseneka ne. Til 'Eçkê, Di'xê, Girbellê, gundên 'Emereka ne. Evdil imam Melbend ê Temere ka ye…

Giringtirîn gundên Xeleca, li Sûriya ev in: Malbata Hecî Yûsifê Îsa û 'Emereka, li gundên Dikûkê, Sîha, Dellawiyê.

Malbata Etiya, li gundê Til Sexr, Malbata Ebasê Silo ji Heseneka, li gundê Xirbe pis û Ribî'atê rojhilat.



Wêneyê lewendek  teşîrês ji devera kîkan
(Ji parastiyên ristevan salih Heydo)

# *Hoza Omeriya*

Hoza Omeriya hozek Kurdî kevnar e, cihnişînê wan yê kevnar – dikeve çiyayên rojhilatata bajarê Mêrdîn, ta digihêje Nisêbînê. Bi hoya pirbûna wan û tengiya devera wan (70 gundên mezin ku niştecihên her gundekî di ser hezarî re, li çiyayên ku xakê çandiniyê, li wan – hindike, digel rêjeya bilind ji zaruwan) – naçar bûn ku ji sedên salan ve belav bibin, li gelek bajarên nêzîkî devera wan, ew ên ku tevaya wan di bin desthilata Osmanliya de bûn, Amûdê, Qamişlo, Dirbêsiyê, Serê kaniyê, û hin gundên li hawîr van bajaran, û dûrtir ew mişext bûn bajarên Hesekê, Mûsil, Heleb, ta gihan Bêrûtê. Piştî roxandina desthilata Osmanlî û peymana Saykis-Pîko ew mişextiyên Omerî– li cihên xwe akincî bûn. lê piraniya wan li bajarên Sûrî bi cih bûn, nemaze li cihên ku keysên kar li wan peyda dibûn.

Omerî bi desthilanîn in, û hestê wan yê netewî xurt e, piraniya wan welatparêzin, bi comerdî. Omerî tirsokiyê na pejirînin, ne dûrin ji şer û bi hevçûnê, ta di nav kesên hozê de, dubendî û arîşe–çê dibin. Dubendiya Mehmûdkî û Utmankiya navdar û kevnar e, lê bi hoya zanîn û xwendinê di nav wan de, bê guman dê rêjeya arîşe û dubendiyê – kêm bibe û têgihiştin û hevkarî bikevin cihên wan. Omerî mereqçiyên karin, û ji kar şermzar na bin, ta radeya ku hin karan dikin, ku hin hozên Kurd yên din na pejirînin, û bi vê egerê, ew ji aliyê abûrî ve Pêşve diçin. Omerî mereqçiyên huner û folklorê Kurdî ne, û Gelek behredarên wek Hisênê Omerî di nav wa de xuya bûne.

Omerî cuwanên xwe, keç û xortên xwe – hevjiyan dikin, û astenga – na êxin pêşiya hevjiyanê, ne bi bilindkirina qelen, û ne bi mercên giran li ser malbata zavê.

Malbata Mihemed Cizîrî, Mêr û jinên wan – navdar in bi spehîbûnê û kesayetiya xurt. û ji bo vê yekê, malmezinên hozên Kurdên din, gelek jin ji wê malbatê – anîne.

Giringtirîn bereyên Omerî, li bajarê Qamişlo ev in: Golî, Metînî, Kurikî, Kersivanî, Xanîsorî, Talatî, Tinatî, Sîtî, Çalî, Xirab banî... Rewşa abûrî ya Omeriyên Qamişlo başe. Rewşenbîr û xwediyên bawernameyên zanîna bilind, di nav wan de –rêjeyek ne hindike. Malbatên Golî ji Omeriyên Qamişlo, malbata Birê Xello, malbata Elo, malbata Hesen ê Birahîm, Malbata Keleş, Malbata Mella.. .

Kesayetiyên xuya ji Omeriya, li Qamişlo: Malbata Nezîr A'xa, Malbata Heskê, mîkanîkî û dahênerê navdar Şemsiddînê Sîtî û hinên din.

Giringtirîn bereyên Omeriya li bajarê Hesekê: Bêrtî, Metînî, Kurumî, û malbatên Hemê, Haciya, Perpotî û hinên din.

Bereyên Omerî, li Amûdê: Kurumî, Bêrtî. Bereyên Omerî li Dirbêsiyê: Bêrtî, Malbata Mellê. Bereyên Omerî, li Serê kaniyê:Sadî, Reşwanî, Xerab banî...

Giringtirîn gundên Omeriya; li Cizîrê: Li devera Qamişlo, Gundên Malbata Fatimê: Qîra, Ozimler, Şercî. Li devera Serê kaniyê: Xirbê Bîrê, Salihiyê, Xirbe dibis, Cemîliyê,

Ebdisselama rojava. li devera Tiltemir: Ezîziyê, Dawudiyê. li devera Dirbêsiyê: Salihiya malbata Kûtê.

Hoza Omeriya tête navdan bi navê bapîrê xweyê Pêşîn Omer.

Malmezina Omeriya malbata Mihemed Cizîrî ye. Eve Zincîrek berjor ji vê malbatê :parêzer mihemedseîd, NezîrA`xa

Mihemed, Mehmûd, Tahir, Hesen, Mihemed, mela Mustefa (birayê MihemedCizîrî), Utman A'xa, Evdella, Berekat, Mîr Som.

Çima Mihemed tête navdan bi naznavê "Cizîrî" ? dibêjin Mîrê

Botan carekê bûye mêvanê bavê Mihemed Cizîrî, û dît ku Mihemed xortekî cansivik û bi tore û berbiçave. Mîrê Bota guman kir ku Mihemed navmaliye yan rencbere li nik mêvandarê wî, û nizanibû ku ew kurê wiye, bi erkê malbava xwe radibe. Mîrê Bota ji mêvandarê xwe xwest ku wî xortî diyarî wî bike. Bavê Mihemed nemerdî ne kir û Mihemed diyarî Mîr kir. Piştî demekê Mîr dît ku nîşanên Mihemed û reftara wî ne yên rencberane.

Piştî Mîr rastî naskir ku bavê Mihemed kurê xwe diyarî wî kiriye! Mîr rabû bi êzgirtin û xilatkirinek hêjaja, Mihemed li malbava wî vegerand, û bivê hoyê navê î bû MihemedCizîrî.

Mixabin dijîtiyek xurt di nav herdû bereyên 'Itmankî û Mehmûdkî ji vê hozê-hebû. Ev dijîtî û dubendî, ji dema pêşi yên malmezina Omeriya, malbata Mihemed Cizîrî–dest pê kir,

Bi hoya nekokiya di navbera du serekên Omeriya de,'Itman A'xa û Mehmûd, li ser A'xtiya hozê. Diyare ku Mehmûd xurtir bû ji 'ItmanA'xa di wê çaxê de. Mela Mustefa kurê 'Itman A'xa bû, dest ji bavê xwe berda bû û li nik dijê wî Mehmûd bû.

Rezm û dijîtî kûr bû di nav herduwan de, û ketin qewxeyan û'Itman A'xa hat kuşin, û zordariyek mezin li ser hevalbendên wî hat sepandin. Hoyê vêketina van qew'xeyan ew bû ku Mehmûd ji 'Itman A'xa xwest ku destê xwe ji ser çarda'x û dehlê hilîne, û 'Itman A'xa çarda'x û dehl şewîtandin, da nekevin destê dijê wî. Piştî demekê, mela Mustefa û malbata xwe li hev hatin û Mehmûdkî şikandin, lê ew dubendiya xwe bi xwe ewa bê sûd, em bi umîdin ku dawî li wê hatibe.

Bîrewer û rîsipiyên Omeriya hoza Millanê Xidir û Omeriya û herdû malmezinên wan digihînin hev û dibêjin: Mîr som mamê pêşiyê malbata Xidir bû , û ji reftar û kiryarên birazayê xwe nedilxweşb bû, lê nexwest rik û dijîtî dinav wan de der bibe, û ji devera Millanê Xidir barkir û hin xizm û mirovên wî, digel malbatek Êzîdî bi wî re barkirin û li çiyayê Omrriya niştecih bûn, û Gundê Tinatê ava kirin.

Ev çîrok ber bi hiş ve têt, çikû durvên spehî yên malbata Mhemed Cizîrî û Xidir A'xa nêzîkî hevin, û hebûna malbatek Êzîdî digel Mîr som di wê barkirinê de, û hebûna rêjeyek Êzîdî di nava Millanê Xidir de, û nêzîkbûna herdû deverên Millanê Xidir û Omeriya ji hev – dihêlin ku bawerî bi rastiya vê çîrokê bêt.

# Hoza Millanê Paşê

Hoza Millanê Paşê – hozek mezin û bi nav û deng e, li Kurdistanê. Ji pirbûna êl û bereyên vê hozê – hatiye navdan "Hezar Mill". Beşê mezin, ji vê hozê, ji berî çar sed sal de,ji rojhilata devera Hekariya û rojavaya deryaçeya Urimye – rabûne û hatine devera Wêranşehrê û li roj avaya Mêrdînê – cih girtine. Û ji wê deverê belav bûne, û dest danîne ser deverek fireh û mezin, ta gihiştine çiyayê Evdil 'Ezîz ê Geylanî, ji başûr de, û gihane çemê Ferat, ji roj ava de, û gihane çemê Xabûrê Serê kaniyê, ji roj hilat de.

Giringtirîn êl û bereyên vê hozê ev in: Dodika, Keja, Çimika, Hacika, Kora, Cibika, Kum bi neqşa, Ale reşa, Ber guhana, Xidirka, Dêwa, Menda, Cemaldîna…û hin êlên din.

Hin êlên Milla, bi ola xwe Êzîdî ne, wek êlên Dinna, Şerqiya.. Birrek ji hoza Milla – tête navdan "Millanê Xidir, li navbera bajarê Amûdê û girên volkanî yên Kewkebê Millan, li rojhilata bajarê Hesekê – cih girtine. Ji kevnariya van her dû hozan –na ête zanîn ka çi pêwend, wan digihîne hev. Birrek dî, ji hoza Millan, li nêzîkî parêzgeha Wanê – bi cih bûne. Ev ên han – têne navdan bi "Millanê ga-westiyayî".

Hin ji Millan dibêjin ku pêşiyên vê hoza mezin Bextiyarî ne, ji rojhilata Kurdistana jêrîn – hatine. Lê xuyaye ku ev gotin – ne gelekî durist e, çikû zaravên Milla û Bextiyariyan

dû rî hev in û xuya ye ku ya rast ew e ku Milla, ji navenda Kurdistanê, ji devera Hekariya hatibin, bi nîşana ku li nêzîkî

wê deverê, Millanên Ga-westiyayî – hene, û çikû pêwendên hozîtî – xurt bûn, di navbera Millan û hoza Şikaka de, û ev hoza Şikaka ji cihgirtiyên deverek nêzîkî Hekariya ne, Pêşiyên A'xa yên Şikaka, hespek rind û zînekî giran buha – diyarî

kirine, ji Temir Paşayê Millî re, zengo yên wî zînî zêrîn bûn, û bi vê yekê, Temir Paşayê Millî, dihate navdan, bi "Temir Paşayê zengo zêrîn".

Malmezina vê hoza giran – malbata Keleş Evdî ye, ewê ku bingehê serokatiya vê malbatê, li ser millan daniye, ji nêzîkî çar sed sal de. Keleş Evdî gernasekî çeleng – bû, û hin xortên Millan –bi xwe re, digirtin û kesên neyar û kesên çikûs–talan dikirin û dişellandin, û ew talan û destketî, li xizan û tengezarên Milla – belav dikirin. Keleş Evdî poz- bilind û derûn-paqij bû, carekê bazirganek şelland û tiştên pêwîstî heval û êla wî bûn – ji bazirgan sitand, lê wî û hevalên wî – dest ne dan hezar zêrên ku li nik Baş-bazirgan bûn, û bi merdî, bazirgan, ji cihê tirsê derbas kirin.

Bi van awayan Osmanlî û fermandarên wan, Kesayetiya Keleş Evdî ya xurt – nas kirin. Û berdest û şîretkarên wan – xwestin ku Keleş Evdî û hoza Millan, bi tevayî – bikevin destê fermandariya Osmanlî.

Pişkinîndar ê şalyariya hundur – pêşinyar kir ku Keleş Evdî bibe parêzgerê Urfa yê, û hin berpirsiyarên Osmanliya xwestin ku wî bidin xuya kirin di nav êlên deverê de. Û bi vî awa yî, serokatiya Keleş Evdî, li ser Millan – hate pejirandin, ji aliyê hozê û Osmanliya herduwan de.

Rêzika bavên vê malmezina Millan, bi vî awayî, li pey hev, ber jor dibin: Birahîm Paşa, Me'emo,Temo, Mehmûd, Temir

Paşa, Mehmûd, Bişar Paşa, Birahîm, Mehmûd, Keleş Evdî.

Ji Keleş Evdî û virde, bandora vê malbatê – fireh bû, û ser-destiya wan, li çar hawîr – belav bû. Gelek caran, ew li ber Osmanliyan – rabûne, û ew û hoza Millan hatine êşandin û talan kirin, û hatine kuştin û tune kirin. Bişar Paşa, Kalikê Temir Paşa, bi destê Osmanliya – hatiye tune kirin, Temo

neviyê Temir Paşa û kalikê Birahîm Paşa – di cenga dijî Osmanliyan de – hatiye kuştin, çikû li aliyê Birahîm Paşa yê Misrî –rawestiya bû, di cenga wî de, ew a dijî Osmanliya di salên 1839-1841 de. Bavê Birahîm Paşa di zindana Osmanliya de – mir. Humûd kurê Birahîm Paşa, Tirka ew di zindanê de – jehrdadayî kirin.

Di nav vê malbatê de, dudo pir xurt û xwedî bandor bûn, yek ji wan Temir Paşa bû, çikû ew kete gelek cengan, û devera desthilata xwe fireh kir, kete qew'xeyê dijî hoza Mewaliya û ew dûr kirin, ji tixûbê devera Millan, kete cengê dijî hoza El'Ubêd, û da ser pişta wan, ta ku ew di tixûbê Iraqê re derbas kirin. Osmanlî naçar bûn, ku bi wî re, nerm bikişînin, û ew carekê kirin parêzgerê Sêwasê, û carekê kirin parêzgerê Urfayê. Tev ku ew, hin caran, li ber Osmanliya radibû, wan hin caran alîkarî ji wî dixwestin. Wî pişkdarî kir di berevaniya di ber bajarê Ekka de, dijî êrîşa Napolyon.

Kesê duwemîn ku di vê malbatê de, navdar û hêzdar bû – Birahîm Paşa ye. Ew di sala 1845 de – hatiye ruwê Cihanê, wî di gêncî û ciwaniya xwe de – nav da, û devera bandora

xwe – fireh kir, û pir xwedî rêz û rûmet bû, li nik Xanê Osmanliya Evdihemîd ê duwemîn. Birahîm Paşa – kete gelek cengan, dijî hozên mezin, kete qew'xeyek mezin dijî hoza Şemmera, bi serokatiya Faris, di sala1903 de, di vê qew'xeyê de, Şemmera şikestin, û çil Xatûnên malmezina wan (malbata Mihimmed) – hatin dîl kirin, û Millan ketin ser pişta Şemmera, ta ew ji Wêran Şehr, di çemê Cerrahê re derbas kirin. û di sala 1905 de, carek dî Şemmera,bi serokatiya Hadî – êrîşî Millan kirin, û dîsa Şemmera şikestin.

Birahîm Paşa ne hişt ku hoza 'Iniza derbasî rojhilata çemê Ferat bibin, û ne hişt Şemmera jî serdestiyê, li hozên rojavayî

ava mezin (Dicle) – bikin, û navbera van herdû çeman, bi serfirazî – parast,û bi wê egerê hate navdan"Qlîçê orta her dû Ferata".

Birahîm Paşa bexşdar û bê kîn bû, û di xurtiya xwe de, di neyarê xwe de dibuhirî. Ça'xê ku hoza Şemmera, li hember wî şikestin, bi mehdera jinek Gergerî ku li malbata Mihimed bi mêr bû – di neyarên xwe de buhurî, û ji ser pişta Şemmera û Hadî – vegeriya. Û ça'xa ku êla Qeregêçiya, li hember wî şikestin, û serekên wan (Dirê'î û kurê wî) dîl hatin girtin, Birahîm Paşa di wan buhirî, tev ku ew êl ,bi serekên xwe ve, her û her – dijî Millan bûn, û li aliyê neyarên wan bûn. Her wiha wî ew çil Xatûnên ku ji Şemmera dîl girtibûn – bi merdî berdan, û li xwediya vegerandin.

Birahîm Paşa, Pişkdarî di qirkirina Ermenî û Fillehan de – ne kir, vajî vê yekê, alîkarî bi gelek tengezarên wan re kir.

Birahîm Paşa çav vekirî û konevan bû, û pêwendên xwe, bi gelek navendên xurtiyê re – pêk anî bûn. Digihişt Xudeywiyên Misrê, û têkiliyên wî bi rojhilat-zana û konevanên Urupî

re – hebûn, û dan û sitandin dikir, digel konevanên nav-netewîyên wek, Saykis, û Elfonson...

Birahîm Paşa guh dida mezin û hişmendên Millan, û rêz ji hemnişîn û Şîretkarên xwe re – digirt, her û her, şîret û alîkariya wan – dixwest. Giringtirîn kesên nêzîkî wî, evên han bûn: Mihemed A'xa pismamê wî, Emer A'xa, serekê êla Kora, Hisênê Qenco û Bişar A'xa serekên Êzîdiyan, û Mela Xelîlê 'Elikî yê ku bi erkê navberiya Birahîm Paşa û Sultanê Osmanlî

Evdil hemîdê duwem – radibû.

Ji demên berê de, gelek caran Osmanliya zor û sitem – li Millan û malmezina wan dikirin, lê piştî1908 an, ça'xa ku

"Komela yekbûn û hilkişîna Tirkî", desthilat bi dest xwe girt, û da ser rêçek regezperest, sitema Tirkan, li ser Millan û malmezina wan – pirtir bû, bi awakî ku dihat gotin: "Salek li ser Filla, û salek li ser Milla "Ango Millan jî bûn armanca sitema Tirkan, her wekî ku Fille armanca wê sitemê bûn.

Tirka dest dane ser dast (mal) û bermayên giregirên Millan, û xwestin Birahîm Paşa bigirin û tune bikin, piştî ku dest dane ser dastên wî yên guhestî û neguhestî. Birahîm Paşa naçar bû ku ji navenda desthilata xwe derkeve. Lê zora Tirka, li ser wî û li ser Millan –pirtir bû, û ji ber wê tengiyê û zorê, Birahîm Paşa, di sala 19o8a de, di nav pêlên Kuldarî û dilşikestinê de, û di nav tengezariya piştî rûmeta bilind de – giha Xwedayê xwe, û li nêzîkî Kewkebê Milla, hola serkeftinên wî, xaka welatê xwe himbêz kir.

Piştî Birahîm Paşa, Osmanliyan lawên wî girtin, lê bi awakî hişmnd, piraniya wan hatin berdan, nemaze bi jîriya Xensa Xatûn ku keça yekî xwedî bandor di desthilatê de, bi navê Ebdiqadir–ji kurê xwe Xelîl yê girtî re xwest, û bi alîkariya wî,

Xelîlê Birahîm Paşa hate berdan. Xensa Xatûn, ji Ebdiqadir re

Got:"Te kurê hewiya mi berda, û kurên min hiştin!". Û bi vî awayî Me'emo û Sima'îl jî, bi alîkariya 'Ebdilqadir, piştî Xelîl hatin berdan di dema beriya cenga Cihana pêşîn de.

Xatûna Birahîm Paşa, Xensa – pir jîr û payedar bû, û pişkdarî di gelek çareyên aloziyên hoza millan de – dikir. Kesayetiya wê xurt bû, û digel serbilindiya wê, bi hoza Millan, ew bi hoza malbava xwe jî – payedar bû. Gelek caran, halan di gernasên Xeleca û Kîkan de – hildida, çikû ew ji malmezina Xeleca bû, û Kîkan û Xeleca yek hoz dihatin jimartin, û Xensa payedariya xwe, bi wan – dida xuya kirin, û di got: "Ya'xên wan – ya'x ên gura ne". Ango ya'xên wan jî xurt in, çikû ya'xên gura jî – pez

kuj in. Xatûn Xensa, xwedî rêz û rûmet bû, li nik A'xa û keyaxan û li navenda tevaya êlên xwedî pêwend bi Millan re. Di rûdaw û boneyan de yek ji nîşanên rêzgitina wê, ew bû ku A'xa û keyaxan serê wê maç dikirin. Xensa hişmend û konevan û dil xurt bû. Û gihişte payeke bilind, û hate navdan bi bernavê "Paşa". Carekê şandek hoza 'Iniza hatin nik Birahîm Paşa, û pêşinyar kirin ku her dû hozên Millan û 'Iniza bibin hevbend, û derbasî herdû aliyên Ferat bibin, bi dostanî û hevbendî. Beriya ku Birahîm Paşa bersiva wê şandeyê bide, Xensa, di ser çîtê re bang da: "Em li cihê xwe û hûn li cihê xwe, em hevbendiyan naxwaz in".

Birahîm Paşa şareza bû di kar û barên hozdarî de, û serdarekî gernas û karger bû di cengan de.Û hay ji tevgera Kurdî û konevaniya Cihanî– hebû.

Mark Saykis, di vekolîna xwe de ewa bi navê **(Hozên Kurd yên Impratoriya Osmanlî)** dibêje:"Birahîm Paşa serwerê Milla ye.1- digel ku şêniyê wî ne pirtir ji 30 konî ye, lê desthilata wî li ser 2000 kon e. 2- rêzgirtinek wî ya mezin heye, li nik Qizilbaşa, ne ji bo ku zengîne, lê çikû serekê Milla ye. 3- ew bi tenê biyaniyê ku dikare di devera Dêrsim de , bi rê ve biçe, bê zîrevan. 4- Hoza Şemsikî ya li devera **A** (navbera deverên Kerkûkê ta deryaçeya Wanê), wî bi nav, serekê xwe dibînin. 5- Gundên cudamayî û tenha li deverên Enadol û Erzincan, ji wî di axivin wek serekekî bavîtî. Ev tiştekî taybet û tenha ye, çikû ev Kurdên me jimartin; Şî'e , Pûtperest, bawerên bi yekîtiya hebûnê, Zaza, û suniyên mûsilmanin ku Birahîm paşa ji va yên dawîne. Ev bandor ne konevanî, û ne oldariye. Û di ser van re bandorek wî ya dî heye, Kurd ji dûriya gelek mîl, rezm û nekokiyên xwe li ber wî datînin,û dadweriya wî–di pejirînin ta dawî". Belgeyên Osmanlî yên dîwanî ku li nik malbata Birahîm Paşa

ne–didin xuyakirin ku ew xwediyên milyonên donimên xakê çandiniyê bûn, li wê devera dirêj dibe, ji Wêran şehrê, ta digihêje çiyayê Evdi'ezîz ê , û ji çemê Xabûr ê Serêkaniyê ta 60 k. m. bi aliyê rojava de, û berê digiha çemê Bilîx.

Malbata Birahîm Paşa, xakên xwe yên jêrîn, ango yên li Sûriya man, ewên ku pirtir ji sê melyon donim bûn -pa rastin, û bi alîkarî û orta'xiya malbata Esfer Neccar – ava kirin û çand in. Lê desthilata Sûrî, dest danî ser wan xakan, û beşekî Mezin –da Erebên Reqqayê, û beşek da pirojeyên Lîbî, û beşê mayî tar û mar kir, bi yasa ya "çak kirina çandiniyê" (Islahizzira'î), bi awakî kîndarî û Qereqoşî, û da Erebên deverê, û beşekî pir hindik–ma ji wê malbata fireh re, Mixabin, hindikan ji cotkarên hoza Millanê Paşê – sûd wergirtin, ji wan xakên malmezina xwe.

Mixabina mezin ew e, ku piraniya malbata Birahîm Paşa, vê demê ew nizanin, bi zimanê Kurdî bipeyivin. Em bi umîd in ku gênc û zaruwên vê malbatê – dê kar bikin ku cihê vê kêmasiyê dagirin, û vegerin himbêza gelê xwe.

# *Hin piroje û yasayên şovînî Li ser gelê Kurd li sûriya*

Li parêzgeha Cizîrê, Giringtirîn pirojeyên şovînî ev in:

**1-** Çembera Erebî, di sala 1974 de.

**2-** Hijmara awarte, di sala 1962 de.

**3-** Li ser deverên, sînorên nav-netewî, Fermana yasakarî /49/, di sala 2008 de. Digel guhertina navên gund û bajarên kurdî û nexşeyên Erebkirinê.

## *Çembera Erebî*

Ji demek dirêj ve, hinek ramanên dûr ji rastiyê, û dijî rewşa dîrokê – li ser gelê Kurd li Sûriya ji serê hin şovîniyên Ereb an, û li ser ziman û xameyên wan – têne der, bi amanca ku tariyê daxin ser hebûna kurdan, û ser xakê bav û kalên wan, û astengan bixin pêşiya wan, di rê ya pêşveçûna wan de, û ew şovînî dixwazin durv û nîşanên gelê kurd yên netewî – winda bikin, û nasnameya wî nepenî û wêran bikin.

Yek ji pirojeyên wan şovîniyan ku desthilata Sûrî û Be'esi-yan bi cih kirine – çembera Erebî ya sitemkar û dekdar, ya ku bi biryarek serdariya kişwerî ya partiya Be'es, li Sûriya, di 24-6–1974 de, û desthilata Sûrî yekser, dest bi cihkirina wê biryarê kir.

Naveroka wê biryarê ew bû, ku çil gundên mezin bêne ava

kirin, li devera sînorên Sûriya, li hember Turkiya û Iraqê, ji rojavaya Serê kaniyê, ta bigihêje çemê Dicle, bi dirêjaya

275 k. m. û bi pehnaya10 – 15 k. m. Ango bi pîvana 3400 k. m.ên çargoşe, da ku ew 40 gund bibin çandinîgeh, û 4 hezar xêzanên Ereb yên parêzgehên Reqqayê û Helebê, li wan niştecih bibin, bi behaneya qerebokirina wan, di cihê xakên wan yên ku di bin deryaçeya avbenda Ferat de – man e.

Lê amanca biryarê ew bû ku beşekî ne hindik, ji xakê devera Kurdî – bide wan Ereban, da ew dever, hin bi hin – bête Erebkirin, û Kurd ji wê bêne mişext kirin, çikû ji sala 1962 de, 150 hezar Kurdên wê deverê, hatibûn – rût kirin, ji mafên welatdariyê, û nasnameya Sûrî ji wan hatibû sitandin. 335 gundên Kurda ku ketin ber Çembera Erebî, û xakên wan bi tevayî, yan beşê mezin – hatin dan ji wan Ereban re, ew ên ku ji nû ve, hatin navdan "Erebên 'Xemr" û bûn xwediyên xak, ne wek cotkarên din ku sûd werdigirtin ji "yasaya çakkirina çandiniyê" (Islah zzira'î) ku her sal baca xak didin desthilata Sûrî. Ricîma Sûrî, xanî ava kirin, ji wan Erebên 'Xemr re, û dibistanên nimûneyî, ji wan re – ava kirin, jêderên avê, ji wan re pêkanîn. Gundên wan ketin rêzana bajarvaniyê, ji sala 1996 de, bi rêzanên endazyarî, ne wek gundên din, û bûn delaliyên ber dilê desthilata parêzgeha Hesekê.

Navên gundên hatine Erebkirin ev in:

**1-** Melbendê devera Dêrika Hemko: Malikiye, Eynil xedra, Telissidq, Essîhiye, Elmustefawiye, Til e'ewer.

**2-** Navçeya Çil a'xe: Elcewadiye, Elhemra, Tewekkul, Me'e-şûqe.

**3-** Melbendê devera Qamişlo: Elmenazire, Elheremûn, Elqehtaniye, Tel Berhem, Hulwe, Ummilfursan, Enteriye, Henadî Hîmo, Essewre, Elhatimiye, Ummirrebî'i, Buheyre, Elcabiriye.

**4-** Melbendê devera Serê kaniyê: Tel Tişrîn, Elqinêtre, Elqeyrewan, Zehril'Ereb, El Esediye, Burqe, Telil hedare, Telil erqem, Elmutenbbî, Ummi'izam, Elmusenna, El-'Inadiye, Errawiye, Eddehma, Henadî.

Ev Çembera Erebî yek ji pirojeyên şovînî yên tirsnake, ew ên ku hatine amade kirin, bi amanca çewsandin û mişextkirin û 'Erebkirina gelê Kurd, li Sûriya. Û ji dehên salan de, ev ramanên şovînî –hatine belav kirin, ji hişmendên Ereb yên kîndar û xameyên wan yên zingarî. Û Be'esî, bi duristî wan ramanên çepel – bi cih dikin, bê kêmasî.

Yek ji wan hişên kîndar û gemarî – hişê Mihemed Teleb Hilal e, ew ê ku ev ramanên jêrîn – pêşinyar kirine:

**'' 1- Bila desthilata Sûrî, Kurdan ji deverên wan mişext bike, bi aliyê bajarên hundirê Sûrî yên dûr, û bila nişteciyên wan Ereb bin. Di pêşiyê de, Kurdên ku metirs, ji wan – hebe, bi rêzan û pilanên li pey hev, Û hin bi hin …**

**2- Bi cihkirina konevaniya nezaniyê, li nav Kurdan, ango dibistan û zanîngeh, li devera Kurda – pêk neyên, çikû ev (zanîn, li nik Kurda) dijî daxwaza me ye, bi awakî eşkere û xurt (ango zanîn Erebkirina Kurda bi cih na ke, û Kurda hişyar dike dijî me).**

**3- Piraniya Kurdên Cizîrê, welatdariya wan Turkî ye. Pêwîst e ku em tomarên xwe yên bajarvanî – rast û durist bikin, û ev tişt nuho pêk têt. Lê em dixwazin, ku li pey vê rastkirinê, mişextkirina kesên Kurd yên ku welatdariya wan, ne bi cih be, û radestkirina wan, bo xwe her-menda (dewleta) ku ew pêgirtiyê wê ne. Û hem pêwîst e ku em tûj binerin, li welatdariya wan kesên Kurd ku welatdariya wan Sûrî be, û em bibînin ew çawa bûne Sûrî, çikû welatdarî, bê fermana yasakarî ya komarî – na ête qezenc**

**kirin. Divêt ku her welatdariya bê wê fermana yasakariya Komarî – bête gengeşe kirin, û kesê Kurd ku metirs, ji wî – ne be bimîne. Û her kesê ku metirs, ji wî hebe, welatdariya wî, ji wî – bête sitandin, da ku em wî vegerînin welatê wî.**

**4- Girtina dergehên kar, li ber Kurdan, ta ku Kurd bikevin rewşek ku nikaribin tevgerê bikin, û tengezar bibin, bi awakî ku amade bin ji bo barkirina ji deverên xwe, di her gavê de. Pêwîst e ku yasaya ''çakkirina çandiniyê'' (islahizzira'î) –ne hêle ku Kurd bibin xwedî xak, û ne hêle ku xak bi destê wan keve, bi çi awayan be''.**

Ev in hin pêşinyarên Teleb Hilal û çirçirkên şovîniya Erebî, û Be'esî jî, ji dil û can, van ramanên kîndar û sextekar û dekdar – bi cih dikin, û sitem û yasa û pirojeyên zordariyê – girantir dikin, li ser tengezarên gelê Kurd, li Sûriya.

Bi encama van kirên dekdar, ji tevaya desthilatên ku hatine Sûriya, nemaze desthilata Be'esî, azar û sitem, li ser millê Kurda – giran bûne, û kesên Kurd, bi hezaran – mişext û aware dibin, bi aliyê hundirê Sûriya û derva wê de, yên diçin dervey welat, azarên giran hildigirin, ji bo pêk anîna pêwîstên derketina derve, û kull û derdên biyaniyê –dikêşin, tev ku hin welatên ku bûne mişextgehên wan, wek Elmanya – êdî, dil tengiyê ji wan dikin û dixwazin, wan vegerînin Sûriya. Û gava vegerin –dê piraniya wan tûşî çewsandin û girtin û azarên core core bibin, ji destê esayişên desthilatê.

Û kurdên ku bi aliyê bajarên Sûrî de – mişext bûne, wek Şam û Heleb…di van her du-sê salên dawîn de, mişetxbûna wan pir bûye, bi awakî tirsnak. Em dikarin bêjin: Ev ne mişextbûne, ev mişextkirine, bi egera çewsandina desthilatê û zordariya piroje û yasayên awarte, ku wan tengezaran, naçar dikin ku ji devera Cizîrê birevin, ji ber zor û xizaniyê. Lê li

mişextgeha jî, ew tûşî gelek aloziya dibin; keysên kar kêm in, kar erzan e, nebûna xaniyan û buhabûna destmiza wan, û nebûna mercên tenduristî, di wan xaniyên ku bi dest dikevin, digel, buhabûna pêwîstên jiyanê, û pêdiviyên tevger û çûn û hatina bi aliyê cihê kar de.

Ev beşekî hindike, ji aloziyên wan. Zuhayî ya van her du-sê salên dawîn, û tunebûna dahatê çandiniyê, û buhayî ya bê sînor – bûne serbar, ji bo derdên çewsandin û zordariya desthilatê, bi awakî ku peyvek ketiye ser zimanan, û vê rewşa tengezariyê – berder dike, ew peyv ev e: "Xwedê gotiye: Zuhayî li mi, û desthilata Sûriya gotiye: Buhayî li mi"!!.

Partiya Be'es, ji sala 1961 de, ev pêşinyar, û yên wek wan – bi cih dike, bê kêmasî, li gorey ku keys bikeve destê wê. Bi Çembera Erebî, 800 hezar donim, ji xaka devera Kurdî – ji cotkarên Kurdan – sitandin û dane Erebên Reqayê û Helebê. Û bi yasaya "Çakkirina çandiniyê" (Islahizzira'î)pirtir ji vê Çemberê, ji xakên devera Kurdî, dane Erebên devera Cizîrê, û piraniya cotkarên Kurd – bê par kirin ji xwedîtiya xakên deverê, ta ji karê, di wan xakan de, bi destmiz (îcar).

Û ji aliyê zanînê de, Şovînî û Be'esî dikoşin ku cuwanên Kurd nezan bimînin, Kurdên xwediyên bawernameyên rade-bilind (heştê ji sedî û di ser re) – na êne pejirandin, di kolîcek ku hin Erebên xwediyên radeyek nizmtir (60-70 ji sedî) têne pejirandin. Û Kurdên rewşenbîr û xwediyên bawernameyên zanîna bilind, kar bi dest wan na keve.

Ey Cizîra zengîn, ey Cizîra gencîn e, ey Cizîra pitrol û pembo, ey kaniya dahat û behredariyê; îro wêranî li nava te digere, û xopanî li çar hawîrî te – diçe û têt. Wêraniya te, dirêj dibe, ne wek lerzîna zemînê, bi xulek û demjimêra ye, ne wek lehiyan, bi roja ye, ne wek hilweşînên, (ket û toz jê rabû). Îro

tu wêran dibî, di xizanî û tengezariyê de. Dahatên serdeman, tene, sebze, êmîş, pembo…kêm bûne, kaniyên wan diçikin, çi tişt nîne cihê wan bigire, ne kargeh, ne dezgeh, ne geşt û guzarî, ne bazirganiya derve, çikû ew ne serbest e. Tu wêran dibî, bi gendeliya desthilatê, bi talankariya berpirsan, bi bertîl û dizî û xap û dekan, tu têt wêran kirin, bi buhakirina sotemeniyê û her pêwîstên jiyanê.

Ey parêzgeha Cizîrê; tu di hana hemî parêzgehên Sûrî de – diçû, bi coreyên tene, bi pembo, bi pitrolê…ka îro kî di hana te de têt?! ka hevgirtina civakî? ka alîkariya desthilatê, ji tengezarên te re??!

De bispêre Xwedê û hêza xebata dadmend.

## serjimara awarte di sala1962 de

Ev hijmara ku pêk hat, bi amanca ku beşekî mezin ji Kurdên Sûriya, ji mafên wan yên bingehî bêne bê par kirin, ew karekî regezperest bû, ji pileya bilind, ji Şovînîtiyê, û cihê şermezarî û gunehkariyek mezin bû, di dîroka desthilata Sûrî de.

Kişandina mafê welatdariyê, ji nêzîk150 hezar kesên Kurd, ku nuha ew û zarojçkên xwe gihane sedên hezaran– bê parkirina wa ye, ji hemî mafên wan yên mirovatî û şaristanî yên pîroz. Ji mafê kar, ji mafê xwedîtiya samanên berçav û razber, ji mafê pîşeyê azad û hînbûna wî , ji mafê perwerdebûnê, ji mafê tevgera azad li nava welat…. 48 sal derbas bûn, ji dema wê hijmara qidoş, di 5-10-1962 de, û kurdên Sûrî dozdarên wan mafa ne, û bizav û tevgera Kurdî ya ramyarî û konevanî, li pey daxwaza çareyekê ne, ji bo vê pirsgirêkê, û desthilata Sûrî na bihîze, û deng na be xwe. Hin beringarên Ereb yên Sûrî jî–bawer in bi vê kêşeyê, û piştgiriya tevgera Kurdî ya konevanî dikin,di vî babetî de. Lê Be'esî her wek xwe ne, guh na din dengên dadmend, û li ser ya xwe ne. Rêxistinên dîmuqratî û hevalbendên azadî û mirovatiyê – rexnegirin, li van kirên şovînî, dijî Kurdên Sûrî, lê çirçirkên şovînî – her li ser sextekarî û kîna xwe ne, û dûrî hevkarî û hevjiyana bi aştî û xweşiyê ne, soza didin, lê yekê bi tenê ji wan sozên xwe – bi cih na ênin.

Dîroknasên kevnar û nuh didin xuya kirin, ku gelê Kurd nêzîktirîn gel e, ji Ereban, di dîroka Islamê û ya nuh de.

Selahiddîn, welatê Islam û Ereban – rizgar kiriye, ji Xaç-perestan. Û di ça'xên hevdem de, Kurd li aliyê Ereban rawestiya ne, dijî koledaran,Yûsifil 'ezeme, Henano, û raperînên Beyandûr û Amûdê û çiyayê Kurmênc – tevde mînakin, bo vî helwêstî. Lê Be'esî, li hember van piştgirî û

emekdariyê, Kurdên Sûrî – di çewsînin, xakên, wan ji wan, distînin, wan talan dikin, dixin zindanan,dikujin…

Gelên rojhilata navîn tevde, di dîrokê de, ketine cengan dijî Ereban, lê Kurd û Ereb – ne ketine cengên netewî, li dirêjiya dîrokê. Lê Be'esiyên Iraqê, çekên kîmyayî li Kurda weşandin, û Kurd "Enfal" kirin, bi komkujî û qirkirinê û talanê, û Be'esiyên Sûrî, Kurda diçewsînin, û welatdariyê ji wan dikişînin, wan bê par dikin ji mafên wan, û xakên wan, ji wan distînin, wan bi zordarî û dekan – dikin Ereb, wan bê nasname dikin, û berê wan didin mişextî û derbiderî û biyaniyê.

Desthilatên Sûrî, serê xwe, bi çewisandina Kurda – mezin dikin. Di sala 1961de, yekîtiya Misr û Sûriya – têk dan, û navê Sûriya, ji nû ve kirin "Cumhûriya Erebî ya Sûrî" û gotin: Kurd li Sûriya nînin, da gunehê têkdana yekîtiya Misr û Sûriya – veşêrin, bi şovîniya dijî Kurda. Paş ê Be'esî û Nasiriyan, di sala 1962 de – pîrozbahiya wan têkdarên yekîtiya Misr û Sûriya kirin, bi hijmara awarte û çewsandina Kurdên Sûrî, û di pey re, desthilata Be'esî, zincîra pêşinyarên Teleb Hilal, yek bi yek, bi cih dike.

Xuya ye ku hêj kîna şovîniyên kar bi dest – têr ne bû ye, bi piroje û yasayên wan yên regezperest, ji Çembera Erebî û ji bê parkirina wan, ji xakên devera wan, û ji pê lêkirina mafên

wan yên mirovatî û bingehî.

Piştî vê zuhayiya her du-sê salên dawîn (2008 -2010), gelek Kurdên parêzgeha Cizîrê, mişext bûne, bi alî bajarê Şamê ve, bi hêviya ku karekî ji xwe re – bibînin, lê desthilat û esayişên Şamê, fermanek giştî –belav kirin, li firoşgehên bazirganî, û li xwaringehan. Naveroka wê fermanê qede'xekirina kar bû, li ser her karkerê ku nasnameya Sûrî ya kesîtî hilnegir e. Û wê

belavokê digot: 'Her kesê xwedîkar ku bê nasnameya Sûrî ya kesîtî – karkera bigire, dê tûşî ziyandana ta sedhezar L. S – bibe, digel zindankirina şeş mehan, ta salekê.

Piştî vê belavoka rûreş, hijmarek mezin, ji Kurdên Cizîrê yên ku rût bûne ji welatdariyê – hatin qewirandin, ji cihên ku kar li wan dikirin. Ev dide xuya kirin ku desthilata Sûrî, çendî kîndar e li ser Kurdan, çima ku Kurd in, û çendî bendewar in ku Kurd ji birçîbûnê – mişext bibin, dervey welatê xwe Sûriya.

Cihan ji sedsaliya bîstan , ewa qidoş – derket, û ji demên cenga sar derket, û ket dema ku hêzên navnetewî – berî dane çareserkirina pirsgirêk û kêşeyên mezin, û berî dane aştî û azadî û parastina mafên mirov û gel an. Lê her û her çirçirkên şovînîtiyê û xwediyên durişmên bê kok, ji desthilata Be'esî, kêşeya çewsandina Kurdên Sûrî, û pirojeyên regezperest – çareser na kin.

Kêşeya hijmara awarte – yek ji pêmayên hêzên teng-aso yên hiş zingar û hişgemar e, ew ên nikarin bi kesên din re, jiyanê bi rê ve bibin, û her, bi ramanên xwe yên pûç re, dijîn, û nikarin pişkdariya wekhevî û azadiyê, digel kes û gelên din re – bikin. Û her dijîn di sengera kînê de, û tenha ji civata mirovatiyê, di sergoyê dîrokê de – dimirin.

Mixabin ku partî û rewşenbîrên Ereb, li Sûriya –bê deng in, li ber van kirên desthilatên Sûrî, ew ên ku her kesê bi rûmet, ji wan, şermezar dibe û wan na pejirîne. Di ser vê rewşa dijwar re, bed aydiyolocî yên şovînî – piştgiriya desthilata zordar dikin, û bi sextekarî û bê şerm, berevaniyê di ber regezperestî û sitemkariyê de dikin.

Lê hin kesayetî yên zana û ji xwe-fedî, ji Erebên Sûrî, van kirên desthilatê – rexne û rû sar dikin. Dr. Burhan 'Xelyûn

dibêje: "Aso li ber tevgera netewî ya Erebî hatine girtin, nikarin yekîtiyê pêkbînin, nikarin li hember Israîl – rawest in.. Xuya ye ku bi çewsandina Kurdan, û rûtkirina wan, ji nasnameya wan, desthilatên bê bandor, dixwazin wan karan bikin serkeftin û keresteyek netewî, û bifiroşin hiş û ramana gelê Erebî, lê wate ne ew e ku rewşenbîr û xwedî raman û serdarên konevanî, berpirsî li ser wan nîne".

Jîrek û çalakê Sûrî Ekrem El bunnî dibêje:

"Bê guman û bivê nevê ye, ku gelê Kurd, li Sûriya heye, û netewê duwemîn e piştî gelê Erebî, lê rastî tête birîn kirin, û dibe dîlê li hev pêçana tevger û teqela yên winda kirin û tune kirinê ku tundrewên hundir û dervey desthilatê – bi wan radibin. Ev xwendina şovînî ji dîroka civakê Sûrî re – pir metirs û tirsnak e, û hûnana civakê Sûrî – ji hev dixe, çikû gelek nerînên dijî hev pêktîne, û rewabûna hêzên netewî yên pir jimar, li Sûriya ku vî civakî pêktînin – dixe metirs û aloziyan".

Ev kêşeyek niştimanî û giring e, û berpirsiya rastkirina wê, û pêk anîna dadmendiya wê – tevaya partî û hêzên konevanî li Sûriya – hildigirin, ne Kurdên Sûrî bi tenê, çikû ev şovînîtî – leke û kêmasiye, li ser şaristaniya Sûrî ku ji pênc hezar sal de – dirêj bû ye.

## *Fermana yasakarî ya komarî ya /49/*

Ev yasa ya seyr, yasa ya serdestî û çewsandinê ye, ev konevaniyek fermiye, ji desthilata Sûrî, dijî gelê Kurd li Sûriya, ev qulpek e, ji zincîra pirojeyên şovînî, bi amanca talankirina xak û xaniyên Kurdên, li Sûriya, da naçar bibin ku bertîlên giran bidin Esayiş û desthilatê, da mişext bibin bi aliyê dervey welat de, yan bi aliyê bajarên dûr ji devera Kurdî, li hundirê Sûriya.

Gava em tûj li vê ysayê binerin, em dê bibînin, ku ew dijî peymanên nav-netewiye, hem dijî Destûra Sûriya û yasayên wê ye jî. Benda **1**ê ji vê yasayê, dibêje**: ne durist e çêkirin, yan guhestin, yan guhertin, yan qezenckirina çi mafên berçav, li ser xak û avahiyên deverên sînorî (parêzgeha Hesekê tev sînorî ye), yan bikar-anîna wan, bi çi awayî be, pirtir ji sê salan, bi navê çi kesî be, yan ji berjewenda wan re – bê destûrdana pêşinde. avakirî bin ew xak û xanî yan ne, di nav nexşe yên rêxistî de bin, yan dervey wan bin''.**

Û benda duwemîn çawatiya destûrdanê dide xuyakirin û dibêje: **''Destûrdana ku di benda 1 ê de ji vê fermana yasakarî hatiye – derdikeve bi biryara ji şalyarê hundir yan kesê raspartî ji wî, piştî pêşinyara şalyarê çandiniyê,**

**û piştî pesendkirina şalyarê bergiriyê. Nepesendkirina şalyarê hundir bê vegere, rexne û berengarî, li wê na be,**

**ji bilî dema ku sedema nepesend-kirinê nemîne, yan piştî salekê, bi daxwazek nuh bête pêşkêş kirin''.**

Ev herdû bend pê li mafê xwedîtiyê (milkiyetê) dikin, çikû wateya xwedîtiyê ew e ku xwediyê tişt karibe wî bikarbîne

(isti'imal) û qezncê ji wî bike (isti'xlal) û dan û standinê bi wî bike (teserruf). Lê ev yasa xwediyê xak û avahiyê – girê dide bi destûrdana sê şalyaran, yê hundir û yê bergiriyê û yê çandiniyê, û her sê dezgehên esayişê ku pêgirtiyên wan in, ew ên ku wek dewletên di hundirê dewleta mezin de ne.

Ev destûrdana ha, pêk anîna wê gelek zor e, yan ji binî bi dest na keve, nemaze gava destûrxwaz Kurd be. Û hem ev yasa ya seyr, dijî benda (madde) 17 ye, ji daxuyaniya Cihanî ji mafên mirovan re, ya ku dibêje: **"Ji mafê her mirovekî ye ku bibe xwediyê tiştan, bi tena xwe, yan bi pişkdarî. Ne durist e rûtkirina çi kesî, ji xwedîtiya wî, bi serdestî".**

Bi vî awayî destûrdana xwediyê xak û avahiyê –pir zore û pir astenge, bi hoya pêwîstiya pesendkirina sê şalyar û dezgehên wan, wiha reng e, nepesendkirina şalyarê hundir ya ku bê vegere, û rexne û gilî li wê na be, digel şovînîtî û gendeliya dezgeh ên esayişên pêgirtiyên wî, ew ên ku bertîla dixun, û wek xwe şovînî dimînin.

A-Ji aliyê dî ve, biryarên dadgehan du rade û sê radeyên wan – hene, du bare û taze dibin (ist'inaf), û cudakarî (temyîz) dibin. ji ber van egeran, destûrdan û biryara dadgeha dê bi salan dirêj bibin. û gava biryara dadgehan raweste, li bendewariya destûrdanê, ev dibe dijî Destûra Sûrî ku di benda133 de, dibêje: **''1- Dadwer serbixwe ne, çi dest-hilatdarî li ser wan nîne, di dadweriya wan de, ji bilî yasa yê. 2- Rûmeta dadweran û nihadê wan, û pakiya wan girawdarin, bo mafên mirovan û azadiya wan''.**

Lê li gorey vê yasaya seyr, şalyarê hundir dikare, li ber biryara dadwer – raweste, bi ne dana destûrdanê.

Hem ev yasa rêbîrê (mebde'ê) cudabûna her sê desthilata – têk dide, çikû benda **4** ji vê yasayê dibêje: **''Çi dozên bicihkirina**

**mafekî ji mafên ku di benda 1 ê de hatine –na be tomar bibe (li dadgehan) û na be ku nîşana dozê jî – bête danîn, bê ku destûrdan, di nav belgeyên dozê de be. Û divê her dozên ku nuha li ber dadgeha ne, bê belgeya destûrdanê – bêne vegerandin, digel miqatebûna li benda 31 ê ji biryara (86) di sala 1926 de''.**

Ev birga dawîn ji benda 4;

1-pê li mafekî pîroz dike, ji mafên mirova yên belge-newîst û bê guman, ew mafê xwestina dadmendiyê ye, ji dadgehan, ev dibe windakirina dadmendiyê, û hem ev benda **4**, eşkere dijî benda **8** ji daxuyakirina Cihanî ji mafê mirovan re ye, ku dibêje: **''Ji her kesî re heye, penah bibe, bo dadgehên niştimanî, da ku dadmendiyê bibîne, li hember her karên ku dijî mafên bingehî bin, ew ên ku yasa dide wî''.** Her wiha benda **10**, ji vê daxuyaniya Cihanî – dibêje: **''Ji her mirovekî re heye, bi wekheviya tekûz, digel kesên din, ku li kêşeya wî - bête nerîn, li pêş dadgehek serbixwe û pak ji layengerî û zivirandinê, bi nerînek dadmend û eşkere, da maf û lixwegirtiyên wî û çi tawanbariyên ku rûqalî wî dibin – ji hev derîne''.**

2-Hem ev benda **4**, ji vê yasayê, dijî birga çaremîne, ji benda **28** ji Destûra Sûrî ya hemîşe ya sala 1973, ew a ku dibêje: **''Mafê dadgehbûnê, û bi rêveçûna birînkirin û berevaniyê, li ber dadweran –parastiye, bi yasa yê''.**

Di ser van re, ev benda 4 pêşkêşkirina dozên ku li ber dadgeha ne – bê bandor kiriye, û nahêle li wan bête nerîn.

**B-** ji aliyê bandora zû û bi lez de, ji yasayan re: Ji rêbîr (Mebde'e) û têgihiştinên serekî ye, di zanîna yasa yê de – rêbîrê **bandora zû** ji yasayan re, ku her yasayek bandora wê ya zû – li ser rewş û bûyerên ku di siha wê de – çê dibin û

rû didin, ango yasaya nuh, na ête çespandin, li ser bûyer û rewşên berî derketina wê yasa yê, da mafên ku hatine qezenc kirin ji kesan re, di yasayên kevn de, berî derketina yasaya nuh – bêne parastin. Ev rêbîr girêdayî ye, bi rêbîrê **''nevegerîn a yasayan''** bi wateya ku her yasayek çespandina wê – bi şûnde na vegere. Lê yekemîn bend ji yasaya **49**, di sala 2008 de, bi vegerandina dozên ku tomar bûne, berî derketina vê yasayê – dihêle ku bandora wê, bi şûnde hebe, li ser bûyerên berî derketina wê, nemaze hinek doz hene ku berî dehên salan hatine tomar kirin, û li ber dadgehan mane û biryara dadgehî ya dawî – ne hatiye sitandin, û îro ew doz dê bêne vegerandin, bi bandora vê yasayê.

Birga (B) – ji benda çaremîn ji vê yasayê dibêje:

**''Biryarên dadwerên xak û xaniyan – têne bi cih kirin, li gorey karên Sînordanîn û nivîsînê'' (Kidasro), ji wan xak û avahiyên, li deverên sînorî yên nav netewî (parêz-geha Hesekê tevde – sînorî ye) û têne nivîsandin li rûplên xak û avahiyê, lê gava têne guhestin, di wan rûpelan de, divê nîşanek hebe, bide xuya kirin; ku ne duriste bawer-nameya xwedîtiyê(qoçan) bête dan, yan bi cihkirina çi girêbend û dan û sitandinan, bê bi cihkirina destûrdanê (bi awayê di benda 3 ji yasaya 41, di sala 2004 de)''.**

Ev beşê dawîn ji benda **4** dide xuyakirin ku biryarên dadwerên xak û avahiyê – dê rawestin, ta ku destûrdan pêk bê, ango biryarên dadgehan bikevin bin destê desthilata kargêrî (bi cihkirinê, tenfîzî) çikû destûrdan ji nik her sê şalyara (digel esayişên wa)ye, û şalyar dikare bide, û dikare ne de. Û ev dijî benda **131** ji Destûra Sûriye ya ku dibêje: **''Desthilata**

**dadgêrî ser bi xwe ye, û serokê komarê girawdarê vê serxwebûnê ye, bi alîkarî ya serekê encumena dadgêriya bilind''**. Û hem dijî benda **133** birga **1**, ji Destûrê ye, ew a ku dibêje: **''Dadwer serbixwe ne, çi desthilat li ser wan nîne, ji bilî yasayê''.**

Ji van hoyên ku me gotin – xuya dibe ku çendî ev fermana yasakarî ya 49, di sala 2008 de – ne rêk e, digel Destûra Sûrî, di gelek cih an de. Û dijî rêbîrên desthilata dadgêrî û serxwebûna wê ye, û dijî gelek bendên yasa ya şarevaaniya Sûrî ye. Û digel van teva, bandorên vê yasayê yên civakî û abûrî – dê gelek aloziyan tev rakin, nemaze kesên girêbestên xak û avahiyên wan – hebin û pêwîstî destûrdanê bin, û gava destûrdan nebe – dê gelek arîşeyên ku çareser na bin, bikevin navbera kesên ku dan û sitandin –kirine, di warê xak û avahiyê de. Hem bi encama vê yasayê, dê avahî ya bingehî kût û pûç bibe, û pirojeyên avahiyê û reftarên wê – rawestin, û bê karî dê pir bibe, û li pey wê mişextî û tengezarî û encamên giran ku na ên hilgirtin.

# *Nerînek li ser hin ramanên Mihemed Teleb Hilal*

M.T. Hilal, navê vekolînê li Sali'xname ya (raporta) xwe ya esayişî kiriye, û ew kiriye pertûkek û çap kiriye, bi navê: **''vekolînek li ser parêzgeha Cizîrê, ji aliyên netewî û civakî û konevanî''.**

Lê ev pertûk mercên vekolînan bi cih na ke, çikû ji mercên wa ye, şarezabûna di babetê de, û di vî warî de, M. T. Hilal, bi xwe, di birga **4** de, ji pêşgotinê, dibêje:

**''Nasîn û zanîna min, bi parêzgeha Cizîrê, ta nuha (piştî pêk anîna vekolînê) ji şeş mehan–derbas ne bû ye, û ez xweş dizanim ku ev dem ne bes e, ji bo vê vekolînê, nemaze digel piraniya karên min yên rojane ku demê nahêlin ji wê re''.** Her wiha, rastî û babetî – ji mercên bingehî ne, di karên vekolînan de, lê em karin bêjin ev pertûk, raportek esayişî ye, ne gihiştî û ne babetî ye, û ramanên şovîniyekî esayiş in, ku kar dike ji desthilatek ne dimuqratî re, û têgihiştin û baweriya wî, ew rêbîrê ku dibêje:

**''Amanc pêdiviyên xwe – rewa dike''.**

M.T. H, di dawiya birga şeşan de, ji pêşgotinê, dibêje:

**''Ez bawer im ku dem hatiye, ku rêzanek cihgirtî bête danîn, bo vê parêzgehê, û bo pakkirina wê, ji regezên biyanî, da ew ên ''Exyar''** (ji bil, ango ji bilî Ereban) **û**

**koledarên li pişt wan, gendeliyê di vî perçeyê giranbuha de, xwediyê zengîniya mezin, ji dahatê netewî –ne kin, û**

**belav nekin, û bi taybetî, ku bihna pitrolê dest pê kiriye hil dibe, û belav dibe, di vî perçeyî de, ji zeviyên Rimêlan û Qereşok. Ev jî arîşeyê pir girêk dike''.!!**

Ji mafê her welatiyekî Sûriye, ku bi pirse; Ew ên biyanî kî ne? Û kîja koledar, li pişt wan in.. Û çi gendeliyê di Cizîrê de dikin? Û ew ên ji bilî Ereban çi kes in? Lê M.T. H. di 160 rûpelên pertûka xwe de, dide xuyakirin ku ew Kurd in.

Ji mafê me ye ku em bêjin: Kurdên Sûriya – ne biyanî ne, Kurd ji niştecihên Cizîrê yên dîrokî ne. Birahîm kurê Mihemed, ê ku navdar e bi "Istexrî " û gihaye Xudayê xwe di sala 951 Z de, xwediyê pertûka "El'eqalîm" di rûpela115 de, dibêje:'' **Di navbera Mûsil û Feratê navîn de, 28 hozên Kurd dijîn.''** ango berî 1059 salan, Kurd niştecihên devera Cizîrê ne, Kîkan, Kurdika, Bozika… Û 25 hozên din, ji Kurd ên ku wan deman li Cizîrê bûn. Û kurda, ji demên kevnar de, li çêregehên Cizîrê, pez û tariş – xwedî kirine. Û Kurd in yên ku xakên Cizîrê, berî her kesî, bi cotên ga û hêstira, hilkirine û av ji zikê zemînê der anîne, Kurd in yên ku xakên Cizîrê vejandine, û çandine bi genim û ceh, Kurd in yên ku ji çemê Sefên û çemê Cerahê – birinc av dane, Kurdên Koçer ên Bota ne, xwediyên Til Koçer û çêrgehên pêşiya wî girî , berî ku navê wî bibe "Ye'rubiye".

Hoza Millanê Xidir, xwediyên "Kewkebê Milla" yê bi nav û deng, di folklorê Kurdî de. Hoza Millanê Paşê û hoza Beraziya û hozên din ji Kurdên Cizîrê – ew in yên ku navbera herdû Feratan parastine, ji dizî û destdirêjiyê.

Raste, Kurd ne Ereb in, lê Kurdên Cizîrê û Kobaniyê û Kurda'xê – niştecihên dîrokî ne, li deverên xwe, û welatdarên dilsoj û perwer in, ji welatê xwe re.Van welatiyên Kurd, ji

welatê xwe hez kirine, berî ku pitrol derkeve, û nuha jî, ew ji welatê xwe hez dikin.

Hozên Koçera, Hesinan, Abasa, Omerka, Aliya û hozên Sinceqa Xelef A'xa, û hozên Cizîrê tevde, ji Qereçox û Rimêlê û Cizîrê –hez kirine, ne ji bo pitrolê, lê ji ber ku welatê wa ye.Ew ên ku ji Cizîrê hez dikin jibo pitrolê – ne welatdar in, pato-xur in. Ên ku bihna pitrolê, bi wan xweş e – sîxur û xwedî berjewendên qirêj in, û welatdarên sexte ne. Û dîrokê da ye xuya kirin ku wan Cizîr – pêş ve ne birine, û ew in ku gendeliyê, di Cizîrê de – dikin, û dixwazin Cizîrê û xwediyên wê – wêran û talan bikin.


Û ji bo ku pêzanînên şovîniyên wek M. T. H. – firehtir bibin

Pêwîste ew zanibin ku di pêşiya sedsaliya 19 Z de, beşê mezin ji hoza Şemmera, ji devera Necdê li Hicazê mişext bûn, ji ber desthilata Wehabiyan, û di jêra Ferat re derbasî Iraqê bûn di sala 1803 de . Paşê gava Şemmera ketin Iraqê, rezm û ceng ketin nav wan û hozên Ereb yên ku berê li jêra Iraqê bûn. Şemmera ketin cengan dijî hozên Ubêd û Sayih, û Tey û Cubûr. Ev hozên han neşên xwe ragirin li hember Şemmera, hozên Ubêd û Sayih mişext bûn ji ber Şemmera bi aliyê devera başûra rojavaya Kerkûkê, paşê bi aliyê Hewîce de, û li wan devera niştecih bûn. Û hin ji hoza Cubûr, ji ber Şemmera mişext bûn bi aliyê devera Xabûr, ji Hesekê û berjêr. Û hin ji hoza Teya ji ber Şemmera mişext bûn, bi aliyê başûra çemê Hezavî (Red). Û beşekî dî ji Şemmera, ji ber hoza Iniza û malmezina wan malbata Si'ûd mişext bûn bi aliyê Iraqê de, piştî 1902 Z (1).

Ev nexşya ci'xrafî ya jêrîn di dawiya demên dawîn de ji fermandariya Osmanlî – hatiye nigar kirin, ev nexşe xweş dide xuya kirin : 1- Hoza Şemmera di wê demê de li jêra

Iraqê bûn. 2- Û hoza Cbûriya wê demê hêj nehatibûn devera Hesekê û Xabûr , ji ber serdestiya şemmera. 3- Hoza Teya di vê nexşeyê de xuya dibin li devera jêra çemê Red li Sûriya. Êdî kî niştechê Cizîrê yê dîrokiye, û kî biyaniye??.

**(1)lêdiwana D. Ebdilfetah Elî Botanî, li ser pertûka Mark Saykis(Hozên Kurd..), Çapa Darizzeman, rûpela 36 .**



M.T.H. di pêşiya derwazeya (medxel) pertûka xwe de, dibêje: **''Ev perçeyê, ji welatê me yê giranbuha... bû ye şano, ji bo jêmayên netewî yên wêranbûyî, ew ên ku dem û dîrokê ew daqurtandine, û bi ser wan de, gelekên din jî – xwarin e û vexwarine''.**

Mebesta M.T. H. ew e ku gelê Kurd netewekî wêran bû ye, û çi ji wî sax ne ma ye. Diyar e ku ev pehlewanê Şovînî, hiş û çavên xwe tevde winda kirine, eger hişê wî, di hebûna netewê Kurd de nagihêje, gelo çavên wî jî, çil milyon Kurd – na bînin?! Xuya ye gava ev şovîniyên ji vî rengî, dibêjin Kurd li Sûrî tune ne, bê şerm dixwazin ku sextekariya xwe diyarî bikin, ji desthilatên Îran û Turkiya jî re, da bi hev re bibêjin: Gelê Kurd hebû demekê, lê nuha tevde têk çû ye û ne ma ye!!!

M.T.H. Her wiha, di derwazeya pertûka xwe de, dibêje: **''Mixabin ku çemê Xabûr, surûda xwe ya kuldar dibêje,**

**ji demên dirêj ve, ji çîroka gelê Ereb yê qenc û aram û xweragir, ewê ku ji bilî mirovatiyê, çi penagehan – nas**

**na ke, ta ku ew nalîna Xabûr xurt bû ye, û 'xeyidiye, û bû ye şoreşger. Ev nalîna Xabûr, nalîna Yafa tîne bîra me''.**

Rast e Çemê Xabûrê Serê kaniyê dike nalîn, lê ne ji bo ku Yafa bîne bîra hina, çikû Xabûr dinale, ji ber derdên xwe, ji ber kargeriya çewt û şovînî, ew a ku kaniyên wî çikandine, bi çar avbendan, û berê ava wî dane xakên biyabanên bê behre û bê dahat, û xakên nêzîkî wî, xakên Cizîrê yên behre dar û pir dahat – ji ava wî, bê par kirine. Û Xabûr nuha bûye rewangeha ava ne pak. Rast e xwediyên Yafa dikin nalîn, ji ber sitema hatiye serê wan, ji destên şovîniyan, lê ne rast e ku şovînî dilê wan bi êşe, li ser gelên sitembar.

M. T. H, di dawiya rûpela 3 de, ji pertûka xwe dibêje:

**''Tête dîtin ku Kurdên rojhilat, ne wek Kurdên rojava ne , ne bi şêwe, ne bi reng, ne bi serî, û ev her dû beşên Kurd, ne wek Kurdên başûr in. û bi hoya vê cîwaziya wan, pîvanên zanistî, wan – nacivînin ser hev, wek gelekî xwedî durvên regezî û nijadî…''.**

Regez-zana yên Cihanê tevde, dane xuya kirin ku gelên Cihanê tevlihev in, û çi gel nîne ku tek-regez be, û yek şêwe be, bi durvên regezî. Gelo gelê Ereb tek regez e? Gelo Ereb ên Libnan û Somal yek reng in?! Gelo ser û ruwê Ereb ên Sûrî û Misrî - wek hevin?! Gelo şêweyên Ereb ên Iraq û Tûnis – wek hev in?! ez nizan im, çima Teleb Hilal ji rebenên Kurda dixwaze ku tek şêwe, û tek reng, û serî-wekhev bin, ta ew bipejirîne ku Kurd bibin gel, yan bikevin rêza neteweyan!.

M. T. H, carek dî, di dawiya rûpela 3 de, ji pertûka xwe, dibêje: **''Piraniya vekolîneran dibînin; ku Kurd tevli-heviyek, ji gelek hozên koçer in, hin ji Îran, û hin ji Ermênya, û hin ji gelên din li deverê''.**

Di vê birga ha de, M.T.H, Kurda dighîne Îranî û Ermenî û gelên wê devera wan, lê di cihekî dî de, ji rûpela 4 dibêje: **Zaravên wan, wek zimanê Qereçiya ne** ''. (ango yê Qereçî ya ziman e, lê ên Kurda zarav in, û bi wateyek dî, Kurd Qereçî ne, ne gel in). Ji aliyê **tevliheviya koçerî**, eger koçerî leke be, gelo koçerên Ereb pirin, yan koçerên Kurd?! Eger tevliheviya koçeran leke be, her kes dizane ku tevlihevî di nav Ereban de, ji her gelên din pirtire. Mixabin! Ev e toreya şovîniyê zargemarî, ew ê ku nizane bi zimanê xwe binivîse, û xwe dike zimanzanê zarav û zimanên biyanî!!

M.T. H, di rûpela 4 de, ji pertûka xwe,dibêje:

**''Ev cîwaziya ha (cîwazi ya regezî) dirêj dibe, bi aliyê zimanê Kurdî de, çikû hin caran, tu dibînî hinek hozên**

**Kurd, di peyvên hev de – nagihêj in… û gava em, di şar-istaniyên kevnar de, li zimanê Kurdî vegerin, em zimanê Kurdî yê yek ta–nabînin, lê her hozek xwediyê zaravekî taybet e, û her zaravek, di zaravê dî de – na gihêje, bê wergêr ''.**

Gelo, ev ziman-zanê sextekar dizane ku (Qamûsa Feyrûz-abadî) ya ku navdartirîn ferhenga Erebiye – ji 40 zaravên Erebî hatiye civandin? Û di zimanê Kurdî de 4 zarav bi tenê hene, Kurmancî, Soranî, Lorî, û Zazî. Zaravên Soranî û Lorî nêzîkî hev in, zaravên Kurmancî û Zazî jî nêzîkî hev in. Gelo Erebên Sûdan, di zaravê Erebên Sûrî de, digihên?Gelo hoza Şemmera, di peyva Erebên Se'îdî yên Misrê de-digihên?!!.

M. T. H, di dawiya rûpela 4 û pêşiya rûpela 5 de, ji pertûka xwe, dibêje: **''Li ser vê rewşê, encam dibe ku welatekî netewî, ji Kurda re nîne, çikû ew hinek mirovên niştecihên çiya ne ku surištê, hinek sali'xên taybet dane wan, wek niştecihên her deverek taybet, ew ên ku sali'x ên wan taybet in. Niştecihên çiya cîwaz in – ji niştecihên deştan, û yên peravan, û Kurd ji vê cîwaziyê – derbas na bin, û welatekî netewî, ji wan re nîne, çikû ne dîrok, ne zimanê netewî, û ta ne regezê yekta, ji wan re – tune ye, ji bilî sali'xên xurtî û tundî û hişkiyê''.**

Her kes dizane ku Kurd ne niştecihên çiya bi tenê ne, Kurd li deştan jî –hene, hem li newal û mêrga jî – hene, û xakê Kurdistanê, pir şêwe ye, û pir reng e, û pîvana wî ya pirtir ji pêncsed K. M. çargoşe ye – tev ne çiya ye, ta ku Kurda teva, bi tek nimûneyên sali'xan pêk bîne.

Û kê gotiye ku jîngeh bi tenê, sali'xên kesayetiya mirovan– pêk tîne?! Kurd jî, wek gelên din, kasayetiyên wan – gelek cor in, xurt hene û qels jî hene, tund hene û sinc nerm jî – hene,

hişk hene û dilovan jî hene. Û ji aliyê tundî û hişkiyê ve, her kes dizane ku Kurd ne tundtir û hişktirin, ji wan şovînî yên xwekujên teqemeniyan, ew ên ku xwe, yan tirimbêla xwe, yan xwe û tirimbêlê tevde – dipeqînin, û bi dehan û sedan ji kesên bê guneh dikujin!!!.

Di nav neteweyan de, baş û nebaş hene, lê ya giring ewe nasîna reftar û ferhengî û rewiştên wan netewa ye. Sebaret Neteweyê Kurd, gelek Sali'xên neqenc ketine stuwê wî, ji aliyê dijên kêşeya Kurd, wek tundî, rêbirîn, dizî, û Kêmasî yên nijadî..t .d. ta hin kesên vekolîner jî ketine bin bandora wê bangeşa kîndar û bê kok, û hin jî, bi hoya pêzanîna kêm, ketine ber wan pêlên bê kok û şaşiyên dûrî rastiyê.

Ji bo van hoyan, em dê têbîniyên hin kesatiyên Cihanî li ser neteweyê Kurd û surişt û Sali'xên wî, ew ên, bi hûr nerîn û rêbazek zanistî, Kurd dane xuya kirin:

1-Kulodîs Cêms Rêc, niştecihê Birîtanya li Be'xdayê, di pêşiya sedsaliya 19 de, dibêje:" Ez, bi kuldariyek bê sînor, ji Kurdistanê bar dikim, çikû ji binî de, ne diket bîra mi, ku ez baştirîn mirovên di tevaya rojhilat de, li wê deverê bibînim.

Min dostanî bi wan re girêda, û bi dilsojiyek bê hempa, wan bi mi re dan û standin dikirin, li her devera ku ez diçûme wê, û bi dilovanî û mêvandariyek bê sînor... û ev bîrhatinên min – dê her û her di hundirê derûna min de bimînin, ta ez sa'x bim".**(1)**

2-Fîld Marşalê Elmanî Fon Karl Fontike nivîsandiye li ser mêvandariya Kurda, dibêje:" Gelek asa û aşna ye, li welatê Erziroma Kurda, gava zanibin ku mêvanek dê were ba wan, yan giha be nav wan, ku birrek zilamên temendar û navdar, bi qona'xekê ji gund der dikevin, da pêşwaziya wî mêvanî bikin... û çendî mêvan li nik wan bimîne, rêzgirtina wî pirtir dibe. Ew dilteng na bin ji mêvan, û çi car ji wî zivêr na bin...

Û ez dê her û her, mêvandariya van Kurda ji mi re – sipas bikim, û ez dê wê mêvandariyê di bîra xwe de bînim, ta ez li jiyanê bim...". **(2).**

3- Şakir Xasbak, di pertûka "Kurd û kêşeya Kurdî" de, piştî ku li ser Sali'xên Kurda di axive, dibêje:" Bi kurtî, kesê Kurd mirovekî dilovan, dilpak, comerd û dilfirehe, ji xêzan û cihnişînên xwe hez dike, serbilinde bi neteweyê xwe yê Kurdî, bi mezintirîn serbilindî. Û xweş xuya ye ku ew nivîskarên ku ew Sali'xdane bi Sali'xên pîs, yan rastiyê nizanin, yan dilnexwazên êrîşkarin, û di van her dû rewşan de, buhayekî zanistî, ji wan Sali'xên wan re nîne". **(3)**

**(1) lêdiwana D. Ebdilfetah Elî Botanî li ser pertûka Mark Saykis ''Hozên kurd...) çapa Darizzeman, rûpelên 11 û 12.**

**2- Govara torevanê Kurd, hijmara 4, rûpela 30, wergerandina D. Ebdilfetah Elî Botanî.**

**3- Kurd û kêşeya Kurdî, çapa 2, rûpelên 91-92.**

M. T. H, di dawiya rûpela 5 de, ji pertûka xwe, dibêje:

**''Eger yek dozê bike, bê girove û belge, û bêje: ''Ev arîşe (kêşeya Kurdî) – he ye, û li ser linga ye''. çi bersiv ji me**

**re nîne, ji bilî ku em veger in, bi aliyê bayên konevanî yên Cihanî, ên kevnar û nûjen, ku Kurd lîstok in, li ber wan, û bi pileya pêşîn, berjewendên Cihanî, wan bayan – tevradikin û pêş de didin, û bi pileya duwem, kîna li ser Ereban, hiştiye ku ev arîşe rabe ser lingan''.**

Ev sextekariyek eşkere ye li ser bûyerên dîrokê. Ew ên ku qezenc ji bayên konevanî kirine–ne Kurd in, û bayên konevanî yên kevnar û nûjen tevde, ta nuha jî, bergeha wan, her dijî çareserkirina kêşeya Kurdî ye. Berî cenga Cihanî ya pêşîn, ew bayên konevanî rawestiyan, li ruwê şoreşa Kurdî, bi serdariya şêx 'Ubeydillahê Nehrî, di 1881z de, û bi wê keserê bû penahber li Hicazê, gaziya xwe gihand Xudayê xwe, û giha wî. Lê ew bayên konevanî alîkariya hin gelên bindestên Osmanliyan kirin, û şoreşa Birahîm paşa yê Misrê, digel alîkariya bayên konevanî, Osmanlî qels kirin, û pişta wan – şikandin, li Filestîn û Libnan û Sûriya, ta giha beşekî mezin ji Turkiya nuha. Û di dema cenga Cihanî ya pêşîn de, wan bayên konevanî yên Cihanî alîkariya Şerîf Hisên kir in, di şoreşa Erebî ya mezin de, û bi wê alîkariyê Hicaz û Filestîn û Libnan û Sûriya û çend perçeyên din ji bin destên Osmanliyan – reha bûn, û paşê bûn dewletên serbixwe. Lê mixabin! wan bayên konevanî yên Cihanî yên wê demê jî – bûn kilamet, li ser gelê Kurd, û ew xistin bin barekî giran, ji barên rêkeftina qidoş ya Saykis-Pîko, ya ku Kurd perçe kirin, bi çar tîşan, û paşê, ew

kirin diyarî ji çar desthilatên deverê yên şovînî, ji Tirk û Ereb û Faris an re.

Û piştî cenga Cihanî ya yekemîn, carek dî, wan bayên konevavî yên Cihanî, ew welatên Ereban ku di bin destên

Osmanliyan de bûn – derxistin û man serbixwe. Lê ew bayên konevanî yên Cihanî, li dijî şoreşên gelê Kurd, yek li pey yekê – rawestiyan, û ne hiştin ku ew bigihên amancên xwe yên rewa, şoreşa şêx Mehmûd ê Hefîd, şoreşa şêx Se'îd ê Pîran, şoreşên Barzan, şoreşa Dêrsim, şoreşa Agirî, tevde, bayên konevanî yên Cihanî – dijî wan rawestiyan, û ew têk dan.

Piştî cenga Cihanî ya duwemîn, wan bayên konevanî yên Cihanî, alîkariya gelek welatên Ereb, ên bin destên Firensa û Berîtanya û Italya – kirin, û ew rizgarkirin û man serbixwe. Lê wan bayên konevanî yên Cihanî – li dijî şoreşa Barzaniyê nemir, û şoreş û komara Kurdistan li Mihabad – rawestiyan, û ne hiştin ku ew bi azadiyê şad bibin.

Nuha em karin ji vekolînerên dadmend – bipirsin; kî ne ew ên lîstok bûn li ber bayên konevanî yên Cihanî ? û kî ne ew ên şoreşên giran vêxistin, û hezarên cangoriya pêşkêş kirin, lê bayên konevanî yên Cihanî – dijî wan rawestiyan?.

Kesên şovînî û desthilatên Faşî – nikarin bi kes û gelên din re bijîn, û çavên wan bar na be, ku kes alîkariya kes û gelên bindestên wan bikin, ta rexneyek rût jî, li ser xwe na pejirîn in. Gelo Şerîf Hisên gava alîkariya wî hate kirin, ji konevanên Cihanî, lîstok bû, ji bo berjewendên Cihanî? Gelo kîjan gelê bindest, bê alîkariya azadîxwazên hundir û Cihanî – rizgar bû ye, ji bindestiya koledar û desthilatên sitemkar? Şovînî û desthilatên zordar – dixwazin ku navend ên Cihanî jî, ji wan re li çepkan bidin, û ji wan re bêjin destên we xweş bin, her wekî, ku ji rebenên welatiyên xwe –van tiştan dixwazin .

M. T. H, di pêşiya rûpela 6 de, ji pertûka xwe, dibêje: **''Arîşeya Kurdî ku nuha dest bi rêkxistina xwe kiriye – Amasek( avsanek, wermek) pîse, çê bû ye, û hatiye çê kirin, di laşê neteweyê Erebî de. Çi derman, ji wê amas û avsana pîs re – nîne ji bilî jêkirina wê''.**

Kêşeya Kurdî bûye arîşe, çikû mafên gelê Kurd yên rewa –ne gihane xwediyên xwe. Egera wê arîşeyê û êşa amas û avsana pîs ya ku ketiye laşê gelên rojhilata navîn–mafxurên mafên dadmend in, ne gelê Kurd e, ew ê ku doza mafên xwe yên rewa dike. Êşa amas û avsana pîs ya laşê gelên vê devera reben – şovînî û sitemkarên ku gellaciyê li çarhawîra dever ê – belav dikin, û rezm û cengan her vêdixin, û agirê wan gellacî û cengan – gelên deverê disojin. Êşa amas û avsana pîs ku ketiye laşê wan gelên reben, li vê deverê, hoyê wê êşa pîs, regezperestên ku na gunc in, bi gelên din re, û qîma xwe bi hevjiyanê – na ênin. Ev regezperest divê bêne dûr kirin, ji nav gelên deverê, çikû ew qîma xwe, bi hevjiyanê – na ênin, yan divê bêne jêkirin, ji laşê gelên deverê, û bêne cudakirin, digel wê êşa pîs, da tenduristiya wan gelan li wan veger e, ne ku gelê Kurd – bête jê kirin.

M. T. H, di rûpelên 20 - 21de, ji pertûka xwe dibêje:

**''Arîşe ya Kurdî, ji kokê de, werar bû û pêş ket, di dema xwîn rêjê Ebdilkerîm Qasim de, ew ê ku xwe bi zorê kire xwediyê şoreşa 14 Tîrmehê, û durişmên wê dizîn, û wî hişt arîşeya Kurdî – şêweyê xebata çekdarî wergire.. Erê, Ebdilkirîm Qasim destûr da Kurda, bi derxistina 15**

**rojnameyan, û bi hînkirina zimanê Kurdî, di dibistanên wan de, û bernameyekî Kurdî, ji wan re, bi taybetî –xiste**

**îzge û tilivizyonê de, ku Kurdên li çarhawîra welat, li wan guhdarî dikirin''.**

Çendî şovîniyên dijî kêşya Kurdî – çav nebar in û çendî dûrî rastiyê diçin, ji bo berjewendên xwe yên ne rewa!. Rast e şoreşa 14 ê Tîrmehê – serkeftinek dîrokî bû, ne ji bo Kurda bi tenê, lê ji bo gelên Iraqê bi giştî, û kêşeya Kurdî, ji wê – sûd wergirt, û durişmên wê şoreşê bilind û bi rûmet bûn. Lê çawa Ebdilkerîm Qasim, xwe bi zorê kire xwediyê wê? (Ango ne xwediyê wê bû!). Rast e heval û pişt mêrên wî hebûn, û alîkariya wan karger bû, ji bo serkeftina wî, lê kî ji bilî Ebdilkerîm Qasim – serdarê wê şoreşê bû? Û kî bû xwediyê wan durişmên wê yên azadîxwaz ji bilî wî?. Bê guman şovînî û Be'esî ne xwediyên wan durişman bûn, çikû paşê xuya bû ku ew dijî wan bûn, û dijî wan kar kirin. Lê mixabin! ku keysebaz û şovîniyên digel Ebdilkerîm Qasim, ne hiştin ku ew wan durişman – bi cih bike. Ev ji alîkî, û ji aliyê dî ve, desthilatên şovînî û yên ne dîmuqrat, li roj hilata navîn Ebdilkerîm Qasim kişandin, bi aliyê diktatorî û zordariyê de, ta ku dest ji wan durişman berda, û ji asta wan durişman daket û hate xwar.

Şovîniyên dijî azadiyê û dijî kêşeya gelê Kurd, derxistina 15 libên rojnameyan, ji 5- 6 milyon Kurd re – pir dibînin, û dixwazin dengê Kurda ji binî der nekeve, û kes wî dengî ne bixwîne û ne bi bihîze! Û çavên wan – bar na bin ku zimanê Kurdî, li dibistanê Kurdan jî –bête xwendin, digel ku îzge û tilivizyon û dibistanên Kurdî, di demên Nûrî Se'îd de jî – hebûn, berî dema Ebdilkerîm Qasim, lê xuyaye ku dest hilat a Nûrî Se'îd – çaktir bû, ji desthilatên şovîniyên ku piştî roxandina wê desthilatê, bi deh ên salan hat in, û ew hêj pîstir bûn, ji desthilata Nûrî Se'îd, bi gelek pileyan!.

M. T. H, di rûpela 22 de, ji pertûka xwe, dibêje: **''Ew rewş li Iraqê wek xwe ma, ta şoreşa Şewaf hat ku xurtiya Kurda pirtir bû, çikû Qasim bawerî da Kurd û komonist an, û wan jî, mêr ji wî re – pêşkêş kirin, û şoreşa Şewaf perçiqandin, û nokeriya Ebdinnasir, ji wê ça'xa dîrokê de, pişkdarî kir, digel ya Ebdilkerîm Qasim, ta kû xwîn , bi çeman, li Mûsil bi rê ve çû. Û Berzanî keys dît ku berengarên Kurd yên dijî xwe – berbat bike, û bi hezar an ji wan tar û mar – bike, û bi çola bixe, çikû desthilatê ew ne parast in, û deng ji wê ne hat!. Û amancên herdû desthilatên yekane, li nik Ebdinnasir û Qasim – gihan hev, di dijîtiya Erebîtiyê de (Şu'ubiyet: gel baziya dijî Ereban) û pîlangêriya dijî kêşeya netewî ya Erebî''.**

Çendî ev şovîniyê dîmagogî – şerm na ke, ji windakirina rastiyê û ji sextekariya bangeşî!. Rast e; Ebdilkirîm Qasim û Kurdan û komonistan, bi hev re, li şoreşa Şewaf dan û ew perçiqandin, çikû ew yaxîbûna Şewaf – dijî berjewendên gelê Iraqî bû, bi giştî, û pîlangêrî bû, ji aliyê Ebdinnasir û nokerê wî Ebdil Hemîdi sserrac û Be'esiyên Sûriya, bi hev re, çikû ew her sê, di wê demê de (dema yekîtiya Misr û Sûriya), hevbend bûn, û dixwestin Iraqê tev li pitrola wê daqurtînin, û qaşo! bi hev re, kar dikirin, ji bo yekîtiya Ereban. Lê dirêj ne kir, ew hevbendî ji hev ket, û yekîtiya Misr û Sûriya – têk çû, û Be'esiyên Sûrî – dijî wê yekîtiyê rawestiyan, û bûn hevbendên wan kesên ku ew yekîtî têk dan! Seyre, Seyre ku şovîniyekî sexte bangeş – bi bêje: Ebdin Nasir noker e, û wî bike pîlangêr, li ser Ereban, û liser kêşeya netewiya Erebî, û di bîra her kesî de ye ku Ebdin nasir, wê demê, pehlewanê neteweya Erebî bû, û pehlewanê yekîtiya Ereban bû. Xuya ye ku

şovîniyên bi vî rengî, rêzê na din hevbendiyê, û na din rêbîrên (mabadi'i) aydiyolocî, û baweriyên xwe, tenê guh didin keys û berjewendên xwe, û gotina wan ya îro, soza doh dixwe.

Ev şovînyê bed-surişt, hêsra dibarîne, li ser berengarên dijî Barzanî, Caşên Kurda yên digel desthilatên Iraqî – li Kurda dixistin û şoreşgerên welatparêz dikuştin. Ev dilovaniya wî ji wan Caşên xiniz re –dide xuya kirin ku surişte wî û Caşan – wek hev in. Gava ew hêmayê neteweya Erebî û pehlewanê yekîtiya Ereban, Ebdinnasir – dike noker û pîlangêr, li ser kêşeya neteweya Erebî, ew xwe dixe rêza Caşên Kurd ku dijî hêmayê neteweya Kurdî Barzaniyê nemir bûn,.

M. T. H, di rûpela 26 de, ji pertûka xwe, dibêje:

**"Kurd dicivin li terîşa dirêjiya bakur, ji parêzgeha Cizîrê, li hembera sînorên Turkiya, bi kûraya nêzîkî, 15-35 k. m. ji devera Serê kaniyê li rojava, ta sînorên devera Dêrikê, li rojhilat. Ev civandina Kurda pir û himbiz e, li wan xakên behredar û zengîn, bi awakî ku gelek zor e pêk anîna berîkek Erebî, çendî biçûk be, li hinan ji wan deveran, nemaze, li deverên Dêrikê, Tirbe sipiyê, Qamişlo, û Amûdê. Kurd, zengîntirînên deverên Cizîrê, bi pirtirîn rêjeya baranan – dager dikin, çikû rêjeya baranê, li Dêrikê û Qamişlo – dikeve navbera 400 –500 m. m. li gorey nexşe yên baranan. Kurd behredartirînên xakan, û xurt-dahat ên wan, ji bo çandiniyê – dager dikin, di ça'xa ku rêjeya barana dever ên Ereban – ji 200 m. m. derbas na be''.**

Rast e Kurd, li wan deverên xakên Cizîrê yên behredar –

civiya ne, çikû ew dever ji welatê wan yê dîrokî ye, ne ku dager kirin e!. Û Kurda ew deverên han vejandin e, û ava kirin e, bi kolana çalên avê, çendî ku kûr bûn, û bi hilkirina xakên wan, bi cotên ga û hêstira, bi tev rakirina axa wan xakan, ji bo

çandiniyê, di wê dema ku gîsinkêşên Mîkanîkî – ne bûn, û bi çinîna dahatên wan xakan, bi das û qeyna'xan, di wê dema ku çinînkarên nûjen (derrase) – ne bûn. Gava Teleb Hilal pirs bike; Çima Kurd himbiz û pirin li wan deveran? Em dê rave bikin ji wî re ku ew himbiziya Kurda, li wan deveran – pêwîst bû, ji bo karên vejandina wan xakan, ji bo cotkirina bi ga û hêstira, û çinîna bi das û qeyna'xa. ji ber wê himbiziyê, tu îro nikarî, berîkek xak ji Ereb an re, pêk bînî, çikû çi berîkên bê xwedî, li wan devera – nînin. Û ji ber vê yekê şovîniyên wek te, çare ne dîtin, ji bo pêk anîna wê berîka Erebî ya biçûk, ji bilî talankirina xakên Kurda, bi Çembera Erebî, û bi yasa yên Qereqoşî, û pirojeyên regez-peresî û talana zordarî, bi gelek navên sexte û berovajî.

Eger Teleb Hilal bi pirse; Çima Erebên Cizîrê–man li deverên xakên ne behredar? Em dê rave bikin ji wî re, ku hin Erebên li Cizîrê bûn, wan jî xakên behredar girtin digel Kurda. Lê ew Erebên pez û tariş – xwedî dikirin, ew li çêrgehan digeriyan, û li nav pez û tarişên xwe, bi hilobiyan demên xwe – derbas dikirin, û hin caran, dibûn nijdevan û tarişên hozên din–direvandin, yan didizîn, yan talan dikirin.

Ev jiyan, di wê demê de, ji wan re– hêsatir bû. Û hin Erebên ku nuha li Cizîrê ne, ew berî vê demê – ne li Cizîrê bûn.

Firehiya wan deverên ku kurdên Sûriya vejandin e û ava kirin e – ne 15-35 k. m. – bû, belkû 40 -80 k.m, bû, ta digihişte Til koçer û sînorên bajarê Hesekê û jêra Xabûrê Serê kaniyê li hin deveran.

Kurd regezên avahiyê ne, cotkar in, karker in, pez û tariş xwedî –dikin bi şarezayî. Kurdên Cizîrê dest bi avahî û çandiniyê–kirin,bi demek dirêj, berî Erebên Cizîrê.

Ji bo duristkirina pêzanînên şovînî yên wek M. T. H, divê bête zanîn ku Ereb, li deverên Cizîrê – pir hindiktir bûn ji Kurdan. Stîvins Hamislî Logirig, di rûpela 212 an, ji pertûka xwe de " Sûriya û Libnan di bin desthilata serperiştiya Firensî de" dibêje:

"Sebaret niştecihên parêzgeha Cizîrê, salixnameya serjimêr a sala 1937 a,van hijmarên hatî – dide, li ser belavbûna niştecihên vê parêzgehê:42000 'Erebên musilman, û 82000 Kurd, û 31000 filleh, û 2000 Êzîdî, û 1000 ji Cuhû û Çerkezan. Filleh Katolîkên Sûrî, Ermenî, Ersoziksên Sûrî, û Aşûrî ne, û piraniya fillehan niştecihên bajara ne, û piraniya Kurda niştecihên gunda ne, û niştecihên 'Ereb, hin li gunda ne û hin koçer in".

Û Stîvin, li ser daxwazên wan niştecihên Cizîrê dibêje:

"Regezên filleh, nêzîkî tevaya wan, doza bijaretiya taybet, li

deverê, yan cudabûna giştî –dikin, dibin parastina Firensa de, û piraniya Kurd û Ereban, doza hin coreyên ji van daxwazan dikin, lê kêmîtiyek giring ji wan piştgiriya dest-hilata navendî li Şamê dikin, çikû desthilatek musilmane.

Û asta bilind ji Firensiya dixwestin çespandina peymana 1936, û piştgiriya desthilata Şamê dikirin. Lê astên din ji Firensa; têbîniya giştiya Firensî ya ku dengê wê dihate bihîstin, bi pileya yekem, û şandeyên ku kar dikirin, li Cizîrî, bi pileya duwem, û fermanberên Firensî li deverê, ewên ku her rexnevan bûn li konevaniyên desthilata Şamê, bi pileya sêyem, van teva piştgiriya daxwazên piraniya niştecihên Cizîrê dikirin. Digel ku dozdarên otonomiyê li Cizîrê – bawer dikirin ku desthilata Şamê û Firensa dê guh bidin wan, û dê bi xweşî pêşwaziya wan bikin."

Û Stîvin dixe ser û dibêje:" Ew hêrsa fermanberên desthilata

Şamê, li Cizîrê, ewa bê nermî, û xuyabûna wan di heftiyên dawîn de, ji sala 1936a de, û nerêzgirtina wan ji hestên niştecihên Cizîrê re–guman û dijminayî li Cizîrê, dijî desthilata Şamê tevrakirin, û piştgiriya desthilata Şamê ji lîsta xwe re, dijî lîsta berbijarên Cizîrê – bû hoyê ketina lîsta desthilatê.".

Û berî sed salî, deverên çandî li Cizîrê hindik bûn. Regezên gund ava dikirin, û çandinî dikirin – Kurd bûn. Pir kêm ji Erebên Cizîrê, di wan deman de, karên çandiniyê kirine.

Berî ku şovîniyên wek M. T. H, xuya bibin, Kurd û hin hozên ji Erebên Cizîrê – bi dostanî û alîkarî, bi hev re, li Cizîrê, jiyana xwe derbas dikirin. Gava Kurd li çêregehan digeriyan, ji bo pez û tarişên xwe, dema Buharê –diçûn deverên jêrîn yên neçandî, li nav Ereban, û li wan çêregeh an, hozên Ereb, (Şerabî, Herb, Tey)…alîkarî bi wan re dikirin, bi rêzgirtin û dostanî. Her wiha, dema havînê, dema çinîna çandiniyê, Ereb dihatin deverên jorîn, dihatin gundên Kurda, tarişên xwe, li pirêze yên ceh û genim – diçêrandin, piştî paleyê û çinîna çandiniyê. Û Kurdên xwedî çandinî, devehên wan Ereban, bi destmiz digirtin, bi olçek û çiwalên genim, û sapên genim û ceh, bi wan devehan, diguhestin bênderan, û jin û zarokên wan Ereban, sinbilên genim, berev dikirin, û genim ji wan sinbilan, diweşandin, ji bo nanê xwe yê salane. Xizanî, wê demê –pir bû, li nav hozên Kurd û Ereb tevde, û xwediyên pez û tariş hindik bûn, her wiha, xwediyên çandiniya pir jî–hindik bûn. Lê rewşa hozên Ereb bi giştî – kambax bû, çikû bê çandinî bûn, û genimê wan bi kirrîn bû, û kêmasiya nan, li nav wan – rû dida, pirên salan, ta rewş digiha ku di cihê nan de, hinek xwarinên din – pêk di anîn, yek ji wan xwarinan (Ritiye) bû, ku şîr û mast tev li hev dikirin, da ku tîr û sitûr bibin, û bê nan dixwarin, û xwarinek dî ji kardiya kelandî û hişkkirî pêk

di anîn, û di demên pêwîst de, ew kardiya hişk, bi mast re dikelandin, û bê nan dixwarin. Navê vê xwarinê "La'iye" bû. Û hin caran, toraq (dewê kelandî ku pir tîr dibe) tev li arvan dikirin, da rêjeya arvan hindik be di nan de.

Seyre ku îro, şovîniyên wek M.T. H, dixwazin ku wan Ereb an bixin asta şaristaniya Urupa, bi qewirandina Kurda, û talankirina gund û xakên wan û pitrola wan û hemî zengînî yên devera wan, da ku dengên xwe bilind bikin, û bi bêjin: **''Em çêtirîn gel in''. !!**

M. T. Hilal, di dawiya rûpela 36 û pêşiya rûpela 37 de, ji pertûka xwe, dibêje:

**''Ew nerîna me ya kevn (li ser Kurda) – ji boçûnek ne netewî û ne resen dihat, çikû oldarî tev li netewiyê – dikir. Û hinek serdarên me yên berê -ew ên ku qaşo Ereb bûn -digotin: (Kurd musilman in, Û nêzîktirîn kêmîtiyên me ne, ji her kêmîtiyên din, û pirtir şayiste ne, bi dilovaniya me). Ev e ew nerîna me ya kevnar ku demê da xuya kirin ku ew derew e, çendî ku kesên durû û dekdar, li ser wan ramanên bê girove – ma ne. Nuha her tişt kete cihê xwe de, û şaşiya wê nerînê – xuya bû, ew nerîna ku ketibû ser zimanê kesên gelêrî û qels nerîn, gava ku bi pesindarî digotin: (Kurdî!) bi wateya rêkxistî, dilsoj û emekdar, ji desthilatê re, û ji bo wê parêzdar e.**

**Koledar jî alîkarî di xuyakirina vê nerînê de – kir, bi pîlangêrî, û bi pişkdariya di rê-windakirinê de, li ber gelê Erebî, ji nerîna wî ya resen, da xencerek nû di pişta netewiya Erebî û kêşeya Ereban ya giştî de – biçikîne, digel xencera Isra'îl. Dem hatiye ku em wê nerîna sexte, perçe perçe bikin û tar û mar bikin, û nerîna zanistî ya resen di cihê wê xin. Û dem hatiye, em olê, di vî warî de – cuda**

**bikin, ji netewê. Ol bi xwe ne çi tişt e, ji bilî ku hilperînek ji hilperînên ramana Erebiye, di dema xweşvebûna wê de, çikû ol berhema Ereba ya mirovatî ye, di demên bi serketî de. Û ji me na ête xwestin ku dilê me bi wê ve bimîne, û em rawestin, bê tevger''.**

Ev Şovîniyê hiş-nexweş, biratiya Kurd û Ereban – nerînek şaş û ne resen dibîne, û wê nerîna biratiyê û hevjiyana her dû gelan, bi hev re, bi dilovanî – tevlihev kirinek şaş, di navbera ramanên netewî û oldarî de – dibîne, û nezaniyek ramanî dibîne ku cihê tinaza wî ye. Û wan serdarên Erebên ku bi wê biratiyê bang dikin, û dilovaniyê ji Ereban dixwazin, li ser Kurda – ji rûmeta 'Urûbetê , rût û bê par dike. Û dibîne ku ew kesên, bi biratiya Kurd û Ereban bang dikin – durû ne, û bi wan durişmên oldarî, bangeş û bazirganî û pîlangêriyê dikin, û dilpakên Ereb yên qels-nerîn, ji rê ya rast – şaş dikin, ta ew ramanên ne durist ketine serên wan kesên dilpakên ku pesnê Kurda didin, bi dilsojî û rûmet û emekdariyê.

Ev şovîniyê har, wan kesên, bi biratiya Kurd û Ereban bang dikin – dibîne nokerên koledar, ew ên ku pîlanên koledar bi rê ve dibin, dijî neteweyê Ereb û dijî kêşeyên Erebî, bi giştî û dixwazin xencera Kurdî jî, di pişta netewiya Erebî de – biçikînin, her wekî ku xencera Isra'îl berê, di pişta wê de – hatiye çikandin.

Ev şovîniyê rûreş – pê li pîrozdariya ola Islamê dike, û rûmeta wê dişikîne, gava dibêje: "Ev ol berhema ramana Erebî ye, di demek buhurî de". Çikû ev peyv, caneweriya oldarî –ji Islamê dûr dike, û rûmeta wê ya canewerî na hêle, çikû wê dike berhemek ku bi demê re, tête guhertin, û ji aliyekî dî ve, ola Islamê – dide xuyakirin berhemek ji ramana mirovan, ne pey'xamek Xwedayî, û wê dibîne ramanek ku dem li wê buhuriye, nema êdî karger e, û pêwîste ku bête guhertin.

M.T. H, di rûpela 40 de, ji pertûka xwe, dibêje:

**''Ji vê nerîna ha pêwîst e em guh nedin pêwenda oldarî, di nerîna xwe de, li Kurda, çawa me guh neda wê, di nerîna xwe de, li Tirka. Ji bo vê, pêwîst e em li Kurda binerin ku ew bi her karîn û koşanên xwe û her tiştê ku didêrin, dixwazin wî welatê xwe yê ne dîtî – bi afirînin, û li pey vê nerînê, û li gorey wê, têt ku Kurd dijminên me ne, û çi cudayî di navber a wan û Isra'îl de nîne, û digel pêwenda olê, di nav me û Kurda de, bê guman Yehûdistan û Kurdistan du çuqulîkên ji yek kokê ne. Di ser vê re, bayexdanên koledar, û karê wî yê xurt û navendî dijî netewiya Erebî. Ev e nerîna rast û durist''.**

Kîna regezperestî, şovîniyan kor dike ji dîtina rastiyê, yan hin caran, ew xwe kor dikin, da rastiyê ne bînin û ne bêjin. Gelo çawa nerîna vî şûvniyî, li Kurd û Tirka – wek hev e?! Tirka 450 salî, Ereb çewsandine, û ew nav didan (Pîs millet), û Kurda berevaniya wan kirine, sedên salan, û ew parastine ji Xaçperestan, û rêzgirtinê didin wan. Lê ew, ji aliyê xwe, Kurda diçewsînin, mişext dikin, talan dikin, û dikujin. Gelo çawa Kurd û Isra'îl, di nerîna wî de wek hev in? Isra'îl çend milyon Ereb qewirandine û mişextkirine, ji bilî hezarên ku kuştine, û ji bilî şikandina wan, di çend cengan de. Çawa Yehûdistan û Kurdistan du çuqulîkên ji yek kokê ne?! Kurd Arî ne, û Cuhû Samî ne, pismamên Ereba ne, her dû çuqulîkên yek kokê ne, û pesnê kurên Isra'îl, di gelek cihan de, ji Qur'anê –hatiye.

M. T. Hilal, di rûpela 41 de , ji pertûka xwe, dibêje:

**"Nifşê nuh ji Kurda, kur, nevî, ta birayên biçûk – îro ew xwenda û hînbûyî ne, ew in regezên metirsiyê, û ew serdarî ya çalakiyên Partîtiyê dikin… Û kesê ku îro li Cizîrê bigere, dê zû bibîne, baştirîn û nuhtirîn dibistan ji her pileyên perwerdeyî, li deverên Kurda ne. Lê deverên Ereban, kesekî guh ne da ye wan. Eger ev çi bi mebest û niyaziyek qenc be, û ji bo Erebkirina Kurda be, yan bi mebestek ne qenc be, û ev a ha pirtir tête ber çavan –bê cudayî encam ew e ku wan dibistanan ber girtine, û me bi xwe, ji xwe re, dijminên dijwar afirandine, ew ên ku zirziyê û bawermendiyê û girove û peyvdariyê –dicivînin. Çendî rikdarî û milmilaneya bawermendiyê zor e! her milmilane li hember wê sivik e! Erê, nifşê nuh ji Kurda – nifşekî bawermend e, gawir e (baweriyê bi hebûna Xwedê na êne) bawermend e, bi partîtiya xwe, her wekî bawermend e bi xwe".**

Ev şovîniyê çav nebar, têra wî na ke ku Kurd bêne çewisandin, û bêne mişext kirin û bêne kuştin, di ser van re,

dixwaze ku yên mayî jî, nezan bimînin û bibin rencber li ber destên ya'xên Ereban. Ne sûcê Kurda ye, gava Ereb na xwîn in û ji xwendinê – hez na kin. Desthilata Cizîrê, berê dibistan li kêm gundan ava dikirin. û Kurda, li gundên xwe, dibistan bi kelpîçan ava dikirin, lê kêm ji Erebên gundan, dibistan, li gundên xwe ava kirin, û Erebên koçer, xanî ji xwe re ava ne dikirin, dê çawa di wê çaxê de dibistanan ava bikin? Lê tête bîra min, ku kargeriya perwerdeyî, mamosta dişandin konên koçerên Ereban, lê xuya ye ku ev awe, dê bê sûd û bê encam be.

Di cihê ku ev şovîniyê dixs û kîndar, şad bibe, bi xwendin û pêşve çûna welatiyên xwe, ew bi kîna xwe diperçive, gava dibîne nifşê cuwan ji Kurda–dixwînin, û dibin şareza, xwedî

peyv, xwedî girove, û bawermend, û bi desthilanîn, û wan dibîne metirs!. Rast e ew metirs in, li hember şovîniyan, maf û erkên xwe nas dikin, û gava sitem li wan bibe, dizan in li sitemê vegerînin, bi kêmanî dizanin ku sitem li wan bûye. Ev şovîniyê bê nihad, wan hînbûyên Kurd – dijmin dibîne, û bê şerm dibêje: "me ev dijmin li ser xwe afirandine " û wan dibîne neyarên zirz yên hişmend û xwedî girove ku dikarin milmilaniyê û zoraniyê bikin, bi xurtî, û ev şovînî tirsa xwe

dide xuyakirin, ji rikdarî û zoraniya van hînbûyên Kurd, çikû zoraniya bawermendiyê pir zor e.

M. T. Hilal, di rûpela 43 de, ji pertûka xwe, dibêje: **"di pîlangêriya koledarî de, ji bo Kurda, herdû leşker-gehên Cihanî, di dîroka milmilanî ya wan de, li ser çi tiştî li hev ne kirine, wek rêkeftina wan li ser du şano yan, li ser qada Erebî bi xwe, şanoya Filestîn û şanoya Kurdistanê".**

Ev şovîniyê ser hişk, na keve bîra wî ku dadmendî, ji vê Cihanê winda ne bûye, û hêj, li ser rûyê zemînê, kesên xwedî nihad û dilovan hene. Na keve bîra wî ku ev her dû leşker-gehên rojhilat û rojava, piraniyek pir mezin, ji Cihanê û mirovan – dinuwînin, û gava li ser kêşeyekê bigihên hev, xuya dibe ku aliyên dadmendiyê, di wê kêşeyê de – xuyane, lewra ku piraniya Cihanê, wê kêşeyê – dipejirîne. Ev şovîniyê hiş gemarî, çima ji Cihanê dixwaze ku li pey ramanên wî yên çewt bi rê ve biçe?! Û ji sitemkara re li çepka bide, û ji wan re, bêje: Aferîn !! Û ji aliyekî dî ve, çima ev şovîniyê bed-sinc, Kurda û Isra'îl – dide ber hev, digel cudayiya mezin di navbera wan de. Kêşeya Kurdî doza gelê bindest û sitembar e ku hatiye perçiqandin, di bin lingên desthilatên sitemkar de. Lê Isra'îl xurt e, û sê qatî dijminên xwe, zordariyê dike. Û ji aliyê sêyemîn de, çima ev şovînî, rêkeftina herdû leşkergehan ji bo Kurda – dike pîlangêriyek koledarî?! Gava herdû leşkergeh, li

ser kêşeya kurdî bibin yek, ew dibe hevkarî ji bo rizgarkirina gelê Kurd yê sitembar, dibe piştgirî ji bo kêşeya mafên mirovan, dibe bicihkirina mafê gelan di biryardana çarenûsê xwe de, û dibe rawestina li aliyê azadî û dadmendiyê.

M. T. Hilal, di dawiya rûpela 43 de, ji pertûka xwe, dibêje: **''Leşkergehê sermayedar, ji kevn de, kêşeya Kurda pêk anî û kar ji wê re kir, bi giştiya wê, û her ji bo wê kar**

**dike, bi mebesta danîna kospan, li pêş yekîtiya Ereban, û bi cih anîna nameya wan, bi pileya yekem, û ji bo berjewend ên xwe, bi pileya duwemîn, çikû ew bawerî yê bi çi tiştî, na êne, ji bilî perçekirinê, her û her û bi awayên core core, û cilên li gorey kawdan û demê – li xwe dike, carekê bi navê neteweyî, û carekê bi navê olê, û carekê bi navê mirovatiya azarkêş, ta ku arîşeya Kurdî gihişte astek Cihanî, û ta ku bû wek rêxistinek Cihanî, ji yên saznameya neteweyên hevgirtî, û nîşanên vê yekê li ber çava ne, di rojnamegeriya fermî ya desthilatên rojava de, û di îzgeyên wan de, û bi damezrandina nivîsgehan, li Siwîsra û xwe hermendên (dewletên) din yên biyanî, ta ku ew arîşe, di têgihiştina civakên rojava de – bû beramberî kêşeya Berlîn, di bayexdanê de, yan wek Elmanya bi giştî. Û leşkergehê rojhilat – bes ne kir, bi wê kira di Filestîn de, va ye îro jî, ew û dijminê xwe, leşker-gehê rojava, ji nû ve gihane hev, ji bo teqelaya rabûna bi şanoyek kuldariya nuh, li ser qada Erebî, va ye ew leşkergehê rojhilat, eşkere piştgiriya yaxîbûna Berzanî û tevgera Kurdî dike, bi rojnamegerî û îzgeyên xwe, bi navê mirovatî û biryardana çarenûsê jî. Ev tev, kêşeya Filestîn tîne bîra me. Diyar e ku divê Ereb, carek dî bêne pêvedan, çawa ku di Filestîn de, hatin pêvedan''.**

Ey şovîniyê çav nebar, çima tu gazina ji leşkergehê sermayedar dikî?! Û çima tu qenciya wan jibîr dikî?! Ma ne ew bû ê ku pişta Osmanliya şikand? Ma ne ew bû ku di cenga Cihanî ya yekem de, 10 welatên Ereban, li Asya – ji bindestê Osmanliya rizgar kirin, û paşê bûn welatên serbixwe? ji bilî welatên Ereb li Ifrîqiya ku di cenga Cihanî ya duwem de, û piştî wê – bûne serbixwe. Lê ne di wan deman de, û ne piştî wan , çi perçe ji Kurdistanê rizgar nekir. Û wî leşker-gehê sermayedar, bi rêkeftina Saykis–Pîko, Kurdistan û gelê Kurd perçe kir, û piştgiriya çi şoreş û raperînên Kurda – ne kir, û di dawiyê de, Kurd xistin bin destê desthilatên şovînî û regezperesên wek desthilata ku tu jîrikê wê yî!.

Ey şovîniyê çav nebar, tu dilgiran dibî çima ku kêşeya Kurdî di îzgeyekê de, axivtin li ser wê dibe, yan di rojnameyekê de, xuya dibe! Tu ji dixsî şêt dibî, ku nivîsgehek li bajarekî Urupa, ji kêşeya Kurdî re – vedibe! Lê na keve bîra te, ku wan desthilatên Urupî ,di cihê Ereban de – ceng vêxistine, li ser Osmanliya, û Ereb rizgar kirine, û Kurd bi wê alîkariya wan, kêfxweş bûn. Û yên wek te naxwazin, dengê Kurda derkeve û ne bête bihîstin! Ev çi ezîtî û mirdaliya ku pêwîste hûn ji wê şerm bikin! Ma tu dixwazî hûn Kurda, bi çekên kîmyayî qir bikin, û di ser re, kes li ser wê qirkirinê ne peyiv e ?! Ev çi hovîtî ye?!.

M. T. Hilal, di rûpela 44 de, ji pertûka xwe, dibêje:

**"Tiştê ku pir derûnê dibirre û dîlim dike, bi azar û tehliyî – helwêstê karbidestên Misrê, ne helwêstê gelê wê, ji arîşeya Kurdî. Li gorey têbîniya wan karbidesta; (Kurd musilman in, bira ne, di olê de). Me berê ev gotina derewîn ne pejirandiye, û me ew şaşî û derew dîtiye. Û di têbîniya wan karbidestan de, (Kurd welatî ne). Herwekî ku ew, me sûcdar dikin bi zordariyê li ser Kurdabi bê bextî û derewa!**

**Ew karbidest, baweriyê bi çareyên aştiyê tînin, di navbera Kurd û Ereban de. Ev têbîniya wan –pir nêzîkî ramana Ebdilkerîm Qasim e, ew a bed-amanc, gava bi henekok, şeypûra (bûqa) wî bang dikir: (Bijî biratiya Kurd û Ereban..) Ev nerîna karbidestên Misrî li vê arîşeyê, dijî Ereba ye (Şu'ubiye), û li rû ye, û ne kûr e, digel ku ew karbidest ramankûr in, êdî pêwist e ku ew bed-amanc bin. Em gelek kuldar in, ji vê bedamancî û bê nihadiya wan, û pişkdariya wan, digel koledarên rojhilat û rojava, ji bo qezencên yekane, û pêk anîna Imperatoriyê, di demek ku ne dema desthilata Imperatorî ye, û ne dema desthilata yekane ye jî''.**

Ev şovînî û yên wekî wî, dijî her kesê ne wek wan bi rame, û li gorey ramana xwe ya çewt, bawer in ku ê ne wek wan be, dijî wa ye. Mebesta vî şovîniyî, bi desthilata Misrê, Ebdil Nasir û desthilata wî ye, gava ku dibêje desthilata yekane, ew li ser fermandariya Ebdinnasir dipeyive. Û gava fermandarên Misrê bibêjin Kurd welatî ne, ev rastiyek bê guman e. Her wiha gava ew bibêjin Kurd musilman in. Lê nerîna wan şovîniyan ew e ku Kurd ne welatî ne , û ew şovînî guh nadin Islam û oldariyê, çikû ew ola Islamê dibînin berhemek ramana Erebî, di demek helkeftî de, û ramana Erebî dikare ramanek çaktir ji wê ya ku dem lê buhirî – bi afirîne. Û bi vê nerînê, ew şovînî, dê çawa guh bidin Kurda û musilmanan. Û bi giştî, gava Ebdilkerîm Qasim bang dikir; Bijî biratiya Kurd û Ereban, rastî digot û belkî bawer bû bi wê durişmê. Lê şovîniyan, rê li ber wî girtin û ne hiştin wê durişmê bi cih bike. Eger desthilata Misrê, wê demê yekane bû jî, bê guman ew fermandarî hêsatire li ser gel ji fermandariya partiyek şovînî ku her yek ji wan fermandarekî yekane ye. Eger desthilata Ebdil Nasir – Imperatorî be, ew hêsatire ji hezarên

Imperatorên şovînî yên bed-raman û bed-amanc. Gelo çawa deshilatên rojhilata Cihanê û desthilatên rojavaya wê, tevde şaş in, û şovînî, bi tenê – li ser rastiyê ne? Gelo çawa na keve bîra van şovînî yan, ka dongî ya şovîniyên berî wan çi bû?! Çi bû dawiya şovîniyên wek Mûsilînî, Hitler, Seddam û …?!

Di vî babetê jêrîn de, em dê li ser her13 pêşinyarên şovînî yên M. Teleb Hilal – rawestin, û wan ji hev veçirin, tev ku berê em hinekî li ser her çar bendên pêşîn peyivîn, lê nuha em, dê li ser tevaya wan rawestin, bi têr û teselî.

M. T. Hilal, di rûpela 46 de, ji pertûka xwe, dibêje:

**"Dever tevde, wek em dizanin, li Turkiya û Iraq û Sûriya û ta li Îranê – hevgirtine, li seranserê sînoran. Pêwîst e, em sûdê ji helwestê Turkiya wergirin, ew helwestê ku dibe bête guhertin, li gorey kêfa konevaniya koledarî, çikû Turkiya nuha, her kesê Kurd ku regezê metirsiyê be – mişext dike, bi aliyê hundirê welat de. Ji bo vê, em pêşinyar dikin: 1- Desthilata Sûrî biryarê bide, bi destpêkirina kar û barên mişextkirina Kurda, bi aliyê hundirê welat de, digel belavkirina wan li gelek cih an, û digel haybûna li regezên metirsiyê ji Kurda, û bere bere. Bila ev mişextkirin bi rêzan û nexşe yên du sale û sê sale be , û dest bête kirin bi regezên xwedî metirs, ta bigihêje yên kêm metirs, û her wiha…".**

Ev şovîniyê rûreş, bê şerm, vê pêşinyara zordariyê pêşkêş dike, û dixwaze ku hezarên xêzanên Kurd –bêne mişext kirin û qewirandin, û bêne belav kirin, li deverên Ereba yên dûr li Sûriya. Û dixwaze ev tawana mezin veşartî bimîne, bi awayê ku hin bi hin – bi cih bibe, û bi rêzanên du sale û sê sale be. Û dest bête kirin, bi mişextkirina kesên Kurd ku tirs ji wan hebe, ango yên welatparêz û dilsojên Kurdayetiyê bin, ta Kurd bi

tevayî, ji deverên xwe yên zengîn û behredar bêne hilkirin, ji kokê de, û xakên wan û her tiştên didêrin – ji destên wan derkevin, û li deverên biyanî – bibin parsek, ta bêne Erebkirin, piştî ku hêz di wan de ne mîne.

**''2-Konevaniya nezankirinê: Pêwîst e ku dibistan û peymangehên zanistî, li deverên Kurda – ava nebin, çikû berê, me dixwest ku bi dibistan û zanîngehan – Kurd bibin Ereb, lê dijî daxwaza me, Kurd zana bûn, û bi awakî xurt –li neteweyê xwe, xwedî derketin''.**

Ev e konevaniya şovîniyên Be'esî, dixwazin Kurda nezan bikin, da karînên wan yên zanistî û abûrî – ne mînin, û ramanên netewî û şarezabûna abûriya nûjen, li nik wan – nemînin, û bêne mişextkirin, û li deverên Ereban, demek dirêj parsek bimînin, û bibin rencberên Ereban, û wê gavê, li gorey hişmendiya şovîniyan, dê ew Kurdên bê hêz, naçar bibin, hin bi hin, bibin Ereb û bêne pişavtin.

**''3-Piraniya xurt ji Kurdên niştecihên Cizîrê, nasname û welatdariya wan Turkî ye. Pêwîst e tomarên bajarvanî bêne rast kirin, û ev tişt, nuha kar jê re tête kirin û pêk tê, lê em dixwazin dûrkirina her kesê ku welatdariya wî**

**ne bi cih be, û radestkirina wan bo xwe-hermenda (dewleta) ku ew Kurd pêgirtiyên wê ne. Digel vê her kes ê nasname û welatdariya wî hebe, vekolînek hişmendî, li**

**ser wan – bibe, û bête nerîn ka çawa wan ew welatdarî wergirtine? çikû welatdarî bi cih na be, bê fermanek yasakariya komarî (mersûm Cumhûrî), û her welatdarî**

**ya bê wê fermanê – pêwîst e bête gengeşe kirin, da ew kesên Kurdên kêm metirs –bimînin welatdar û bi nas-name, û ji yên din welatdarî bête sitandin, da em dawiyê**

**wan vegerînin welatê wan''.**

Ev e serweriya yasayê li nik şovîniyên Be'esî, fermanberekî biçûk, biryarê dide ku piraniya Kurdên Cizîrê – welatdarên Turkiya ne!! û mixabin ku berpirs û desthilata bilind, li pey van core biryar û pêşinyarên wiha diçin, û wan pêşinyar û biryarên Qereqûşî –bi cih dikin. Xwediyê vê biryara giran Serhengekî(efserekî) biçûke (Mulazim ewwel e).

M. T. H) bi vê biryara ha,Tomarên salixên şarevanî ser rast dike, li gorey kêfa şovîniyan, û sed û pêncî hezar kesên Kurd bê par dike, ji welatdariya wan! Û bi vê bes nake, dixwaze, wan radestî welatekî dî bike, her wekî ku ew welatê dî di bin destê wî de ye, û dê fermana wî zû zû – bi cih bîne!! Û Teleb Hilal, li pey Şovînîtiya xwe diçe, dixwaze vekolînek dî bike, li ser Kurdên welatdar yên mayî, ka her yek ji wan welatdariya wî bi fermanek yasakariya komarî ye, yan na? Xuya ye ku Teleb Hilal dê ji her Kurdekî welatdar, fermanek yasakariya taybet bixwaze!! Û ji bîr dike ku Sûriya berî 1924, ne bû, û tevaya welatiyên wê, nasname û welatdariyê xwe, bi fermanek yasakariya komarî giştî wergitine, di sala 1924 de, ne bi bawernameya zayînbûnê.

**''4- Girtina deriyên kar: Pêwîst e ji me re, ji bo pişkdariyê, di pilanê de, girtina deriyên kar li ber Kurda, da em wan bixin rewşek ku ne ma karibin tevgerê bikin, di pêşiyê de. Û paşê têkevin rewşek ne aram, ta ku bibin pêkhatî ji bo barkirinê, di her kêlîkê de. Û pêwîst e ku bi vî tiştê ha, bête girtin, di karên çakkirina çandiniyê (Islahi zzira'î) de, di pêşiyê de li Cizîrê, bi awakî ku yekî Kurd nebe xwediyê xak, ta bi kirê jî, xak bi dest Kurda ne keve. Regezên Ereb hene û pir in. Sipas ji Xwedê re''**

Ev e beramberiya keysên kar ku şovînî ji welatiyên xwe re pêk tînin! Ev e durişmê derewîn yê şovîniyan ku bang dikin (xak ji wî kesî re ye, ku têde kar dike), di cihê wî durişmî de, hezarên cotkarên Kurdan – bê par dikin, ji wan xakên ku sedê salan di wan de kar kirine. Ev e şoreşa karker û cotkar an ku şovîniyan kiriye durişm, û bi wî bang dikin!! Ev e hevpişkiya (Iştirakiya) ku sêyeka nameya Be'esî, ji nav her sê durişmên nameya nemir**; Yekîtî, azadî , û hev-pişkî!!.**

Ev e dadmendiya şovîniyan, bi talankirina xakên welatiyên Kurd, ku ji bav û kalan de, xwediyên wan xaka ne, ew xakên ku vejandine, û gund di wan de ava kirine, û ji sedên salan, kar di wan de kirine, û li wan miqate ma ne, bi hilkirin û cotkirina wan, bi çakkirin û pakkirina wan, ji kevir û kortan, û ji gemar û gellaşa ku di wan de şîn dihat.

**''5-Belavkirina êrîşek bangeşiya fireh û himbiz, di nav regezên Ereb de, dijî Kurda, bi mebesta amadekirina regezên Ereb, di pêşiyê de, ji bo her arîşe û rûdawên ku dibe çê bibin, di nav Ereb û Kurdan de, û paşê ji bo jihev-xistina Kurda, bi awakî ku bikevin rewşek nîgeranî û ne aram de''.**

Ev e konevaniya şovîniyan; tev rakirina arîşeyan , di nava welatiyan de, di hundurê welat de, û vêxistina aşûb û ceng an, di nav dirawseyên gelan de, û gurêxkirina regezên dijîtiyê, li ser tevlihevî û wêrankirinê. Diyar e ku şovînî kardikin, ji bo firehkirina dijminahiyê, di navbera Kurd û Ereb an de, û diyar e ku ev rûdawên kuldar ku li devera rojhilata navîn çê dibin, û ev azarên cengan ku hatine serê gelên deverê, ji kuştin û wêrankirin û awarebûnê – ne bes in, li ber çavên şovîniyan, û

dixwazin agirên nekokî û dijminayê – gûrtir bikin, û li ber azarên reben û perîşanan dîlanê bikin, bi hêviya sûd wergirtinê ji wan karan.

**"6-Rakirina Sali'xên oldarî, ji pîr û kesayetiyên olderên Kurd û şandina pîr û kesatiyên Erebên resen, da bikevin cihê wan de, yan guhestina pîrên older yên Kurd, bi aliyê hundirê welat de, li cihên hinên din, çikû civatên olderên Kurd – ne civatên oldarî ne, ji binî. Û bi duristî civatên wan Kurdî ne. Ew in ên ku gava me ew vexwendin, wan birûsk dijî Berzanî ne dan, lê wan pejirandin ku birûskê bişînin, dijî rijandina xwîna musilmanan. Û ev peyv çi peyv e!".**

Ev şovîniyê dijî oldariyê, gava bawer e ku ola Islamê berhema ramana Erebî ye, ew ne bawer e bi pey'xemberiya Muhemed, çikû ew Islamê dibîne hişmendiya kesayetiyek Ereb, ne peyxemberî ji aliyê Xwedê, ew Sali'xê oldariyê ji Muhemed – ra dike, û li nik wî hêsatire ku Sali'xê oldariyê, ji olderên Kurd – rake. Ev şovîniyê ha, ji olderên Kurd dixwaze ku çav ji kuştina Kurda bigirin, û dujûnan, li ser Barzanî bibarînin, çima ku berevaniya Kurda dike, û ji wa olderên Kurd dixwaze ku dujûnan, li ser Kurda bibarînin, ango dujûna li xwe bikin**. Û ev peyv çi peyve**! wek wî got.

**"7-Lihevdana Kurda li bin guhên hev, û ev hêsa ye, û dibe ku bi hêsayî, bi dest keve, bi tevrakirina wan Kurdên dozdariyê dikin ku ji nijadê Erebî ne – dijî wan Kurdên bi metirs, û wiha ev kar, kaxez û bawernameyên wan Kurdên xwediyên wê dozdariyê –didin xuya kirin".**

Ev şovîniyên han gellacên destebaş in. Gellaciyê di navbera Kurd û Ereban de dikin, tev ku Kurd nêzîktirîn gel bûn ji Ereban re, û Ereban jî xwe bi xwe – li bin guhên hev dixin, bi

rêbazên oldarî, wek Sunnî û Şî'î, pêşverew û paşve- rew, şoreşger û noker…Û gellaciya wan derbasî welatan dibe, û desthilatên wan li bin guhên hev – dixin. Êdî nema Kurd dilê xwe–bi xwe dişewitînin, gava gellacên şovînî wan li bin guhên hev bixin, çikû kilamet, gava belav dibe, li ser gelek azarkêşan – sivik dibe.

**"8- Niştecihkirina regezên Ereb û netewiyên bawer- mend: li deverên Kurda yên sînoran, ew Erebên han dê bibin keleh, di mandê de, û dê bibin zîrevan li ser Kurdan, ta ku bêne mişext kirin. Em pêşinyar dikin ku ew regezên han, ji hoza Şemmera bin, çikû ew xizantirîn hoz in, ji xwedîtiya xakan, û ew, ji sedî sed – dabînkirîne ji aliyê netewîtiyê".**

Ev şovîniyê dilreş, bi her awayî, dixwaze Kurda bi êşîne, û dixwaze wan tune bike. Ew Erebên ku niştecih dibin, di xakên Kurdan de – ne kelehên berevaniyê ne, ew talankerê xakên ku ne yên wan in, çima ev şovînî, wan nav dide netewiyên bawermend? Ew netewiyên regezperestin, dest-dirêjin,û

bed-suriştin. Çendî ruwê vî şovîniyî reş e! Û çendî ew gellac e! gava ku dixwaze, Kurdên mayî jî, li deverên sînoran –bêne mişext kirin, û li gorey yasayên van şovîniyan, parêzgeha Hesekê tevde – kirine deverek sînorî, ango ew dixwaze ku Kurd, li vê parêzgehê nemînin. Ji alîkî dî ve, ew dixwaze ku hoza Şemmera ya ne hestyare, ji Kurda – bike dijminê wan, û wan berde hev, da ku ew dostaniya di nav wan de, ji kokê de – bête hilkirin û ne mîne.

**"9- Terîşa bakurê Cizîrê bigerînin deverek leşkerî, wek devera bereya cengê, bi awakî ku perçeyên leşkerî, têde bêne danîn, ku karê wan yê giring – niştecihkirina Ereban**

**be, û hilkirin û dûrkirina Kurda be, li gorey rêdanîna desthilatê''.**

Di vê bendê de, ev şovînî, rewşa dijminayê – li ser Kurda, diçespîne, bi xistina perçeyên leşkerî, di wê deverê de, bi mebesta bi kar anîna zordariyê, ji bo mişextkirina Kurda bi zorê, û dana xakên wan, ji wan Ereban re, ew ên ku nuh niştecih bibin, bi awakî fermî, û li gorey rêdanîna dest- hilatê, bi nerînek dijminayî li Kurda, ew nerîna ku Kurda dixe rêza Isra'îl, û devera Kurdî jî – dike bereya cengê, wek wê bereya li hember Isra'îl.

**''10-Çêkirina çandinîgehên tevayî, bi awakî leşkerî–ji bo wan Erebên ku desthilatê, ew niştecih kirine, li wê terîşa bakurê Cizîrê, bi mercê ku ew kesên wan çandinî-gehan – bêne meşq kirin, li ser wan çekan, wek wan niştecihên Cuhuwên Isra'îl yên li ser sînoran bi tekûzî''.**

Vê carê, ev şovînî, cengaweriyê eşkere dike, wek dezgehekî leşkerî, dixwaze piştî ku Ereb–bêne niştecih kirin, li deverên Kurdî, wan çekdar bike, bi rêzanek leşkerî, û wan meşq bike, li ser wan çekên rêk û pêk, da amade bin ku bi pehlewanî di wê cengê de – biserkevin. Ev e cenga pîroz, li ber dilê şovîniyan!!.

**''11-Ne dana destûrê bo wan kesên ku bi zimanê Erebî na peyivin – bi têkiliya mafê hilbijartin û palandinê, li wan deverên navbirî''.**

Ey şovîniyê ne terazûbûyî. Gava hûn Kurda mişext bikin, ji deverên bav û kalên wan, û hûn xakên wan ji wan bistînin, û bi nerîna dijminayî, li wan binerin, û wan wek Isra'îl bibînin – çawa dê hûn mafên hilbijartin û palandinê (xwe pêşkêşkirina ji bo berpirsiyê)–bidin wan? digel ku hûn sed û yek lîstik û sextekariyan, di wan herdû mafan de dikin, bê şerm.

**''12- Nedana welatdarî û nasnameyê, ji binî–bo çi kesê ku dixwaze, li wê deverê niştecih bibe, welatdariya wî ya resen ji çi deverê be, (ji bilî welatdariya Erebî û…t. d.)''.**

Aferîn ey şovîniyê hiş qirêj; welatdariya wê deverê nede kesî, ji bilî wan Erebên şoreşgerên wek te, û wek Erebên xwekuj ew ên xwe dipeqînin, da bi dehan û bi sedan mirovên bê guneh – bikujin û kût û birîndar bikin, yan ew ên ku gemiyan direvînin, û dehên milyonên dolaran werdigirin.

M.T. Hilal, di dawiya pêşinyarên xwe de, dibêje: **''Ev pêşinyar ên min ne besin''.**Raste ev para wî bi tenê ye! Xwedê mirovzadeya biparêze, ji pêşinyarên şovîniyên wek wî û ji wî zirz tir.

# *Rewşa desthilatdariya Sûrî piştî Osmanliya*

Di sala 1920 de, piştî cenga Cihana yekemîn, desthilatek Erebî pêk hat, bi serperiştiya Firensa. Rewşenbîr û konevan ên Sûriya ji bajarên mezin bûn, nemaze ji Şam û Heleb… Û hestê wan yê netewî nuh û germ bû, û kêşeya Filestîn û dozdariya Cuhuwa, ji bo pêk anîna welatê netewî ji wan re, li Filestîn – xurt dibû, û Ereb û Musilman – dijî wê dozê bûn, û bi vê egerê her tevgera Cuhuwa pêş ve diçû, hestê netewî, li nik rewşenbîr û konevanên Ereb – gûrtir dibû, û bi aliyê tundî û regezperestiyê de – diçû.

Konevanên Sûriya nûjen – rewşenbîrên bajarên mezin bûn, digel Kesayetiyên hozdar û êldar ew ên ku piraniya wan – ne xwenda bûn, nemaze Kesayetiyên parêzgehên rojhilata Sûriya, Cizîrê, Dêra Zorê, Reqqa. Bi vî awayî, desthilat – di destê rewşenbîran de bû, û ev ên han, kesayetiyên ne rewşenbîr, li pey xwe dikişandin, bi wî hestê neteweiyê ku her diçû, tundtir dibû, digel wî hestê hozdarî ku li nik kesayetiyên ne rewşenbîr di desthilatê de, ew jî, ji hestê regez-perestiya hozdarî, bi aliyê regezperestiya netewî de – çûn.

Li parêzgeha Cizîrê ku piraniya niştecihên wê–Kurd bûn, û hozên Ereb yên Cizîrê , 90 ji sedê wan koçer bûn, û Kurdên Cizîrê, li beşê mezin, ji Cizîra jorîn, gund ava kiribûn û çalên avê yên bin zemînê kola bûn,û çandinî dikirin, li 30-40 k. m, û li hin cih an pirtirbûn, û ber jêr ta 70- 80 k. m. çêrgeh bûn, ji

pez û tarişê Kurda re. Û hozên Ereb, li Cizîrê ku piraniya wan koçer bûn, li cihê avê û çêreyê digeriyan, nemaze li aliyên başûra herdû çemên Xabûr û Red, û di havîna de, gava çêre li deverên jêrîn hişk dibû – dihatin gundên Kurda, pez û tarişên xwe, li pirêzeyên ceh û genim – diçêrandin, û teneyên ku ji wan re pêwîst bûn – ji ba Kurda dikirrîn, yan jin û zarokên wan, sinbilên genim, ji pirêzeyan – berev dikirin, û tene ji wan sinbilan der dixistin. Divê bête zanîn ku hozên Ereb yên mezin –ku li Cizîrê xuya dibûn, Hoza Şemmera, li jêra Iraqê bû, û hoza Beggara li parêzgeha Dêra Zorê bû. Hoza Cubûrî ya Ereb ew jî mezin bû, li Cizîrê bû, û li hawîrî Hesekê bû, dûrî deverên Kurda bû. Hozên Ereb ku hin ji wan nêzîkî devera Kurda bûn ev in: Herba, Şerabî, Benî seb'a, Teyya.

Desthilatdar û pûlîs û fermanberên Cizîrê, 95 ji sedê wan – ji niştecihên parêzgehên din bûn, ta nuha jî ne parêzger û ne serdarê pûlîsa, ji niştecihên Cizîrê, li vê parêzgehê – ne ketine desthilata wê!. Desthilatdarên parêzgeha Cizîrê ku tevde Erebên rewşenbîrên ji dervey wê bûn, û regezperestiya netewî bi wan re hebû, bi egera ne li heviya Ereb û Cuhuwan –dîtin ku Kurdên Cizîrê, Piraniya xakên jora Cizîrê avakirine û piraniya wan di çandiniyê de kar dikin, û rewşa wa ya abûrî – çaktire ji ya Erebên Cizîrê.

Ew ê desthilatdariyê, bi nerînek regezperestî – li van diyardeyan – nerî, û hin kar û barên dijî Kurda – dane ber çavên xwe, lê bi nehînî, çikû ew desthilatdarî wê demê – qels bû. Hin hozên Ereb degel kirin dijî hozên Kurd, hozên Kurd jî kirin du beş, welatparêz (wetenî) û ne welatparêz (noker), û yên pêşîn kirin hevbendên hozên Ereb, û hin qezencên dem demî – dane wan, hin xakên Kurda, li Cizîra jorîn, li ser hin hozên Ereb tomar kirin, digel ku wan hozên Ereb çi karên çandniyê di wan xakan de, ne kiribûn. û hin serekên hozên

mezin, ji Ereban gurêx kirin, li ser hozên Kurd, da bi zordarî, xakên devera Kurdî – ji destê wan derxin, û piraniya xakên Cizîrê yên ne vejandî – li ser Ereban tomar kirin. Û bi van kar û barên şovînî, gelek şerên hozdarî di nav hozên Kurd û Ereban de – rû dan.

Em dê li ser hinan ji wan şerên hozdarî – rawestin:

Hoza Şemmera ku tev koçer bûn, û piraniya niştecihiya wan – li jêra Iraqê bû, û hoza Koçerên Botan ku dostên Şemmera bûn, bi nîşana ku di şerê navbera hoza Şemmera û hoza Millanê Birahîm Paşa de, sed suwarên koçerên Botan, bi serdariya Birahîm A'xa kurê Mustefa Paşa yê Koçer– alîkariya Şemmera kirin dijî Millan.

Ji nişka ve, disala 1927 de, hin suwarên Şemmera ji Malbata Şellal – ketin pêşiya hin suwarên Koçer, da wan ji çekdarî bikin, û wan bi şellînin û tarişên wan – ji wan bistînin, lê suwarên Koçera berevaniya xwe kirin û ew şikandin û yek ji wan, bi navê Bineyyan – kuştin, û yekî dî birîn kirin.

Û di sala1932 de, carek dî, Şemmera ketin pêşiya Nayif Paşa û12 suwarên Koçera. Şemmera pirtir bûn, û herdû alî ketin şer, û di encamê de, Milêhan ê birayê Dehamê Hadî –hat kuştin, û Tirêwî birîndar bû, û hespek Şemmera–hate kuştin, û di van her dû şeran de, çi ziyan ne gihişte Koçerên Botan.

Di sala 1958 de, piştî kû herdû hoz li hev hatin, hinek ji Şemmera êrîşî bereya Wareserya ji Koçeran – kirin, û di şerê di nav herdû aliyan de, du mêr û jinek – hatin kuştin.

Lê bi pendiyariya serekên herdû hozan, Nayif û Deham ê Hadî, ew lihevhatin birin serî. Ji bo wê lihevhatinê, û piştî ku Nayif Paşa dît ku desthilat layengerê Şemmera ye, nema doza wê devera bakurê Til koçer kir, ew a ku bi pîvana 10 k. m. di 15 k. m. de bû, û ji devera Koçera bû, û ma ji Şemmera re. Û

ji bilî wê deverê, gelek gundên Nayif Paşa, bi "Çembera Erebî", û çakkirina çandiniyê (Islahizzira'î) û yasayên şovînî – çûn, û Nayif Paşa nema kula wê devera ku gihişte Şemmera – kişand, çikû Nayif naskiribû ku ew dever dê her biçe, û xwest ew bibe sedema vemirandina dijminahiya navbera herdû hozan.

Rewiştên hozdarî, hin qenc in, û ji berjewenda mirova re ne. Û hin ji wan ne ji berjewenda mirovatiyê ne.

Regezperestî ramanek çewt e. zordarî, serdestî, sitem – ji rewiştên hozdarî ne, lê ne qenc in, û ziyanê digihînin mirovatiyê û mirovên bê guneh. Hem ziyana van rewiştan fireh dibe, û hin caran, digihêje zordar û sitemkaran bi xwe. Rewiştên qenc yên hozdariyê – hevkariya hoza, alîkariya hozên ku dikevin tengiyê, û hevjiyana bi têgihiştin... ji berjewenda mirovatiyê re ne. Şemmera hozek mezin e, û bîrewerên wê pir in, û gelek car, bi hozên din re, ji Kurd û Ereban – hevkarî pêk anî ne. Lê têkiliyên Şemmera digel Kurdên Sûrî – leke û şaşî tê de hene. Me mînaka têkiliyên vê hozê digel hoza Koçerên Botan derbas kir. Û em dê mînakên din jî –bidin xuya kirin.

Şemmera di demên hozdariyê de, ezmûnên wan pir bûn, û pend ji wan – werdigirtin. Lê hin caran, ew pend jibîr dikirin. Pendek ji yên Şemmera ew gotina li ser zimana "Xwedê xurttire ji kurê Si'ûd" li ser serbora şikestina Şemmera û malmezina wan, malbata Reşîd, li hember hoza 'Iniza û malbata Ebdil 'ezîzê Si'ûd. Mebesta vê pendê ew e ku xurtî ji çi kesî re na mîne, xurtiya Xwedê bi tenê, ji wî re – dimîne.

Mixabin! Şemmera ev pend, hin caran – jibîr kirine, û zordarî li hozên biçûk kirine, bac û "Xûkîtî" ji hin hozên cihgirtî û xwediyên gunda û çandiniyê standine, û bûne asteng, li ber

avahî û vejandina xakan bi çandiniyê, û ya ji van kambaxtir, gava serekên Şemmera – ketin bin bandora şovîniyên desthilata Sûrî de, ziyan û sitem gihandin Kurd ên Sûrî, û gelek perçeyên xakên hozên Kurd – ji destên wan derxistin. Erê xuya ye ku Şemmera hevkarî digel pêşinyara heştemîn ya Mihamed Teleb Hilal re – kirine, ew pêşinyar Dibêje:

**"8-Niştecihkirina regezên Erebên netewiyên bawermend, li deverên Kurdên sînoran. Ev Erebên han – dê bibin keleh di mandê de, û bibin zîrevan li ser Kurdan, ta ku ew Kurd bêne mişext kirin. Em pêşinyar dikin ku ew regezên Ereb – ji Şemmera bin, çikû ew ji xizantirînên hoza ne, ji xwedîtiya xakan, û ji aliyekî dî ve, ew dabînkirî ne, bi netewîtiyê ji sedî sed".**

Diyare ev pêşinyar – hatiye pejirandin, ne ji aliyê Şemmera bi tenê, lê ji aliyê du hozên mezin yên din, ji Ereban, hozên Cubûriya û Beggara jî, berî 65 sala, hevkarî bi vê ramanê re kirine. Mixabin ku ev ramana regezperest her diçe – li nav gelek hozên Ereb, li Cizîrê belav dibe.

Hoza Şemmera, destdirêjî li hoza Abasa kirine, berî nêzîkî

nod salî, di dema Dellî kurê Colo de, û bereya Misgal ji Şemmera – êrîşî gundên hoza Abasa kirin, lê şervanên Abasa, bi serdariya Dellî – li hember Şemmera rawestiyan û ew şikandin û dane ber xwe, ta ew gihandin gundê Kelehê, li devera Koçerên Botan.

Ew hestê dijminahiyê – bi Şemmera re ma, û desthilata Sûrî du gundên Abasa–li ser Şemmera tomar kirin, lê Şemmera naskirin ku Abasa bi hêsayî gundên xwe na din wan. Şemmera ew herdû gund dane hoza Omerka û li ser wan tomar kirin, da herdû hozên Kurd, bi pêxîla hev bigirin. Û devera jêrîn ku ya Abasa û Kurdên din bû, û çêregeha pez û

tarişên wan bû, lê neçandî bû, bi hoya ku gîsinkêş û çinînker ên – mîkanîkî nebûn. Desthilata Sûrî ew devera jêrîn, li ser Şemmera tomar kir, û da wan.

Her wiha Şemmera, bi alîkariya desthilata Sûrî, bi tomar kirinê, dest danîn ser devera jêrîn ya Aliya, ew a ku hêj çêregeha pez û tarişê hoza Aliya bû, û hêj nehatibû çandin. Di ser van dekan re, Şemmera êrîşî gundê Kevirê Dinna kirin, da wî gundî, ji destê Aliya derxin, lê hoza Aliya, nemerdî nekirin, û êrîşa wan, polî poşman – bi şûn de, vegerandin.

Carek dî, dema ku Şako yê Kurd, 'Efra jina Ebdirrehman ê Medlûl, ji serekên Şemmera –revand, Şemmera ew bûyer kirin behane, û xwestin şerekî fireh, dijî devera Abasa û Aliya vêxin. Lê bi hêminiya Kurda û xwe ragiriya wan, û girtina Şako û Efra, ji aliyê desthilatê, û kuştina herduwa, bi destê Şemmera, dawî li wê arîşeyê hat.

********

Cubûriya jî, hozek mezin e, ji Erebên Cizîrê, piraniya wan, ta berî 60 salî–koçer bûn, pez û tariş xwedî dikirin, û hindik ji wan – niştecih bûn, li kenarên çemê Xabûr, li devera bajarê Hesekê, ji başûr û rojava de. Ev hoz, di demên hozdariyê de – ne şervan bû, û li ser wan dihate got in: "Mêra mêr dikuştin, û Cubûriya hûr dişuştin". Û her peyrew bûn bo desthilata Osmanlî, û çi caran, yaxî nebûne li ber wê desthilatê. Û ji bo vê yekê, Osmanliya, naznavê Paşa – dane Muslit, ji malmezina wan, malbata Mulhim. Û gava ku desthilata Sûrî pêk hat, bi serperiştiya Firensa, Cubûriya, çi cara li ber Firensa ne rabûn, tev ku Hesekê navenda desthilata Firensiya – bû, û di wan çaxan de, piraniya hozên mezin, ji Kurd û Ereban – li dijî Firensiyan yaxî dibûn. Û gava desthilata Erebî, li bin serperiştiya Firensa –cih girt û xurt bû, serekên Cubûriya pêwendên xwe digel wê desthilatê çê kirin û bûn

peyrewên dilsoj ji wê re, bi dostên wê re dost bûn û bi dijminê wê disthilatê re dijmin bûn.

Bi vî awayî Cubûriya bûn dijî Kurda, û wê desthilatê, dever ên Kurda yên jêrîn – li ser Cubûriya tomar kirin. Devera jora Til birek ku dihate navdan "Berkesiz" û kenarên Çemê Ceqceq ku dihate navdan çemê "Hirmêsê", li ser Cubûriya hatin tomar kirin, tev ku ew dever – yên êla Temika bûn, her wiha devera jêrîn ya êla Mîrsiniya bû, lê bi alîkariya desthilatê, li ser Cubûriya tomar bû.

Cubûriya xwe xurt dîtin, û bi piştgiriya desthilata Sûrî, destdirêjî kirin, li ser van herdû êlên Kurd, û êrîş kirin ser dever a jêrîn ya Mîrsiniya, bi serdariya Ebasil'axewat ji malbata Mulhim. Mîrsiniya berevaniya xwe kirin, û şer vêket, û di encamê de, 'Ebasil'axewat hate kuştin.

Em dê li ser vî şerê Cubûriya û Mîrsiniya – rawestin. Ev şer û piraniya şerên hozdarî, di navbera hozên Ereb û Kurd de – destpêkirin, piştî xurtiya desthilata Erebî, li Sûriya, bi egera qelsketin û roxandina Firensa, di cenga Cihanî ya duwemîn de. Şerên Begara û Kîkan tev, di her dû salên 1944–1945 de, vêketin. Şerê Cubûriya û Mîrsiniya di sala 1944 de bû. Şerê di navbera Şemmera û Aliya de, şerên di navbera Şemmera û koçera de, ne liheviya Kurdên Abasa û Omerka, bi destwerdana Şemmera – tevde di demên desthilata Sûriya Erebî de bûn. Û ew şerên hozdarî tevde – di navbera hozên Ereb û kurd de bûn, bi piştgiriya desthilata Sûrî, ji hozên Ereb re, û bi mebesta ku ew hozên Ereb – dest deynin ser xakên ku Kurda berê girtibûn û ava kiribûn. Û gava ew mebesta desthilata Sûrî bi giştî, bi şerên hozdarî – bi cih ne hat, ewê desthilatê, bi yasa û pirojeyên şovînî, ew mebest bi cih kirin. Ew mebestên şovînî, bi Çembera Erebî, bi hijmara awarte ya sala 1962, û bi yasaya çakkirina çandiniyê "Islahizzira'î", bi

fermana yasakarî ya /49/ di sala 2008 de, t. d – hatin bi cih kirin.

Ev şerê Cubûriya û Mîrsiniya, yeke ji wan şerên hozdarî, ji aliyê hozên Ereb, dijî hozên Kurd. Hoya vî şerî ew bû, ku hin Kurdên ji êla Mîrsiniya, di salên sî yan de, ji sed-saliya bîstan, hin gund ava kiribûn, li devera bakura Tilbirek. Ew gundên Mîrsiniya ev bûn:Gundê Heso Xelef, Qolo, Qurdîsê, Werdiyê, Girzîn...t. d. Serekên Cubûriya, piştî ku dîtin gîsinkêş (terektor) û çinînkar (derrase) yên Mîkanîkî, ketin kar – xwestin wan gundên Mîrsiniya yênbakura devera xwe ji destê Mîrsiniya derînin, û gava Mîrsiniya daxwaza wan – ne pejirandin, Ebdil'ezîz ê Muslit serekê Cubûriya – gef li wan kirin ku dê gundên Mîrsiniya ta gundê Topiz yê Evdiyê Xello, serekê Mîrsiniya ku nêzîkî sînorê Turkiya ye, teva, ji destê wan, derxe, bi zorê. Niştecihên wan gundên Mîrsiniya yên jêrîn ku nêzîkî devera Cubûriya bûn – tirsiyan û hewar gihandin Evdiyê Xello. Û Hiskoyê Biro yê Xello, birazayê Evdiyê Xello, digel 8-9 suwarên çekdar – di hana wan gund ên Mîrsiniya yên jêrîn de hatin.

Serekên Cubûriya biryar dan; êrîşî wan gundên Mîrsiniya yên jêrîn bikin, û wan talan bikin û biqewirînin. Dibe ku di bîra wan de bû ku berjor biçin, ta gundê Topiz, wek ku Ebdil'ezîzê Muslit gotibû, yan bigihana sînorê Turkiya, wek

ku Raxibê Beşîr serekê Beggara, li ser Kîkan gef kiribûn, yan wek ku gundên Tilcemalê û Dugirka, ku li ser Şemmera hatibûn nivîsandin.

Tête gotin ku Ebbasil A'xewat, yek ji serekên Cubûriya bû, û şervanekî wa yê bi nav û deng bû – biryara Cubûriya ne pejirand, û 'Ebdil'ezîz ê Muslit, tinazê xwe bi wî kir, û ew cixirand û got: "Tu yê şahî û govenda yî" (ango tu ne şer-

vanî). Ebbasil A'xewat şermezar bû, û li ber xwe ket , û biryar da ku serdariya wê êrîşê û wî şerê dijî Mîrsiniya bike, û sedên suwarên çekdar, ji Cubûriya – êrîşî wan gundên jêr în yên Mîrsiniya kirin.

Hisko û çekdarên xwe bose girtin, li gundê pêşîn, gundê Heso Xelef, Hisko ji çekdarên xwe re got: "Kes ji we, berî min, tivingê ne teqîne, û miqate û nigehdar bin, li koleyekî reş yê Ebbasil A'xewat, ew kole segman e, eger ew, li me bi

zivire, û bikeve pişt me, û me ji paş ve, bibîne, yek fîşek û berika wî – ji nîşanê şaş na çin".

Êrîşa şervanên Cubûriya nêzîkî bosegeha Hisko û çekdarên wî – bû, û şervanên wan hatin nas kirin, Hisko destûra teqînê da. Bê guman, ew û çekdarên xwe yên hilbijartî, tev segman bûn, berikên wan, ji nîşanê şaş ne dibûn. Hisko ji çekdarên xwe xwest ku Ebbasil A'xewat – ne kujin, çikû her dû, berê dostên hev bûn.

Gava pêta şer hil bû, yekî ji çekdarên Hisko got: "Hûn wî koleyê reş ew ê segman – ji mi re bihêlin, ez dê wî bikim berger, û gorî û qurban ji diya xwe re, çikû mi çi qurban hêj li wê ne da ne". Û hesp û suwar–hatin kuştin, û di pêşiya kuştiyan de, Ebbasil Axewat û koleyê wî yê reş –hatin kuştin, û Cubûriya şikestin, û rahiştin termê Ebbasil Axewat û reviyan. Lê piştî ew hinekî dûr çûn, kurê Ebbas vegeriya, hat kilaşa bavê xwe, ew a li cihê kuştina wî ma bû. Hisko got: "kilaşa bavê wî bidin wî, û wî şermezar nekin".

Şerekî dî jî, berê - çê bibû di navbera Cubûriy û Temika de, lê herdû aliya, zû li hev kirin, ku rojhilata Ceqceq ji Cubûriya re be, û rojava ji Temika re be. Lê bi alîkariya desthilata Sûrî û piştgiriya wê ji Cubûriya re, çend gundên bakura Telberek, ji devera Temika gihan Cubûriya. dijminahî gûr bû, û bi wê

egerê, piraniya wan herdû deverên jêrîn yên Temika û Mîrsiniya –man ji Cubûriya re, ji bilî çend gundên ku paşê Kurda ji Cubûriya Kirrîn.

Deverên jêrîn yên Kurda li hembera devera Amûdê, ango deverên hozên Millanê Xidir, Gabara, û Deqoriya, ew jî

hatibûn tomar kirin, li ser hoza Cubûriya, lê bi egera ku desthilata Sûrî, ev her sê hoz "Wetenî" – didîtin, û ew desthilat ne dijî wan bû, Cubûriya, gundên wê deverê – firot in wan her sê hozan, tev ku Cubûriya ew dever, ne ava kiri-bûn, û ne cot li wê kiribûn, û ne çandibûn. Ew devera jêrîn ya wan her sê hoza bû, çêregeha pez û tarişê wan bû, û nîşan ên wan yên dîrokî li wê deverê – winda na bin, û nîşana mezin Kewkebê Milla ye. Lê ya qenc ew bû ku şer û kuştin – di nav wan û Cubûriya de, çê nebûn.

# Pîlanên desthilatdarên Sûrî li devera Kîkan

Di dawiya sedsaliya 19 de, hoza Kîkan bi cih dibûn, di navbera çemê Circib ji rojava de, Girherîn û Mêrdîn ji bakur de, Girsorê Kîkan ji rojhilat de, û çemê Xabûrê Serê kaniyê û qefa yên paş bajarê Hesekê, ji başûr de. Hoza Herba ya Ereb û biçûk, di wê gavê de, 5- 6 gund li devera çemê Zirganê – girtibûn, û xwe perçeyek ji bereya Şukkura ji Hoza Kîkan – didîtin. Û hoza Şerabî ya Ereb, li başûrê Xabûr – bi cih dibûn, dewarên reş û pez xwedî dikirin, li bakurê çiyayê Evdil 'Ezîzê ta çemê Xabûr – bi cih dibûn, li tenişta wan hinek bereyên ji hoza Begara ya Ereb û mezin ku li çola navbera çemê Xabûr û Dêra Zorê, Pez û dewar xwedî dikirin, ew û Şerabî, li başûra Xabûr – têkilî hev dibûn. Hoza Kîkan sê-yeka devera xwe – ava kiribûn, û çandinî li wî beşî dikirin, lê beşê mezin ji Kîkan – xwedî pez û koçer bûn. Şerabî, di havînan de – dihatin devera Kîkan ya çandiniyê, pêwîstên xwe ji tene–dikirrîn, yan zarok û jinên wan, sinbilên genim – berev dikirin, û genim ji sinbilan der dixistin, ji bo sala ayinde, û bi vî awayî, têkiliyên wan, digel Kîkan – xweş bûn. Şemmera hoza Ereb ya mezin – niştecihên jêra Iraqê bûn, koçer bûn, êrîşkar û talanker bûn. Êlên biçûk û hozên cihgirtî û xwedî çandinî – nikarî bûn bi pey wan kev in, çikû zû êrîş û talan dikirin, û zû bi dûr diketin. Ji ber vê yekê, hin hozên biçûk û cihgirtî yên xwedî çandinî, bacek bi navê "xûkîtiyê" di dane Şemmera, da tûşî bedkariya wan ne bin.

Piştî ku desthilata Osmanlî ket, nemaze piştî sala 1925 a û vir de, desthilatdarên Sûriya, bi regezperestî, hozên Ereb yên

nêzîkî deverên Kurda bûn – gurêx kirin ku xakên dever ên Kurda bigirin, û wan desthilatdarên regezperest alîkariya hozên Ereb dikirin, di wî karê regez perestî de, û cenga Beggara û Kîkan – yek ji wan rêzan û pîlanên hatin danîn, bi amanca destdanînê li ser xakên deverên Kurda, ji aliyê hoz ên Ereb ve. Wan desthilatdarên regezperest, pîlana wê cengê danîn, û agirê wê vêxistin, û hozên Herba û Şerabî û hin ji Şemmera – kirin hevbendên Kîkan, bi amanca ku dema Kîkan bi serkevin, di wê cengê de, ew hevalbendên wan yên Ereb bibin ortaxên kîkan di xakên wan de, û bi wê rêzanê, çi alî biserkeve, ceng dibe ji berjewenda Ereban.

Hin bûyerên pêşîn ku bûn hoyên cenga Beggara û Kîkan:

**1-** destdirêjiyên herdû bereyên Ebû mi'îşa û Ebû hemdana li ser gundên Kîkan, û li ser hevalbendên wan ji Şerabiya.

**2-** Himdî yê Mugezel û bereya wî ji Ebû Hemdana, pezê Si'îdê Emer talan kirin.

**3-** Ebû Hemdana zordarî li niştecihên gundê Sûr ji bereya Remaka, ji Kîkan – dikirin, û ava wan, ji ber wan –di girtin, û ne dihiştin ew pez û sewalên xwe – av bidin, digel dujûnên qirêj, ku ya sivik – ev bû: "nifret li zimanê we yê xwehr bêt" Ango zimanê Kurdî.

**4-** Zordariya Beggara, li ser Şerabiya (hevbendên Kîkan), û

Şikandina namûsa jinek Şerabî, bi zorê, li ber çavê şuwê wê. Û lê vegerandina Şerabiya, bi êrîş û talankirina hin pezên Beggara, û kuştina kurê Xalid ê Tella'i, û kuştina Milêwî. Her wiha Mihimedê 'Ilêwî ji Şerabiya – hate kuştin.

**5-** Naçarkirina hecî Derwêş ji Kîkan ku dest berde ji heşt gundên xwe, li devera Til bêder, ku pîvana wan pirtir ji 70 - 80 hezar donim bû, bi egera zordariya Beggara û dest

hilatdariya Erebî ku piştgiriya Xalid ê Tella'i dikir, ta ku bi buhayekî pir erzan (4500 L. S.) ji destê hecî Derwêş derxist, û da Xalid ê Tella'i.

**6-** Hemîd A'xa ji malbata Ristêm, qasidek hinart ba malbata hecî Dawudê Beggarî, da ji wan re bêje: "Şerabî hevbendên Kîkan in, di bin parastina me de ne, divê hûn zordariyê li wan nekin". Û bersiva Wegga'ê hecî Dawud ev bû: "Divê Kîkan ji vê deverê bar kin. Û kesê azad û jîr, amaje tenê besî wî ye". Hemîd A'xa û Hisên ê hecî Derwêş, bi tinazî li wê gefê vegeran din, û gotin: "Erê, piştî paleyê û çinîna dexlê xwe, em dê bar kin"!!.

**7-** Silêmanê hecî Derwêş û Xelefê mela Salih, ji kesatiyên Kîkan, giliyê destdirêjiya Xalidê Tella'i kirin, li nik hecî Dawudê Beggarî, da wî vegerîne. Lê bersiva hecî Dawud ev bû: "Gava Xalid bikeve cengê dijî we, Beggara tevde, ta wawîkên devera Dêra Zorê, dê digel Xalid – bikevin cengê dijî we". Silêmanê hecî derwêş û Xelefê Mela Salih, li wî vegerandin: "Eger wawîkên Dêra Zorê, di hana Xalid de – werin, dê gur û şêrên zozanan di hana me de – werin".

Bi vî rengî cenga Beggara û Kîkan – çirîsk da, û roj bi roj, agirê wê cenga hozdarî, bi bingehekî konevanî – hil bû:

**1-** Di serê Gulana 1944 de, cengê rû da, li navbera gundê Witwitiya li çemê Zirganê û Girê Qayinê (Ênil'Ebid) û Dir'xamê Damûk ji Beggara – hate kuştin, û Beggara, cawekî reş, li stuwê devehekî gerandin, û hinartin nav hoza Beggara, ta tixûbê Dêra zorê, û bi wî awayî, hewara xwe – gihandin tevaya Beggara. Û bereyên Beggara tev, di hanê de hatin.

**2-** Şerê girê Hessikê: Di havîna 1944 de, şervanên Beggara li qefa ya pêşiya Hessikê civiyan, û Şervanên Kîkan û beşekî

hindik ji hoza Şemmera, li bakurê Hessikê civiyan, herdû alî, li hawîr girê Hessikê – ketin şer, û Kîkan û hevbendên wan şikestin, û 15 şervanên Kîkan – hatin kuştin, 13 ji bereya Sim'êla, yekî Necarî, û yekî Remakî. Û kuştiyên Beggara hindik bûn. Şayenî gotinê ye ku Şemera pişkdarî di tevaya şeran de kirin, lê bi hijmarek kêm, û bi kuştiyên hindik.

**3-** Şerê qefa ya Şûniyê û Boxazê: Di roja piştî şerê Hessikê de – şer nuh bû, şervanên Beggara li Sefawî, rojhilata gundê Şûniyê–civiyan, û şervanên Kîkan, li qefa yên bîra Me'emo (Hicêra ) û Asî û Boxazê – civiyan. Gava şer vêket, yekî Beggarî – hate kuştin, û Beggara êrîş kirin, û Kîkan şikestin. Kuştî di vî şerê ha de – hindik bûn, lê 15 şervan ji Kîkan – hatin dîl kirin, Piraniya wan – ji bereya Azîza bûn, û tivingên Berno ji hinên din – hatin standin, û piştî riswakirinê hatin berdan. Û di wê rojê de, li rojavaya girê Qayinê (Ênil'Ebid) – şervanek ji Şerabiya – hat kuştin, û yek dîl bû. Şayenî gotinê ye ku malbata Mehil, ji Ebû-Hemdana, sê dîlên Kîkan – parastin, ji Seho ew ê ku dixwest wan bikuje.

4- Şerê Sefawî yê duwemîn: Kîkan, piştî şerê Hessikê û şerê Sefawî yê pîşîn – şermezar bûn, û li ber xwe ketin, û xwe dan ser hev ji bo ku tola xwe bistînin, û hevbnedên xwe – gurêx kirin. Şerabiya amadebûna xwe dan xuya kirin, lê hoza Herba – guh nedan Kîkan, Îsa yê 'Ibêdo yê Herb tinazê xwe bi Kîkan kir, û got: "Kîkan dê carek dî tivingên Ecemî (Berno) – bidin Beggara". Piştî 4 meha ji şerê Sefawî yê pêşîn, Kîkan û hevbendên xwe, li diyarên rojhilata Perpere civiyan, û Beggara li qefa yên Sefawî û Şûniyê –civiyan. Gava berpirsên desthilata Sûrî, xurtî û hêrsa Kîkan dîtin, bi du zirihpoşan ketin pêşiya wan, xwestin Kîkan bi şûnde vegerînin, lê şervanên Kîkan guh nedan zirihpoşan, û

efserekî zirihpoşan Zekeriya Çerkesî û leşkerekî wî – hatin kuştin, û êrîşa Kîkan pêşve çû, û carek dî, herdû alî – li Sefawî gihan hev, û Beggara şikestin, û nêzîkî 30 kesî ji wan hatin kuştin, û tar û mar bûn. Û pişt dan, ta di çemê Xabûr re derbas bûn, û li deverên rojhilat û rojavaya Sefawî jî, Beggara şikestin. Şayenê gotinê ye Hisênê hecî Derwêş û hin gernasên din, di vî şerî û şerên din de, ji cenga Beggara û Kîkan –nav dan, tev ku serketin bi qehremaniya şervanên hozê teva bû. Hisênê hecî Derwêş kesayetiyek berçav bû, ji nav Kîkan û bereya Azîza, Bîrewer û millet- perwer bû, gelek arîşeyên hoza Kîkan çareser dikirin, bi hişmendî. Û li servî şerê ha, stiranek, li ser hişên wê gavê – kete nav zimanên stiranvanan, perçeyek ji wê stiranê ev e:

"Hêdî bajo, hêdî bajo l' me fermane
ew fermana cara hane
pir qidoş û pîs fermane
wek fermana cara hane
Li Koxik û li Perpere,
li wan cara (diyara)
bavê Emşa* 'igal xwehrkir,
da ber suwara".

(*Bavê 'Emşa navtêdana Hisên ê hecî Derwêş e.)

Herwiha ji wan şervanên Kîkan yên mêrxas, ev ên han bûn: hecî Salimê Kosekî, Ehmedê hecî Mehmûdê Azîzî, Yûsifê Îsa yê Xelecî, Ferhanê Îso ji serekên Azîza...û hinên din jî dibe ku ew ji van gernastir bin.

**5-** Şerê çemê Zirganê: Di sala 1945 de, carek dî Beggara – vegeriyan, û desthilata Sûrî, Çal-avek (bîr) ji wan re, li

nêzîkî girê Qayinê – kola. Û bi behaneya li hev anîna kîkan û Beggara, di serê havîna 1945 de, civînek pêk hat, ji berpirsên desthilatê; Hilal, kaptên Qasim, û Lamendî yê Firensî, da serperiştiya lihev-anînê bikin. Nûnerên Kîkan Sima'îl ê hecî Derwêş û hecî Mensûr bûn, û nûnerên Beggara Raxib ê Beşîr û Xalid ê Tella'i bûn. Ev tev de, li nik leşkerê Heccana, li gundê Witwitiya li Zirganê – civiyan,û biryara lihev hatinê dan. Di

Di roja duduwa de, serekên Beggara Es'ed ê Beşîr, Xalid ê Tella'i, Hecî dawud – hatin gundê Sefer, bi mihvanî, li nik Sima'îl ê hecî Derwêş, lê digel van civînên li hev hatinê, Beggara bi serdariya Hecer ê hecî Dawud û Mihimed ê Temra – ji nişka ve êrîşî Şerabiya kirin li Witwitiya, û ew şikandin û Şerabiya xwe dane alîkî, bê berevaniyek jê bête gotin. Êrîşa Beggara pêşve çû, li dirêjaya çemê Zirganê, ta gihişte devera Herba, ew jî şikestin û berbat bûn. Kîkan dereng nûçeya wê êrîşê bihîstin, û ji ber vê yekê, hana wan hindik bû, bi 70–80 suwaran bi tenê bû, lê bi egera rêzbûna suwaran li pey hev, dûmana wan pir xuya dibû. Hana Kîkan gihişte pêşiya qewxeyê, li gundê Pisîs, di vê hanê de, çend suwarên Bereya Remaka, û çend suwarên Koseka – hebûn, û piraniya mayî ji Azîza bûn. Mela Hesen, yek ji serekên Herba pêşwaziya hana Kîkan kir, û nav di Hisên ê hecî Derwêş da, û got: "ka Ebû 'Emşa? Ka Hisên? ta namûs jî çû!. Hisên li wî vegerand: "Amade ye, li hember çavê te ye". Û hana suwarên Kîkan, yekser êrîşî Beggra kirin, û dane ber xwe, ta ew gihandin Tilwerd, bi qonaxa 10 k. m. û şervan ên Beggara – hatin peritandin û pirtir ji 30 kesî ji wan – hatin kuştin, û wê hana Kîkan tola 18 kuştiyên Herba, û duduwên Koseka, û yekî Remakî – standin. Û carek dî, Beggara vegeriyan başûrê Xabûr.

Di vî şerê ha de, piştî hate nasîn ku Beggara şikestin, hecî Hedla hevjîna hecî Derwêş serekê Azîzan, û Nofa Evdirrehman hevjîna Ferhanê Îso ji serekên Azîza, van herdû jinên resenzade, teksiya Ebbûd Bedro bi kirê girtin, û berê xwe dan hola şer li Til werd, ewa ku dûr bû ji

cihnişînê wan, bi 40 k. m, û li pêşiya şervanên Kîkan rawestiyan, û ji wan xwestin ku ji ser pişta şervanên Beggara vegerin, û herduwa gotin: "Herwekî em naxwazin hûn bêne kuştin, wiha jî, da û xwehên şervanên Beggara jî – naxwazin ku bav û birayên wan bêne kuştin. Em dê xwe bixin bin simên hespên we, eger hûn ji ser pişta wan ne vegerin. Bese şer û kuştin"!.

Şervanên Kîkan naçar bûn ku şer û li peyçûna Beggara rawestînin, ji bo rêzgirtina van herdû keçên bavan, û bi şûnde vegeriyan. Ev e sincê jina Kurd ya bilind-nijad û dilovan, ew a ku berevaniyê rewa û erk dibîne, lê sitem û zordariyê – na pejirîne. Ne wek wan jinên ku li pişta şervanên xwe yên zordar radiwestin, û halanan di wan de hil didin, û piştî ew şervanên zordar têne şikandin, ew jinên piştgirên wan dibin dîl, û têne girtin, û li ber rûmeta xwe na kevin û naparêzin.

Di encama vê cenga du sale de, pirtir ji 70 kesên Beggara, û 50 kesên Kîkan û hevbendên wan – hatin kuştin, û dawî li wê cengê hat, lê pîlan û dekên konevan û desthilatdarên şovînî, ta nuha jî – dimînin.

Em dê hindekî vê berevaniya rewa ya hozên Kurd li devera Cizîrê, li hember van hersê hozên Ereb, Şemmera, Cubûrya, û Beggara – bi nerxînin. Ev her sê hozên mezin ku bûn amêr ji

desthilata Sûrî re, dijî hozên Kurd li Cizîrê, ew ên ku li hember wan rawestiyan, û berevaniya xwe û gundên xwe û rûmeta xwe kirin, û ew parastin, bi nîşana ku ev her sê hozên Ereb yên mezin, digel Piraniya wan, li gorey wan hozên Kurd ku dixwestin zordariyê li wan bikin, dekên wan hozên Ereb

li wan vegeriyan, û hatin şikandin. Û rast-goyên wan hersê hozan, vê rastiyê bi cih dikin û dibêjin: Wan hozên Kurd, digel hindikbûna xwe, bi merdî û çelengî, maf û xak û rûmeta xwe – parastin. Her wekî ji mêj ve, bi hezarên salan, li hember sitemkar û zordaran rawestiyane, di demên Horî yan de, beriya çar hezar sal, gava payetextê wan, li Orkêş (Girê moza, li devera Amûdê) bû û xwedî-ferman bûn li navbera Ferat û Wanê. Her wiha di demên Mîtaniyan de, Ku fermandar bûn li tevaya deverên Cizîrê û bakura Sûriya, beriya 3500 sal. Her wiha ji demên Mîdiya û Keyxusro de, beriya 2500 sal, ew ên ku fermandar bûn, li ser hemî deverên ku îro Kurd li wan niştecihin. Em dê li ser van teva bi axivin, di cihê babetên wan de.

Lê di van demên kambax de, bi egera gûrbûna bayên konevanî, dijî kêşeya Kurdî, û di bin destê fermandariyên şovînî û piroje û yasayên regezperest de, Kurd ji asta xwe daketine û ma ne bindest. Lê digel van teva, berxwedana gelê me, ne rawestiya ye, ta ku zincîrên zorê bêne perçivandin.

# Zincîra pîlanên li ser devera Kîkan

Qulpên wê zincîra regezperest – li pey wê lihevhatina Kîkan û Beggara:

**1-** Tomarkirina beşekî mezin, ji devera Kîkan, li ser wan hevbendên Kîkan yên Ereb, ji Herba û Şerabiya û Şemmera, ew ên ku hevbendiya wan jî – dek û pîlan bû, ji desthilata Sûrî:

**A-** Pênc-şeş gundên Herba, bi tenê – li ser çemê Zirganê bûn. Desthilata Sûrî, deverek fireh li herdû aliyên Zirganê, ji devera Kîkan – li ser Herba tomar kir, bi pehnaya 10 k. m. û dirêjaya 25 k. m. û da wan.

**B-** Şerabiya li başûra çemê Xabûr bûn, desthilata Sûrî, ji her dû alî yên çemê Zirganê, bi pehnaya 15 k. m. û bi dirêjî ya 25 k. m. li ser wan tomar kir, û da wan. Tev ku devera Zirganê tevde – beşek bû ji devera Kîkan, çikû berî 300 sal, Kîkan devera çemê Zirganê, ji hoza Zirrika stand in, piştî şerekî xwînrêj, di navbera her duwan de. Û gundê Girê Mîr cihnişînê Mîrê Zirrika bû. Û ta nuha jî, Hoza Şemmera çemê Zirganê – nav didin "Zirreg" ango "Zirrek" li ser navê wê hoza Kurdî ya li vê deverê bû.

**C-** Desthilata Sûrî, devera Sêgiran, bi dirêjiya 8 k. m. û pehnaya 7 k. m. li ser Şemmera Tomar kir, û da wan. Ji ber ku ev her sê hoz – hevbendên Kîkan bûn, di cenga Beggara û Kîkan de, Kîkan ji şerma – naçar bûn ku wê tomarkirina regezperest, bipejirîn in, û hem xweş ne dîtin ku rezm û şerekî dî dijî hevbendên xwe yên berê – vêxin.

**2-** Qerebokirina (te'ewîd) Beggara, du car û sê car, piştî lihevhatina wan û Kîkan, li ser wan gundên devera Kîkan ku desthilata Sûrî, li ser Beggara tomar kiribûn, tev ku ew gundên han, ji devera Kîkan bûn, ji demên bav û kalan de.

**3-** Zordariya desthilatê li hecî Derwêş û naçarkirina wî ku gundê Til bênder û yên hawîr wî, bi rûberê 7- 8 hezar hiktar – bifiroşe Xalidê Tella'i yê Ebû Mi'îşî, bi buhayê 4500 L. S. çikû desthilatê piştgiriya Xalidê Tella'i dikir.

**4-** Bêparkirina cotkarên Kîkan, ji hezarên hiktaran ji xakên devera "Qesrikê" û belavkirina wê deverê li ser Durûzên Colan yên gumanbar bi nokeriya Isra'îl, ew ên hatin mişext kirin, ji parêzgeha Qinêtra, bi wê egerê. jibilî beşên ku EbûMi'îşa û Şerabiya û hinên din – ji xakên Qesrikê birrîn.

**5-** Jibilî piroje û yasayên regezperest, bi amanca çewsandina Kurdên Sûriya, wek Çembera Erebî, jimara Awarte ya sala1962, yasaya "Islahizzira'î"…ku para devera Kîkan, ji sitema wan – giran bû.

# Belge û nîşaneyên akincîtiya Kurda ya dîrokî li Cizîrê

**1-** Til Koçer: Ev bajarê ku ava bûye berî çarhawîra xwe, û nuha tête navdan Ye'erubiye – dikeve başûra Dêrika Hemko bi nêzîka 45 k. m. û ji demên kevnar de, tête navdan, bi xwedîtiya Koçerên Botan – ji devera hawîr wî girê kevnar re. Lê nuha, bi piştgiriya desthilata Sûrî, Ereban ew dever girtine, ta 8 - 10 k. m. li bakurê vî girê ha. Ya seyr ew e ku Ereban, ne kurda, ew nav bi zimanê Erebî li wî girî kirine!. bi wateya ku ev dever ya Koçera ye.

**2-** Deşta Hesinan: Ev deşt jî, ji demek dirêj ve – hatiye nasîn bi navê hoza Hesina, û nuha jî piraniya akinciyên wê – ji vê hozê ne, digel hin Kurdên din. Bajarê devera kargeriya vê deştê – Dêrikaka Hemko ye, û nuha tête nav dan "Malikiye", her wiha tevaya gundên li hawîr wê jî, navên wan hatine Erebkirin, û piraniya xakên vê deştê –bûne zeviyên desthilata Sûrî, û hin gihane Erebên Selemiyê û Reqqa yê. Û piraniya Kurdên niştecih li wê deverê – ji wan xakan bê par in, û têne navdan "Ecnebî" ango biyanî.

**3-** Pira Demir koprî: ew pira hesin ya ku li ser çemê nêzîkî ÇilAxa bû, ew a ku rojhilatnasê Ingilîzî, Cêms Bingham, beriya 195 salan – li ser wê gotiye: "Niştecihên wê deverê

tevde Kurd in". Îro jî Kurd li wê deverê ne, lê navê ÇilAxa bûye "Cewadiye" û navên hemî gundên, li wê deverê –

hatine Erebkirin, û xakên wê, bi piroje û yasayên regez-perest yên desthilata Sûrî – gihane Erebên Reqqayê û hin Erebên deverê, û piraniya Kurdên akincî li vê deverê – bê par ma ne, ji xakên wê, û têne navdan "Ecnebî " ango biyanî.

**4-** Çemê Hezavî (çemê Redd): Ev çem berê çem bû, bi saya avên çemê Tirbesipiyê û çemê Çil A'xa, û çemê Girê pirê ku hersê dadiketin ser çemê Hezavî (Redd), û bi ava van her sê çemên biçûk, Çemê Hezavî dibû çem, lê îro, navê Hezavî bûye "Redd" û her sê yên din ma ne bê nav. Diyare ku navê Hezavî Kurdî ye, û devera wî jî – Kurdî ye. Û piraniya cotkarên Kurd yên akincî li wan deveran, ji hozên Abasa, Aliya û Dûrika… ji xakên wan deveran, bê par in.

**5-** Gundê Dugirê û Sinceqa Xelef A'xa Ev her dû dever, "Cêms Bingham" li ser wan axiviye û beriya 195 salan, gotiye: "Akinciyê wan devera teva – Kurd in". Lê îro, piraniya cotkarên Kurd yên akincî li wan devera, ji hozên Sinceqê û Tirbesipiyê – ji xakên wan devera bê par in, û ew xak gihane Erebên devera Reqqayê, li gorey Çember a Erebî û yasayên regezperest.

**6-** Kewkebê Millan: Ev girê bilnd û mezin yê volkanî –dikeve rojhilata bajarê Hesekê, bi 7 k. m. ev girê nîv çiya– bi navê Millanê Xidir A'xa, tête navdan. Ev nîv çiya, xwe li hember çiyayê Şingalê, û Çiyayê Mêrdîn û çiyayê

Evdil'ezîz ê Geylanî – dide xuya kirin. Û Her wiha,dide xuyakirin ku hoza Millan ya Kurd – kevnare li vê deverê.

**7-** Til Mecdel: Ev gir bi navê neviyê heftemîn yê Xidir A'xa tête navdan, û dikeve rojavaya bajarê Hesekê, bi 8 k. m. di navbera çemê Xabûrê Serê kaniyê û çiyayê Evdil'ezîz ê Geylanî de. Erebên wê deverê, Mecdel nav dikirin "Ra'î-

errîmat" ango xwediyê asikan (xezalan), Mebest ew e ku devehên wî wek asikan, spehî bûn.

**8-** Qubbet Birahîm: ango kunbeda gorra Birahîm, ev Birahîm navê yekî ji neviyên dûr, ji neviyên Xidir A'xa ye. Ev kunbed dikeve rojhilata Kewkebê Millan, bi 15 k. m. Ereb ên wê deverê, li ser wê kunbedê digotin: "Gebril me'elûg" ango gorra yê hatiye sotin. Ev peyv nifrîn bû, li ser Birahîm A'xa, bi wateya ku wan Ereban dixwestin ku Birahîm, bi agirê Dojehê bête sotin, çikû wan gelek sitem ji destê wî dîtibûn. Ev her dû şûnwar, dîrokiya hebûna van Kurdan, li wan deveran – xweş didin xuya kirin.

**9-** Çiyayê Evdil'ezîzê û Lehîgeha Sînka:

A- Ev çiya dikeve başûrê Xabûr, li navenda pîrozgeha şêx Ebdil'ezîz ê Geylanî, Kurê şêx 'Ebdilqadir ê Geylanî, damezranerê rêbaza Qadirî ya Sofî. Geylan gundek e, Li Kurdistana Iraqê ye.

B- Lehîgeha Sînka – newaleke li devera çiyayê Evdil 'ezîzê ye, û hatiye navdan, bi navê hoza Sînka ya bi serKîkan ve.Vê hozê, li wê deverê –tarişê xwe diçêrandin, û ji nişka ve, lehiyek ji wê newalê hat, û Sînka û tarişê xwe – ketin ber wê lehiyê, û ziyanek mezin giha wan û tarişê wan. ev herdû şûnwar belge ne– bo dîrokiya hebûna Kurda, li wan deveran.

**10-** Gundê Gozeliyê û "Cilîbil A'xa":

**A-** Gozeliyê gundeke li nêzîkî Xabûrê Serê kaniyê ye, ji başûrê rojava ve, li hembera Serê kaniyê.

**B-** Cilîbil A'xa (ango bîra avê ya A'xê): Ev çala avê li qontara çiyayê Evdi'ezîzê ye. Ev herdû şûnwarên kevnar, bi navên Kurdî yên hilbijartî, bi awakî xuya dibin belge, bo dîrokiya hebûna Kurda, li wan deveran.

**11-** Kepezê Kîkan û Girsorê Kîkan:

**A-** Kepezê Kîkan – bilindiyek keviriye, nîv çiya ye, dikeve başûra Mêrdîn, bi 20 k. m. û li ser pişta wî, xak raste û tête çandin. Bilindiya wî alîkare bo dîtina devera Kîkan tevde (75 k. m. di 70 k. m. de). Gav agir li ser wî vêdiket, bi şevê – ji hoza Kîkan teva xuya dibû, û dibû gaziya giştî.

**B-** Girsorê Kîkan, li başûra rojavaya Amûdê dikeve, bi 30 k. m. Ev her dû şûnwar, digel hinên din – belge ne li ser firehiya devera Kîkan, di demên berê de, û hem li ser dîrokiya hebûna Kurdên wê devera fireh.

**12-** Çemê Zirganê: Ev çem ji jora devera Kîkan, ji kaniyên Xursê – der dibe, û ava wî ber jêr dibe. Di van salên dawîn de, ev çem, ji ava kaniyên Xursê – bê par bû ye, û di cihê wê ava kaniyan ya paqij de, êdî ava ne pak, ji zeviyan dizê û dikeve çemê Zirganê. Ev çem tête navdan bi navê hoza Zirrika ku beriya pirtir ji 300 sal, li ser çewlîkên vî çemî niştecih bûn û gelek gund û avahî – çê kiribûn. Navend ên giring yên vê hozê, li ser çemê Zirgan ê– ev in: Girê Mîr, Girê Mîrza (Til diyab), Kesra, Erradê… Dijminahî kete nava Kîkan û Zirrika, û Zirrika şikestin, û naçar bûn ji Zirganê Mişext bibin. Ta nuha jî, hin bereyên Zirrika li nav Kîkan dimînin; wek Birîm zerka, Malbata Nasirê Elî, Kurdika ,Şûrtaziya… Diyare ku ev ên han – ne ketibûn wê dijminahiyê.

Ji stiranên folklorî, tête naskirin ku piştî mişextbûna Zirrika, ji çemê Zirganê, bi egera dijminaya kevn û bi gurêx kirina Osmanliyan, cengek giran di navbera Kîkan û Zirrika de –vêketiye, bi navê cenga Kemala, li deşta Amedê. Û di wê cengê de, ji herdû aliya sed û yek cengawer – hatine

kuştin. Paşê gava herdû hoz – li hev hatin, kuştiyên xwe xistin ber hev, û xuyabû ku kuştiyên Kîkan, bi yekî pirtir bûn, ji yên Zirrika, û Kîkan xwîna Berdewîlê Sînkî sitandin.

Ji wan stiranan, tête nasîn ku Dellu Mîrxanê Kîkî, bi gurêx kirina Osmanliyan, ew cenga Kemala vêxist. Mixabin, di wê cengê de, du cengawerên çeleng û bi nav û deng – hatine kuştin, Boz Begê Zirrikî û Osmanê Elî Xan yê Kîkî, van her dû gernasan, bi hev re – hevdû kuştin. Osmanê Elî Xan, ew bû ku bi tena xwe, keçek Kîkî, bi navê Şêrê – rizgar kiribû, ji nav destên birrek leşkerên Osmanlî.

**13-** Devera Qesrikê: Ev devera fireh û bilind – bi ser çar hawîra xwe dikeve, û li hawîr wê, bilindiyek qefa yên kevirên reş – heye. Li kopika Qesrikê, qûça Cellokiyê, bi pozbilindî, li hember Kepezê Kîkan–xuya dibe. Ew zincîra qefa yên li çar kenarên Qesrikê –didin xuyakirin ku ew, wan xakên Qesrikê yên behredar–diparêzin!. Di navbera wê zincîra qefa yan de, deştek fireh û hin bendên kevirî jî hene, bi rûberê 15 k. m. di 1o k. m. de. Newala Kewê, ji jora Qesrikê, bi aliyê çemê Xabûr de – ber jêr dibe. Û li aliyê bakurê rojava, newala Cilfika ya ku nuha tête navdan "Ênil'ebid" – berê xwe dide rojava, ta nuha jî, di salên bi baran de, kaniyên avê li vê newalê der dibin û di ber Girê Qayinê re – ber jêr dibin.

Qesrik, ji bakur de, ji qefa yên gundê Kevra û Til bêder – dirêj dibe, ta qefa yên Şûniyê û Girê Qayinê. Û ji rojava de, ji Girê Qayinê, ber jêr dibe, ta qefa yên pişta pozê qefa Devebûyînê (Rugube). û ji başûr de, ji wan qefa yên pişt Rugube, bi aljyê rojhilat de – dirêj dibe, ta qefa yên Newala Sor. Û ji rojhilat de, ji qefa yên Newla Sor – ber jor dibe, ta Qefa yên Til bêder û Kevra.

Ev devera xakên fireh û behredar ji çandiniyê re, ji hezarên salan de, ji demên Mîtaniyên Kurd de– cihnişîna Kîkan e, îro cotkarên Kîkan û Kurda – ji wan xakan bê parin, û zorbeya wan xakan – gihane Durziyên Colanê, ji Parêzgeha Qinêtra û Erebên hoza Ebû Mi'îşa û hoza Şerabiya, li gorey yasayên regezperest û şovînî yên desthilata Sûrî, û bi encama ezîtiya Malmezinên Kîkan, bê guhdana berjewenda giştî.

Em dikarin bêjin mezintirîn ziyanên sitema şovînî li ser Kîkan ev in:

**1-** Çembera Erebî ya bed nav.

**2-** çûna Qesrikê ji destê Kîkan.

**14-** Hebûna Êzîdiyan li deverên Kurdî li Sûriya:

**A-** niştecihbûna Êzîdiyên Mûsêsana li devera Dêrika Hemko, beriya hozên Koçer û Hesinan.

**B-** hebûna Êzîdiyan li deverên Hevêrka.

**C-** hebûna Êzîdiyan li deverên hozên Millanê Xidir û Millanê Paşê.

**Ç-** Hebûna Êzîdiyan li devera Çiyayê Kurmênc.

Ev hebûna Êzîdiya belgeye bo dîrokiya hebûna Kurdên Sûrî, bi sê reng an:

**1-** Belgeye bo kevnariya ola Zeradeştî li nav Kurdan, û bi encam kevnariya hebûna Kurda, li vê deverê.

**2-** Belgeye bo tundiya baweriya Kurda, çikû ev baweriya bi olê û bi neteweyê Kurdî her duwan, bi hezarên salan, li nik Êzîdiyan cih girtine, û li nav neteweyê xwe ma ne, digel hilgirtina sitem û zorê.

**3-** dibe belge ku hestê netewî ne kêmî yê oldarî ye.



Xatûnek Êzîdî ji devera Hesekê bi kêsima folklorî



**Du kesyetiyên malmezin ji kurdên Êzîdî**
**ji devera Heskê**

# Hoza Beraziya

Hoza Beraziya hozek Kurdî mezin e, û ji mêj ve di nav Kurdan de, hatiye nasîn. Ev hoz, ji berî sêsed û pêncî salî de, li deşta Sirûcê û deverên çar hawîr wê – bi cih bûye, û dest daniye ser deverek firh û dirêj. Devera wan, ji aliyê bakur ve, ji bajarê Bêlacîkê (li ser millê çemê Ferat, li parêzgeha Urfayê) – dirêj dibe, û berjêr dadikeve, ta keleha Ce'eberê (ew a nuha di nav deryaçeya "AvbendaTebqa" de ma ye li sûriya). Û ji keleha Ce'eberê û li hember wê, bi rojhilat de, dirêj dibe, ta digihêje çemê Bilîx, sînorê surişţî yê navbera Beraziya û hoza Millanê Paşê. Hem ji aliyê bakur ve, ev herdû hoz dirawsê yên hev in, li navbera Bêlacîkê û Wêran şarê. Û gelek pêwendên hozdarî û hevbendî di nava wan de hebûn, û pir caran têkilî hev jî dibûn.

Li vê devera Beraziya, li Sûriya, nêzîkî 340 gundan hene, jibilî niştecihên bajarên Sûrî û yên dervey walat. Li rojavayê devera Beraziya, bi egera dema desthilatdariya Osmanlî, hinek Tirkuman – bi cih bûne, û çend gund, li nêzîkî çemê Ferat, ji xwe re – girtine.

Hoza Fed'ana ya Ereb, li jêrî devera Beraziya hebûn, Lê ew koçer bûn, û di piraniya çaxên xwe de, li "Şamiya" li jêra çemê Ferat diman, û kêm caran nêzîkî devera Beraziya dibûn.

Beraziya, ji bav û kalên xwe naskirine ku ew, ji devera Bêreqdarê, ji zozanên jorîn – hatine. Bêreqdar ya ku nuha

tête navdan Qereyazî. Ew dever dikeve navbera Xinûs û Toqadê, ji rojhilat de hoza Hesena, û ji bakur de devera Kose Hesen, li Erziromê û hoza Cemaldîna, û ji başûr de, devera

Bolanlixê û parêzgeha Mûşê, û ji rojava de, devera Mûradê û Bîngolê. Li devera Bêreqdarê du gelî hene, berê dihatin navdan, bi navê "Geliyê berazan" û "Geliyê kudikan" Ev herdû gelî cihê hoza Beraziya û bereya Gêtika yên kevnar bûn ku ji wan cihan mişext bûn, û hatin devera ku nuha li wê bi cih bûne.

Bereyên serekî ji hoza Beraziya Ev in:

Pîjan, Gêtika, Şedad Mêlekan, Şêxan, Eledînan, Mîran, û hinên din. Her bereyek ji vana şax da ye û pir bû ye, û gelek çuqulîkên wan çê bû ne, wek van çuquliyên tên: Ox, 'As, Qirîş, Mirkîş, Elî zer, Mi'ef, Bilindan, Elîcan... t.d. Hin malbatên Beraziya, ji devera xwe dûr ketine, û li dever ên din bi cih bûne. Hin malbatên Berazî ji bereya Mêlekan, berî 130-140 salî çûne bajarê Hema û hawîra wê, û li wê deverê niştecih bûn û gihiştin payeke civakiya bilind. Malbata Muhsin Berazî, serek şalyarê Sûrî yê sala 1949 an – yek ji wan malbata ye. Piraniya gund û zeviyên vê malbatê, li devera Hema yê, bê dilovanî, û bi desthilatek kîndar, ji wan hate standin, bi talanî. Her wiha malbata Bermeda yên ku ji mêj ve, li devera Harim – bi cih bûne, û gihiştine pileyek rêzdar û bilind, li wê deverê. Ew jî ji bereya Mêleka ne, lê piraniya van malbatan – ji taybetiyên xwe yên netewî dûr ketine û hatine pişavtin.

Beriya 120 salan Beraziya û Fed'ana, li Girê qîza ketin şer û li hev dan. Fed'ana di vî şerî de – şikestin û nizîkî 70 kesî ji wan – hatin kuştin, û sed hesp ji wan – hatin standin, û gelek tarişê wan jî – hat talan kirin, û piştî dan û standinê derbasî aliyê dî, ji Ferat – bûn. Giraniya barê vî şerî li ser millê Gêtika bû, û wan jî, bi jêhatîbûn ew bar hilanîn.

Êla Biraq, ji Tirkimanên ku Osmanliyan, ew xistibûn nava çavên Beraziya, li ser millê çemê Ferat – gelek caran, bi gurêx kirina Osmanliya, destdirêjî dikirin, û hin caran cotkar û şivanên Beraziya dikuştin. Di nav re carekê, gernasek ji bereya Gêtika jî – kuştin, navê wî gernasî hecî Elî yê 'Eba – sork bû, û ew di nav hoza Beraziya û hawîrê wê de, xwedî rêzek civakî û rûmetek bilind bû. pir salan, wî parastina Hecaciyan yên ku serdana mala Xwedê dikirin –li xwe digirt û ew digihandin Mekke û Medîne yê, û vedigerandin bê tirs û ziyan, tev ku ew qona'x gelek dirêj bû, û rê ya wê bi tirs bû, û keleş û diz û rêbirr – têde pir bûn, lê wî bi mêrxasî û gernasî û rûmeta xwe, Hecacî diparastin.

Bereya Gêtika pir li ber wî gernasê xwe ketin, û li tolstandina wî geriyan, ta ku carekê 'Etê Mûsê (yek ji gernas û malmezinên Gêtika bû) 19 suwarên Biraqan girtin, û yek bi yek ew kuştin, û 18 termên wan rêz kirin, lê gava hespên wan jimartin, û dît ku ew 19 hesp in, nas kir ku suwarekî Biraqan – xwe nepenî kiriye. Zû zû li wî geriyan û ew dîtin û gihandin hevalên wî.

Gelek caran, hoza Beraziya, li ber Osmanliya rabûne, û ne diçûn cengên di berjewendên Osmanliyan de, û pir kesên Beraziya – ne diçûn leşkeriya wan, û bacên salane jî – ne

didan wan. Osmanliyan jî êrîşên leşkerî di anîn ser Beraziya, û serekên wan digirtin û hin ji wan dikuştin, wek kuştina Hemê Mûsê û girtina hin birayên wî.

Carekê dijminayî kete navbera Mêlekan û Gêtikan, û dijîtî

di nav wan de – gûr bû. Bereya Şêxan kete navbera wan, da ku wan li hev bîne, lê dijminayî sar ne bû, û agirê wê gûrtir bû. Digel vê jî, her wekî hatiye gotin: "Xwîn na be av" her dû alî, bi wê dijminayê kuldar bûn. Piştî demekê, Eyyûb ê Temir Paşa yê Millî–kete navbera wan, û ew li hev anîn. û xwîna kuştiyan jî – ji cem xwe da.

Li ser vê bûyerê tête gotin; ku serekekî Millan, carekê ji serekekî Beraziya dipirse; Ma mêrxas li cem we hene? Û gava serekê Beraziya navên mêrxasan ji wî re rêz dike, serekê Millî li wî divegerîne û dibêje: Ez ne pirsa van mêrxasan dikim, ez pirsa wan mêrxasan dikim yên ku dikarin du êlên dijî hev – ji ber hev rakin, û wan bigihînin hev û wan li hev bînin.

Hoza Beraziyan û Millan dirawsê yên hev bûn, hin caran, ne xweşî dikete navbera wan, lê çi caran ceng û dijminaya kûr, di navbera wan de – çê ne dibûn. Û hoza Millan û serekên wê dilxwaz û alîkarên Beraziya bûn, di tengayên wan de, û her wiha Beraziya rêz ji Millan û mal mezinên wan re – digirtin. Hevbendiyek taybetî di navbera Gêtika û Êzîdiyên Millan de hebû, di tengayê de, alî hev dikirin. Ev hevbendî dide xuya kirin ku kargeriya cudayîya olê, li ser hevgirtin û alîkariya Kurdan ji hev re – nîne, çikû têgihiştin û baweriyên netewî xurt in. Ji alîkî dî ve, ev hevalbendiya van herdû bereyên ku her yek ji hozekê bû – bi amancek dî ve jî –girêdayî bû ku

amanca xweparastina ji zordariya mal mezinên herdû hozên giran, çikû serekên van herdû hozan (malbata Paşayê Millan û malbata Şahîn malmezin û serekên Beraziya), hin caran destdirêjî li bereyên hoza xwe dikirin, û pêwendên di nav

hozê û bereyên wê de û berjewendên giştî –jibîr dikirin, li hember berjewend ên taybet.

Ta van salên ne pir dûr, ew devera fireh – di bin destê Beraziya de bû , wan ew dever ji bo çêreya pez û tarişê xwe – diparastin, û devera çandiniyê, di wê demê de hindiktir bû ji ya nuha, lê di van sal ên dawîn de, qada çandiniyê firehtir bû û gelek gund ên nuh ava bûn, û devera di destê Beraziya de bû, hinek ji wê, ji aliyên rojhilat û jêrîn de – ji destê wan der ket, çikû desthilata Sûrî dest da ser, û li hin Êl ên Ereb an belav kir. Nuha, devera Beraziya, ji aliyên jêrîn de, Digihêje Gundên Girik, Xatûniyê, Kepirê repin, Til hede û Omerek, ew ên ku dikevin başûra Kobaniyê bi qona'xa 50 - 65 k. m.

Navendên Beraziya yên kevnare, ew ên ku ji wan dest pê kirine, û li wê devera fireh belav bû ne – ev in:

**1-** Navenda bajarê Kobaniyê ku nuha fireh û mezin bû ye, û gihiştiye kaniya Mişed û kaniya Ereban.

**2-** Navendên Mêlekan; wek gundên: Şêran, Helenc, Şeran û Til Hacib…t. d.

**3-** Navedên Şêxan; wek gundên: Çelebî, Yarilî, Bozik.. t.d.

**4-**Navendên Gêtikan; wek Gundên: Til xezal, Xezîne, Mexrec, û Tefşo, Rovî…t. d.

**5-** Navendên Şedad; wek gundên: Xerab naz, Elî şar… t. d.



Sê zeriyên Kurd ji devera Kobanyê





Ev her du lewendên devera Kobanyê
Du kêsimên Folklorî didin xuyanî

# *Çiyayê Kurmênc(Kurd da'x)*

Ey çiyayê nemir û dîrokî, Ey keleha xwe-ragirî û jiyanê. Roman û Yûnaniyan– tu dager kirin, û nîşanên şehristaniyê – dan te, dawiyê bar kirin, û tu ma çiyayê Kurda.

Tirk û Ereban, tu bindest kirin, demek dirêj, û navê te – guhertin, û tu nav dan "Kurd dax" û "Ceblil Ekrad" lê wan nizanîbûn ku navê te mezintir bû, û di cihê Çiyayê Kurmênc de, tu bû çiyayê Kurda teva. Pûtperest, pir xudawend, Cuhû, Filleh û Musilmanan – xwestin baweriyên te biguherin, lê tu ma tund, li ser baweriya yekîtiya Xudawendî û çirîska Zeradeştî, û Êzîdîtiyê ew vêxistî hişt, û qîma te – ne hat ku bawerî û rewişt û têgihiştinên te yên resen winda bibin, her wekî te nepejirand ku nijadê te winda bibe.

Ey çiyayê hêzdar û xurt, dilnexwaz û regezperestan xwestin, te biçûk bikin, û navê te ne hêlin, xwestin navên "çiyayê hewarê "Çiyayê Bilal, Çiyayê Bilê, Çiyayê Meydana, Çiyayê Perse Xatûn, Çiyayê şêx Berekat, û Çiyayê Lêlûn – teva bê nav bikin, û giştiya wan nav bidin "Devera 'Ifrînê" bi tîpa Erebî. Lê Kurên van çiyayên navdar, û gelê Kurd li pişt wan, ta ku hebin, na hêlin ev navên  reha wan kûr, û hêma yên hebûna Kurdî ya netewî – winda bibin.

Çiyayê Kurmênc, hin caran tête navdan, bi navê Efrîn, bajarê navendî û mezin li devera vî çiyayî. Sînorên Çiyayê

Kurmênc, ji rojhilta bakur de, devera Killis. Û ji rojhilat de, deşta Meng, û deşta Tel Rif'et. Û ji başûr de, deşta Etarib. Û ji rojava de, deşta 'Umq (berê deryaçe bû, bi rûberê 220 k. m. çargoşe). Û ji bakur de, deşta Lêçe ya volkanî ya ku berê, beşek bû, ji Çiyayê Kurmênc û nuha di bin destê Turkiya de

ma ye. Û bi vê deştê sînorê Çiyayê Kurmênc – di gihişte nêzîkî Deryaya Sipî ya Navendî, bi 20 k. m, li nik gundê Bayasê. Û li pişt sînorê Turkiya, li bakura rojhilata Çiyayê Kurmênc, bajarê Killis –xuya dibe. Ew bajar berê navenda kargerî bû, ji fermandariya Mîrnişîna malbata Canpolat re, ew ên bi nijadê xwe kurd in, û ji ber zor û çewsandina Tirka, bi egera ku Durzî bûn– mişext bûn, bi aliyê Libnan de, bi dostaniya digel malmezina Mîr Fexriddîn ê Me'enî.

Ev Çiyayê spehî û bengîn, çiyayê Kurmênc, cihê geşbûna dilên cuwan û evîndaran, û siroşa dil û hestên ristevan û nivîskaran, ev çiyayê zengîn û behredar, li vê devera Kurdî – makderê şadî û şanaziya niştecihên xwe û Kurdên Sûrî tava ye. Ev çiyayê dîrokî, gelek deşt û newal û gelî, di xwe de werdigire, û 365 gundan – himbêz dike. Pîvana vî çiyayî 2100 k. m. çargoşe ye, û dirêjiya wî 60 k. m. û pehniya wî, pirtir ji 30 k. m. he ye. Û li gorey pêzanînên kargeriya melbendê çandiniya Efrînê, pîvana vî çiyayî (202775) hiktare.

Niştecihên vî çiyayî, di van 30 salên dawîn de, gavên fireh bi aliyê şehristaniyê de – avêtine, û têgihiştinên hozdarî û êldarî – berda ne. Û rewşenbîr û xwendevanên wan –pir bûne û pêş ve çûne. Û di karên çandiniyê de bi ser ketine, nemaze di pirkirina dehl û zeviyên zeytûn û êmîş û sebze yan de.

Li çiyayê Kurmênc, heft navçeyên kargerî hene:

**1-** Efrîn, navçeya navendî û mezintirîn bajarê vî çiyayî ye. **2-** Navçeya Cendirêsê. **3-**Navçeya Şiyê (Şêxil hedîd).**4-**Navçeya Me'ebetlê. **5-**Navçeya Raco. **6-** Navçeya Bilbilê. **7-** Navçeya Şerranê.

Beriya 50 salî, devera Çiyayê Kurmênc, bi şêweyekî hozdarî – dihat parvekirin, di navbera hoz û êlên niştecih bûn, di nav sînorê wê de. Li bakurê rojhilat, hoza Şikakan niştecih

bûn, û li Bakur hoza Biyan niştecih bûn, û li rojava hozên Şêxan û Xwastî û Heştî niştecih bûn, û li başûr devera Cûman, piraniya niştecihan Berwarî û hozên Êzîdî bûn, û li devera orta van teva, hoza Amikan niştecih bûn. Lê divê bête zanîn ku tevaya van devera, hoz têkilî hev bûne, û li çi deverên Çiyayê Kurmênc, hozek li xurû nîne. Û dibe ku di hin deman de, dijminayî diket navbera du hozan de, yan du deveran de, lê hestên regezî û hozdarî qels bûn û dirêj ne dikirin. Û tev ku pir A'xa, li Çiyayê Kurmênc hebûn, lê desthilata wan ne xurtbû û gelek ji wan, di hatin guhertin, û kêm derebegên mezin,li Kurda'xê çê bûne.

Nuha em dê hinekî li ser deverên hozên Çiyayê Kurmênc – rawestin:

### *1- Devera Şikakan*

Ev dever dikeve bakurê rojhilata Çiyayê Kurd daxê. Nêzîkî 40 gundên vê deverê hene:

Giringtirîn gundên Şikakan ev in: Dêrsîwan, Îkîdamê, Ereb wêranê, Ereb simo, Zeytûnkê, Pelîsankê, Alciya, Şerran (navçe ye), Çema, Embara, Ga belekê, Qerecurnê, 'Elkê, Gemrûkê, Metîna. Her heft gundên Meydana ev in: Sê mala, Miskotê, Kûrê, Gazê, Welîkliyê, Dûdê, Ga wenda.

Kesayetiyên xuya, li vê deverê: Malbata Mihemed Mennan (bavê Azad), li navçeya Şerranê. Malbata Birahîm Xelîl A'xa, li gundê Gumrok.

### *2 – Devera Biyan*

Ev dever perçebûye, di navbera Sûriya û Turkiya de, li rojavaya wê, devera Şêxan e, û li başûra wê, devera Amika ye, û li rojhilata wê, devera Şikaka ye. Nêzîkî 45 gundên vê

deverê hene. Û giringtirîn gundên wê ev in: Ebûdan, 'Ûga, Qurnê, Balîga, Bilbilê (navçe ye), Zara, Elî kerra, Heyama, Bexçe, Çolaqa, Bîkê, Solaqa, Mehmûd Obasî, Bêg Obasî, Xayoxla, Kurzêlê.

Biyan bi nijadê xwe Rişwanî ne, û hin dibêjin ew Millî ne, ji demek dirêj ve, ji devera Meletya hatine. Kesayetiyên xuya li devera Biyan Malbata Şêx Sima'îl zade, ew ên nuha niştecihin li Helebê.

### *3 - Devera Şêxan*

Ev dever hatiye perçekirin, di nav Sûriya û Turkiya de, ji herdû aliyên bakur û rojava de. Û dikeve rojavaya deverên Biyan û Amikan. Li beşê Sûrî ji vê deverê, pirtir ji 50


gundên Şêxan hene. Giringtirîn gundên vê deverê ev in: Hesen gul, Kurka, sinarê, Qermitlik, Sorkê, Şiyê (Şêxil hedîd navçe ye), Hecî Xelîl, Badîna, Etmana, Maseka, Mûsîkê, Hecîka, Hopka, Raco (navçeye), Qude, Kella, Qere baba, Bilalîko, Şêx Bilala, Çençeliya, Çeqmaqa

Huce mal, Mamila, Mistiko, Erindê, Hec Bilêl, 'Edwa, Welîklîkê, Dodê. Kesayetiyên xuya li devera Şêxan ev in: Xelîlê Sofî, Fayiq ê hecî Hemîd, Ehmed Gulîn Elloş, Xelîl 'Izzet, li gundê Badîna, Reşîd Hemo, Malbata Mûsa Axa, malbata Mûsa 'Eynî, li gundê Kumreşa.

### *4- Devra Amikan*

Ev dever dikeve başûrê devera Biyan, û rojavaya devera Şikakan, û rojhilata devera Şêxan, û dikeve navenda deverên hozên Çiyayê Kurmênc. Nêzîk 40 gundên vê devera Amikan hene, û giringtirînên wan ev in: Saxir Obasî, Kêlan (Keçel),

Eşûnê, Hesen dêra, Birka, Kotan, Epila, Gundê Dikê, Ereb kerrê, Qere gol, Emara, Bîbaka, Sê malka. Kesayetiyên xuya li vê deverê: Tahir Dîko, li gundê Dîkê. Şêx Mennan, Kesatiyek oldar e. Duktor Ehmed Dîko.




هذه الخريطة مأخوذة من كتاب الاستاذ آمد وهو ترجمة النص الفرنسي الى اللغة الكردية
وقد قمنا بتعريب أسماء العشائر ومركز عفرين والنواحي الرئيسية التابعة لها.

**Ev nexşeya Cixrafî hatiye guhestin ji govara 'Hiwar a Erebî, hijmar /21/ payîza 1998.**

### *5 - Devera Cûman*

Ev dever firehe, ji bakurê rojhilat de, digihêje nêzîkî I'izazê, û li bakurê wê, deverên Şikakan, Amikan, û Şêxan in. û ji başûrê rojava de, beşek ji devera çiyayê Sem'an dikeve ber devera Cûman, û ji aliyê rojava de, digihêje sînorê Turkiya. Li devera Cûman, hinek komelên serbixwe li gundan hene wek gundên Xwastiyan, gundên Heştiyan, gundên Xerzan, gundên Êzîdiyan , û gundên Rûbariyan..t.d.

**A-Devera Xwastiyan:** Ev dever dikeve bakura devera Cûman ji aliyê rojava de. Û dikeve rojhilata devera Şêxan. Giringtirîn gundên vê deverê ev in : Kaxurê, Mîrka, Şêtka, Misrackê, Rehmaniyê, Xaziyan, Deliyan. Kesayetiyên xuya ev in: Mustefa Hesen û Xelîl Xelîl, li gundê Şêtka.

**B-Devera Heştiyan**: Ev dever dikeve başûra devera Xwastiyan. Giringtirîn gundên wê ev in: Cûqê, Martê, Gewrika, Dargirê, Aşka, Kefer sefrê, Kora, Miskê, Gazê, Kefer delê. Kesayetiyên xuya: Birahîm Xelîl Îsa. Hesen Qewas, li gundê gewrika.

**C-Devera Xerzan:** Giringtirîn gundên vê deverê: Gundik, Xerza, Qucûma, Aşka rojhilat. Kesayetiyên xuya malbata Xelîl A'xa ye.

**Ç-Devera deşta Rûbariya ji devera Cûman:**

**1-** Gundê Cilbirê: Ev gund dikeve bakurê rojhlata gundê Basîlê û bakurê rojavaya Îbînê. Li vî gundî hin şûnwarên kevnar hene; sarîncên avgir, û givaştingehên kolayî di tehtan de. Xakên gund deştek behredare, û niştecihên wî Kurdên Rûbarî ne, ji hoza Berwariya. Kesayetiyên xuya, li vî gundî, malbata Osman A'xa, û Arif A'xa yên

Rûbarî û Ehmed Qasim Rif'et, hilbijartiyê (Muxtarê) gund e.

**2-** Basîlê: ev gund, dikeve navbera Cilbirê û Soxankê. Xakê wî ji rojhilat de deşt e, û yê mayî ji çiyayê Lêlûn e. Şûnwarên wî Dêrek wêran heye û hin sarincên avgirin. Niştecihên wî Kurd in, û piraniya wan Rûbarî ne, ji hoza Berwariya. ji kesatiyên xuya li gund, Mûsa Mihemed Mûsa.

**3-** Aqîbê: Ev gund dikeve başûrê rojhilata Basîlê, û başûrê rojavaya Îbînê. Xakên vî gundî, hin deşt û hin çiya ne. Desthilata Sûrî, dehlek darên bê êmîş, li vî gundî çandiye, û xwedîtiyê li wê dike. Niştecihên vî gundî Kurd in, ji hoza Millan in, û hinên din. Giringtirîn malbatên gund: Malbata Ibiş, malbata hecî Birîm, malbata Millan, malbata Emer ya ku ji Başemra hatiye, û malbatek Ereb, malbata Xidir, ji Erebê Welda. Rewşenbîrên vî gundî pir in. Kesayetiya Xuyanî li gund hecî Wehîd bû. Hin şûnwarên kevnar li vî gundî hene, wek şikeftan, sarîncên avgir yên kolayî di tehtan de, û hin givaştingehên kolayî di tehtan de, û gelek serdangehên oldarî: ya şêx 'Eqîl, ya Şêx Mihemed, ya Soraqya.

**4-** Îbînê: Îbe bi kurdî benbestek e, ango benê ku qayişa cot ya ku nîr, bi mijana cot ve – girê dide. Îbînê dibe bi wateya cihê cot û nîr û çandiniyê.

Ev gund dikeve başûrê rojhilata Cilbirê, xakê wî deşt e,

û ew deşt zengîn e. Malbatên niştecihin, li vî gundî, Kurdin, piraniya wan malbatan Rûbarî ne. ji kesayetiyên gund yên xuya, Ebdilhemîd Xubarî, Malbata Mihemed Genco, û malbata Rif'et Xelîl.

**5-** Xerabkê: Ev gund dikeve başûra rojhilata Aqîbê, û bakurê rojhilata Çetel–ziyaret. Xakên wî, deşt û behredar in, niştecihên wî Kurd in, ji Rûbariya ne.

**6-** Giş'ar : Ev gund dikeve bakurê rojhilata Îbînê, xakên wî deşt û behredar in, û niştecihên wî Kurdên Rûbarî ne, û hin malbatên Ereb jî, li vî gundî niştecihin. Xwediyên xaka gund malbatên Rûbarî ne.

**7-** Dêr Mişmiş: Ev gund dikeve bakurê rojavayê Basîlê. Hin şûnwarên kevnar li wî hene; Gorrxaneyek Romanî, ji sedsaliya sêyemînê zayînê de. Û Vêllake Bêzentî û Bircek perestkarî û Dêrek ji dema sedsaliya şeşên Z de .Û hin sarincên avgir û givaştingehên kolayî di tehtan de.

Du malbatên Kurd nuha li vî gundî niştecihin, di çandiniyê û xwedîkirina ajelan de – kar dikin. û xaka gund bi giştî ya malbata Xubarî ye, ji Rûbariya.

**8-** Gobelê: ev gund dikeve bakurê rojava, ji Basîlê. Li vî gundî gelek şikeftên kevnar, li gundekî şûnwar–hene. û Dêrek kevnar ji dawiya sedsaliya çaremîn ê Zayînê de. Ta nuha jî warên wî gundê şûnwar – xuya ne. Xaka gundê Gobelê ya malbata Rûbarî ye, ku li Cilbirê niştecihin.

**9-** Kurzêlê: Ev gundê malbata 'Xubarî ji Rûbariya ne, ew ên ku li gundê Cilbirê niştcihin, û dikeve bakurê roj-hilata gundê Guh belê.

**10-** Kefir betrê: xwediyên vî gundî malbata Şêxo Qasim A'xa ye, kesatiya li vî gundî, Dr. Mecîd Şêxo, ji Rûbariya ye.

**11-** Zerê qat: ev gund dikeve bakurê rojavaya gundê Basîlê. Hin şûnwarên kevnar û spehî li vî gundî hene;

Dêrek mezin li wî heye, di sedsaliya şeşên zayînê de, ava bûye. Malbata Xubarî li Cilbirê xwediyên vî gundî ne, û cotkarên wan tê de kar dikin.

**D- Gundên ku pir şûnwarên kevnar li wan hene, li devera Cûman:**

**1-** Gundê Îndarê: Ev Gund dikeve başûra Efrînê, bi 10 k. m. nêzîkî çemê Efrînê ye, bi 2 k. m. Girê Îndarê şûnwarekî spehiye, dikeve kenarê çep ji çemê Efrînê, dirêjaya vî girî 270 m. û pehnaya wî 170 m. û bilindiya wî 30 m. Ev gir cihê gelek şûnwarên kevnar e. Bendek (sûrek) li bakur û rojhilata bakurê gir –heye, bi dirêjiya 300 m. Li devera gir, dehlên ji ba'xên hinar û mişmiş û xoxa.. dîmenê suriştê, di serdemên Buhar û Havînan de – pir spehî didin xuya kirin, digel mûzîka awazên firinde û çûkên core cor. Şûnwarên Îndarê kevnar in, ji demên hezarê 4 ê berî Zayînê de. Li jora gir, aliyê bakur perestgehek spehî heye, bi kevir ê Baziltî ava bûye, û gelek wêneyên spehî, li wê – nigar bû ne, ji wêneyên şêrên bi bask, û wêneyên serên jinên ku berî dane hev, yan pişt dane hev, û hin peykerên xudawendên Horî, Hitî, Mîtanî, û Mîdî, ew ên ku berê dihatin perestin, li devera Çiyayê Kurmênc.

Û bi lêgerîn û kolanan, peykerê gayekî li pey mirovekî pir girs – der ket. Û peykerê xudawendê wê perestgehê – xwedî rih e, û kumekî tûjik wek kunbeda Laleş li serê wî ye, û wek kumên kulavî yên mêrên Êzîdiya ye.

Serekê lêgerînên li şûnwarên Îndarê, "Mûrês Dûnan" di gotarek xwe de, bi zimanê Firensî, di govara Şûnwarên salane ya Sûrî de, ya ku hatiye belavkirin di sala1965 de,

dibêje: "Xudawendê wê perestgehê, xudawendê rojê ye, ew a ku ji pişt çiya ve xuya dibe".

Û mamosta Fêsel Seyrefî, di gotara xwe de ya ku ji Firensî hatiye wergerandin, di govara "Şûnwarên salane" ya Sûrî de, dibêje: "Niştecihên devera Îndarê baweriyên xwe yên oldarî – ne guhertine, ji kevntirîn deman de. Û dîroknasên kevnar – bawer dikin ku bêjeya (çiya yê Toros) bi wateya: Çiya yê gayan. Û ev ajelên girs, bi gavên xwe yên giran – li qontarên van çiyan digeriyan, û ji ber vê, perestina wan niştecihan – hate girêdan, bi çiya û ga û Rojê ve".

**2-** Gundê Biradê: Ev gund dikeve başûra gundê Kîmar, bi 4 k. m, li Biradê Gorrxaneyek Romanî û sê Dêrên kevnar hene, ya mezin Katidra'iya Colyanos e, di dawiya sedsaliya 4 ê Z de – hatiye ava kirin. Û Dêrek dî heye, di sala 561 Z de, hatiye ava kirin, nuha tête navdan "Birca Mişebik", nêzîkî vê dêrê şikeftek mezin heye, wêneyê serê Ga, li ser wê – hatiye nigar kirin.

Niştecihên gund yên temen mezin, vê dêrê nav didin "Celmêr" ango serdangeha Êzîdî. Xuya ye ku ew dêr – li ser bingehê perestgehek Êzîdî ava bûye. Çikû navê

"Celmêr" li nik Êzîdiyan, wateya pîrozdariyê dide, û ji bo vê yekê niştcihên gund, çarhawîra van her dû dêran, kirine gorrxane ya gund (Mezel), miriyên xwe li wê diveşêrin. Dêra sêyemîn dikeve rojavaya gund.

Dema nuha, sê malbatên mezin ji Kurdan li Biradê niştecihin, malbata Şemo, malbata Ebdo koran, malbata Hemo. Ev gund îro navendekî geşt û guzariye, hezarên biyaniyan serdana wî dikin.

**3-** Gundê Kîmarê: Ev gund dikeve rojhilata gundê Basûtê bi 5 k. m. li vî gundî, dêrek kevnar heye , di sedsaliya 5ê Z de – hatiye ava kirin, û yek dî, di sedsaliya şeşan de hatiye ava kirin. Û stûnek perestkarekî Fille û nenas – heye. Û Dêra sêyemîn li bakurê gund e. Li rojhilata Kîmarê, perestgehek heye bingehên wê û kevanê wê, hêj li dar in, li jora herdû kevanên wê, Xaçek û Kulora Rojê û du Tawûs li herdû aliyên wan hatine nigar kirin. li nêzîk deriyê vê perestgehê nivîsandine, ku ew hatiye ava kirin di sala 572 Z de. Xuyaye ku ew perestgehek Êzîdî bû, paşê wêneyê Xaç xistine navbera Rojê û Tawûs de. Kîmar ê nuha niştecihên wê Kurd in, ji malbata Xelnebokê ên Êzîdî bûn, û ji 50 salî de bûne Musilman. û malbata Dalî Hesen, ew jî, ji nêzîk sed salî de, ji Êzîdîtiyê bûne Musilman, û malbata Necaran û Koçeran, û malbata Hiskan.

**4-** Gundê Birc Evdalo: Ev gund dikeve başûrê rojavaya Kîmarê, û hin niştecihên wî, bi nijadê xwe Şêrewî ne, têne nasîn bi malbata Hisrî, û hin ji niştecihên wî Êzîdî ne.

**5-** Gundê Bî'iyê: ev gund dikeve bakura gundê Basofan, û başûra rojavaya gundê Biradê. Hinek şûnwarên sarîncên avgir û givaştingehên kolayî di tehtan de – li vî gundî hene. Niştecihên Bî'iyê Kurd in, hin ji wan Êzîdî ne, Karê wan çandinî û xwedîkirina ajela ye.

**6-** Gundê Basofan: ev gund dikeve başûra Bî'iyê. Gelek Şûnwar, li Basofan – hene. Dêra keşe Fokas, nivîsandinek Suryanî li wê heye ku di 491-492 Z de – hatiye ava kirin .Û hin sarîncên avgir û givaştingehên kevnar jî – li wî hene. Niştecihên vî gundî, di vê demê de

– Kurdên Êzdî ne, û di çandinî û xwedîkirina ajelan û bazirganiyê de – kar dikin.

**7-** Gundê Kubaşîn (bi wateya) Kunbeda şîn: Ev gund dikeve rojhilata Birc Heyder, bi 2 k. m. Şûnwarên kevnar li wî – hin bingehên avahiyên kevnar û hin sarîncên avgirin. Niştecihên vî gundî Kurd in, û hin ji wan Êzîdî ne, û di çandinî û xwedîkirina ajelan de – kar dikin. Kesatiya xuya, li vî gundî– Bekrî Şemo ye.

**8-** Gundê Vavirtîn (bi wateya ji hev nasîn û cudakirinê), gotinek Êzîdiyan di pertûka Xidirê Silêman û Xelîlê Cundî "Elyezîdiye" de – hatiye, dibêje: "Minnet kar im ji mîra, Vavirtîn bikin kafira ji xenzîra" Ev gund dikeve rojavaya bakurê Kubaşîn, li vî gundî, dêrek pir kevnar heye, li ser wê hatiye nivîsandin ku ji sala 221 Z de – ava

bûye. Û hin Sarîncên avgir û givaştingehên kolayî di tehtan de jî hene. nuha ev gund biçûke, niştecihên wî Kurd in, û hin ji wan Êzîdî ne û di çandinî û xwedîkirina ajelan de – kar dikin.

**9-** Gundê Bircikê Silêman: Ev gund dikeve başûrê rojavayê Basofan, û rojhilata Kela Sem'an. Di vî gundî de şûnwarên kevnar yên spehî hene, û birca li bakurê gund – çar qat e (tebeqe), û Dêrek li vî gundî heye, di sedsaliya 6 Z de ava bûye. Niştecihên vî gundî – Êzîdiyên Şerqiya ne, pismamên malbata Evdalo ne, û di çandinî û xwedîkirina ajelan de, kar dikin. Kesayetiyên xuya li gund – malbata 'Elo ne.

**10-** Gundê Başemra (bi wateya berdayî li ber ba): Ev gund dikeve başûra rojhilata Vavirtîn. Li Başemra şûnwarên Bîzentiya yên spehî hene, û hem Dêrek mezin wêran

bûyî jî heye. Niştecihên Başemra Kurd in, û di çandinî û xwedîkirina ajelan de – kar dikin.

**-Giringtirîn gundên din yên Êzîdiyan li Cûman ev in:**

Qîbarê, Torindê, Basûta, Kevir zêt, Xezêwiyê, Şêx Xidir, Îskan, Şahdêrê, Kevirşîn, Qitmê, Bafîlonê, Qestel Cundo, Sînka, Metîna, Feqîra, Aşka, Çeqelê Cûmê, Miskê, bajarê Efrînê. Xuyaniyên wan Êzîdiyan ev in: malbata Cemîl A'xa, li Qîbarê, Şêx Hisên Birîm, li 'Xezêwiyê, Şêx Mihemed Kalo, li Birc Evdalo.

**-Giringtirîn kevnarên hozên Êzîdiyan, li Çiyayê Kurmênc Ev in:**

Şerqiyan, Xalitan, Dinnan, Dawudiyan. Êzîdiyên Çiyayê Lêlûn û devera Sem'an têne navdan "Şêrewan".

**E – Hin giringtirîn gundên din ji devera Cûman:**

Kefir mizê, Qeretepe, Celemê, Tilsilorê, Dêwa, Dêr palûtê, Mela Xelîl, Terbêlan, Nesriyê, hecî Iskender, Elcê, Cindirêsê (navçeye), Yalan qozê, Rif'etiyê, Emêlkê, Firêriyê, Ebû kab, Hecî lerê, Til Hemo, Tilif, Kokebê, Zelaqê, Qîlê, Qurbê, Kanî gewrkê, Banilîtê, Zêdiyê, Sindiyana. Kesayetiyên xuya – ev in: Şêx Ebdilqadir, ji malbata Genc, li Babilîtê, Malbata Emer, li Firêriyê, Malbata Betal A'xa û Genco Genco, li Celemê, hecî Hemîd (oldar e), li Koran, diktorê Bêterî Hesen Çawîş, li navçeya Cendirîsê ye.

**Ê-Giringtirîn Gundên mayî, li devera çiyayê Lêlûn, ji Cûman:**

Berê hin gundên Çiyayê Lêlûn, digel gundên Êzîdiyan, bi me re, derbas bûne. (Bêjeya "Lêlûn" bi wateya zeytûnên

negihiştî ye). Sînorên Çiyayê Lêlûn ev in: Ji rojava de estêlê (Hewdê, çewlîkên) çemê Efrînê ye, ango deşta gundên Qîbarê, Torindê, Îndarê, 'Xezêwiyê..., ji bakur de deşta Qetmê, Kefir cennê, ji rojhilat de deşta I'izaz, deşta Meng…, û ji başûr de deşta Etarib.

Ev çiya tête navdan "Çiyayê Şêrewa" bi navê hozek Êzîdiyê kevnar, ku li vî çiyayî niştecih bûn, ta nuha jî Şêrewiyên Musilman, li vî çiyayî hene. Û hem hatiye navdan bi "Çiyayê Nebo" bi navê Xudawendekî ku peykerên wî, li vê deverê – têne dîtin. Ew gundên mayî ji Çiyayê Lêlûn – ev in:

**1 - Gundê So'xankê:**

Ev gund dikeve başûra rojhilata gundê Basûtê. Niştecihên So'xankê Kurd in, bi nijadê xwe Êzîdîne, ji hoza So'xana ya Êzîdî, û di sedsaliya 20 Z de, musilman bûne. Li gundê So'xankê şûnwarên dêra hene, di sedsaliya pêncên Z de – hatine ava kirin, û li şûnwarên rojhilata gund, vêlla hene, têne navdan "Sê ling" û li şûnwarên rojavaya gund, du birc û dêrek dî û 7 sarîncên avgir hene.

Malbatên niştecihên So'xankê –ji bere ya Îzola ne, û pismamên hev in. Malbata Mamo, malbata Hisênê Berekat, malbata Gulkê, malbata Berko, malbata Evdo, malbata Xellê, malbata Eyşokê.

Kesayetiyên xuya, li gund: Hemûd ê Hisênê Berekat, hecî Hesen ê Hisênê Berekat, nivîskar Merwan berekat. Niştecihên So'xankê şareza ne, di xwedîkirina mêşên hingiv de.

**2 – Gundê Çetel Ziyaret :**

(serdangeha pîroz ya Yûsif Kofî): Ev gund dikeve başûra rojhilata Aqîbê. Ava bûye li ser bingehên şûnwarên kevnar. Hinek şûnwarên şikeft û sarîncên avgir yên kevnar li vî gundî hene. Niştecihên wî Kurd in, ji Millan in û ji her sê malbatên Bekir, Kose, û Welî –pêk tên. Ev gund navdar bû, bi rezên xwe. Û ev niştecihên gund, di çandinî û bazirganî û pîşeyên azad de – kar dikin.

**3 – Gundê Birc Qazê:**

Ev gund dikeve bakura Kilotê, û rojhilata gundê Kefir Nebo, bi 2 k. m, hin şûnwar li vî gundî hene. Niştecihên wî, Kurd ên Şêrewî ne. Û jêhatîne di çandinî û xwedîkirina ajelan û karên azad de.

**4 – Gundê Kefir Nebo:**

Ev gund dikeve başûra Biradê bi 4 k. m. û bakurê Birc Heyder (Kevir Tîra) bi 3 k. m. Nebo, û Nabo navên Xudawendê nivîsandin û pendiyariyê ne, ew ê dihate perestin, li devera çiyayê Nabo, ango Çiyayê Lêlûn, hem li devera Mîzobotamya, ango navbera herdû çemên Ferat û Dicle, di sedsaliyên 8 û 9 ên beriya zayînê de. Û perestgehên vî Xwedawendî –dihatin navdan "Êzîdahî". Û li devera Çiyayê Kurmênc, gelek mêr û jin, bi navên Nebo, Nebî, Nebê, Nebokê… hene, û li gundê Kîmarê malbatek mezin heye bi navê "Neboyan" û hêj beşek ji wan –Îzîdî ne. Ev diyardeyên han, pêwendên navbera ola Êzîdî û Kurdên Çiyayê Kurmênc, bi wî Xudawendî re, didin xuya kirin.

Li gundê Kefir Nebo şûnwarê ûtêlek pir mezin heye ku ji sala 504 Z de – ava bûye, û ji du qata ye. Hem givaştingehek bin zemînê kolayî di tehtê de . Û li bakurê ûtêlê perestgehek pûta heye, li ser wê, wêneyê kulora rojê

– hatiye nigar kirin, guman ew e ku ev perestgeh ya Xudawendê rojê ye, û di demên Horî û Mîtaniyan de – dihate perest in. Û li gundê Kefir Nebo, gelek şûnwarên avahiyên akincîtiyê û vêlla û şikefta jî – hene. Li gorey Xûrê Entûn Duwêhî di pertûka"PerestkarêQorş de" dibêje; Mar (Keşe) Marûn, ê ku bingehê Kenîseya Marûnî daniye, di sedsaliya 4 Z de, Bexçeyekî (dibistanek) Keşetiyê, li Nebî Horî (Qorş) – saz kiribû, paşê hat gundê Kefir Nabo, li çiyayê Nabo (Çiyayê Lêlûn), da bi tenahî û jiyana zivir, perestina xwe ya Filletiyê– bike". Û Duwêhî pêde diçe û dibêje: "Niştecihên gundê Kefir Nabo pûtperest bûn, Perestina sê Xudawenda –dikirin, Xudawend Nabo (Xudawendê Asiman) û Xudawend Sembtîlos (Xudawendê Ortax) û Xudawend Lawen (Xudawendê Şêr), û peykerên van hersê Xudawendan, li gundê Kilotê yê nêzîkî gundê Kefir Nebo – hebûn, û bi koşanên Mar Marûn û şagirtên wî, ji Mizgîndarên Filletiyê, ew perestgeh û peykerên pûtperestan bûn kenîse, û niştecihên wê deverê bûn Filleh. Û gava Mar Marûn çû Cihana dawîn, ew ji gund ê Kefir Nebo – anîn gundê Biradê û li Katidra'iya Colyanos – veşartin". Di vê demê de, niştecihên vî gundî, malbatek Kurd e, ji gundê Birc Heyder, malbata Ehmed zellûh e, û di çandinî û xwedîkirina ajelan de – kar dikin.

**5–Gundê Kilotê:**

(Kilotê bêjeyek Suryanî ye, bi wateya rewşenbîr, çikû gava Mar Marûn hat Çiyayê Lêlûn, ev gund kire cihê rewşenbîrî ya Filletiyê, yan bêjeyek Kurdî ye, bi wateya kelat, lê bi hoya guhertina desthilatan–hate guhertin û bû Kilotê. Ev gund dikeve bakurê gundê Zoqê, bi 3 k. m. Li Kilotê şûnwarê kelehekê heye, ta nuha li dare. Û li nêzîkî

Kilotê, gundek heye, bi navê Xerab şems, ev nav li vî gundî bûye, bi hoya gelek wêneyên rojê ku li şûnwarên vî gundî hene, digel wêneyên serê ga û gurzê gula.

Ev gund xwedî şûnwar e, dêr û vêlla û perestgeh û xaniyên cihnişîn, li wî hene. Li rojhilata gund dêrek heye, di sala 492 Z de – ava bûye, û li aliyê rojava dêrek dî heye, di sedsaliya 6 Z de – ava bûye. Û li rojavaya gund, kelehek li ser bilindiyekê ye, bi 560 m. di ser deryayê re ye. Ev keleh di bingehê xwe de, perestgehek pûtperesta bû, paşê bûye dêr, di sedsaliya 5 Z de.

niştecihên vî gundî – Kurd in, û di çandiniyê û xwedîkirina ajelan de kar dikin, digel rakirina keviran ji kevirgehên li başûra gund.

**6 – Gundê Birc Heyder (Kevir Tîra):**

Ev gund dikeve başûra Biradê bi 5 k. m. Li vî gundî gelek şûnwarên spehî hene. Şûnwarê giring Birc e, bilindiya wê 11 m. Li dîwarê bircê yê rojhilat, nivîsandinek Suryanî, navê perestkarê ku li wê niştecih bû – dide xuya kirin. Li Birc Heyder sê dêr hene, yek ji wan di sedsaliya 3 Z de – ava bû ye, û her duwên din, di sedsaliya 6 Z de – ava bûne. Niştecihên Birc Heyder Kurd ên xurt in û bi hêz in, û pismamên hev in. Û hinek ji wan, mişext bûne, û li gundê Kefir zêtê dimînin.

**7- Gundê Zoqê (gundê Mezin):**

Ev gund dikeve başûra Kilotê. Û li başûrê rojhilata Zoqê, gundê Xerab şems e. Hin şûnwarên wêran, li Zoqê hene, hin sarîncên avgir û givaştingeh û şikeft. Niştecihên vî gundî – Kurdên Şêrewî ne û xwediyên surîştên tund in, piraniya wan di avahiyê de, kar dikin, û hin ji wan, di çandiniyê û xwedîkirina ajelan de, kar dikin. Malbata xuya

di vî gundî de – malbata Bûdaq e, ew ên ku ji nêzîkî sêsed salî de, li vî gundî niştecihin, û hin ji wan, beriya 50 salî mişext bûne, û akincî bûne, li gundên Basûtê û Birc Evdalo ew ên têne nasîn, bi malbata Hisrî.

**Dêra Keşe Sem'an:**

Ev dêr dikeve başûra rojava, ji çiyayê Lêlûn, hem dikeve başûra bajarê Efrînê, bi 23 k. m. ji şûnwarên mizgîndarên keşe yên jiyan zivir, stûna Keşe Sem'an yê Sitûnî ye, û keleh û kevanên serkeftinê yên ku li cihê tenahî û jiyana wî ya zivir – hatine ava kirin. Keşe Sem'an, di sala 392 Z – hatiye Cihanê, û di sala 459 Z de – çû ye Cihana dawîn, û di 491Z de, Imperator Ziyon, dêrek li ser stûna wî – ava kir. Ev şûnwarên Keşe Sem'an –pîroz in, li nik Fillehan. Rêça van şûnwaran ev e: Efrînê, Torindê, Basûta, Birc Evdalo, Xezzêwiyê, Dêra Sem'an.



Dêra Sem'an



Cuwanek ji Kurdên çiyayê Kurmênc
Bi kêsima Folklorî

( ji parastiyên ristevan Salihê Heydo)

# Nerînek li bandora guhertinên core core, li ser Çiyayê Kurmênc

Diyare ku li devera Çiyayê Kurmênc, bandora hozdariyê qelstire, ji deverên din, ji Kurdên Sûrî. Ev ji ber sê hoya ye:

**1-**Birrên core core, ku ji Kurdên din yên bi sedan û hezaran hatine vê deverê, ji çiyayên Toros, Zagros û deverên din, û niştecih bûne, bi hevjiyanek rengîn û bi lihevkirin.

**2-**Guhertina desthilatan, ji Roman, Yûnan, Horî, û Mîtanî...

**3-**Rengîniya olan li vê deverê, ji olên Êzîdî, Cuhûtî, Filletî, Islam û çalakiyên mizgîndar û fermandar û cengawerên wan olan û bandora wan.

**Em dê hinekî li ser bandora wan olan rawestin:**

Bandora Cuhûtiyê li ser niştecihên vê deverê – hindike, tev ku Aramgeha Pey'xember Dawud û Talût – li çiyayê Parse Xatûn in, û gorra birayê pey'xember Dawud li serdangeha Hennan ya pîroze, li gundê Meşhela, li navbera Kefir Cennê û Efrînê, û gorra Orya li çiyayê Nebî Horîye, ewê ku serleşkerê Pey'xember Dawud bû, û ew şiyand cengê, da bête kuştin, û jina wî ji xwe re bîne, û Xwedê li ser vê kirê – rexne li Pey'xember Dawud kiriye, her wekî di Qur'anê de hatiye. Lê bandora Filletiyê pirtir bû ji ya Cuhûtiyê, çikû gelek Fille li vê deverê pêk hatin, û gelek şûnwar û perestgeh û dêrên wan, ta nuha, li vê deverê dimînin.

Û bandora Musilmaniyê, li vê deverê Xurttir bû, ji yên Cuhûtî û Filletiyê her duwa, bi pirraniya peyrewên vê olê, û belavbûna baweriyên wê.

Lê ya seyr û sirinckêş ku ola Êzîdî û bawerî yên wê li vê deverê – xwe ragir ma ne, di gel zor û çewsandinên ku hatine ser peyrewên vê olê

## *Efrîn*

Nuha dem hatiye em vegerin ser navenda Cûman, bûka Xemilandî, li nav xeml û xêza dehlên Çiyayê Kurmênc, ew bajarê payedar, bi çemê xwe yê behredar, bi Keya û rêzdarên xwedî rûmet, bi pêşveçûn û rewşenbîriya civakê xwe, bajarê Efrîn ew ê ku şayiste ku em, ji dil û can, dirûdek welatparêzî, ji wî re – araste bikin.

Ey Efrîna xoşewîst; navê te Aferîn e (ne 'Ifrîn e), Tu Aferîn û pîrozî û afirandinî. Aferîn û navtêdan e, li ser spehîtiya te ya suriştî. Aferîn bo te! li ser geşbûn û behredariya te, bo zengînî û berhem û dahatên te, Aferîn bo te! ji bo spehîtî û zengîniya li devera çarhawîra te, ji çiya û xakên pir dahat û pir berhem. Aferîn bo te! li ser dehlên zeytûnan, hêmayên pîrozî û aştiyê. Aferîn bo te! li ser keş û hewaya te, ew a ku jiyanê xweş û karger dike, û tenduristî û şadiyê –xewdî dike.

Navê te, ne ('Ifrîn) a Erebî ye, ya ku hatiye Erebkirin, bi wateya toz û talazê, çikû sura bayê te pak e, ji toz û tevrabûn a axê, û çar kenarên te mêrgên hişîn in û ba'x û rez in, toz li wan – na rabe, û her çar serdemên salê, li wan, wek serdema Buhara geş e. Tu afirandina surişţê yî, tu afirandina spehîtiyê

yî, tu afirandina şehristaniyê yî, tu afirandina zengînî û xweşiyê yî, tu afirandina siroşê yî, bo ristevan û rewşenbîran, hem tu afirandina evîna caneweriyî, û tu afirandina dilên evîndara yî.

**Tu Aferîn**
**û Afirandin**
**û Pîrozî yî, û bes!!.**

## *Çiyayên navdar li devera Çiyayê Kurmênc*

**1-** Çiyayê Hewarê: dikeve bakura Efrînê, li ser rêya Efrîn - Raco.

**2-** Çiyayê Bilal: ev dikeve bakura çiyayê Hewarê.

**3-** Çiyayê Bilê: Ew ê ku bilindiya wî nêzîkî 1000 m. di ser deryayê re. Û dikeve bakurê rojhilata çiyayê Bilal.

**4-**Çiyayê Bilbilê bilindtirîn çiyaye, li devera çiyayê

Kurmênc, bilindiya wî 1200 m. di ser deryayê re, û dikeve devera jorîn ji çiyayên Meydanliyan, li bakura rojhilata Çiyayê Kurmênc.

**5-** Çiyayê Parse Xatûn a Êzîdî: Ev dikeve bakurê rojhilata bajarê Efrîn, bi 15 k. m. Ev cihekî pîroz e li nik Êzîdiyan, di boneyên oldarî de, serdana wî dikin. Li Kopika serê vî çiyayî, Kelata Fermandêrî ya (Mîrîtiya) malbata Canpolat – hêj li tenişt Parse Xatûn xuya dibe.

**6-** Çiyayên Heştî û Xwastiyan: Ev dikevin devera rojavaya navîn, ji devera Çiyayê Kurmênc, li tenişta devera Şêxan.

**7-** Çiyayê Lêlûn: Ev çiya bi geliyên xwe yên pir ve – dikevin başûra devera Cûman, li Çiyayê Kurmênc.

**8-** Çiyayê Şêx Berekat: Ev dikeve dawiya rojavayê başûr, ji çiyayê Lêlûn. Kopika Çiyayê Şêx Berekat 786 m. di ser deryayê re. Li jora vî çiyayî perestgehek herdû xudawendên "Ziyos" û "Hîra"– heye. Ev perestgeh – hatiye ava kirin, di destpêka desthilata Romanî de, li ser vê deverê.

Ev perestgeh wêran bûye, û çi nivîsandin – nîne ku dema avakirina wê bide xuya kirin. Tête gotin ku Şêx Mihmed Berekat bûye pakrewan di cenga Xaçperest û Musilmana de. Û hatiye veşartin di hundirê benda wê perestgeha pût perestî de. Ev aramgeha şêx Berekat – pîroz e, li nik Musilman û Durziyan, û Êzîdî jî, serdana wê dikin, di çarşema pêşîn de, ji meha nîsanê, û xwe bi wê pîrozbahî dikin. Rê ya serdana şêx Berekat – ev e: Efrîn,Torindê, Îndarê, Basûta, Birc Evdalo, Xezzêwiyê, Dêr Sem'an, Dar 'Ezze, perestgeha Şêx Berekat.

## *Geliyên Çiyayê Kurmênc:*

**A-** Geliyê Tîran: ev gelî dikeve paş gundê Ketex, li ser rêya Efrînê -Raco.

**B-** Geliyê Cirqa: Ev gelî dikeve devera çiyayê Bilal.

**C-** Geliyê Salan: Ev dikeve devera çiyayên Xwastiyan, li rojavaya gundên Şêtka û Mîrka.

**Ç-** Geliyên çiyayê Lêlûn:

**1-** Geliyê Qertel: Ev gelî, ji gundê Bî'iyê dest pê dike, û li xake rasta Xezzêwiyê – dawî li wî têt.

**2-** Geliyê Hisêniyê: li bakura geliyê Qertel dikeve, û li xake rasta 'Xezzêwiyê – dawî li wî têt.

**3-** Geliyê piling: Ev gelî, ji rojavaya Bî'iyê dest pê dike, û li başûra rojhilata 'Xezzêwiyê, dawî li wî têt. navdana vî gelî yî bi navê "Geliyê Piling" bi hoya ku pilingek li wî geliyî – hebû, ku tarişê wê deverê dikuştin, û paş ê xwediyên tariş ew piling kuşt in.

**4-** Geliyê Şikefta Duderî: Ev gelî ji rojavaya Biradê – dest pê dike, û li xake rasta 'Xezzêwiyê û Birc Evdalo dawî li wî têt. Li vî geliyê ha, şikeftek Duderî û kevnar he ye, derî yê bakur û mezin 8 m. û derî yê başûr ji wî biçûktire. pîvana şikeftê 60 m. di 40 m. de ye, û rûberê wê dibe 2400 m. çar goşe. Erkiyolociyê Yabanî Takîra Akazawa, di lêdiwanek xwe de, li Helebê, di sala 1996 de, li ser vê şikeftê dibêje: "Di meha 8 de ji sala 1993, şandek Sûrî-Yabanî, di lêgerînên xwe de, li şûnwarên şehristanî, bi ser mirovê Niyandirtal – ve bûn, bi dîtina kelexê hestiyê zarokekî, ji wan deman ku temenê wî – di navbera 40hezar - 200 hezar sal berî ya zayînê de ye". Xuya ye ku navê "Duderî " – Kurdî ye.

**5-** Geliyê Kûr: Ev gelî ji gundê Kîmarê, bi aliyê rojava de diçe, ta digihêje xake rasta Birc Evdalo.

**6-** Geliyê Lûlikê: Ev gelî, ji bakurê rojavaya gundê So'xankê dirêj dibe, ta digihêje gundê Kurzêlê dawî li wî têt.

**7-** Geliyê Şikefta Sor: Ev gelî, ji gundê Gobelê, bi aliyê rojava de diçe, û di bakurê gundê Dêrmişmiş de– diçe ser gelî yê Lûlikê.

**8-** Geliyê Kûr hingivê: Ev gelî, ji gundê So'xankê, bi başûr de – diçe gundê Meyyase, paş ê bi rojhilat de -diçe, paşê bi başûr de – diçe gundê Kevir hişîn.



# Şûnwarên Nebî Horî (Qorş)

Ev şûnwarên vî bajarê kevnar – dikevin bakurê rojhilata Efrînê, bi 23 k. m. Li tenişta wan şûnwaran, çemê Sabûnsî – berjêr dibe. Ev şûnwar, li bilindiyekê ne, û avahiyên wan – hatine xwar û kevirên wan belav bûne. Li çar hawîra vî bajarê wêran, bendek kevnar heye, û deriyek li bakur, û yek li başûrê vê bendê hene. Di orta bendê de, dêrek heye, û li rojavaya wê dêrê, stûnên kevir yên bi parsû – hene.

Temaşexaneya vî bajarî 24 rêzên niştegehin, û li jora temaşexaneyê, kevanekî fireh heye, ji bo rêbuwara temaşevanan, û li jêra temaşexaneyê jî, rêbuwarek bilindtir ji cihê orkistera (cihê birra mûsîqî) –heye.

Diyare ku bandora demên (1550 berî Zayînê) desthilata Horiyên Kurd, li ser niştecihên Çiyayê Kurmênc – gelek xurt e, çikû ta nuha jî, mêr û jinên vê deverê, bi piranî têne navdan, bi navên: Horo, Horîk, Horî, Horê… Her wiha xuya ye ku bandora baweriya bi Xudawendê Pend û Nivîsandinê "Nabo, Nebo" li ser niştecihên Çiyayê Kurmênc û niştecihên Mîzobotamya – xurt e, çikû gelek mêr û jinên wan deveran – têne navdan: Nebo, Nebî, Nebê, Nebokê… û ji ber vê yekê, navê vî cihê dîrokî – ma ye "Nebî Horî".

Xudawend "Nebo" – nav daye, ji sed saliya 9 berî zayînê, û hatiye perestin, ta sed saliya 3 ê Z, û perestgehên vî Xudawendî – dihatin navdan "Êzîda". Ev belgeye bo kevnariya ola Êzîdî.



***Nebî Horî***

# *Kurdên Horî*

Ew hinek ji hozên Hindo-Arî ne, niştecih bûn li devera bakurê orta herdû Ferata, li çiyayê Toros, di navbera Girgamêş (Cerablus) û deryaçeya Wanê de.

Dîroknas Horist Kingil dibêje: "Xuyabûna Horiya li wê deverê – di orta demên hezarê sêyemîn ê berî zayînê de bû, û bûn serdarên gelek bajarên Sûrî". Û Girnot Filhilm, di pertûka "Horî, dîroka wan, şehristaniya wan" wergerandin û lêdiwana Dr. Farûq Isma'îl de, dibêje: "Belge yên hatine derxistin ji şûnwarên Şahîtiya Marî ya Feratî, wêneyekî berfireh, ji me re – pêş kêş dike, ji xwehermenda (dewleta) Horî, ew a ku niştecihên wê, bi zimanê Horî – dipeyivîn, li gorey jimartina navên kesên ku niştecih bûn, li wê devera fireh, li başûra zincîra çiyayê Toros û rojhilata deryaya Sipî ya Navendî.

Horî, bi zimanê xwe yê taybet–dipeyivîn, ew zimanê, bi giştî cudabû ji zimanê Somerî û Ekadî, çikû ew navên hatine derxistin, li wan deverên şûnwaran – navên Horî yên li xurû bûn. Û ta nêzîkî 1650 beriya zayînê, serdestiya durv û surişte Horî, li şûnwarên devera Heleb û Alalax (li rojavaya sînorê Çiyayê kurmênc) – xuya dibe, ne tenê di navên kesan de, lê hem di nasnameya civakê oldarî û siloganên oldarî de jî".

Damezrandina desthilata Horiya û xurtiya wan, piştî ketina Imperatoriya Ekadî û nemana serdestiya Kûtiya – bû [(1)]. Dema Şahê Horî ew ê dihat navdan "Etil şîn" yan "Arê şîn",

Payetextê wî li bajarê Orkêş – bû. Ew bajar li şûnwarên girê Moza ye, li devera bajarê Amûdê yê dikeve sê-goşeya Xabûr li navbera van hersê bajaran; Serê kaniyê, Hesekê û Qamişlo. Û

fermandariya Şahê Orkêş – digiha çemê Diyalê, li başûra Kurdistana 'Iraqê, û ji bakur de, di devera Wanê de derbas dibû (2).

Ji alîkî dî ve, Di sala 1948 de Spayzer Gotiye:"Somerî û Babiliya didîtin, ku zimanê Horiyan – Sobertî ye" ango zimanê herduwa yeke. Û Sobertî kevnar û resenên welatê Midiya ne, û li tenişta Kardoya ne û Kurd dibin neviyên wan.

Û belgeyên şûnwarên ku hatine dîtin li Til Birak (li Cizîrê ye) û Nozê (li nêzîkî Kerkûkê ye) – dupat dikin ku ev herdu şûnwar, cihên serweriya zimanê Horî bûn, di demên hezarsaliya duwem de, berî Zayînê.

Hin deqên nivîsandî yên hatine dîtin di şûnwarên Alalax (Telil-Etşan, ew ê nêzîkî sînorê çiyayê Kurmênc e, ji başûrê rojava de, li ser çemê Asî), di van nivîsandinên demên1560 berî zayînê de, navên Horî, bi rêjeyek pir hene.

Her wiha, di nivîsanndinên şûnwarên Marî de, li devera Ebû Kemal, hin navên Horî hene, wek navên ku li şûnwarên Çaxir bazar in. Ev tev belgene ku desthilata Horî, li deverek fireh ji Sûriya – belav bûye, nemaze ew deverên ku Kurd nuha li wan niştecihin, wek devera Çiyayê Kurmênc û Cizîrê.

---

**(1)- Dr. Cemal Reşîd. Dr. Fewzî Reşîd. Dîroka Kurda ya kevnar.**
**(2)- Govara Salnameya şûnwarên Sûrî, derpêç 4, beşê 1,2 rûpel 238.**

# *Kurdên Mîtanî*

Desthilata Mîtaniyan – fireh bû, bi aliyê rojavaya Ferat de, di sala 1470 berî zayînê de. Heleb, wê demê, serbixwe bû, şoreşek li wê vêket, û Mîtaniyan piştgiriya wê şoreşê kirin, û di encamê de, Dirêmî kurê Şahê Helebê yê dawîn – naçarî revê bû, û gelek sal, li deverên biyanî ma, û Şahê Mîtanî, di wê qona'xê de, desthilata xwe fireh kir, ta giha deryaya Sipî ya Navendî [(1)]. Û ji bilî Biratana, sê Şahên din ,Şûtirna, Paras-Tatar, û Çawîş Tatar –li ser textê Şahîtiya Mîtanî rûniştine, her wekî ku navên wan – hatine, di nameyeke di şûnwarên Nozê de, hatiye dîtin. Şahîtiya Mîtanî – gihişte kopika xurtî ya xwe, di demên Çawîş tatar de, di destpêka sedsaliya 15ê berî Zayînê de, çikû gihişte deryaya Sipî ji rojava de, û tevaya bakurê Sûriya, ta Qitînê, li nêzîkî bajarê Hims, û ta beşekî mezin ji bakurê Iraqê [(2)].

Piştî Biratana, Çawîş Tatar–hate ser fermandariya Mîtan, û di wê qona'xê de, Milmilanî kete navbera Misrê û Mîtaniyan de, ji bo serweriya li ser bakurê Sûriya. Ew Milmilanî dirêj bû, ta demên Fir'ewn Tihutmis ê çarem (1400 - 1390 ê berî Zayînê).

Hin teqelayên xweşbûna pêwendan, di navbera Misrê û Mîtaniyan de, hatin kirin, û di demên Şahê Mîtanî Artatma yê pêşîn de, pêwendên navbera Mîtaniyan û Misrê –xweş bûn, û di pişt re xweştir bûn, di navbera Şûntra û Fir'ewnê Misrê de. Paşê herdû malbatên fermandar, bi jinan gihan hev, gava Şahê Mîtanî keça xwe Titoxba (Nifirtîtî ya spehî) da Fir'ewnê Misrê. Hin nivîsandinên şûnwarên Misrê ku li Tellil 'Emarne

– hatine dîtin, amaje dikin ku bandora Nifirtîtî, li ser Misrê – xurt bû, ji aliyê ku oldariya Misrî –hate guhertin, bi oldariya Mîtanî, bi awakî ku Nifirtîtî perestina Xudawendê Mîtanî – guhest welatê Misrê, nemaze Xudawendê Rojê, ta radeya ku Exnaton, navê payetextê xwe guhert, û ew navda "bajarê Rojê". Tiştê sirinckêş – ew e ku navê zîrevanê Nifirtîtî "Mamo" bû, bê guman ev nav Kurdî ye.

**(1) – Girnot Filhilm, wergerandina Dr. Farûq Isma'îl (Horî, dîroka wan, û şaristaniya wan).**
**(2)- Dr. Cemal Reşîd, Dr. Fewzî Reşîd, (Dîroka Kurd ya kevnar).**



## *Şûnwarên Horî û Mîtaniyan li Sûriya:*

**1-** Peykerê kevirî yê serê Xudawendekî Mîtanî, li xwêgeha Cubûl – xuya bû. Ew peyker nuha li mûzexaneya Lover e, li Parîs.

**2-** Peykerekî bironzî ku xuya bû, li "Tellil Muşrife" li şûnwarên bajarê Qitîne, li nêzîkî bajarê Hims, ew şûnwarên ku Kont Dî Boyson, di sî yên sedsaliya 20 an de, kolan û lêgerîn, li devera wan dikir. Ev serî yê Bironzî ji nimûneyê wî serî yê kevirî ku li xwêgeha Cubûl – hate dîtin.

**3-** keleha Helebê: Peykerên du Xudawendên Mîtanî yên xwedî-bask ku bi destên xwe, kulora roja di hundirê heyvê de – hildidin.

**4-** Li gundê Şêx Se'îd, nêzîkî bajarê Şamê, peykerekî Mîtanî yê mezin, ji kevirên volkanî – hate dîtin.

**5-** Hin şûnwarên Mîtanî hatin dîtin, li Til Helef, nêzîkî bajarê "Serê kaniyê", ew ên ku mamosta Codis, di govara Muqtetef ya Misrî de, di rûpela 203, hijmara Tîrmeha 1938 de, dibêje: "ew şûnwar Mîtanî ne".

**6-** Zimanê Horî-Mîtanî, xweş belav bûye di sedsaliya 14 berî zayînê de, li devera navenda Sûriya, ta gihiştiye Qitîne û Qadiş, li bakur û başûrê bajarê Hims. Û di

bûyerên dema êrîşên Şahê Hitî "Xitoşîlî" yê pêşîn de, li ser bakurê Sûriya,di dema 1560 berî zayînê de,ta dagerkirin û wêrankirina bajarê Alalax (Tel 'etşan) – di

depekî şûnwarî yê nivîsandî de, navê serdarekî ji devera Helebê têt, bi navê "Zikreşî", bi wateya dilhişkî. Ev nav Kurdî ye, bê guman û li devera desthilata Horî û Mîtaniya ye.

**7-** Girnot Fêlhilm, di lêgerînên xwe yên şûnwarî de, li 0devera Marî ( nêzîkî Ebû Kemal e), û li Ras Şemra – dibêje:"Hin depên şûnwarî yên nivîsandî bi zimanê Horî, xuya bûne".

**8-** Her wiha li şûnwarên Tel Etşan, li başûrê rojavayê Çiyayê Kurmênc, û li şûnwarên Ûgarît, li perava Deryaya sipî ya navendî, li Sûriya – di lêgerînên şûnwarî de, hezarên navên Horî – hatine dîtin, digel belgeyên şehristaniya Horî.  Ev tev didin xuyakirin ku Horî û Mîtanî, demek dirêj – ma ne fermandarên bakur û rojavaya Sûrî, û bi zimanê wan, dep û belgeyên dîrokî – hatine tomarkirin, di demên nîvê duwem, ji hezarê duwemê berî zayînê de.

Şahîtiya Mîtaniya ket, bi destên Aşûriyan. Nivîsandinên şûnwarî yên Şilminser ê pêşîn (1273 –1244 berî Zayînê) didin xuya kirin, ku wî navenda fermandariya Mîtaniyan "Xanê Cilbit" dager kiriye û wêran kiriye.

# *Depên Babilî yên şûnwarî li ser firtoneya Pey'xember Nû'h*

Ev depên nivîsandina Bizmarî – hatine parastin li mûze-xane ya Berîtanî. Dr.Lambirt û hevalê wî Miller, li ser Wan depan, pertûkek danîne. Paşê vekolînerê Iraqî Ebdillah Zehawî ew ê ku14 sal derbas kirine di karê vekolînê de,li nav bawernameyên mûzexaneya Berîtanî –lêdiwan ê li ser naveroka wan depan dike, di rojnameya Ehram de.

Rojnameya Ehram ya Misrî di hijmara 15 – 10, 1984 de, hevdîtinek digel mamosta Ebdillah Zehawî – belav kiriye, di wê de, dibêje: Min, pertûka "Çîroka Babiliyan û Firtoneya Nûh" ya danerên Berîtanî Dr. Lambirt û hevalê wî Miller – xweş xwendiye, û min dît wan, babetên ku depên şûnwarî ji wan dipeyivin –ne ravekirine û ne wergerandine.

Û hem Zehawî dibêje: Ez, di hêma û tîpên nivîsandî li ser wan depan, gihişt im û min mamikên wan – nas kirin, û kilîdanên wan vekirin.

Ji zimanê wan yê resen yê ku hatiye nivîsandin, bi awakî tev lihev, di navbera zimanê Kurdî û nivîsandina Bizmarî, û wergerandina wan bi zimanê Ingilîzî de.

Û Mamosta Zehawî dupat dike ku navê nivîskarê wan depan "Bira soz e", bi wateya birayê evîndar, û ew yeke ji firzendên Pey'xember "Nûh", û wî peyvek di wan depan de – nivîsandiye ku ew wateya nivîsandina xwe nizane, çikû ew peyvên Xudayê perwerdekar in.

Rojnameya "Sewt urrafideyn" beşek ji wê hevdîtina "Ehram" wergirtiye, û dibêje: "wan depên şûnwarî, dane xuya kirin razên Firtoneyê, û awayê rûdana wê, û cihê rawestina gemiya 0Nûh, û bajarê pêşîn ku li wî niştecih bû ye, û jimara zaruwên wî yên nêr û yên mê ku digel wî reha bûne, û hem amaje kirine, bi bal cihê gorra Nûh û hevjîna wî "

# *Nerînek Kurt li ser ola Êzîdî*

Ev ol kevnar e, hin ji dîrokzanan, wê dibînin çuqulîkek, ji ola Zeradeştî, û hinek wê dikin olek kevnartir, ji Zeradeştiyê, û hin wê dibînin Zeradeştî bi xwe. Derwîş ê Heso, vekolînerê bawermendên Êzîdî, dibêje: "Jiyana Zeradeşt di demên desthilata Mîdî de bû, û beriya wê demê, hin gelên Arî bawerî bi yektiya Xwedê – di anîn, û xwe nav didan bi (Êzîdahî)". Lê gumana nêzîktirî rastiyê ew e00 ku Zeradeştiyên li deverê – bûne du beş, yên li rojhilat û yên Kurd û li rojava. Ên rojhilat man li ser navê Zeradeşt, û yên Kurd û li rojava, xwe navdan "Yezdanî" yan "Êzîdahî". Û yên rojava hin guhertinên bawermendî – gihan baweriyên wan, bi hoyên bandor û çewisandina oldarên Filleh û Musilmanan, ta ku ola Êzîdî xuyabû wek olek serbixwe, ji ola Zeradeştî.

**Hin baweriyên Êzîdiyan:**

Dîrokzanê Yûnanî Kizînfon yê sedsaliya 4ê Z, di Sali'xên wan deverên ku helmetaYûnanî, di wan re, derbas bûye, dibêje di Sali'xê çemê Efrîn ku wî nav dide çemê Berna: "Çem tijî masiyên kedî bû, ew ên ku Sûriyan ew didîtin Xudawend, ne rewa ye ku kes, wan bi êşîne". Bawermendiya Êzîdî, nêçîra masiyan nerewa dibîne, bi hoya pîrozdariya masî, di baweriya Êzîdî de.

Di nizayek xwe de Êzîdî dibêjin: "Hûn bidin xatirê Erş û Kursî, û ga û masî ".

Û ji firindeyê Tawus re, pileyek bilind heye, di baweriya Êzîdî de, çikû ew bawerin ku Xwedê Firişteyê Tawus, berî her tiştî – afirandiye, û bawerin ku firişte Tawus (Cibra'îl), bi fermana Xwedê – hebûnê digerîne. Û Êzîdî wî nav didin "Pîrê kar", û ew serekê her heft Firişteyên mezin e, û Qasidê navbera Xwedê û firişteya ye, û hem di navbera Xwedê û mirov-zadeyan de jî. Û di vê nizayê de, navê wî tête gotin:

"Hûn bidin xatirê çerxan û felek, Horiyan û melek,

sura Tawusî Melek, û çarde tebek".

(ango 7 tebek asiman, û 7 tebek zemîn).

Û wêneyên Tawusî Melek, li hemî perestgehên Êzîdî hene. Û peykerê Melekî Tawus yê bironzî – pîroz e, li nik Êzîdiyan, û wî nav didin "Sinceq". Li çar hawîr wî, didanişin, û nizayên Êzîdahî dikin, bi zimanê Kurdî, û bi amadebûna Goyer (Qewwal). Di vê demê de, 7 peykerên bironzî yên Melekî Tawus – hene, û belavbûyîne li deverên civakên Êzîdiyan, li Cihanê:

**1-** Tawusê Şêxan.

**2-**Tawusê Şingalê.

**3-** Tawusê Helebê.

**4-** Tawusê Xalitan.

**5-**Tawusê çiyayê Hekarî.

**6-** Tawusê Ermênya.

**7-** Tawusê Tebrîzê.

Hem ji Rojê re jî, pîroziyek bilind heye, di ola Êzîdî de. Roj bergeha Êzîdiya ye, di dema perestinê de, berê xwe didin wê, çikû ew ji şewqa Xwedê ye. Êzîdî berê xwe didin rojê, ça'xa berî ku roj hilê, û nizayan (du'a) dibêjin, û sirûd û gotinên bi

terazû dixwînin, piştî rojhilat. Her wiha piştî ku roj diçe ava. Niza û sirûd û peyvên bi terazû tev, bi zimanê Kurdî ne.

Xaçê Êzîdî jî, cihê giringiyek oldarî ye, li nik Êzîdiyan. Ew ne wek Xaçê Filleha ye, çikû her çar aliyên wî wek hev in, û bawerî ew e ku her çar aliyên wî di rewşa asoyî de –hêmayên her çar bergehên Cihan in; rojhilat, rojava, başûr û bakur, û her aliyek ji wî Xaçî berê xwe – dide aliyekî Cihanê. Û hin dibînin ku her çar rexên Xaç – hêmayên her çar regezên hebûnê ne; av, Ax, ba û Agir. Ev ravekirin –digunce, bi deqa perçeyekî, ji Mushefa reş, ku dibêje: "Û Xwedayê perwerdekar, ferman da Cibra'îl ku axê ji çar goşeyên Cihanê bîne, û Cibra'îl ax, ba, agir û av – anîn, û ji van teva, Xwedê Ademê Pêşîn – afirand, û ji karîna xwe, can berdayê, û ferman da Cibra'îl ku Adem têxe Bihiştê, û bila êmîşê dara bixwe, lê pêwîst e ku genim ne xwe. Hem ev ravekirin – digunce bi gotina hêmayê netewiya Kurdî, Ehmedê Xanî re, ku di pertûka Nûbuhar de dibêje:

**''Bizan çar in 'Enasir, Ax û Av û Ba û Agir, hem**

**Mewalîdin, ev in her sê; nebat û me'edin û heywan''.**

Sirinckêşe ku hin Kurdên hevdem wêneyê Xaçê Êzîdî li ser Eniya nexweşên xwe nigar dikin bi teniyê, û dibêjin: "Sa'xlem û da'xlem". Xuya ye ev ji bandora bawermendiya Êzîdiye ku li nik Kurdên ne Êzîdî ma ye.

Hem Ga jî cihê rêzgirtin û pîroziyê ye, li nik Êzîdiyan. Û bi me re, berê derbas bû, ev nizaya şevê, ew a ku ji pîroziya

Ga – di axive: "Hûn bidine xatirê 'Erş û Kursî, Ga û Masî".

Li gundê Xerab şems, li devera Çiyayê Kurmênc, perestgehek Êzîdî heye, dema avakirina wê, berî Zayînê ye, li jora perwaza deriyê wê, kulora Rojê û Xaçekî aliyên wî wek hev,

û heyv û du seriyên Ga – hatine nigar kirin. Ev danîna serê Ga li tenişta Rojê, pileya pîrozdariya Ga dide xuyakirin. Hem di Evista de gelek deq hene, ji pîrozdariya Ga di axivin. Bi hoya karê Ga, di tevrakirina xaka zemînê de, ji bo çandinî û behredariya zemînê, ev ajelê bi sûd – pîroz e, li nik Êzîdî û tevaya Zeradeştiyan. Vekolîner Ebdellah Heccar, di pertûka "Şûnwarên çiyayê Sem'an" de, dibêje: "Dêra Colyanos, li gundê Biradê – hatiye ava kirin, li ser bingehê perest-gehek pûtxane". Û zorbeya vekolînerên şûnwaran – amaje dikin ku piraniya dêrên devera Çiyayê Kurmênc – hatine ava kirin li ser bingehên perestgehên Êzîdî yên berî Zayînê. Hebûna wan perestgehên Êzîdî yên kevnar – dide xuya kirin ku ew Êzîdî niştecihên vê deverê bûn, ji hezarên salan de.

**Pîrozgehên Êzîdiyan:**

**1-** Pîrozgeha Laleş: Ev dikeve Kurdistana Iraqê, li devera Duhokê, ev Pîrozdariya Laleş, bi hoya ku ew cihê pêşîne ku Melekî Tawus, li wî daketiye ser rû yê zemînê, di Çarşema pêşîn, ji meha Nîsanê de. Di Laleş de, gelek aramgeh û ser-dangehên Pîrên Êzîdiyan – hene. Pîroziya Laleş, li nik Êzîdiyan – wek ya Ke'ebeyê ye, li nik Musilmanan.

**2-** Laleş tête navdan "Laleşê Nûranî" çikû şewqdare, bi şewqa Xwedê. Dema Pîrozbahiya salane, bi Laleş, di heftiya dawîn de ye, ji Adara Xawerî (bi roznameya rojhilatî), dawî li wê pîrozbahiya oldarî têt – di cejna sersalê de, ango cejna Melekî Tawus, di serê Nîsana xawerî de.

**Perestina Êzîdiyan:**

**A- Nimêja wan:** dest û ruwên xwe dişon, bi avê, û rabûkî berê xwe didin rojhilat, gava nuh roj derdikeve, û destên xwe didin ser hev, bi sehm, û nizaya (du'aya) beyanê –

dixwînin. Û dema nîv rojê, berê xwe – didin Laleşê Nûranî, û nizaya taybet dibêjin.

**B- Rojiya Êzîdiyan:** Her sê rojên Sêşem û Çarşem û Pêncşemê, ji heftiya pêşîn, ji meha Berçille, bi Roznameya Xawerî – rojî digirin, bê xwarin û vexwarin…ji beyanê ta êvarê, û roja Înê dibe cejna Êzîdî.

**C- Cejnên Êzîdiyan:**

**1-** Cejna Sersalê: Ev dikeve yekê Nîsana Xawerî, ango 14ê Nîsana Zayînî.

**2-** Cejna Çilleyê Havînê: Ev dest pê dibe, di 11ê Tîrmehê de, û di 16ê wê de dawî li cejnê têt, bi roznameya Xawerî, ango 5 rojin.

**3-** Cejna Cema ya Şerfedîn: Ev cejn di payîzê de ye, heft rojan dirêj dike, Êzêdî tev pîroz bahiyê bi wê dikin, di wê de dîlan û sema têne li darxistin, digel gorî û qurban û serdana cihên pîroz li çiyayê Şingalê.

**4-** Cejna Êzîdî: Roja Îna pêşîn ji meha Berçille, bi roz-nameya Xawerî.

**5-** Cejna Bilinde: Ev dikeve 25 meha Berçille, bi roz-

Name ya xawerî.

**6-** Cejna 'Icwe: Ev dikeve roja 7 Çille, bi roznameya Xawerî.

**7-** Cejna Çilleyê Zivistanê: Ev dikeve 20 meha Çille, bi roznameya Xawerî.

**8-** Cejna Qurbanê: Ev dikeve roja 10ê meha 12 bi roz-nameya Mişextî ya heyvê, wek Cejna Musilmanan.

**9-** Cejna Xidir-Ilyas: Ev dikeve meha Reşeme (Sebat), bi roznameya Xawerî .

**10-** Cejna Çarşema sor: Ev dikeve roja Çarşema pêşîn, ji meha Nîsanê, bi roznameya Xawerî.

**11-** Cejna Boqetar Baba: Ev cejn, hoza Dinna pê radibin, di 17ê Gulanê de, li ser her maleke Dinna pêwîste ku pezekê serjê bikin.



Pîrek Êzîdî bi kêsima Folklorê Êzîdî yê dêrîn

# *Nerînek kurt li nasnameya Mîdiya (Mad)*

Mîdiya (Mad), ew xak û deverên ku sînorên wan, ji demên kevnar de – hatine nasîn, li ser navê Mîdiyan, ew sînor, ji bakur de, bi aliyê rojhilata başûr de – diçe, û li hember çemê Aras , dirêj dibe, ta digihêje Deryaçeya Qezwîn.

Ji rojhilat de, ew sînor – dirawsê yê deştên şor (deştên Kwîr) e, û ji başûr û rojava de, ew sînor – bi çiyayên Zagros ve ye. Bergeha dirêjiya Mîdiya – bi aliyê rojhilata başûr û bakurê rojava ve ye.

**Di cuxrafiya dîrokî de, Mîdiya dibe Sê perçe:**

**A-** Mîdiya Atrobanî: Ewa ku ji çemê Aras, bi aliyê rojhilata başûr de diçe, ta digihêje devera deryaçeya Urumya û çemê Vexto û çemên din ku dirijin di Urumya de, û çemê Sorê dirêj (Qizil Uzun) ku çiyayên Bûriz (Bûrizandina berfê gerra wê li hawîr xwe, bi bandora bayê xurt) – dibirre, û li nêzîk bajarê "Reşt" dirije di deryaçeya Qezwîn de. Di vî perçeyê Atro-banî de, hin ji gelên Îranî û Azirbêcanî jî hene. Û 200 k. m. ji çiyayên Zagros jî – di vî perçeyî de ne.

**B-** Mîdiya biçûk: Ev perçe dikeve navbera du zincîrên çiya, ji bakur de, çiyayên Demawend, û ji başûr de, çiyayên Rod, ku dirêj dibin li hembera çiyayên Zagros,

ango ji bakur ê rojava de, bi aliyê başûrê rojhilat de – diçin. Û li bşûrê rojhilata Mîdiya biçûk, deştên Kwîr û şor in.

Ikbatan (Hemedan a nuha), payetextê Mîdiya – bû, û dikeve navbera Mîdiya Atrobanî û Mîdiya biçûk de, li qontara çiya yên Wend e, û niştecihên wê – ji ava berfên wan çiya

vedixwarin. Û devera Ikbatan behredar e, bi sê çemên ku ji wan çiya berjêr dibin, bi aliyê navenda Mîdiya biçûk de:

**1-**Çemê Ebher-ca, ji bakurê rojava – der dibe.

**2-**Çemê Qereso, ji rojavaya Hemedanê – der dibe.

**3-**Çemê Qum, ji başûrê rojava der dibe. Ev her sê çem, ji qontarên çiyayên Bûriz – diçin, bi aliyê deryaçeyên Sultan û Xwê ve, û gelek xakên Mîdiya biçûk av didin. Lê ew çiyayên dikevin başûra Mîdiya biçûk – reng zer û cûn in, û kêm sûd in, ji bo çandiniyê.

**C-** Partakna: Ev perçe jî, dikeve navbera du zincîrên çiya, ew ên digihên çiyayên Zagros. Ji bakurê rojhilata Partakna, çiyayên Rod in. Û ji başûr de, zincîrek ji çiyayên ku digihên çiyayên Zagros. Çemê Rod, devera Partakna – av dide. Û ew Çiyayên jêra Partakna – kêm baran in, û xizantirin, ji xakên Mîdiya biçûk. Welatê Persîd (Furs) yên kevnar dikeve başûrê rojhilata Partakna, û herdû çemên Qarûn û Kerxe,wî welatî av didin. Û deverên Êlam û Sûzyan (Şûş) – bi vê deverê ve ne, û têne jimartin, ji deverên şehristaniyên kevnar.

Li gorey jêderên dîrokî û şûnwarên kevnar, û nivîsînên Bizmarî, li devera rojavaya deryaçeya Qezwîn, hin hoz û

komelên niştecih – hebûn, wek Lolo, Gotî, û kasî…û hin mişextên hozên Iranî – hatin wan deveran, û ew niştecihên kevnar, di nav wan mişextan de – pişivîn, û winda bûn. Û piştî demekê, tevaya wan desthilatek pêk anîn, bi navê "Mîdiya" yan "Mad".

Bi giştî du komelên Îranî, li devera rojhilata navîn xuyabûn, di sedsaliya 8 û 7 ên berî Zayînê de, Komelê Mîdî, û komelê Parsa (Farisa). Û navên fermandarên van her dû komelan, û

bêje û zimanên wan tevde – didin xuyakirin yektiya nijadê wan.

Hêjaye ku bête zanîn, piştî komelê Mîdî pêk hat, û desthilat wergirt, navê Parsa, li devera Mîdiya – winda bû, ta ku li başûra deryaçeya Urumya jî, navê Parsa –ne ma. Diyare ku Parsa (Faris) – ketin devera jêrîn, û Mîdî man li devera bakurê rojava û tevaya deverên çiyayê Zagros. Û Mîdiyan devera desthilata xwe – fireh kirin, û ew komel û hozên berê – ketin bin bandora wan, ta ku pişivîn di nav komelên desthilata Mîdî de. Diyare ku komelên xurt, li wan deverên Mîdî – Kurd bûn, çikû komelên Kardo û Sobarî li navbera Qezwîn û Urumya bûn, û Horî û Mîtanî li navbera herdû Feratan û bakurê Sûriya bûn, û ev her çar mezintirîn komelên Mîdiya bûn, ev her çar pêşiyên Kurda ne, li gorey dupatkirina dîrokzan û Erkiyolociyan.

Li gorey dîroknasê Yûnanî Hîrodîtis, desthilata Aşûrî serdestî, li hoz û komelên Mîdî dikirin, çikû desthilata Mîdî nuh bû û hêj hevgirtina xwe – durist nekiribû. Şahê pêşîn yê

Mîdiya ku desthilata Mîdiyan damezrand – Diyok bû. Ew bû, yê ku bajarê Ikbatan, payetextê Mîdiya – ava kir, û

fermandariya Mîdiya kir, dirêjiya 53 salan,bi awakî durist. Paşê Mîdiyan desthilata xwe – xurt kirin, û hin serketinên

giring – pêk anîn. Desthilata Orato, li devera deryaçeya Wanê – têk dan. Û piştî Diyok kurê wî Firaort – kete cihê wî, bû Şahê Mîdiya, û hoz û komelên Mîdiya – xistin bin destê xwe, û fermandarî li wan kir 22 salan, û bi xurtî dijî Aşûriyan – têkoşîn kir, lê Aşûriyan her destdirêjî li ser hoz û komelên Mîdî dikirin, û êrîş berdidan ser xakên Mîdiyên ku ji bin bandora wan derketibûn.

Di yekê ji wan cengên dijî Aşûriyan de, Firaort hate kuştin, û kurê wî Keya Iksar (Key Xusro) leşkerê Mîdî da ser hev û rêkxist, û çil salî fermandariya Mîdiya kir, û kar kir ku payetextê Aşûriyan Neynewa – dager bike, û desthilata wan têk bide, lê hozên Iskîtî, bi serdariya Madaya kurê Birotîtî – di hana Aşûriyan de hatin, û bajarê Neynewa ji dorpêçê – reha kirin, û Iskîtî man serdest li ser Mîdiya 28 salan, bi hoya piştgiriya Aşûriyan ji wan re. Lê Keya Iksar piştî wê demê, Iskîtî şikandin û xistin bin destê xwe, û serketina mezin ji Mîdiya re pêk anî ku bi piştgiriya Babiliyan, desthilata Aşûrî ya xurt şikand, û bajarê Neynewa payetextê Aşûriyan, dager kir, di sala 612 berî Zayînê de. Her wiha hozên Iskîtî qewirandin ew ên ku dijî Mîdiyan kar dikirin, bi piştgiriya Aşûriyan, ta ku ew dûr kirin ji deverên Mîdiya, û ew gihandin devera Lîdiya li Asya biçûk, lê Keya Iksar, xiniziya Iskîtiyan jibîr nekir, û hem xwest ku devera desthilata xwe – firehtir bike, bi cenga dijî Şahê Lîdiya "Salyat", di salên 590 – 585 berî Zayînê de. Lê di şerê dawî de, roj hate girtin (bê şewq bû) û herdû aliyên cengê – bawer kirin ku ew rojgirtin, wane û nîşanek gefdariya Xudawendî ye, dijî dirêjbûna wê cengê. Û bi navinciya Şahê Kîlîkiya Sîdnîs û Şahê Babil Layenît, herdû aliyên cengê – li hev hatin û peymana wê lihevhatinê girêdan. Û sînorê nav Mîdiya û Lîdiya – bû çemê Qizilyermaq , li Asya biçûk.

Piştî Keya Iksar, kurê wî Istiyak – ket cihê wî, bû Şahê Mîdiya û keça Salyat, Şahê Lîdiya, ji xwe re anî, û 35 salan, di desthilata Mîdiya de – ma. Û bi hoya tevgerên Harbak yê ku ji mezinên Mîdî bû, û dijî Keya Iksar bû, û bi pîlangêriya Şahê Parsa Korş digel Harbak, desthilata Mîdiya ji destê Istiyak der ket, û Korş Şahîtiya Mîdiya jî wergirt, digel ku dê ya Korş Mandana, keça Keya Iksar bû, û Korş xwarzayê

Istiyak bû, lê diyare ku emekdarî –na keve têgihiştina kesên bê bîr û bawerî.

Û Şahîtiya Mîdiya têk çû di sala 550 – 549 berî Zayînê de.

Tev ku Mîdî û Parsa Pismamên Hev bûn, yan birayên ji dê û bavekî bûn, her wekî Mînoriskî gotiye, lê gava fermandarî ji Mîdiyan – giha Parsa, bi Mîdiyan giran bû, û gelek raperînên Mîdî – rû dan, dijî Şahên Parsa, wek raperîna dijî Dara çê bû, û xuya ye her ku raperînek çê dibû, û bi ser ne diket, piştî şikestina wê, beşek ji Mîdiyan, bi aliyê rojava de mişext dibûn û li devera rojava pirtir dibûn.

Qona'xa dawîn, ji çalakiyên Mîdiyan di dema helmeta Iskender ya li ser Îran de bû (331–223 berî Zayînê), gava ku Etropat yê ku berê serleşkerê Darayê sêyem bû, desthilatek nuh li Mîdiya biçûk – damezrand, li devera Azirbêcana başûr ya nuha, û nav lê danî "Etropatkan" û tevaya jêmayên Mîdî di wê de civiyan.

**Mînoriskî dibêje: "Ev Mîdiyên Kurd ku mişext bûn, ji ber zora Parsa, û belav bûn li nava geliyên çiya û hozên biyanî ku ew biyanî nuha nema ne, lê em navên wan zanin ji jêder ên kevnar, bi çavgirtina ji wê cudatiya hêsa, di nav wan kurd an de, regezekî bingehî û pir xurt amaje dike bi bal yektiya Kurda ya kevnar, ew regez zimanê wa ye, digel têvelî û rengên zaravên wî zimanî, çikû ew ziman yekane ye, bi fontîk û dengên xwe, û bi rêzimana xwe. Ev ziman Îranî ye, tev ku cuda ye, ta sînorekî, ji zimanê Îranî yê serekî(Farisî). Gelo yektiya vî zimanê Kurdî ji ku hatiye, di gel wê belavbûna mezin, dinav wan deverên çiyayî ku Kurd li wan niştecih in?"**. Mînoriskî di nav de diçe û dibêje: **"Ev kêşe pêwîstî vekolînê ye, bi beramberkirina di nava tavaya bêje û navên Mîdî yên ma**

**ne, digel rewşa nuha ya zimanê kurdî, ev vekolîn ta nuha**, **bi cih ne bû ye. lê gava ez, bi tûj nerîna dîrokî, dinerim, û ez dibîra xwe tînim wan mişextbûnên hozên Îranî yên mezin, ez mişextbûnek dî, jibilî belav bûn û Mişextbûna Mîdiyan, çi wateyan nabînim jibo ravekirina belavbûna kurda, ta ku gihane devera başûra Enqera, li Asiya biçûk û li bakurê Sûriya. Û di vî babetê taybet de, ez xwe dispêrim piştgiriya nexşeya ci'xrafî ya deverên niştecihbûna Kurda, ew nexşeya ku geştiyarê Ingilîzî Mark Saykis ew ê ku berî cenga Cihana yekem – rabûye bi geştek bi salên dirêj, li deverên Kurdî''.**

Em dê hinekî li ser vekolîna Mark Saykis ( 1879 – 19 19) li

Ser wan cihên ku hozên Kurd, di dema wî de, li wan devera niştecih bûn – rawestin, çikû çalakiyên wî di wê vekolînê de, cihê rêzgirtinê ne, digel hin kêmasî û şaşiyên têde hene.

Mark Saykis fermanberekî konevanê Berîtaniye, bi geştek dirêj (7500 mîl) li ser pişta hespa – rabûye, li her çar kenarên Kurdistanê, di dema 1899 – 1906 de, û pertûkek bi navê (**Hozên Kurd li Imperatoriya Osmanlî) –** daniye**,** di sala 1908 de. Mark Saykis ewe pişkdarê rêkeftina Saykis – Pîko, di navbera Ingiltera û Firensa de.

Saykis dibêje: **''Di her deverek Kurda de, min wergêrekî ku bi zaravê wê deverê zanibe – digel xwe digerand, û ez bi axivtinên bê jimar rabûme, digel kesatiyên Polîs, qantirçî, mela, A'xayên hozan, şivanên pez, şarezayên hespa, posteguhêz, û hinên din ji pêkhatiyên dana pêzanînan''.**

Saykis ew vekolîna xwe kiriye şeş beş, bi sernameya her 6 tîpên pêşîn ji **A B C**.. ya Ingilîzî, ji bilî Pêşgotinê, û di dawiya

vekolînê de, nexşeyek ci'xrafî daniye, bi tevaya wan şeş deverên ku Kurd li wan akincî ne:

1-Devera **A**:dikeve başûra Kurdistanê, di navbera deştên Iraqê û deryaçeya Wanê de, û ji rojava de ta çemê Dicle. Di vê devera **A** de, Saykis navê 76 hozên kurd dibêje, piraniya wan li bakurê Iraqê ne.

2- Devera **B**: dikeve navbera geliyê Bedlîsê û **devera** A de, û ji rojavayê bakur de digihêje çemê Dicle, û ji bakur de, girêk û bilindiyên çiyayê Toros û jora çemê Ferat dibin sînor di navbera deverên **B** û **D** de. Saykis navên 31 hozên Kurd dibêje di vê deverê de. Giringên wan Şêxdodî, Bekira, Tîrika, Reşkota, Pencînara, Bişêriya, Sarihî, Celalî, Bozika, Kwîra. û li devera çiyayê Motka hozên Zazî (Keybûran, Kosan, Boba, Rûtçaba) û hozên Kurmanc Zêdan, Êrika, Pîr Mûsa, Silîva, Kurusa..., Millan, Keçela, Bextiyarî û Şawak..

3- Devera **C:** deverek firehe, dikeve jêr û navenda rojava ji Kurdistanê, ji çemê Ferata ta çemê Dicle, û ji geliyê Bedlîsê, ta devera Şingalê, û ji devera Urfa ta devera hozên Kurdî li Sûriya, li Xabûrê Serêkaniyê ta Kela Ce'berê. Saykis ji gelek hozên Kurdên vê deverê dipeyive, ji Beraziya, Qeregêçiya, Mirdêsiya, û pirtir ji 40 êlên ku xistine nav Millanê Paşê, digel ku hin ji wan ne ji vê hozê ne. Her wiha ji hozên kurd li devera çiyayê Mazî û tevaya devera Mardîn dipeyive; Sorika, Xeleca, Kîkan, Meşkîniya, Sûrgiçiya, Deqoriya, Mîrsiniya. Hem ji hozên Kurd li devera Torê, ji Hevêrka û êlên wan yên fille û Êzîdî, û musilman. Hem ji Mihelmiya, Harûna, Aliya, Abasa ta Mîran û Koçer û Gergeriya, û Êzîdiyên Şingalê, bi tevayî.

4- Devera **D:** dikeve bakura her dû deverên **B** û **A**, ta digihêje hembera çiyayê Qefqas. Saykis navên pirtir ji 25 hozên Kurd


li vê deverê dide xuyakirin, giringên wan hozan evin: Pencinara, Siloka, Lolana, Hesena, Îsoya, Cibira, Elika, Ezdîna, Zîlan, Başmana, Edmana, Heydera, Hemedka, Badila, Sîpka, Mamika, Zirika...

5- Devera **E:** dikeve navbera çemên Qizil yirmaq û Ferat. Saykis navên 15 hozên kurdên vê deverê da ye xuya kirin. Giringên wan evin: Kureşî (Balabiran, Çadirî, Badilî) Koçgêrî, Sînamina, Gurcik, Al xas, Qere Hesen, Do'xana, Nedira, Cîlika, Çox reşa, Dellika, Lek Kurdî, Bellika...

6- Devera ***F*****:** ev dever dikeve dervey Kurdistanê, çikû ew ji hozên Kurd yên bi zordarî hatine mişextkirin, di dema desthilata Sultan Selîmê yekem de, û hatine niştecih kirin, li deverên nêzîk Enqera, li navaTirka. Giringên wan Evin: 1- 300 xêzan ji hoza Oxçîsimî. 2- 400 xêzan ji hoza Orokçiya. 3- 20 xêzan ji hoza Millan. ji devera ***C*** hatine.

4- 120 xêzan ji hoza Şêxbizina. Ew dibêjin em ji devera ***A*** hatine. 5- hin xêzan ji hoza Şêwelî. Ji devera ***A*** hatine.

6- 200 xêzan ji hoza Badila. Bawerî ewe ku ji devera ***E*** hatine. 7- 300 xêzan ji hoza Hacî baniya. Ji Dêrsim yan Qereçda'x hatine. 8- 400 xêzan ji hoza Xatûn o'xlî, ji devera ***C*** ji Qereçda'x hatine. 9- 300 xêzan ji hoza Maxanî, ji devera ***C*** ji Qereçda'x hatine. 10- 800 xêzan ji hoza Omeriya, ji devera ***C*** hatine. 11- 1000 xêzan ji hoza Berekatiya. 12- 200 xêzan ji hoza Cewdika, ji devera **A** ji Şernex hatine. 13- 400 xêzan ji hoza Xillikan, ji nêzîk Rewandûz hatine.14- 500 xêzan ji hoza Sîvika. 15- 400 xêzan ji hoza Tîrika akincî bûne li rojavaya Enqera. 16- hin ji hoza Utmanka. Ji devera ***A*** hatine. 17-500 xêzan ji hoza Zirika, ji devera ***D*** hatine. 18- 500 xêzan ji hoza Canbika, ji devera ***C*** hatine.




خارطة تبين المناطق الكردية في الدولة العثمانية (وضعها السيد م. سايكس في سنة ١٩٠٨)

الحروف ـ تشير الى المناطق التي يسكن فيها الأكراد . الأرقام ـ تشير الى معارب القبائل . الصلبان ـ تشير الى مناطق النسطوريين .

Nuha em dê vegerin li têbîniyên Mînoriskî û Mîdiyan.

Mînoriskî, hin pêzanîn li ser Mîdya ji **''pertûka yekem, beşê30''** 30'' Ya dîrokzanê Ermenî Mayas Xoriniskî – werdigire, û dibêje:

**Mayas efsaneyên Ermenî û Îranî bi hev girê dide, û şahê Ermenî Tîkran dike hevbendê Şahê Îranî Korş, di têkbirina Mîdiya de, û Mayas dibêje: Tîgran piştî serkeftina wî li ser Şahê Mîdî, xweha xwe ya ku jina Şahê Mîdî bû – vegerand cem xwe, digel jina Şahê Mîdî ya dî ''Anoş'' û 10 hezar dîl, ji Maran (Mîdiyan), û Tîgran ew niştecih kirin, li herdû kenarên çemê Araks (Aras). Û Mayas wan cihên dîlên Mîdî – dide xuya kirin, bi wî xakê ku dirêj dibe ji çiyayê mezin (Ararat) ta Cilfe û Nexçuwan û Ordûbad. Û Mayas dibêje: li gorey stranên dîrokî, Ertiwazê kurê Erdeşêr, bajarê (Mara Kêrt) – ava kir, li devera Şarûr, di nav wan Marî yan de''**. Mînoriskî têbîniyên xwe, li ser van pêzanînên Mayas – dide, û dibêje:

**''Hin rastiyên giring di van pêzanînan de –hene, ya yekem, ev nîşankirina Cixrafî ya hûr nerîn, û ya duwem, navdana wan niştecihên Mîdî, bi navê (Mar) di cihê (Mîdiyan) de, û girêdana dema mişextbûna wan, bi ketina Şahîtiya Mîdî, bi destê Parsa. Û bi dil-xwaziyek welatdarî, Mayas navê Şahê Ermênya – dixe nav babetê, û her wiha navê Şahê Mîdî, ji navê Ixrîqî (Iştîvîko) diguhere bi navê**

**(Iştiyag) ku navekî ji rengê navê zihayê efsane (Ejdehak) ew ê navdar di Şahnameyê de.**

**Hêjayê Gotinê ye ku di ça'xa Mayas de, demek dirêj derbas bû bû, li ser ketina Mîdiyên kevnar, lê dîrokzanê Ermenî, navên wan, li hevdemên xwe yên Kurd yên ji wan – danî, û bi vî awayî rewişta kevnar parast, ew a ku dibêje: Kurd neviyên Mîdîya ne. Û ev pêzanînên Mayas, bi giştî, ew û jêderên dîrokî yên Erebî – li hev der dikevin, çikû ew jêderên Erebî Amaje dikin, bi hebûna niştecihên Kurd, li bakura Araks (Aras). Û ya ji van teva giringtir û duristir,amajeyên jêderên Erebî, bi hatina navê gundê (Ecdinqan) belkî Ejdeqan, li nik derbasgeha bajarê ''Devîn''û ev gund cihê ji dayikbûna bavê Selahidînê Eyûbî ye, dijminê Xaçperestan, û damezranerê Firzendeyên malbata Eyûbî (1250-1169)''**.

Mînoriskî dixe ser û dibêje: **''Ez dikarim tiştekî dî – bi êxim ser van; beşê rojava ji devera Mako, li Îran, û bi taybetî, devera Dambat ya ku Mayas li ser wê peyiviye, ta nuha jî niştecihên wê – Kurd in, û gava zimanê Ermenî navê (Mad) yê kevnar – dike (Mar), her wiha di zimanê Farisî de, navê (Mada) bûye (Mah) Û navê Mako yê kevnar – dê bibe (Mah - Koh) ango çiyayên Madan, ev jî, pêwenda Kurda bi Mîdiyan ve – Xurt dike''.**

Çawa Kurda, navê xwe, ji 'Mada' guhertin û kirin Kurd yan Kurmanc, Û dîrokzanê Ermenî pêwenda di navbera Kurd û Mîdiyan de – parast?

Mînoriskî bersiva vê pirsiyarê dide, û dibêje**: ''bê guman, desthilata Mada gelek hoz û komel dicivandin, û gava dirawsê yên Mîdî û Kurda, ji demên sed salan de, mebesta wan – ew be, ku ev herdû gelên nêzîkî wan – digihêjin hev,**

**bi yektiyek konevanî û fermandariyek kevnar û xwedî kok, her wiha Kurd jî dikarin navê xwe – girêdin, bi yekê ji hoz yan komelên xwe yên navdar bi taybetiyên leşkerî yan bi hevgirtinek hozdarî…''** Û Mînoriskî dibêje: **''Her ew guman û nerîna me ya bingehî – li ser xurtiya xwe dimîne, çikû eger Kurd ne neviyên Mîdiyan bin, gelo çi bi wî gelê reh kûr û gernas – hat? û gelo ev torra fireh ji hozên Kurdî ku bi zimanekî Îranî yê yekane dipeyivin, ew zimanê cuda ji zimanên Îran yên din – ji ku hatin?''.**




**nexşeya 13**
**(li gorey pertûka Î. M. Diyakonof bi navê "the Kurds")**

Em dê hin lêdiwanî bikin, li ser van herdû nexşeyên Cixrafî yên dîrokzan Î. M. Diyakonof. Gava em, li nexşeya 13, bi nerînek kûr binerin, dê ev der-encamên jêrîn – ji me ve xuya bibin:

**1-** Piraniya Fermandarî û Şahîtiyên, li deverên desthilata Mîdiya, niştecihên wan deveran, di demên nuha de – Kurd in. Wateya vê ew e ku Kurd neviyên Mîdiya ne.

**2-** Devera "Kardu" ya nêzîkî deryaçeya Qezwîn, ji aliyê roj-ava de, û nêzîkî deryaçeya Urumya, ji başûrê rojhilat de. Ev devera bi "Kardu" hatiye nasîn, ji berî hezarên salan, û ta nuha jî, niştcihên wê Kurd in – belgeye bo reseniya pêwendên Kurda digel Mîdiya.

**3-** Devera "Mardi" ya dikeve rojavaya Kardu, û nêzîkî navê Mardîn e, ew bajarê Kurdî ma ye, ta nuha – wateyekê dide xuya kirin, bi pêwendekê di navbera van herdû deverên ku niştecihên wan ta nuha jî Kurd in. Xuya ye ku mişextbûnek bi aliyê Mardîn de – çê bû ye.

**4-** "Saubaru" ew Şahîtiya dikeve başûra devera Kardu, û dirawsê yên hev in, ta nuha jî, niştecihên van herdû deveran Kurd in. Ev belgeye li ser pêwenda di nav Kurd û Mîdiya de.

**5-** "Manna" Fermandariya bajarvanî, bajarê Patîx bavê Manî Pey'xemberê nigarkar, dostê Hurmiz kurê Şapor, ew ê ku hat kuştin, bi fermana Behramê kurê Şapor. Patîx cengawerekî "Ikbatan" bû, li nik Farisan piştî ketina desthilata Mîdî, paş ê bû perestkarekî Filletiyê. Ev


payetextê Manna yek ji deverên peyrewên desthilata Mîdiya bû, û xuya ye ku Patîx yê ku bi nijad – Mîdî bû, û ji pileya cengawera bû, qîma wî nehat ku kar ji Farisa re bike, mişext bû û çû bajarê Mardîn, û bû fillehekî perestkar, û kurê wî "Manî" li bajarê Mardîn hatiye vê Cihanê û rêya jiyana xwe girtiye, ta gihaye narvîna xwe.

**6-** Horî û Mîtanî ew hozên Arî ku ji Îrana Kevnar hatibûn, û li hin deverên fermandariya Mîdiya niştecih bûn, beriya ku desthilata Mîdî bête damezrandin di sala 727 berî zayînê de.Xuybûna Horiya, her wekî dîrokzan Horist kingil da ye xuya kirin, di nîvê hezarê sêyemînê berî zayînê de bû, û Horiya desthilatek pêk anîn di çaryeka dawîn de, ji hezarê Duwem berî Zayînê, li devera navbera Ferat û Wanê, û payetextê wan Orkêş bû (Girê Moza) li devera Amûdê ji parêzgeha Cizîrê li Sûriya.

Dîrokzan dibînin ku Mîtanî ji Horiya ne, van Mîtaniyan jî desthilatek pêk anîn di sala 1530 berî zayînê de, payetextê wê "Waşûkanî" bû (Serê kaniyê) ji parêzgeha Cizîrê. Û desthilata wan fireh bû, ji Ferat derbas bû, ta giha Çiyayê Kurmênc û bakura Sûriya.

Ev herdû desthilat pişkdar bûn di desthilata Mîdî de, dema ku hat damezrandin di 727 berî Zayînê de, ta ku ket di 549 berî zayînê de. Niştecihên deverên van herdû desthilatan, ta nuha jî Kurd in. Ev jî belgeye bo reseniya pêwendên Kurd û Mîdiya, digel wan belgeyên me bûrandin.

* * * *




**nexşeya 15**
**(li gorey pertûka Î. M. Diyakonof bi navê the Kurds)**

Gava em, bi nerînek hûr, li nexşeya Cixrafî ya 15 binerin, dê ev der-encamên jêrîn, li ber çavên me xuya bibin:

**1-** Di destpêka damezrandina Mîdiya de, di sala 727 berî Zayînê de, ew ne gelek fireh bû, çikû ew hêj qels bû, nikarî bû ku desthilatên wek Horî, Mîtanî û Mardi..bixe bin destê xwe. Û di tenişta wê de, fermandariya Aşûriya xurt bû, ser-destî û destdirêjî li wê dikirin.


**2-** Di dema desthilata Keya Iksar de, bandora wî xurt bû, û hoz û komelên Mîdiyan civandin ser hev, û ew desthilatên serbixwe kirin fermandariyek xurt. Û devera desthilata Mîdî du qat fireh kir. Û Iskîtî jî (dijên hundirê Mîdiya û hevbendên Aşûriyan) – şikandin û dûr kirin, û bi alîkariya Babiliyan, Aşûrî jî şikandin, û payetextê fermandariya Aşûrî, Neynewa dager kir, di sala 612 berî zayînê de. Û desthilatek xurt bi navê Mîdiya – pêk anî, li hember desthilata Parsa ya qelstir.

**3-** Di dema deshilata Ejdehak de tuxûbên Mîdiya pir fireh bûn, nemaze bi aliyê rojhilat de, li deverên Imperatoriya Ariyan û Carmaniyan. Ev Ejdehak (Istiyak) kurê Keya Iksar e, dema desthilata wî 35 sal bû, û dema desthilata bavê wî Keya Iksar 40 sal bû. Me qezencên Keya Iksar – bûrandin.

Lê Ejdehak, tev ku wî tuxûbên Mîdiya – pir fireh kirin, ew ket gelek şaşiyên mezin, çikû wî hoz û komelên Mîdî çewsandin, û gelêriya xwe, li nava gelê xwe – winda kir, bi egera ku ne dadmend bû. Ejdehak ne pendiyar û konevan bû, çikû xwe sipart dixs û dil nexwazên xwe, gava xweha xwe Mandana – da Kambîs (Kembociya) bavê

Korş, Şahê Parsa, û xweha Tîgran Şahê Ermênya – kire hevjîna xwe, û van her duwa, bi hev re, fermandariya wî xistin, di sala 549 berî zayînê de, piştî cengek 3 – 4 salan. Û ji aliyê qezenca wî bi firehkirina tuxûbê Mîdiya, rast e ku qezenc giring e, lê parastina wê giringtire, û Ejdehak nikarî bû wê qezenca xwe bi parêze, digel ziyanên mezintir.

* * * *



Kêsma dêrîn ya Folklorê devera Urumya
Ji Mîdiya Dêrîn



Zeriyek Kurd ji devra Hekarî bi kêsima
Folklorî li devera B ji nexşeya Saykis
(Ji parastiyênristevan Salihê Heydo)

## Ferhengok

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L

M N O P Q R S Ş T U Û V

W X Y Z

---------------------------------------

### A

**Ajel:** tariş, malat, jîndarên kedî.
**Akam:** encam, dongî (netîce).
**Akar:** sinc û Sali'xên bilind.
**Akincî:** niştecih, ê li cihekî di jî û dimîne.
**Aloz:** arîşe, dijwar.
**Alozî:** dijwarî, arîşeyî.
**Amade:** pêkhatî, berhev, heyê li cihê jê-gotî.
**Amaje:** nîşan dan. nîşan.
**Amanc, armanc:** nîşan, mebest.
**Amas:** Avsan (werm)
**Amêr:** amraz (alet).
**Antax:** kesê bi dizî dijî dirawsê yê xwe kar bike.
**Arezû:** niyaz, daxwaza xurt.
**Asik:** mamiz, kejal, xezal.
**Ast:** rewşa bilindiyê, rade, pile.
**Asteng:** kosp, cihê sext.
**Aşna:** xweş hatiye nasîn.
**Aşûb:** gellacî û tevlihevî.
**Aram:** hêmin, asûde.
**Aramgeh:** gorra kesê pîroz.
**Araste kir:** berê tiştekî ya kiryarekê da alîkî.
**Arîşe:** dijwar, dijwarî.
**Asa:** wek. awayê surişţî ('adetî).
**Aşna:** navdar, nasbûyî.
**Aware:** derbider, ji cih derketî.
**Awarte:** ne asa,der avêtî, ne li rê.
**Avsan:** amas (werm). Nêm.
**Azar:** jan.
**Azarkêş:** jankêş, zorkêş.
**Ayinde:** dema hêj tê, mand.

### B

**Bac:** Pêtak, pereyên ku desthilat ji peyrewên xwe distîne.
**Bangeş:** durişmê amancek taybet.

**Baq:** gurz (mînak gurzê gula).
**Bayex:** giringî (Ehemiyet).
**Bayexdan:** dana giringiyê.
**Bed surişt, bed..:**pîs sinc.
**Berbijar:** palandî(mureşeh).
**Beyan:** sipîde, elend.
**Behre:** şens. dahata zeviyên zemînê (bereket).
**Behredar:** pir dahat.
**Belge:** girove, bawername.
**Belge newîst:** tiştê ku ne pêwîstî belgeya be (bedîhî).
**Ber:** Berhem, dahat.
**Berbijar:** palandî, ê pêşkêş dibe ji bo deshilatê yan karekî.
**Bere:** beşek ji hozê.
**Bere bere:** hin bi hin.
**Berger:** gorî,(qurban).
**Berengar:** ê dijî hinan radibe. ê napejirîne.
**Berengarî**: li ber rabûn.
**Behane:** hoyê ne rast (hincet).
**Bijar:** hilbijartî.
**Birg:** perçeyekî taybet ji nivîsandinê.
**Bi saya**: bi qenciya. bi alîkariya.
**Bizav:** tevger.
**Boçûn:** berî dan ramanê bi aliyekî taybet de.
**Bose:** sîpe, cihgirtina veşartî li pêşiya neyar.
**Bûyer:** rûdaw, tiştê diqewime

## C

**Ci'xirandin:** tevrakirina 'xeydê.
**Cîwaz:** cuda.
**Cîwazî:** cudayî.

## Ç

**Çak:** qenc, baş.
**Çav teng:** çikûs, ne merd.
**Çehr:** dîmenê rû.
**Çeleng:** çalak, jêhatî.
**Çember:** kember. pişt-bend.
**Çepel:** bê sûd.
**Çespand:** bi cih kir li gorey rêzanekê.
**Çewsandin:** zordarîkirin.
**Çewlîk:** xakê li kenarê Çem.
**Çimandî:** xwehrbûyî.

## D

**Dad:** bi cihkirina maf û erkan.
**Dadmend:** kesê maf û erkan bi cih bike.
**Dahat:** berhema zeviyên zemînê. Deramet. Behre.

**Dahêner:** berhemdar.
**Dast:** darayî, taybetiyên kesan.
**Dastan:** rista dirêj li ser bûyerên dîrokî û cengan.
**Degel kir:** gurêx kir, han da. Hêrsdar kir.
**Dek:** xap û bêbextî.
**Deramet:** berhema zemînê.
**Der bi der:** aware, ê ji cihnişînê xwe derketî.
**Der encam:** encama ji kiryarekê der dikeve.
**Derûn:** hinav, nihad.
**Deryaçe:** deryaya biçûk.
**Desthilat:** Fermandarî.
**Destmiz:** buhayê kar.
**Destwerdan:** destxistina nav taybetiyên kesên din.
**Dêmanî:** gundî**.**
**Dêre:** direng. kevnar.
**Didêre:** xwediyê tişte**.**
**Dilêr:** dilxurt, mêrxas, grnas.
**Dikoşe:** bi hêz kar dike.
**Diltezîn:** tiştê dil ditevizîne, bi jan e.
**Dinuwîne:** bi rewayî cihê hinan digire.
**Dirê'xî:** leke ya bi cihkirina kar (texsîrî).
**Dirûd:** pate. silava xurt.
**Diyarde:** bûyera gelek car tête ber çav.
**Dîdar:** hevdîtin.
**Dîl:** girtiyê destê dijmin.
**Dîlim kir:** bi kêrê perçe kir.
**Dongî:** dawiya tişt.
**Dubare:**ducar.
bi **Dugiyan:** avis, dergûşbar.
**Dujûn:** arastekirina peyvên pîs.
**Dupat kir:** bê guman kir**,** du cara bi cih kir.
**Durişm:** banga bi amanca taybet.
**Durv:** nîşanên surîştî.
**Dûnde:** zaruwê nêr, law.

## E

**Efser:** ser leşker (zabit).
**Emekdar:** qencînas, qencî bar.
**Encam:** akam, dongî (netîce).
**Erk:** karê ji mirov tête xwestin, berpirsî.
**Esayiş:** dezgehê parastina desthilatê.
**Estêl:** cihê kûr yê avcivîn ('hewz). çewlîkên kenarên çeman.

**Ezmûn:** nasîna ji serpêhatinê, sengandina pêzanînan.

## Ê

## F

**Ferhengî:** zanîn û rewştên Netewî.
**Fermanber:** karkerê berpirs li nik desthilatê.
**Fermî:** ji cihê fermandar.
**Ferzend:** jêmayên kesan ji zaro û neviyan.
**Fêrbûn:** hînbûn, têgihiştin.
**Firtone:** barana pir digel ba yê xurt.
**Bi Fîz:** ê xwe di ser xwe re dibîne., ê qurre.

## G

**Gef :** hereşe, fort.
**Gellaş:** geya ya biyanî di nav çandinyê de.
**Gencîne:** cihê parastina kerestên giran buha.
**Gengeşe:** dan û standina li ser babetekî taybet.
**Gendel:** çirûkê bê sûd.
**Gendelî:** çirûkiya derûnê.
**Gelêrî:** kes û tiştê aşna li nav gel.
**Geştiyar:** ê digere li dever û welatan.
**Gewde:** qilafet.
**Gewz:** rûgeş.
**Girove:** belge, bawername.
**Gurêx bû:** hate handan.
**Gurêx kir:** hêrsdar kir.
**Gûr:** pir vêketî, Xurt.

## H

**Halan:** nav têdan.
**Han:** bersiva hewarê.
**Helmet:** êrîşa leşkerî ya mezin û giran.
**Hevbend:** ên pabend bi peymanê.
**Hev jîn:** jina bi mêr, mêrê bi jin.
**Hêma:** nîşaneyê rêzdar, simbol.
**Hêrs:** tevrabûna 'xeyda mêrxas.
**Hêsa:** sivik, ne zor.
**Himbiz:** bilind rêje, pir jimar.
**Hiner:** hêz, xurtî.
**Hinart:** şiyand.
**Hînbûn:** fêrbûn.
**Ho:** sedem.
**Hol:** meydan. gastîn.
**Hoz:** komelek bere yên regezî.

## I

…………………

## Î

…………………

## J

**Jêder:** binema, ê tişt jê çê dibe.
**Ji mêj:** ji berê de, ji zû ve.

## K

**Kar ger:** xwedî bandor, çalak.
**Kar mizd:** kirya kar.
**Kat:** çuqa nuh ji kokê hişîn dibe.
**Kawdan:** rewş, bar, çawatî.
**Kedî:** kehî, canewerên ku ji mirovan na tirsin.
**Kereste:** regezê tişt (madde).
**Kêşe:** doz, daxwaza bi rezm.
**Kilamet:** rûdawa pir nexweş.
**Kilîdan:** kilîd (qifl)
**Kişwer:** welat. perçyekî mezin ji welatekî.
**Kopik:** bilindtirîn cih di çiya, gira...de.
**Koşan:** karkirina bi hêz.
**Kudik:** çêlikê beraz.
**Kosp:** rêgir, tiştê sext.

## L

**Layenger:** yê li aliyê hina raweste dijî hine dî.
**Leke**: şûreyî, nengî (eyb).
**Lêkdayî:**du tiştên bûne yekperçe.
**Lêlûn:** zeytûnê negihiştî.

## M

**Malbat:** çend xêzanên li bavekî digihên hev.
**Mamik:** tiştê na ête rave kirin bi hêsayî.
**Mand:** dema ku hêj têt.
**Melbend**: navend(merkez).
**Merc:** hoyê pêkhatina bûyerekê.
**Meşq:** hînbûna bi kiryar.
**Mijane:** perçeyê darîn ku bi nîrê cot ve têt girêdan.
**Milmilane:** rikberî, zoranî.
**Mirdal:** çirûkê derûn pîs.
**Mişext:** derbider, aware.
**Mujde:** mizgîn.

## N

**Na gunce:** li hev nake digel rewşê.
**Navnetewî:** Cihanî, dewelî.
**Naznav:** navê torevanî, hunerî…

**Navbirî:** ê ku berê peyv li ser wî bû ye.
**Necirî:** tiştê tête rastkirin û şayik kirin.
**Nehînî:** veşartî, bi dizî.
**Nemaze:** bi awakî taybet.
**Nemerdî:** dirê'xî( texsîrî).
**Nepenî:** nexuya, veşartî.
**Ne rêk:** ne wek, dij.
**Nerxandin:** danasîna buha, danasîna giringiyê .
**Newe:** nifşên li pey hev ji zaruwan, yan hevdeman.
**Nigehdarî:** miqatebûn, guhdan .
**Nihad:** derûna mirovanî (ûjdan).
**Nijad:** regez, koka hozdarî.
**Nijar:** dîwarê korta binê zemînê.
**Nijde:** birek şervanên ku êrîşî hinan dikin.
**Nijdevan:** yek ji kesên nijdeyê.
**Nimûne:** mînak (mestere).
**Nîgeranî:**dilperîşanî.
**Niyaz:** arezû, mebest.
**Noker:** rencber, 'xulam.
**Nuqum bû:** bi tevayî kete bin avê.
**Niza:** sirûd û lavayên oldarî.

## O

**Oflaz:** ê bi fîz, ê dikeve çav xwe, qurre.
**Orta'x:** Pişkdar (şirîk).

## P

**Padaş:** qereboya başiyê, rêzgirtina ji bo başiyê.
**Palandin:** xwe pêşkêşkirin ji bo desthilatê yan kar.
**Paye:** rade, pile. xwedîtin.
**Pejirandin:** pesend kirin.
**Penah bû:** xwe avêt talda...
**Penahber:** derbider, aware.
**Pendiyar:** bîrbir, şareza.
**Perwerde:** ê hatiye hîn-kirin. ê hatiye xwedî kirin.
**Perwaz:** destpêka firê.
**Peyman:** soza xurt.
**Peyrew:** ê ku dide pey hina.
**Piroje:** rêzana têtê danîn ku bi cih bibe. (meşrû'i).
**Pişkinîn:** lêgerîn ji bo zanîna durist.
**Pişkinîndar:** yê li tiştekî digere.
**Pîlan:** nexşedanîn. dek.
**Pût:** peykerê têtê perestin.

## Q

**Qad:** xak, zemîna rast.

**Qasid:** şande, kesê tête hinartin ji bo bicihkirina karekî.
**Qaşo:** Xwedê giravî, gerek wiha ba, lê wiha nebû.
**Qerebo:** tiştê tête dan, di cihê ziyana gihaye hinan.
**Qew'xe:** cenga giran.
**Qidoş:** bê şens, bed bext.

## R

**Radikal:** xwediyê daxwazên ne li gorey asa, tund- rêbîr..
**Rade:** pile (derece).
**Radest:** xwedan a destê kesê dij.
**Ramyar:** konevan (siyasî).
**Rave kirin:** şirove kirin.
**Rasipartî:** cihgirê bi sipartina yê bilindtir.
**Razber:** tiştê wateyî (me'enewî) li hember tiştê keresteyî (maddî).
**Reftar:** tevger. dan û standin.
**Regez:** reh, reg. nijad û kok.
**Reha bû:** rizgar bû.
**Renc:** zor û giraniya kar.
**Resen:** nijad bilind (esîl).
**Rewa:**pejirandî li gorey yasa û civak...
**Rewal:** cuwanê nûhatî.
**Rewişt:** ferhengiya kevnar. nerît. xo.
**Rewş:** Sali'x, serûber, çawatî. xeml.
**Rexne:** sengandin. berengarî.
**Rezm:** nelihevî, bihevçûn.
**Rêbîr:** bîr û baweriya tund. baweriya cihgirtî (mebde'e).
**Rêdar:** zagon (qanûn).
**Rêje:** pileya çendîtiyê (nisbe) beşek ji giştî, sê yek, sed yek. …
**Roxandin:** hilweşandin.
**Rêkeftin:** lihevkirin.
**Rûdaw:** bûyer.
**Rûqalî tişt bû:** hat pêşiya wî.

## S

**Sali'xname:**rapor, peyama nivîsandî bo berpirsê bilind.
**Saman:** zengînî.
**Sebaret:** ji aliyê.., li ser...
**Sehm:** saw, rengtirsa ji rêzgirtinê.
**Seng:** giranî li terazûyê. giraniya civakî, kesayetî..
**Senger:** çeper, tabû.
**Sepand:** kire erk li ser...
**Sergevaz:** serekê bi karîn.
**Sergo:** cihê civandina tiştên ne pak.

**Serjimêr:** hijmara fermî ya kesan, xaniyan**...**
**Serketî:** ê bi serkeve li ser dij.
**Sername:** navnîşana babet.
**Serwer:** mezintirîn serek.
**Serperişt:** nigehdarê li tişt.
**Sewal:** tariş, ajel.
**Seyr:** semere ('ecêb).
**Silogan:** durişm.
**Sinc:** surişt.
**Sirinckêş:**tiştê ku nerîn û ramanê dikêşe.
**Siza:** azardana xwediyê sûc.
**Sur:** dilkêşî. bayê nerm.
**Surgûn:** dûrkirina ji welat yan cihnişîn.
**Sûd:** qezenc.
**Sûc:** guneh

## Ş

**Şalyar:** alîkarê Şah yan Serek wezîr.
**Şanazî:** serbilindî bi nijad, sinc, kiryar…
**Şano:** temaşe xane.
**Şayiste, Şayen:** hêjayê pesn yan padaşê.
**Şehr, Şar:** bajar.
**Şaristanî:** akar ên têgihiştî û pêşveçûyî yên bilind.
**Şeypûr:** bûriya Mûsîqî.
**Şênî:** birrek konên nêzîkî hev.
**Şêt:** dihn. ne hişdar.
**Şiyan:** karîn.
**Şu'ûbî:**(Erebiye) gelbaziya dijî Erebîtiyê.
**Şû:** mêrê jinê.

## T

**Tawan:** sûc, guneh.
**Tene:** libên genim, ceh…
**Tenduristî:** sa'xlemiya laş.
**Teqela:**xwestina bicihanîna karekî.
**Têr û tesel:** danasîna hûr û girsê tişt.
**Tinaz:** galte, sûkayetî.
**Tol standin:** heyf hilanîn.
**Tomarkir:** bi cih kir bi nivîsîn, wêne…
**Tore:** xûyê qenc. ramanên Nivîsandî, wêje (rist û pexşan).
**Tundrew:** dilhişk ê bê dilovanî.
**Tûre bû:** 'xeyidî, dil teng bû.
**Tûşî bû:**bûyerek ne baş li wî ket.

## U

……………………

## Û

……………………

## V

**Vavirtîn:** jihevgerandin û nasîna tiştan ji hev.
**Vejandin:** sa'x kirin.
**Vekolîn:** lê gerîna xurt û pirsiyan.

## W

**Wane:** carek ji hînkirinê (ders).
**Wate:** mebesta peyvê, nivîsînê…
**Werar:** çakbûna pile bi pile. Dilxurtî, zorhilgirî.
**Wergirt:** ji dest hina girt. Li xwe kir.

## X

**Xame:** pênivîs (qelem).
**Xawer:** rojhilat.
**'Xeyd**: tûrebûn, diltengî.
**Xêzan:**bav û da û zaruwên wan, kes û kar.
**Xiniz:** kesê dikeve aliyê neyarê civak yan netewê xwe.
**Xul:** gera lîskê, kar…
**Xulek:** yek ji şêstê demjimêrê.
**Xû, Xûy:** surişt. nerît ('adet)

## Y

**Yasa:** rêdar (qanûn).
**Yasakarî:** danîna yasayan (Teşrî'i).
**Yawer:** alîkar yan hevalê mezinan (Şah, Serek, A'xa..).
**Ya'x:** kêm hêz, hûr qilafet.
**Yaxîbûn:** li ber rabûn. raperîn.
**Yeker:** yek perçe.

## Z

**Zade:** Zêç, firzend (nesl).
**Zal bû:** bi ser ket li ser dijê xwe.
**Zevî:** xakê çandî.
**Zirih:** zirxê cengê.
**Zirihpoş:** ê zirx li xwe dike. Amêrên çekdarî ên gulle wan kun nake.
**Zivêr:** dilteng ji hina, nehez.
**Ziyan:** dijê qezencê.
**Zîrevan:** Pasvan, bekçî.
**Zorbe:** piranî.

## ***Jêderên vê vekolînê***

**1-**  Berekat ( Merwan ) : Çiyayê Lêlûn

**2-**. Berekat ( Merwan ) : Efrîn di deman de

**3-** Diyakonof ( Î.M.) : Mîdiya, Wergêr: Wehîba Şewket

**4-** Ebdirrehman (Dr. Xelîl ) û hin wergêrên  din : Evista

**5-** Hevind ( Govara) Hijmara 3-4, Nivîskar: Zinar Zazî.

**6-** Hiwar (Govara ) Hijmarên: 11, 12, 16, 17, 6o, Nivîskar: Dr. Azad Elî. Û hijmara 21, daner Roger  Lescaut, wergêr: Dr. Amed.

**7-** Logirig (Stîvin Hamislî) :Dîroka Sûriya û Libnan, di dema desthilata Firensî ya serperiştî de.

**8-** Me'lûf (Emîn) : 'Hdaiqinnûr

**9-** Mînoriskî( V.F ) : Têbînî, Kurd neviyên Mîdiyane, Wergêr:  Nivîsgeha Pêşverew.

**10-** Qasim( 'Îsa Birahîm) : Elmîran fî imaret Botan

**11-**. Reşîd (Dr. Cemal) : Dîroka Kurdên Kevnar

12- Rondot (Pierre) û Roger  Lescaut : Hozên Kurdî li Sûriya, Wergêr  Dr. Izziddîn Kurdî.

13- Saykis (Mark) : Hozên Kurd li Imperatoriya Osmanlî, Wergêr: Dr. Xelîl 'Elî Murad.

14- Silêman (Xidirê) û Cindî ( Xelîlê) : Êzîdiyatî.

**15-** Zekî (Mihemed Emîn): Dîroka Kurd û Kurdistan, Wergêr: Mihemed Elî Ewnî.

16- Û gelek mereqdarên dîroka hozên Kurdî.

## ***Pertûkên daner yên çap-bûyî:***

**1-** Nigarên kul û derdên jiyanê, (Helbest) 12 – 1996.

**2-** Nerînek di terazûya ristên Kurdî de, (Vekolîn) 8 – 1997.

**3-** Geştek li nav ba'xê ristên Cizîrî, (beşê yekem) 3 – 2000.

**4-** Hin hest û ramanên netwî û civakî, (nivîsînên corecore) 4 – 2002.

**5-** Geştek li nav ba'xê ristên Cizîrî, (beşê duwem) 10 - 2003.

**6-** Doza giran û umîdên tevlihev, (Beşê yekem). Helbest.10 – 2006.

**7-** Doza giran û umîdên tevlihev, (Birra duwem).Helbest.11 -2007.

# Fehrist


| BABET | RÛPEL |
|---|---|
| Diyarî | 9 |
| Pêşgotin | 11 |
| Hoza Koçerên Botan | 15 |
| Hoza Hesina | 23 |
| Hoza Abasa | 25 |
| Hoza Omerka | 29 |
| Hoza Aliya | 31 |
| Hoza Aşîta | 35 |
| Hoza Hevêrka | 41 |
| Hoza Pinar Eliya | 51 |
| Hoza Deqoriya | 57 |
| Hoza Gabara | 61 |
| Hoza Millanê Xidir | 65 |
| Hoza Kîkan | 71 |
| Hoza Omeriya | 81 |
| Hoza Millanê  Paşê | 85 |
| Hin piroje û yasayên şovînî ;Çembera Erebî | 93 |
| Serjimara awarte 1962 | 99 |
| Fermana yasakarî ya komarî ya /49/ | 103 |
| Nerînek li ser hin ramanên M.T. Hilal | 109 |
| Rewşa desthilatdariya Sûrî | 143 |
| Pîlanên desthilatdarên Sûrî | 153 |
| Zincîra pîlanên li ser devera kîkan | 161 |
| Belge û nîşanên hebûna kurdî | 163 |
| Hoza Beraziya | 171 |

| | |
|---|---|
| Çiyayê Kurmênc | 179 |
| Nerînek li bandora guhertinên corecor | 199 |
| Çiyayên navdar li devera çiyayê kurmênc | 201 |
| Şûnwarên Nebî Horî | 205 |
| Kurdên Horî | 207 |
| Kurdên Mîtanî | 209 |
| Şûnwarên Horî û Mîtanî | 211 |
| Depên Babilî yên şûnwarî | 213 |
| Nerînek li ser Ola Êzîdî | 215 |
| Nerînek kurt li ser nasnameya Mîdiyan | 221 |
| Ferhengok | 241 |
| Jêderên vekolînê | 251 |
| Pertûkên daner | 252 |
| Fehrist | 253 |